Mîrzeyê Çolo Siloyan



RIYA KU BER BI ZIYARETÊ DIBE: PEY SÊ SALAN RA



Pêşkêşî
bîranîna dê û bavê xwe yên ezîz
Çoloyê Silo û Emîna Memê dikim





"Bona min riya ku ber bi ziyaretê dibe, rêyeke dijwar bûye, lê îro ez şa û bextewar im, çimkî ez îdî ji wê rê derbaz bûme û li Ermenîstanê warekî ber dilê êzdîyan ezîz – Ziyaret heye".

Mîrzeyê Çolo Siloyan

MÎRZEYÊ ÇOLO SILOYAN

EZDIKI.COM

RIYA KU BER BI ZIYARETÊ DIBE: PEY SÊ SALAN RA

Wergera ji ermenî: Têmûrê Xelîl

БИБЛИОТЕКА
ИНСТИТУТ
ЕЗИДСКОЙ ИСТОРИИ И РЕЛИГИИ
книга № 17 0050

Yêrêvan 2015

Berpirsyar: Sêrgo Yêrîysyan
doktorê zimanzanîyê, profêsor

C 566 Siloyan Mîrzeyê Çolo
Riya ku ber bi ziyaretê dibe. Pey du salan ra (Yêrêvan, Edit-Print, 2015, 306 rûpel+168 rûpelên rengîn):

Ev pirtûk bona sêsalîya ji roja duakirina ziyareta êzdîyan ya li Aknalîçê ronahî dibîne û tê da îzbatî û bûyerên bi xuliqandina ziyaretê ra girêdayî hene, wek nimûne seredanên pêşin û dudan yê serekê ruhanîyê yê hemû êzdîyên cihanê, cenabê Mîrê Mîran Tehsîn Beg li Ermenîstanê, axavtinên tevgelên wê bûyera dîrokî. Di vê pirtûkê da gotinên xudanê wê hene derheqa rêze-heykelên ermenîyan-êzdîyan, ji wana heykelên Zoravar Andranîk, Ûsiv beg, Cangîr axa û bîranîna bona şehîdên Komkujîya ermenîyan. Di kitêbê da ku armanca wê ya sereke sazkirina ziyaretê ye, bazirgan-xunedarê ji Moskvayê Mîrzeyê Çolo Siloyanê sazkirina ziyaretê bingeh girtîye û bi xwendevanan ra bîr û bawerîyên xwe parvedike derheqa jîyana xwe, roj û demên buhurî, xwefemdarîya miletîyê, pevgirêdanên ermenîyan û êzdîyan, derheqa paşeroja Ermenîstanê da. Ev pirtûk bona xwendevanên bi goveka fire ye.

ISBN 978-9939-52-988-2

© Mîrzeyê Çolo Siloyan
© "Edit Print"

Dewsa pêşgotinê an jî fikir û dîtinên Mîrzeyê Çolo Siloyan yên ji dil û xeyalên wî

Sala 2013an girêdayî sersalîya ziyareta êzdîyan ya li Aknalîçê pirtûka Mîrzeyê Çolo Siloyan ya bi sernivîsara "Riya ku ber bi ziyaretê dibe" ronahî dît, ku derheqa wê yekê da ne, ka ew ziyaret çawa xuliqî. Nivîskarê pirtûkê bi vê yekê ra tevayî, fikir û dîtinên xwe yên derheqa dostanîya gelên ermenîyan-êzdîyan, rehên wê raberî xwendevanan dike. Tê da malûmatîyên hewaskar hene derheqa bingehdanîna ziyaretê, duakirina wê, usa jî bûyerên bi wê ra girêdayî da. Di pirtûkê da fikir û bawerîyên kesên ruhanî yên ji merkeza ruhanî ya hemû êzdîyên dinyayê hatî, karmendên bi nav û deng hene.

Gava pirtûka "Riya ku ber bi ziyaretê dibe" çap dibû, fikirek xuliqî, ku her sal ewê careke din çap bibe, û emê bi bûyerên nû û teze va ewê dagirin û bixemilînin. Û çimkî sersalîya 2an ya ziyaretê bi vekirina heykelê dostanîya ermenîyan-êzdîyan û ewledên gelê êzdî yên layîq Ûsiv beg û Cangîr axa, dostên wan yên here baş Zoravar Andranîk va hate pîrozkirin, lema jî femdarî ye, ku xudanê pirtûkê – Mîrzeyê Çolo Siloyan derheqa wan bûyeran da fikirên xwe yên dagirtî dibêje û navê "Çar mezinayên dostanîyê an jî hisreta welêt di dil da" lê kirîye.

Çawa ku sernivîs ji me ra dibêje, pirtûka pêşin derheqa kar û barên çar mezinayên dostanîya ermenîyan-êzdîyan raberî me dike – Ûsiv beg û Komîtas, Cangîr axa û Zoravar Andranîk û destnîşan dike, ku 145 salîya Ûsiv begê û 140 salîya Cangîr axa temam dibin. Derheqa jînenîgarîya wan da malûmatîyên hewaskar tênе raberkirinê, rola wan di destpêka sedsalê da û salên dû wê ra tênе ber çevan. Eva yeka berî sersalîyên rojbûnên wana, wê

malûmatîyên baş bide xwendevanan derheqa du ewledên hêja yên gelê êzdî da.

Û bona vî karî Mîrzeyê Çolo Siloyan rêwîtîya Ermenîstana Roava kirîye, çûye warên jidayîkbûna Ûsiv beg û Cangîr axa – gundê Eslanlûya Surmelîyê û gundê Çîbûxlûya Wanê. Di dema rêwîtîyê da çûne gundê warê jidayîkbûna bavê Mîrzeyê Çolo jî, gundê Kullikê. Nivîskarê pirtûkê derheqa wan hesîn û fikiran da şirove dike, ku ewî li gundê ber dilê xwe ezîz da texmîn kirîye.

Wek ku li hîvîyê bûn, di pirtûkê da malûmatî hene derheqa wê yekê da ka 29ê îlonê li Ziyareta Aknalîçê çi qewimî. Mesele, vira heytehola vekirina kompleksa heykelan ya dostanîya ermenîyan-êzdîyan bi 5 heykelan va qewimî û ev şahî wek her sal vê carê jî bi tevgelîya bi hezaran kesan va hate derbazkirin.

Di nava çend mehan da ev war bûye cîyê hizkirî ne tenê bona êzdîyan, lê usa jî bona ermenîyan, tûrîstan. Vira bingehê gelek şahîyan tê danînê. Mesele, 25ê sibatê 150 salîya ewledê ermenîya yê hêja, dostê gelê êzdî Zoravar Andranîk hate kivşkirinê.

Di pirtûkê da tê gotinê, ku li Ziyareta Aknalîçê cara pêşin eyda Melekê Taus hatîye kivşkirin, ku gorî salnameya êzdîyan roja sala teze ye. Di pirtûkê da usa jî derheqa wê yekê da tê gotin, ku çawa çûne ji gundê Mêsêr, li navçeya Saratova Rûsîyayê hest-pestên Cangîr axa anîne, çawa 100 salîya Gelkujîya Ermenîyan dane kivşê, ku birêz Mîrê Mîran Tehsîn Beg û wezîrê Komara Ermenîstanê yê parastinê Sêyran Ohanyan jî tevî bîranîna wê rojê bûne.

Di vê pirtûkê da usa jî şirovekirinên derheqa rêzafîlmên bernameya "Kartisk" yên bi sernavên "Êzdî: ewledên Rojê", "Riya ku ber bi ziyaretê dibe: pey salekê ra", "Riya ku ber bi ziyaretê dibe: pey du salan ra", "Hisreta welêt di dil da" hatine bicîkirinê, ku bernameya "Kartsik" ew kişandine. Bi van bûyeran va pirtûk diha dewlemend bûye. Xwedîyê pirtûkê matêrîyalên pirtûka berê parastine, ku li wir ew bawerîyên xwe bi sernivîsara "Riya ber bi ziyaretê" raberî xwendevan dike. Û ewî di zû da xwe li riya ber bi ziyaretê girtibû, bi pêşîyên xwe ra tevayî, lê tenê 29ê îlonê sala 2012an gihîşte

mirazê xwe, gava bi serokatîya serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê, birêz Mîrê Mîra Tehsîn Beg û bi tevgelîya desteya bilind ya ruhanîyên ji Lalişê li Aknalîçê dua li ziyaretê hate kirinê. Bi emirê serekê ruhanî 29ê îlonê hate elamkirinê wek Roja ziyaretê.

Bê guman, salnivîsarvanên dema me û dîrokzan wê ewê rojê qeyd bikin û destnîşan bikin, ku li Ermenîstanê ziyareteke wisa hate çêkirin û wê rojê hate vekirin. Dîrokzan wê herwiha di ser da zêde bike, ku ziyareta êzdîyan ya li Ermenîstanê di rojeke payîzê ya xweş û germ da vebû, wê rojê tavê nedîr dabû. Ewê rojê yê herî bextewar bazirganê ji Moskvayê Mîrzeyê Çoloyê Siloyan bû, ku ev ziyaret bi mecal û hereketê wî xuliqîye. Ew bi dilekî şa got: "Ev ziyareta xem û xeyalên min e, ku herdu Masîs lê mêze dikin, ew cînara Dêra ermenîyan ya sereke ye, ku li Êcmîadzînê ye û ji çiyayê Elegezê bayekî hênik dilê me baristan dike". Ziyareta ku Mîrzeyê Çolo Siloyan daye çêkirin, îdî dusalî ye, xwedî dîroka xwe ye. Her kes tê vir, êzdîyên ji welatên dereke, ji cî û warên dûr û nêzîk, tên serê xwe ber ziyaretê daynin, dua bikin, rê û rizmên kal û bavan pêk bînin. Ermenî jî tên, miletên din jî tên bona serê xwe ber ziyareta Xwedê daynin.

Ev pirtûka han derheqa wê yekê da ne û ne tenê wê. Beşa wê ya pêşin da rojnîşa 29ê îlonê sala 2012an e, dema roja dua li ziyaretê hate kirin merivên amadekar bîr û bawerîyên xwe gotin, ew bûyer qîmet kirin û daxwezên xwe anîne ser zaran. Em wê jî bêjin, ku di nav wan da hemû mêvanên wê rojê yên qedirgir hebûn bi serokatîya Mîrê Mîran Tehsîn Beg. Em dikarin seredana wî bi nav bikin wek ya dîrokî, ji ber ku ji serekên ruhanî yên hemû êzdîyên cihanê tu kes di nava zêdeyî 100 salan da nehatibû Ermenîstanê.

Bingehê vê beşa pirtûkê bernameyên têlêvîzyonê ya bi navê "Kartsik" in ("Bîr û bawerî") bi rêportaj û hevpeyvînan va û li ser bingehê wan sazkirina fîlma bi sernavê "Riya ku ber bi ziyaretê dibe". Di beşa pirtûkê ya din da bazirganê navdar Mîrzeyê Çolo Siloyan bîr û bawerîyên xwe bi xwendevanan ra parvedike. Sernivîsarên pirtûkê xweber derheqa naveroka wê da şirove

dikin, ku ew raberî xwendevanan dike - "Merivê herî bextewar an jî Ziyaretek di nava dem û dewranan da tê sazkirin", "Dijî berxwedana di hindava şerbazîyên sedsala 21ê an jî derheqa dijwarîyên êzdîyên dîyasporê da", "Kar û xebata pir li welêt e an jî em gerekê Ermenîstanê bikin welatê xewn û xîyalan".

Mîrzeyê Çolo Siloyan dema behsa diyaspora li Moskvayê û bajarên Rûsîyayê yên cuda-cuda da sazbûyî dike, derheqa koka xwe ya miletîyê da ji bîr nake, behsa wan pêwendî û danûsitendinên êzdîyan dike, ku li xerîbîyê dijîn, lê bi dil û can di heyra Ermenîstanê da nin û bêrîya wê dikin. Di pirtûkê da hevpeyvînên balkêş hene, ku Mîrzeyê Çolo Siloyan bi xwe hewl dide bersîva wan bide. Ewana di hevpeyvînên bi sernavên "Berbanga behra Wanê ya edilî" û "Di dema dijwar da gelê ermenî li rex me ye" da xuya dibin. Ev pirtûka gelekî balkêş û dewlemend bîr û bawerî û xeyalên xudanê pirtûkê ne ji sala 2012an hetanî meha îlona sala 2015an.

Mîrzeyê Çolo Siloyan û olka êzdîyan 3 salîya ziyareta Aknalîçê bi bûyareke teze û giring va didine kivşê. 22ê nîsanê sala 2015an bi haziraya serekê ruhanî yê dînê êzdîyan Mîrê Mîran Tehsîn beg û desteya bilind ya ji Lalişa Nûranî hatî hîmê qubeya Taûsî Melek hate danînê. Êdî proêkta qubeyê heye (arkîtêktor Artak Xûlyan) û hîm hatîye kolanê. Wê demek derbaz be, û olka êzdîyan ya Ermenîstanê wê bibe xwedîya qubeyeke bedew. Me qirar kir, ku wêneyê qubeyê ser qapaxê pirtûka "Riya ku ber bi ziyaretê dibe. Pey sê salan ra" hebe.

Rastîyê jî, riya ku ber bi ziyaretê dibe, ne hêsa ye, xwesma ku ew ber bi qubeya nû dibe.

Sêrgo Yêritsyan,
doktorê zimanzanîyê, profêsor

P.S. Ev pirtûk di nav sê salan da hatîye nivîsar. Her sal ew bi nivîsên teze va hatîye dewlemendkirinê, lema jî emê hinek caran rastî dubareyan bên. Em bi zanebûn wana dihêlin, û ser wê bawerîyê ne, ku her yek ji wana derheqa dema xwe da nin.

Banga 100 salîya Gelkujîya ermenîyan û vegera Cangîr axa li ziyareta Aknalîçê

Hilbet, piştî xebata berhemdar ya sala 2014an li ziyareta Aknalîçê, ku 5 heykelên kesên ber dilê me ezîz hatine çêkirin, rehetîyek lazim bû. Lê tabetîya merivan nedihat, çimkî ziyareta ku bi kompleksa heykelan va hatibû dewlemendkirin, her kesî ber bi xwe dikişand, ew bûbû warekî bona dîtinê hewaskar ne tenê bona êzdîyan, lê usa jî bona ermenîyan, miletên din û bona tûrîstan. Li vira tiştekî balkêş jî tê meydanê. Dibe ev ziyareta me bibe sebeb, ku tûrîst ji wira berê xwe bidine devera Armavîrê, dibe xem û xîyal gelek bin, lê rastîyek heye. Ber çevê me rastîyek xuliqîye, ew jî ew e, ku emê hema bêje salekê li ziyareta xwe rojbûna wan kesên bi nav û deng bidine kivşê, ku heykelên wana li vir in. Êdî em derheqa wê yekê da nabêjin, ku heykelê dostanîya gelên ermenî û êzdî dike bîra me, ku gerekê rojeke taybet hebe bona kivşkirina wê rojê. Bona vê pirsê û pirsên din êdî gavên pêşin hatine avêtin.

Çend mehan pey vekirina kompleksa heykelan ra 150 saliya rojbûna Andranîk Zoravar bû.

Her kes zane, ku Andranîk Zoravar ji alîyê êzdîyan da gelek hizkirî bûye wek merivê bi Cangîr axa ra nêzîk.

Û tiştekî gelekî şabûnê bû, ku wê rojê me di kompleksa heykelan da bi hezaran kes dîtin, piranîya wan êzdî bûn, ku hatibûn qedirê ermenîyê mezin û dostê gelê me bigirin. Xên ji wê, ku ji alîyê miletê me da gotinên dilgerm hatine gotinê, li meydanê gelek sazbendên êzdî demeke dirêj sitiranên ser Zoravar Andranîk, Cangîr axa, Ûsiv beg sêwirandî gotin. Bi hezaran kes koçerî û govend direqisîn, û ew hemû seba xatirê Zoravar Andranîk bû.

Şabûn, serketin, dostanî, ruhê pêwendîyên mirovatîyê yên ji

dil û germ li wir perwaz dida. Lê ji dîdema kevirî li me mêze dikir serleşkerê navdar, welatparêzê mezin Andranîk Ozanyan, ku ji bo welatê xwe canê xwe feda kir. Lê berî ku ji Ermenîstanê here, li hewşa Dêra Êcmîadzînê cara dawî rastî Cangîr axa hat. Paşê dîtindaran şedetî dan, ku di navbera wan da sohbeteke dûr û dirêj bûye, aminaya xwe li hev anîne, lê bona paşeroja Ermenîstanê herdu jî xemgîn bûne. Paşdemê da jî Andranîk her firsend bi kar anîye û silavên xwe yên germ ji hevalê xwe yê çekdarîyê ra şandîye.

Gava fikir hebû bona bingehdanîna kompleksa heykelan li Aknalîça me, me biryar kiribû, ku heykelên Zoravar Andranîk û Cangîr axa li rex hev bêne danînê, bi bejina xwe ya kubar û mêrxasîyê va. Dema berî çend salan gora Zoravar Andranîk cîguhastî welêt kirin, em jî fikirîn, ku em gerekê gora Cangîr axa ji warê wî yê sirgûnkirî – Saratovê bînine Ermenîstanê. Xwesma pey hobêlyana rojbûna Zoravar Andranîk ra, berî 100 salîya gelkujîya ermenîyan ew pirs careke din serî hilda û gelekan behsa wê yekê dikirin.

Ew yek gerekê bi heykelê li Aknalîçê yê bedew va pêk bihata û te digot qey dengek bangî hemûyan dike bi lez wê gavê bavêjin. Û me ew gav fesal avît.

Di destpêka nîsanê da dêlêgasyona me ya biçûk, ku xên ji min nebîyê Cangîr axa – Wezîr, doktorê zimanzanîyê, profêsor Sêrgo Yêrîtsyan, yek ji nûnerê olka ermenîyan ya li Saratovê Sîmon Kaxyan jî di nav da bûn, me berê xwe da Saratovê. Armanca me ew bû, ku mezelê Cangîr axa bibînin û ji wir hest û pestên wî, xwelîya goristanê cîguhastî ziyareta Aknalîçê bikin. Berî ku em bigihîjine wira Sîmon Kaxyan bi mûzêya gêologîyê ra tevayî hinek karên tivdarekdîtinê kiribû, hewil dabû mezelên biratîyê an jî goristanên tevayî li wan waran dîyar bike, ku warê Cangîr axa yê sirgûnkirî bûye. Heyf, me warê çalkirina wî dîyar ne kir, goristan an cîguhastî kiribûn, an jî li wir xanî hatibûn çêkirin. Lê xênji vê, hinek malûmatîyên din ber destê me hebûn. Ew malûmatî me bi zar û bi nivîsar ji wan kesan sitendibû, ku li warê sirgûnê bûne. Mesele, di bin destê me da malûmatî hebûn, ku Cangîr axa li herêma Saratovê,

navçeya Krasnoarmêyskê, gundê Mêssêrê, 50 mêtran nêzîkî dêra gund, di navbera dêrê û gelîyê nêzîk da hatîye bianxkirinê.

Em berê xwe didine wî gundî. Navê wî yê niha Ûst-Zolîxa ye û weke 100 kîlomêtran ji Saratovê dûrtir e.

Her çar alî berîstan e. Dar û daristan kêm in. Rast e, meha nîsanê ye, lê bîna buharê nayê, zêde bîna bayê zivistanê tê, lema jî li vir berf û şilope tevlihev dibe. Ji dûr va çemê Volgayê xuya dike, ku hemdê xwe dikişe. Li ser rê warên jîyanê xuya dikin. Piranîya wan xalî bûne, kes tê da najî. Ez texmîn dikim, ku di salên şêr da ev war di çi halî da bûye, dema leşkerên faşîst êrîş birine ser û ji ber wê jî vira xeta riya hesin hatîye çêkirin. Bi van fikiran va pêşî em gihîştine merkeza Krasnoarmêyskê, ku mîna bajarekî biçûk bû, lê demeke kurt şûnda em gihîştine Ûst-Zolîxayê.

Em yekser bêjin, ku li vî gundî warê sirgûnê bûye, ku Cangîr axa ji sala 1937an heta sala 1943an lê derbaz kirîye.

Ev war warê sirgûnê bûye û li vir bi şuxulê malhebûna gundîtîyê va mijûl bûne, femdarî ye, ku kesên vira piranî karê xwelîbêcerkirinê û rêncberîyê kirine.

Dîroka vî warê jîyînê gelek balkêş e, ku şedetîya wî dêra lyutêrîyê ya nîvhedimî ya bê ban e. Ew destpêka sedsala derbazbûyî, diha rast sala 1914an hatîye çêkirin. Ew tê wê maneyê, ku li vira alman hebûne. Ewana bi teglîfkirina Yêkatêrînaya 2an hatine vira, bi armanca ku piştî manîfêstoya sala 1762an xwelîya vir ya ekindar bêcer bikin. Bi fermana qiralîçê ya sala 1766an gundîyên ji Prûsîya rojava, Badênê, Hêssênê û warên din hatine vira. Û hema ji wan jî gundê pêşin tê avakirinê û navê serekê wan "Mêssêr" jî li vî gundî kirine. Gundîyên alman ew xwelîya bi ber bona xweşkirina aborîya xwe bi kar tînin, ekinekî baş distînin. Sala 1891ê jimara binecîyên vî gundî digihîje 4360 merivî, ev war bi ekinê xwe va li sûka kirîn-firotanê deng dide, ku her roja şemîyê kar dikir û ji gundên der û dorê jî dihatine vira, xurek dikirîn. Û nizanî bo çi desthilata Stalîn hema li vî gundî warê sirgûnîyê çê kiribû, ku binecîyên wî him xwelîbêcerkirinê va mijûl dibûn, him jî karê çêkirina

xeta riya hesin dikirin. Em wê jî bêjin, ku di salên şêr da binecîyên alman jî ji vir hatine sirgûnkirin. Wek ku hevalbendên Cangîr axa yên sirgûnê destnîşan dikin, ew jî dema sirgûnê bi karê xwelîbêcerkirinê va mijûl bûne. Û kesên der û dorên wan yên di sirgûnê da zanibûn, ku ew kî ye û qedirê wî gelek digirtin. Li vira êzdî û ermenîyên mayîn jî di sirgûnê da bûn. Wana zanibû, ku Cangîr axa nexweş e, lema nedihîştin ew karên giran bike. Bona wana gelek hewaskar bûn gotinên wî yên terbîyetkirinê, qise û temîyên wî, zanebûn û berbihêrîya wî. Yek ji ermenîyê sirgûnkirî gotîye, ku her caran li wî dişêwirîn, çimkî ew merivekî xwedî cêribandina pir bû, her cûre ecêb hatibûn serê wî û ewî bangî gencan dikir berbihêr bin, ber dijwarîyan ber xwe bidin, digot ku hûn genc in, temamîya jîyana we ber we ye.

Pêşî em li wê mezîla axê gerîyan, ku ew êzdî û ermenîyên Cangîr axa nas dikirin, destnîşan kiribûn. Pêşî em bi merr û kulingan va xebitîn. Paşê me texmîn kir, ku ew yek bêfeyde ye, me traktor da xebatê. Vê carê jî encam ne zêde bi dilê me bû, lê me çend hestûyên mirîyan dîtin. Dihate texmînkirinê, ku li wir mezelên bi kom hebûye. Merivên sere digotin, ku li vir gelek kes hatine çalkirin, êdî badilhewa cîyên din negerin, ji ber ku di salên 70î da goristana gund ya kevin, ku kesên sirgûnkirî li wir hatibûne definkirinê, cîguhastî cîyekî din kiribûn, lê li cîyê kevin xanî hatine lêkirinê. Jina gund ya here sere Galîna Bokatanova 84 salî, ku soz dabû me derheqa warên jîyînê yên kevinare da malûmatîyan bide, rêberîya me kir ber bi goristana kevin, ku berî 40-50 salan li wir dewsa wan havîngeh hatibûn çêkirin. Dima ku me ji goristana li rex dêra Lyutêrîyê hinek xwelî hilda, û ew yek nebîyê Cangîr axa – Wezîr kir, lê me kulîlkên sor danî dewsa xwelîya ku me kolabû, dû ra em ber temene bûn, ango me bejina xwe tewand. Gava me ya duduyan jî mantiqî bû: xwelîya ji vira hildayî gerekê cîguhastî kompleksa heykelan ya li Aknalîçê bikin û gerekê bikine nava hîmê heykelê Cangîr axa û berî wê jî me ji warê jidayîkbûna wî – ji gundê Çîbûxçî ya li herêma Wanê xwelî anîbû û kiribû nava hîm da.

Li rex dêra Lyûtêrîyê ev her tişt wek bûyareke hewaskar xuya

dikir, meriv dixwest her tişt bi dengekî bilind bêje. Şilope dibarî, bayekî sar dihat, lê em bêdeng li wir sekinîbûn.

Çavên Wezîr şil bûbûn, di destê wî da xwelîya ji goristanê bû, ew bêdeng sekinî bû. Bi xwe jî nizanibû wê demê çi bike. Dû ra Sîmon Kaxyan tevî xeberdanê dibe û dibêje, ku li ser vê axê bi hezaran kesên sirgûnkirî mirine, di nav wan da êzdî û ermenî jî, ku tu sûcek jî nekiribûn, lê welatparêz in, tevaya jîyana xwe karê bona milet û gelê xwe kirine, wek Cangîr axa, û lema jî hatine sirgûnkirin.

"Ez gelek şa me, ku bi kêmanî bi vî cûreyî Cangîr axa wê vegere welatê xwe,- Sîmon Kaxyan dibêje,- lê hûn zanin çiqas kesên nenas hene, ku li vira hatine çalkirin. Eger em behsa Cangîr axa bikin, em dikarin bêjin, ku ew bi vî cûreyî vedigere warê xwe. Ez zanim, ku ew li warê sirgûnkirî jî navê miletê xwe, şerefa xwe, xeysetê xwe bilind xwey kirîye, herdem bi şêwr û temîyên xwe va hêz û qewat daye hevalên genc yên mînanî wî sirgûnkirî".

Dû ra, pey xeberdana Sîmon Kaxyan ra Sêrgo Yêrîtsyan xeberda: "Bi dehan salan ew daxweza merivên Cangîr axa mîyaser nedibû, ku dixwestin meytê wî cîguhastî warê wî bikin, çimkî mezelê wî merivê mezin û binavûdeng gerekê bi sîmvolîkî be jî, li Ermenîstanê be. Hema ew yek bûye bingeh, ku me dixwest wî şuxulî bînine sêrî.

Çavê min herdem li ser Mîrzeyê Çolo Siloyan bû, ku timê nerehet bû. Bi sehetan ji wî warî dûr nediket, ku mezelê biratîyê li wir bû, lê hîvîya wî xurt bû. Ew hîvîya wî bi vî awahî pêk hat".

Dû ra em demeke dirêj bêdeng man. Ez nizanim, tiştên em bêjin tunebûn, yan me her tişt îdî gotibû – bi mêzekirina hevdu û bêdengî gelek tişt digot. Te digot qey di nav vê bêdengîyê da emir û karê Cangîr axa perwaz dida – bi hezaran rûpelên xwe yên mêrxasîyê va. Gelo Cangîr axayê, ku gelek caran ji mirinê fitilî bû, dikaribû bifikirîya, ku ewê li berîstanên Rûsîyayê ji vê dinyayê bar bike û li goristana biratîyê ya li rex dêra Lyûtêrîyê bê çalkirinê. Niha nûnerên gelên ermenî û êzdî amadekarîyê dibînin wî mêrxasî vegerînine welêt.

Çendekî şûnda di guhê gelekan da gotinên Ûst-Zolîxa (Mêssêra berê) yên jina gund ya here sere deng dida: "Dîroka gundê me hewaskar e, beşeke wê dîrokê warê sirgûnê ye. Ewana li vira jî, di van şertan da şerefa xwe bilind xwey kirin, derheqa miletê xwe û malbetên xwe da difikirîn. Gava behsek digihîşte wan, dinya ya wan bû. Hûn zanin merivên çawa zane, navdar ji vê sirgûnîyê ra derbaz bûne. Binecî hema bêje bi sirgûnkirîyan ra nediketine nava danûsitendinan, lê ewana bi gundîyan ra li deştê û ser xeta hesin dixebitîn. Binecîyan digot, ku ew merivên ji miletên cuda-cuda bûn, di nav wan da ermenî û êzdî jî hebûn. Warê sirgûnê heta niha jî maye. Dîsa sirgûnkirî tînine vira, lê tenê ji Rûsîyayê. Bi gotineke din, ew heta niha jî kar dike. Îzbatî ye, ku di salên şêr da çêkirina xeta hesin serê gelekan xwerîye. Û çêkirçî binecîyên vî warî bûn.

Kesên sirgûnkirî gerekê tu wextan bênav nemînin, em borcdar in bizanibin, ku ew merivên çawa bûne, jîyana wan û karê wan çawa bûye. Ez şa me, ku ez hatime hest-pestan bibînim û bi xwe ra bibim".

Roj diçe ava, şilope zêde dibare, em xwe li riya Saratovê digirin, ku vê carê ji me ra dirêj hat. Hilbet, di salên 30-40î yên sedsala derbazbûyî der û dorên vî warî berîstan bûne, bi zivistana sar û zehmet va, lê bi xwelîya xwe ya ekindar va. Mêrxasê him Sardarapatê, him jî Baş-Aparanê, mêrxas û serekqumandarê ku zora tirkan birîye, gerekê bibûya xwelîbêcerkir, bi kêmanî di 5 salên sirgûna xwe da, lê dîsa jî ew yek ji ecêban e, ku anîne serê wî.

Ne axir ew dikaribû di Şerê Wetenîyê yê Mezin da bibûya leşkerekî baş, weke ku gelek tevgelên şerê mêrxasîyê yê Gulanê da ne tenê bûne leşkerên Şerê Wetenîyê yê Mezin, lê wisa jî bûne qumandar.

Ez ser wê bawerîyê me, ku gerekê ne tenê pesinê mêrxasên me bê dayînê, lê herwiha gerekê jîyan û karê wan raberî nisleta genc bikin. Çi ku heye hindik e. Mêzekin ew kesana zehmetîyeke çawa dîtine. Di rastîyê da piştî testîqkirina qeydê Sovêtîyê ew kesana ketine nava rewşeke teng, her deqe li bendê bûn ku wê ne

tenê duruşmeya "dijminê milet" bi wan va bikin, lê herwiha wê wana sirgûn kin. Him Cangîr axa, him jî Ûsiv beg (ew çû Farizistanê û vegerîya) dikaribûn welat terk bikirana, biçûne welatên dereke, lê wana wisa ne kir, çimkî pêşîkêşên milet nikaribûn terka miletê xwe bikirana û xwe li riya şaristanîyê bigirtana û tenê li xwe bifikirîyana. Dibêjin, ku Zoravar Andranîk ji hevalê xwe – Cangîr axa ra gotîye, ku herine welatekî dereke, lê ewî bersîv daye, gotîye ku nikare miletê xwe bi tenê bihêle, yên ku hêvîya xwe danîne ser wî, warên xwe hîştine, hatine. Hilbet, ewî zanibû, ku wê wî bikine hebisê, wê sirgûn bikin. Usa jî kirin. Lê dema milet dît, ku ew teslîm nebûn û ne revîn, ew li rex wan man.

Di rê da ez û Sîmon Kaxyan di erebeyekê da bûn. Dostanîya min bi wî ra ya gelek salan e. Pey bûyerên ha ra carina bêdengî jî xweş e. Ez destpê dikim derheqa diyaspora ermenîyan ya Saratovê da jê dipirsim. Dema em li balafirxaneya Saratovê peya bûn, dêra ermenîyan ber çevê min ket. Meriv digot qey ew ji ezmanan hatîye. Ew hema li rex balafirxaneyê ye û bûye yek ji sîmvolên Saratovê, çimkî ew berî gişkan di pêşîya mêvanan da tê û wana verê dike.

Sîmon Kaxyan dibêje, ku eva çend sal in ew wê dêrê çê dikin, lê xilazîya wê xuya nabe, çimkî pêşîyê dixwestin tenê dêrekê çê bikin, paşê çêkirina komplêksê di serê me da xuliqî, ku li wir gerekê xaçkevir, kevirên bîranînê, usa jî navbenda xwendinê-çandê hebûna.

Ez bi fikiran va ziyareta me ya Aknalîçê himberî vê kompleksê dikim: armancên paqij û ji dil çiqas mînanî hev in! Ewana ji karên biçûk dest pê dibin, paşê dibînî, ku gekerê kar berdewam bikî, dîsa bikî. Rojtira din, gava ez dîsa çûme dêrê û kompleksê, ez ecêbmayî mam. Ya here sereke, min ew daxwez û hevgirtina ji dil dît, ku dostên me yên ermenî her tişt dikirin bona çêkirina dêra Astvatsatsîn û tevaya kompleksê bi serfinyazî xilaz bikin.

Ez dikarim bêjim, ku dostên min yên ermenî wê li bajêr xwedî ocaxa xwe bin, wê bêne wir ne tenê bona duakirinê, lê wisa jî bona wê yekê, ku nasîya xwe bidine kûltûra miletê xwe, zarok wê hînî

zimanê xwe bibin, ango Saratov wê bibe navbendeke ermenîyan.

Wek ku dostên min yên ermenî digotin, li her deran wê warê hêsabûnê be, bi şadirwanan, bi golên bedęw va. Li vira meriv dikare serhêsa û dilrehet be. Ez bi dostanî razîbûna xwe didime Yekîtîya welatparêzîyê ya Saratovê ya bi navê "Krunk" û wan kesên ku bi alîkarîya wan ev warê ermenîyan yê bedew tê çêkirinê.

Ecêb e, ku ermenî bi kêmanî di salên 1700-1800î wek tucar hatine vira, kolana xwe ya ermenîyan çê kirine, herwiha li rex kenarê Volgayê warekî ermenîyan saz kirine, ku tucarên ermenî herdem serî lê dixistin. Wana qeysî û kişmîş, tametîskên Rohilatê yên mayîn dianîne vira, ji vira jî nan dibirin, digîhandin heta Farizistanê. Nivîskar Mînx di pirtûka xwe ya bi sernivîsa "Birayên sibatê" da nimûneya ermenîyekî bazirgan – Kalûst Bogdanî Kalamkarov tîne, ku eşîya ji Bekûyê, Astraxanê, Pişkavkazê dianî û di bazara Saratovê ya Jorîn da difirot.

Salnivîsar dide xuyakirin, ku Kalûst Kalamkarov dikana xwe bi wêneyên baxçeyên Kavkazê va dabû xemilandin, bi çivîkên ser daran va, bi şînkayê, bi germayê û bi wê yekê va dilê binecîyên Saratovê baristan dibe, xwesma dilê zaran, ku ew ermenîyê mezin gelek caran şîrinayî û qeysî dide wan.

Wek ku dostê min Sîmon Kaxyan dibêje, sala 1913an li vir 451 ermenî hebûn û piştî gelkujîya ermenîyan jimara wan bi carekê va zêde bû, ew jî bi hesabê penaberên, ku ji gelkujîyê filitîbûn. Diyaspora ermenîyan ya Saratovê danûsitendinên xwe zêde bi ermenîyên Astraxanê yên derecebilind û bazirgan ra dikir. Ermenî alîyê çêkirina perçeyan da hosta bûn.

Sîmon Kaxyan ewqas hewaskar gilî dike, ku zehmet e her tişt di bîra xwe da xwey bikim. Em diçin ber xaçkevirê li merkeza bajêr û kulîlkan datînine wir. Sîmon dibêje, ku sed heyf îro li Saratovê tu kolaneke ermenîyan tune. Rast e, xelk kûçeyeke navbenda bajêr wek ya ermenîyan bi nav dikin, çimkî ew berê wisa dihate binavkirin. Lê dû ra bi destî kesekî va hatîye guhartin. Lê dîwana bajêr bona şaşîya xwe rast bike, pêşnîyar kirîye ew warê ku dêra

ermenîyan li wir e, bê binavkirinê wek"Seyrangbaxê ermenîyan". Sîmon ser wê bawerîyê ye, ku ew pêşnîyareke gelekî baş e.

Ez dipirsim: gelo li Saratovê û der û dorên wê çend malên êzdîyan hene? Ew jimareke rasteqîn nizane, lê dibêje, ku danûsitendinên wan bi ermenîyan ra gelek in. Karê çêkirina dêrê da alîkarîya pereyan jî dane. Orta wan û malbetên ermenîyan gelek xweş e.

Li wir jî wext hindik e. du rojên me zû derbaz bûn. Alîkî va me karê xwe qedandîye û wext e rê bikevin, berê xwe bidine Ermenîstanê, alîyê dinê va jî hevalên me yên Saratovê ewqas dilgerm û mêvanhiz bûn, ku em vî warî diha zêde hiz dikin û em li wan waran va diçin, ku lingê ermenîyekî mezin – Mîxaîl Tarîêlovîç Lorîs Mêlîkov lê ketîye, yê ku di salên nexweşîya tayê da bûbû welîyê tevaya warên li rex Volgayê, di nav wan da Saratovê jî, û di nava çend mehan da ew nexweşî da hilanînê û ew belaya ku serê bi hezaran kesan xwer, ji holê da rakirinê û navê "gemkêşê nexweşîyê" (sala 1879an) lê kiribûn. Li vir derheqa wê yekê da jî ji bîr nekirine.

Û gelek îzbatî û bûyerên din. Û li balafirê ez bi dostê xwe Sêrgo Yêrîtsyan ra em hewil didin jimara wan ewledên ermenîyan bidine rêzê, ku bi serfinyazî qulixî Qiralîyeta Rûsîyayê kirine, hurmet û sîyaneta ermenîyan bilind xwey kirine. Lîsteyeke mezin derket.

Em berbanga sibê gihîştine balafirxaneya Rewanê ya "Zvartnos"ê, berbangeke meha nîsanê ya bedew e. Herdu Masîs di bin şewqa royê da diçûrisin. Cangîr axa vegerîya welatê xwe.

Belkî jî gerekê çend roj derbaz bibin, bona em tiştên dîtî bimehînin û destpê bikin biryar bidin ka di rojên pêş me da emê çi bikin, çimkî roja 22ê nîsanê ne dûr bû. Wê rojê wê li ziyareta Aknalîçê 100 salîya Gelkujîya ermenîyan bihata kivşkirinê û hema wê rojê jî wê hest û pesten Cangîr axa, ku me ji goristana biratîyê anîbû, li ziyareta Aknalîçê bikine nava xwelîya hîmê heykelê wî.

Di vî karê pîroz da wezîreta parastinê ya Komara Ermenîstanê piştgirîyeke mezin da bona her tişt bi qedirgirtina leşkerîyê va bê

БИБЛИОТЕКА
ИНСТИТУТ
ВОСТОКОВЕДЕНИЯ
N° 170050

kirinê. Wezîrê parastinê bi xwe dibêje, ku çiqas mijûl be jî, ewê ese di wê merasîmê da amade be. Ji Navbenda ruhanî ya êzdîyan li Lalişê jî behsên xêrê tên, ji wira dibêjin ku dêlêgasyoneke wan bi serokatîya serekê ruhanî yê hemû êzdîyên cihanê, Mîrê Mîran Tehsîn beg wê wan rojan li Ermenîstanê be, bona tevî heyteholên 100 salîya Gelkujîya ermenîyan bibin, ku wê li Rewanê û li Dêra Êcmîadzînê bêne derbazkirin.

Hilbet, karê tivdarekdîtinê lazim e, çimkî wê cara pêşin ber kevirê bîranînê yê bona Gelkujîya ermenîyan qedirê bîranîna şehîdên gelkujîyê bê girtin.

Lema jî bîranîna 22ê nîsanê hema li ber wî kevirê bîranînê tê derbazkirin. Pêşî bi hazirîya metranê ermenî, serekê ruhanî yê herêma Armavîrê Sîon Adamyan, paşê jî bi serokatîya serekê ruhanî yê hemû êzdîyên cihanê Mîrê Mîran Tehsîn beg dest bi heytehola ruhanî dibe, paşê metran Sîon Adamyan xeber dide.

"Gelî cimaetê, eva bîranîneke dawî ya berî bîranîna ruhê şehîdên Gelkujîya ermenîyan e, çimkî wek hûn zanin, sibê li Dêra Êcmîadzînê wê bi serokatîya metranê mezin bi hezaran şehîdên me bêne bîranînê û wê navê horîyan û melekan li wan bikin. Ji wê şûnda herdem wê ew bêne bîranînê, dû ra emê ber xaçkeviran û ber heykelên gelikujîyê wana bi bîr bînin. Lê îro em vira berev bûne bona herdu miletên me 100 salîya gelkujîya ermenîyan bi bîr bînin, du miletên ku bûne xwedî qederekê. Van dawîyan li bakurê Îraqê gelê êzdî pêrgî qedereke wisa bû, ku hatibû serê ermenîyan, meriv dibê qey sala 15an di sedsala 21ê da ber çavê dinya medenî dubare bû. Em îro bona wê yekê jî berevî vira bûne, ku careke din hestîyên Cangîr axa bispêrine xwelîyê, ku hela di dema xortanîyê da dengê heqîyê bilind kiribû. Gava bavê wî Xetîf axa mir, paşayê Wanê fikirî ku wê bikaribe hukumî li ser 12 gundên êzdîyan bike, ku di bin destê Xetîf axa da bûn. Û leşkerên xwe şand bona ew hebûna xwe teslîm bikin. Cangîr axa bi xwe derket, guhê leşkerekî paşa jê kir, gotê: "Here ji xwedî-xudanê xwe ra bêje, ku Xetîf axa

tune, lê Cangîr axa sax e û xwedîtîyê li miletê xwe dike". Sala 1904an saleke xêr bû, çimkî du paşa rastî hev hatin – Cangîr axa û Andranîk Ozanyan, ku yek ji ewledekî ermenîyayî mezin e. Û gava pê hesîya, ku Cangîr axa gerekê bizewice, Andranîk paşa xwest bibe serdewatîyê wî. Û ew dostanî diha mehkem û qewîn bû. Cangîr axa û êzdîyên din jî ketine ber derba sala 1915an û mecbûr man mihacirî Ermenîstana Rohilatê bibin, lê sala 1918an bi lawên ermenîyan ra tevayî warên Ermenîstana Rohilatê – Sardarapatê, Baş-Aparanê, Qerekilîsê parastin. Îzbatîyeke hewaskar: Koma ji 2000 siyarîyan dikir 20 selefê tevaya artêşa ermenîyan, ku dijî tirkan şerê man-nemanê dikir. Û ew îzbatîyeke mezin e, ku gelê êzdî tevî parastina gelê Ermenîstana Rohilatê û gelê xwe bûye. Em ber şehîdên xwe temene dibin, serê xwe berjêr dikin, û em êdî miletekî bêçare nînin, em miletekî dewekar in, çimkî dewleta me heye, Ermenîstan serbixwe ye û li hemû warên cihanê li gelê xwe xwedî derdikeve. Û îro em wek milet gerekê, wek dewekar xwe biparêzin. Û îro em dixwezin sala teze ya gelê êzdîyan bimbarek bikin, ku şemîya buhurî hate pîrozkirin. Em dixwezin ku Sala teze bona wana aram û edil be, bona bikaribin careke din bibin xwedîyê welatê xwe, vegerine malên xwe, bi jîyaneke xweş va bijîn. Bira Xwedê bi hezaran duayên xwe va ruhê şehîdên me ronahî bike, wisa jî ewledên gelê êzdî, yên ku bi destî eynî tirkan li Îraqa Bakur da şehîd ketin. Bira Xwedê qewatê û sebirê bide me hemûyan. AMÎN".

Birêz Mîrê Mîran Tehsîn beg got:

"Ez we hemûyan silav dikim, xwesma mêvanên derecebilind û razîbûna xwe didime gelê ermenî, ku herdem jî li rex êzdîyan e. Sala 1915an bi ermenîyan ra tevayî êzdî jî hatine qirkirinê û wî çaxî jî ermenîyan û êzdîyan bi hev ra şerê dijminê xwe kirine. Û îro êzdîyên li welatên cuda-cuda dijîn, hevalên wan yên ermenî hene û biratîya me berdewam e û ewê bi dewranan wisa be".

Amadekar ji heykelê bona şehîdên Gelkujîya ermenîyan diçine

ber bi heykelê Cangîr axa, bona nebîyê Cangîr axa – Wezîr Xetoyan di bin dengê sirûda ermenîyan û dengê solên lingê leşkeran tabûta bi hestûyan va ya ji Saratovê anî bike hîmê heykel da. Ew bi kevirê gorê û kulîlkan va tê pêçan.

Dû ra merasîm dest pê dibe û yê pêşin ku xeber dide, wezîrê parastinê yê Komara Ermenîstanê Sêyran Ohanyan e.

"Sala 2015an bona gelê ermenî saleke taybet e. Îro bi gelê ermenîyan ra tevayî cihana pêşketî şîna wan şehîdên gelkujîyê dike, ku berî 100 salan pêk hatibû. Merasîma îro, ku diyaspora êzdîyan teşkîl kirîye, hema bona wê rojê ye. Em navê hemûyan yek bi yek zanin. Ew gelkujîya pêşin bû, ku sed sal jê darbaz bûye, û îro em gişk navên wan di kûraya dilê xwe û ruhê xwe da xwey dikin. Ev bedbextî ya me hemûyan e, him ya ermenîyan e, him jî ya êzdîyan e. Lê ewê ne ermenîyan, ne jî miletên din ne şikênand, yên ku li rex ermenîyan sekinîbûn, di nav wan da êzdî jî. Em xeberên xwe yên razîbûnê didine wan dewletan, civakên pêşketî û miletên dost, ku gelkujîya ermenîyan nas kirine û şermezar kirine. Û ev merasîma ji alîyê xûşk û birayên me hatîye teşkîlkirin, bîranînek e bona wan rojên reş. Û em razîbûna xwe didine dostên xwe, çimkî me gelek rûpelên dîroka xwe bi hev ra nivîsîye. Me bi xûşk û birayên xwe yên êzdî ra tevayî çetinayî û rojên xweş dîtîye. Û îro jî di dîroka nû ya gelê ermenîyan da em herdu milet ji gelkujî ders hildayî tevî şerê bona rizgarkirina Arsaxê dibin, ku bi sitûyê me va alandine. Xûşk û birayên me yên êzdî mînanî pêşîyê xwe – Cangîr axa, ku me hestûyên goristana wî anîye Ermenîstanê, di şerê bona rizgarkirina Arsaxê li rex me bûne. Ewana îro jî li rex me ne. Êzdîyên ku eskerîyê da qulix dikin, li Komara Ermenîstanê di şertên wekehev da tevî karê him parastina welêt, him jî karên sosîal-civakî dibin, ango Komara Ermenîstanê welatê wan e. Bê şik, di dema her merasîmeke ha da em gerekê derheqa dostanîya xwe, biratîya xwe da xeber didin, û ez ser wê bawerîyê me, ku xên ji gotinên dilxweşîyê, gerekê razîbûna xwe bidine wan kesan,

ku vî warê batinî ciwan dikin. Bira dostanîya gelên ermenî û êzdî ewqas mehkem bibe, wek ku sal bi sal, meh bi meh, roj bi roj ev warê buhurtî – ziyareta me ciwan dibe. Rehma Xwedê li şehîdên me be û silavên germ ji bo dostanîya me ya bi sedsalan, ku wê heta-hetayê bijî".

Wek ku em li bendê bûn, li wir silavnameya yekîtîya rezadilên parastvanên welêt hate xwendinê, û li wir wisa jî gênêral-lêytênant, mêrxasê Arsaxê Manvêl Grîgoryan jî hazir bû.

Li silavnameyê herwiha dihate gotinê:

"Ez ji navê yekîtîya parastvanên rezadil, hemû parastvanên komarê, şervanên brîgada 5an, welatparêzên xort û genc û ji navê xwe razîbûna xwe didim, ku li rex kompleksa heykelan ya ermenîyan-êzdîyan, 100 salîya Gelkujîya ermenîyan tê bîranînê".

Dostanîya gelên ermenî û êzdî ji kûraya sedsalan tê, me bi hev ra gelek rê qedandîye. Di şerê Sardarapatê da li rex ewledên ermenî mêrxasên êzdîyan jî şer kirine bi serokatîya Cangîr axa. Qedera gelên me bi wê yekê va jî yek e, ku herdu gel jî ji alîyê eynî hovî da hatine qirkirinê. Bona di sedsala 21ê da pêşî li gelkujîyan bigirin, bona gelên me bi aram bijîn, em mecbûr in hevgirtî bijîn, di her pirsekê da piştgirîya hev bikin. Ez gerekê bi şabûn bêjim, ku him ermenî, him jî êzdî vê rastîya sade rind fêm dikin.

Şerê Arsaxê da ewledên gelê êzdî jî li rex me bi mêrxasî şer dikirin, bi serokatîya min jî şervanên êzdî egîtî û mêranî nîşan dane û min texmîn kirîye, ku ew her deqe amade ne emirê xwe bidin bona azadîya Arsaxê, bona serxwebûna gelê ermenî. Li rex mêrxasên ermenî di vî şerî da êzdîyên şîrhelal jî şehîd ketine. Silav li giyana şehîdan, ew nemir in.

Bona qewînkirin, kûrkirina dostanîya ermenîyan-êzdîyan ev kompleksa heykelan roleke mezin dilîze û em bona çêkirina wê razîbûna xwe didine dostê ermenîyan yê mezin, bazirgan Mîrzeyê Çolo Siloyan. Banga min a leşkerîyê ew e, ku gelên ermenî û êzdî

bi hev ra bin. Ermenîyan û êzdîyan li vê deverê 5 000 salan bi hev ra jîne, berî 1000 salan jî bi hev ra jîne û dostanî kirine, berî 100 salan jî û berî 25 salan jî bi hev ra jîne û mil bi mil kar kirine. Û bi hezaran salên din jî emê li rex hev bijîn, emê bi hev ra ber dijwarîyan ber xwe bidin û bi ser kevin. Gelên me wê bi hev ra hela gelek rûpelên serketinê binivîsin".

Piştî silavkirinê fermana gênêral-lêytênant, mêrxasê Arsaxê Manvêl Grîgoryan hate xwendinê.

"Bona keda mezin ya di şerê ermenîyan û êzdîyan yê miletîyê-azadîyê da Cangîr axa Xetoyan piştî mirinê bi mêdalyaya bîranînê ya bi navê "Ermenîstan, brîgada 5an" va xelat bikin".

Bi vê mêdalyaya bîranînê ew kes têne xelatkirinê, ku bi mêrxasî şer kirine. Cangîr axa di tevaya jîyana xwe da yekî wisa bûye. Ew hela xort bû, dema şerê tirkên bêbav kir.

Mêdal teslîmî nebîyê Cangîr axa – Wezîr Xetoyan kirin.

Min jî ji navê malbeta me mêdalyaya bîranînê ya "Cangîr axa" teslîmî Manvêl Grîgoryan kir, ku dostekî min yê herî qenc e û bi alîkarîya wî ev ziyareta me ya li Aknalîçê mezintir û firehtir bûye.

Gênêralê xwedî gelek mêdalyayan got, ku bona min serbilindî ye ez xwedî mêdalyaya Cangîr axa bim, ji ber ku ew ne tenê merivekî mêrxas û egît bû, lê wisa jî yek ji wan kesan bû, ku dostanîya gelên ermenî û êzdî mehkem kir.

Em bêjin, ku gênêral-lêytênant Sêyran Saroyan jî bi medalyaya Cangîr axa va hatîye xelatkirin. Dewsa wî kurê wî ew mêdal sitend. Ez di ser da zêde bikim, ku wê rojê xên ji êzdîyan gelek karmendên ermenî jî mêdalyayên "Cangîr axa" û "Ûsiv beg" sitendin, wek welîyê Armavîrê Aşot Xahramanyan, metranê dêra Armavîrê Sîon Adamyan, parlamentarê Parlamentoya Ermenîstanê Aragats Axoyan, rêvebirê mûzê-înstîtûta Gelkujîya ermenîyan ya Sîsêrnakabêrdê Hayk Dêmoyan, serekê înstîtûta dîrokê ya Akadêmîya Zanyarî ya Komara Ermenîstanê Aşot Mêlkonyan, sêkrêtarê wê înstîtûtê Karên Xaçatûryan, serwêrê kompleksa

heykelan ya Sardarapatê Karên Arîstakêsyan, serwêrê arşîva dewletê ya Ermenîstanê Amatûnî Vîrabyan, serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê, Mîrê Mîran Tehsîn beg, serekê ruhanîyên Lalişê Bavê Şêx, lawê serekê ruhanî Mîr Hazim, karsazê êzdî yê Îraqê Elî Êzdî Xelîl, nûnerê êzdîyên Ermenîstanê Ezîz Temoyan, Amo Şeroyan, Sîabendê Xudo Bekoyan, Rizganê Simo Şemoyan, Cindî Amoyan, êzdîyên Rûsîyayê Têlman Fêroyan, Zade Cindoyan, Samvêl Koço, Yûrayê Dasinî, merivên Cangîr axa û Ûsiv beg – Sûrên, Wezîr û Miraz Xetoyanan, Mecîd beg û yên mayîn.

Belkî jî em rojekê navê hemû kesên xelatgirtî bidine rêzê, lê em şa ne, ku li rex me ew mirov in, ku bêy wana me nikaribû ev heytehola han ya bi navûdeng û dagirtî derbaz bikira.

Her caran jî min qedirê wan merîyan girtîye, yên ku rast, zelal û helal xeber didin. Mesele, her caran zanyarên Înstîtûta Dîrokê ya Akadêmîya Zanyarî ya Komara Ermenîstanê têne cem me û dokladên hewaskar dixûnin. Roja vekirina ziyaretê serwêrê Înstîtûtê, doktorê dîrokê, profêsor Aşot Mêlkonyan gelek baş xeberda û qîmetekî bilind da çêkirina ziyaretê. Îro jî sêkrêtarê Înstîtûtê Karên Xaçatryan qîmetekî mezin da Cangîr axa û rola wî di şerê Gulanê da, ew mêrxasî û xwenehêvişandin destnîşan kir, ku di şerê dijî tirkan da kemala wan mezin bû.

Û ji ber ku gilî hate ser Cangîr axa, ez careke din dubare bikim, ku em hemû jî deyndarê wî kesê mêrxas in, çimkî me hela tam ser jîyan û karê wî lêkolîn ne kirîye. Ez nizanim çi gerekê bê kirinê, lê zanim, nivîsên di arşîvan da wê derheqa wî da gelek tiştên teze bêjin. Ewê îzbatî û bûyerên nû raberî me bikin derheqa wî camêrê mêrxas da.

Ev hemû gerekê bê hesibandinê wek karê nekirî, eger ji destê me jî bê em wî alî da karekî bikin, em hazir in.

Dema li ser vê dikê sekinîyî, alîkî va hewas e meriv guh bide xeberdanên her kesî, alîkî dinê va jî eger lazim be tu jî xeberdî, wê demê cabdarîya te diha zêde dibe û tu xwe nerehet texmîn dikî. Heta berî çêkirina ziyaretê min zar xeber dida, lê pey çêkirina

ziyaretê ra xeberdana zar dest min nakeve, ez nikarim bê nivîsar tiştekî bêjim, çimkî fikirên min gelek in, lê gotinên min hindik in. Lema jî ez niha fikirên xwe dinivîsim, paşê dixwînim û xwendina ber gelek kesan jî ne pir hêsa ye. Lema jî niha bo min hêsa ye xeberdana xwe nivîskî we ra bêjim.

"Welatîyên min, kesên ber dilê min ezîz

100 salîya Gelkujîya ermenîyan îro li ber heykelê Aknalîçê yê bona bîranîna şehîdên zulmkarîya cantirkan di sala 1915an da em gîhandine hev.

"Dîrokê çend caran îzbat kirîye, ku êşên merivan û rûreşîya merivan bêsînor in. Lê berî ku cantirk sedsalekê pêşda ew hovîtîyên xwe pêk anîn, merivayî nizanibû ku dikare biqewime dewletek bikaribe bi plankirin xelkê sivîl, jin û zaran, kal û seqetan bide ber xwe û bikuje, ecêbên nebînayî bîne serê wan. A bona wê yekê ye, ku çavên me bi hêsir in. A bona wê yekê ruhê me bi xem e. Îro em vira berev bûne ne tenê wan mîlyon û nîv şehîdên birayên xwe yên ermenî bîr bînin, lê wisa jî wan miletên kêmjimar – êzdîyan, aşûrîyan, huruman bîr bînin, ku di destpêka sedsala 20an da li Tirkîyê mînanî ermenîyan ketine devê şûrê zulmkaran. Ez bawer im, ku temamîya gelê ermenî, ewledên wê yên şîrhelal, dema 24ê nîsanê baqên gulan daynine ber heykelê bîranîna şehîdên Gelkujîya Mezin ya li Sîsêrnakabêrdê, bi edetê xaçparêzîyê yê here merivhizîyê va wê şehîdên gelên dinê jî bîr bînin, ku wê rojê ketine bin derbên tirkên hov.

Vê roja şînê da ez bi dilekî êş dibêjim, ku beşeke tevaya cihanê heta îro jî ji dest bîranîna şehîdên xwe dizêrin. Merivaya medenî hetanî îro jî helwesta hinek dewletan ya înkarkirinê û xwemukurnehatinê temûl dike, di nav wan da ya Tirkîyê jî, ku behsa wê yekê dikin ku bona gelkujîyê xudêgiravî îzbat lazim in. Ez dixwezim pirsekê li wan bikim û zanim jî, ku ewê nikaribin bersîveke bi aqil û têr û tije bidin. Karmendên sîyasî û civakî, ji kerema xwe bêjin: 1,5 mîlyon ermenîyên li Tirkîyê, bi sedan hezaran êzdî, aşûrî,

hurum, ku li Tirkîyê dijîtin, di ku da çûn, winda bûn? Ka herine ser axa niha ya Ermenîstana Rojava, xwesma Qersê, Îdirê, Wanê û hûnê li rex warên ermenîyan gelek gundên êzdîyan bibînin, ku li wir mal û mezelên wan bêxwedî mane.

Desthilatdarên Tirkîyê yên niha û berdevkên wan bi çavên xwe yên "girtî" hewil didin bona armancên xwe yên sîyasî wan hemû bi hezaran îzbatîyan û rêçên ermenîyan û miletên din yên kêmjimar yên derheqa kuştin û jiholêrakirina wan da nebînin.

Ez bawer im, heta ku tevaya dinyayê bi heqî û helalî gunehkarîyên pêşîyên serekên niha yên Tirkîyê şermezar neke, li her qulçekî dinyayê wê zulmkarîyên ha bibin û wê paşê şaş bimînin ka çawa di sedsala 21ê da li cihana pêşketî milet bi kokê va têne qirkirinê û warên wan têne hilweşandinê.

Şengal, Laliş. Evana navên ber dilê her êzdîyekî ezîz in. Bi sedsalan li warên pêşîyên xwe mane. Lê sala par dinya dîsa hejîya, dema dît ku li vî warî gelkujî pêk hatîye. Ji alîyê hov û wehşên dewleta Îslamê ya nûpêketî dest bi qirkirin û zêrandina êzdîyên Îraqê kirin û karê xwe di bin perdeya xudêgiravî temûlnekirina dînê wan dikin, lê di rastîyê da daxweza wan ji kokê va qirkirina êzdîyan û zevtkirina axa wan e.

Bi hezaran êzdî hatine kuştin, revandin, şuhurandin, dîlgirtin. Neteweyên Yekgirtî mecbûr ma wê yekê wek "gênosid" bi nav bike, ango gelkujî. Û lema jî hemû rêxistinên êzdîyan yên cihanê, di nav wan da yên welatîyên me yên Komara Ermenîstanê jî, dengê xwe bilind dikin himberî hovîtîyên dewleta îslamê, bona azadkirina wan pênc hezar jin û keçên êzdî, ku dîl girtine.

Hevalên hêja,

Di vê roja me ya şînê da ez nikarim çend gotinan derheqa cahiltîya me ya îroyîn da nebêjim. Dema welatîyên me li Îraqê ketine rewşeke teng, xort û keçên me di nav xwe da hevgirtinek çê kirin, armancek dane pêş xwe û alîkarîya peretî û moralî dane welatîyên xwe. Sîyanet û hurmet ji wan kesan ra, ku ji cî û warên dinyayê yên cuda-cuda bi rezadilî çûne welêt bona bi çekan Lalişa

Nûranî û nav û namûsa miletê xwe biparêzin. Îro Şengal hewil dide aramîya xwe bi qewata xwe va biparêze û ez bi bawerî dikarim bêjim, ku parastina here baş parastina bi destê me ye. Li vî warê ber dilê me ezîz da, li Ziyaretê em ber heykelê bona bîranîna şehîdên ermenî û êzdî sond bixun, ku emê yekdest bin, emê mîrata pêşîyên xwe mînanî ronahîya çavên xwe xweykin.

Ez gotina xwe serhevda tînim û berê xwe didime qewata herî zor - Taûsê Melek û hêvî jê dikim, ku ew miletên dinyayê û gelên bira - ermenîyan û êzdîyan biparêze, di nav aştîyê û xweşbextîyê da xwey ke, wana ji qeza û belayan dûr xe".

Gava min gotinên xilazîyê dixwendin, meriv dibêje qey hinekî rehet bûm, gava min reng û rûyê haziran yê beşerxweş dît. Rastîyê jî tiştekî şabûnê ye, ku 100 salîya gelkujîya ermenîyan û bûyareke gelekî ferz ketine hev: Cangîr axa vegerîya Ermenîstanê û ji vir şûnda li Ziyareta me ne tenê heykelê wî heye, lê wisa jî kevirê bîranînê heye.

Dû ra şagirtên dibistana Zovûnîyê tên, ew bi gotinên xweş va pesinê Cangîr axa, Ûsiv beg û Zoravar Andranîk didin, dibêjin ku ew bi koka xwe ya êzdîtîyê va kubar in.

Pey ra artîstê emekdar yê Komara Ermenîstanê Rûbên Sahakyan xeber dide derheqa rûpelên jîyana karmendên şerê ji bo azadîya Ermenîstanê da. Dengê wî yê mînanî dengê bilbilan li temamîya warê ziyaret lê bela dibe, û ew deng helana dide dengbêjên êzdî û yên din û ew jî dest pê dikin, distirên. Roja ewrayî bi carekê va safî dibe, ro diçûrise û ew ronahî pencên xwe davêje ser herdu Masîsan û dîdemeke wisa saz dibe, wek ku ew yek di wêneyê wênekêşê emekdar yê Komara Ermenîstanê Şmavon Şmavonyan hatîye nitirandin, ku li ziyaretê ye. Ne axir herdu Ararat bona me her yekî steyrkên ronahîdar yên bawerîyê û hêvîyê ne û qewata me hema di wê yekê da ne.

Ev yek diha berbiçav dibe, gava em bi serekê ruhanî û desteya ruhanî a bilind va diçine ziyareta me, li ku duayan dikin

û qirarên dînî pêk tînin. Lê dû ra diha xweş dibe: hîmê ziyareta teze tê danînê, ku wê navê Taûsî Melek lê bikin. Şabûna miletê me bêhesab e. Bona min demeke here xweş e. Rast bêjim, ez derheqa vê yekê da gelek fikirîme... Gava ya pêşin çê dikirin, ango ya niha heyî, dibe qet fikira me ra jî derbaz nedibû, ku ew dikare bona gelê bawermend biçûk be. Milet bi xwe dixweze bi nêzîk va tevî hemû heyteholan bibe. Û ziyareta me da gerekê horî û melekên me xuya bin. Bal me edetên qenc dixuliqin û ziyareta me dibe warê derbazkirina eydên milet. Me îsal cara pêşin 15ê nîsanê eyda Taûsî Melek da kivşkirinê.

Wê rojê yek ji tiberkên Taûsî Melek, ku li gundê Craratê tê xweykirinê, anîne ziyaretê. Dîrok dibêje, ku weke berî 100 salan du qewalên êzdîyan hatine Ermenîstanê bona bi ruhanîya xwe ra bibine nas, navbera xwe da danûsitendinan çêkin. Şertên wan salan wisa bûn, ku ew êdî nikaribûne vegerine welatê xwe, çimkî sînor hatibûne girtin. Paşê hema li vir jî wefat dibin û li gundê Sengerê, navçeya Elegezê têne definkirin û ew tiberk li Ermenîstanê dimîne. Ew tiberka ku di nav gelek dijwarîyan da derbaz bûye, teslîmî Şêx Ezîz dikin û ew heta îro jî wê tiberkê xwey dike.

Di nav wî wextî da ew tiberk gelek caran di nav xeterê da bûye. Îro ew bê tirs li gundê Craratê ya li navçeya Armavîrê da ne. Ew kêm caran ji mal tê derxistin. Yek ji wan caran ew bû, ku ew temamîya rojekê – roja eyda Taûsî Melek li ziyareta Aknalîçê bû.

Em hatin gihîştin pirseke din a ferz, ku mecalên ziyareta me dike bîra me.

Li vir gerekê temamîya milet eyda xwe pîroz bike. Ziyareta me ew mecal dide me, bi demûdezgehên xwe va, bi mezîla xwe va, bi navbenda xwe ya xwendinê-çandê va. Ez di ser da zêde bikim, ku navbenda me wê zûtirekê dest bi karê xwe bike û ewê alîkarîya xwe raberî hemûyan bike.

Ez dixwezim, ku zarên êzdîyan, xort û keç haj ji sitiran û sazbendîya miletîyê hebin û ne tenê li dewata, lê wisa jî li dikên navdar da xwe eyan bike. Ji bext ra ew firaseta miletê me heye.

Em miletekî sitiranhiz, sazbendîhiz û reqashiz in: tu êzdîyek tune, ku nikaribe û nexweze bikeve govendê û bireqise. Lê wext hatîye, ku bi kêmanî ser dereceya nîvprofêsyonal hunurê xwe nîşanî temaşevanan bikin, û bextê me anîye, ku gencên me yên vî karî berdewam bikin, hene, xwendkarên me yên di îdareyên xwendina sazbendîyê, konsêrvatorîya ser navê Komîtas da hene. Em gerekê wisa bikin, ku ewana piştî xwendinê kêrî pêşketina hunurmendîya miletê xwe bên. Her caran, gava em çev li zarên Zovûnîyê dikevin, ku ew çawa ezberîyan dibêjin, distirên û direqisin, dilê merivan ji şabûnê baristan dibe. Ez dixwezim, ku ewana di emirê xwe yê gihîştî da jî bikaribin hunurmendîya miletîyê raberî gelê xwe bikin.

Ez rind nizanim, lê min dixwest ku wênekêş û heykelterêşên êzdî jî hindik nîbûna. Dibe hebin jî, serê xwe kirine ber xwe, karê xwe dikin, lê minê bixwesta, ku gelekan derheqa wan da bizanibûya.

Her kes zane, ku em li Ermenîstan wek welatê êzdîyan yê duda bûne xwedîyê nivîs û edebîyet, me xwendin dest anî, em di her dereceyên jîyanê da pêş ketin.

Ez usa jî zanim, ku efrandarên êzdîyan jî ne hindik in. Ewana merivên bi temenên cuda-cuda ne. Van axirîyan me kitêba "Axa welatê min" (helbest, çîrok, hikyat) bi ermenî çap kir û li wir efrandinên gelek kesên bi emirê cuda-cuda va cî girtine. Hûn zanin li wir çiqas germayî di hindava Ermenîstanê da heye, wî welatî, ku miletê min sitar kirîye?

Bona her êzdîyekî ocaxa wî, mala wî ber dilê wî ezîz e. Û lema jî piranîya berheman pesinê wan yekan didin û ew yek milet qedîm xwey dike, ew bi koka xwe û bi dînê xwe va tê girêdan. Û lema jî ji her rûpelên pirtûkê hizkirin û şêkirdarî difûre, tê xuyanê, ku di hindava qîmetîyên milet da xemxur in, di hindava paşeroja xwe da ji xwe bawer in û bi her cûreyî hewil didin hebûna milet xwey bikin. Ev helwest diha zêde bûn, dema sala 2014an di meha tîrmeh-tebaxê da gelkujîya êzdîyan ya 74an pêk hat. Me fêm kir, ku miletê me li welatê xwe da jî ne aram e. Tenê axa ermenîyan e, ku em

lê ne tenê aram in, lê em li vir pêş dikevin, ziyaret û heykelan çê dikin.

Pey Gelkujîya ermenîyan ya mezin ra êzdîyên Ermenîstana Rojavayê bi birayên xwe yên ermenî ra tevayî li Ermenîstana Rohilatê hêwirîn, di nav demeke kurt da rabûne ser qedeman, xwe girtin, xwendin û perwerde sitendin, bûne xwedî nivîs û edebîyeta xwe. Her kes zane, ku zargotina me, sitiranên me bi zar ji nislekê derbazî nisleke din bûne. Lê di nava vê sedsala dawî da em ne tenê bûne xwedî nivîs û xwendinê, lê usa jî edebîyeta me xuliqî, pirtûk derketin, efrandarên êzdî di janrên cuda-cuda da pêş ketin, helbest, destan, serpêhatî, heta roman jî nivîsandin. Niha ez bi çavekî baristan vê kitêbê mêze dikim û bawer im, ku ewê helaneke teze bide efrandarên êzdî û edebîyeta me ya miletîyê wê pêş bikeve.

Ew pirtûk dikare bê hesibandin wek firsenda naskirina komeke efrandarîyê ya mezin. Lê dîsa jî em ne ser wê bawerîyê ne, ku me berhemên here baş berevî vê pirtûkê kirîye. Meriv dikare piştî çapkirina vê berevokê bigihîje wê armancê, eger hêvî hebe, ku her sal wê efrandinên nivîskarên êzdî bêne çapkirinê, lê berî wê komîsyona taybet wê li wan berheman mêze bike, fikira xwe bêje û destûra weşandina wan bide. Ev hemû wê zûtirekê pêk bê.

Ez bi hêvî me, ku wê edebîyetzan û xwendevanên aktîv bi karê qîmetkirina berheman va mijûl bin. Hilbet, ewanayê di nav wan da wê germayê bibînin, ku di nav gelên ermenî û êzdî da heye. Lê dema li ziyareta Aknalîçê merkeza me ya xwendinê-çandê dest bi kar bike, li vira wê lênihêrandin û şopandina pirtûkan jî bê derbazkirinê.

Di vî karî da lazim e çanda miletîyê bê vejandinê û pêş bikeve. Em herdem nîne ku dikarin çanda xwe, hunurmendîya xwe raberî gelê dost û bira bikin. Îro hunurmend, sitiranbêj, wênekêş, helbestvanên me yên bi şuret hene û gerekê firsendê bidine wana feraset û merîfeta xwe nîşanî civakê bikin. Bira ev pirtûk li ser wê rê bibe nimûneyeke baş derheqa welêt, biharê, hişyarîyê,

evînê û bawermendîyê da bi riya aqilmendîya miletîyê – zargotinê, helbestvanîyê, efrandarîyê va.

Rastîyê jî me hewil da bîranîna şehîdên Gelkujîya ermenîyan bîr bînin. Û di wê rojê da serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê bi desteya xwe ya bilind va rabû çû Sîsêrnakabêrdê û qedirê bîranîna şehîdên gelkujîya ermenîyan girt. Dema ew rastî rojnamevanan hat, got:

"Em ji Îraqê hatine, em hatine bona qedirê bîranîna şehîdên gelkujîya ermenîyan bigrin. Dostanîya me ji demên buhurî tê. Dema yek ji miletên me ketîye rojeke teng, yek li rex yê din sekinîye. Eger ecêbek hatîye serê ermenîyan, êzdî li rex wan bûne, ermenî jî piştgirîya êzdîyan kirine, dema lazim bûye.

Me hertim jî xweşbextîya gelê ermenî xwestîye û em niha jî dixwezin. Em – êzdî, ku li gelek welatan miletekî kêmjimar in, dengê xwe yê şikyatkirinê bilind dikin û dibêjin, ew, çi ku yê ermenîyan e, gerekê li wan bê vegerandin, çimkî ew malê wan e. Xênji ermenîyan xaçparêzên din jî, aşûrî û êzdî jî hatine qirkirinê. Ew hemû gelkujî gerekê bêne şermezarkirinê û dewletên Ewrûpayê gerekê dew bikin, ku ew bêne şermezarkirin û gelkujî bêne naskirin. Em bi gelê ermenî ra ne û Gelkujîya ermenîyan şermezar dikin".

Bi van hemûyan ra tevayî bona me qewimandineke mezin bû vegera taybet ya ewledê miletê me yê hêja Cangîr axa ser wê axê, ku ewî bona wê bi gelê xwe û gelê xwe yê bira ra tevayî şerekî mezin kirîye. Ew serekqumandarekî serketî bû, merivekî xwedîyê ruhê mezin û nimûneya jîyana wî, şerê wî hela hê wê demeke dirêj bona nisletên paşwextîyê bibine şemdan.

Dostanîya gelê ermenî û êzdî hewcê wê yekê ye, ku ji ewledên xwe yên hêja hertim hêz û qewatê bistîne, dibe di van şertan da hema ji Zoravar Andranîk û Cangîr axa.

Saratov-Yêrêvan-Aknalîç,
Nîsan, sal 2015

EZDIKI.COM

Ruhê dostanîya ermenîyan-êzdîyan

Avtor – Sala 2014an piştî xebateke xurt û kardar li ziyareta êzdîyan ya li Aknalîçê 5 heykel hatine meydanê û wana rewşeke kaw û xemileke bedew dane der û dorên ziyaretê, gelek kes seredana wê dikin û ev bûye cîyê herî hizkirî ne tenê bona êzdîyan, ermenîyan û miletên mayîn, lê wisa jî bona tûrîstan. Dibe wext hatîye, ku ziyareta êzdîyan ya li Aknalîçê bona tûrîstan bibe wargehê ber dilê wan ezîz. Û karê şênkirin, dewlemendkirina zîyareta êzdîyan rojekê jî nasekine, şahîyên cûre-cûre têne teşkîlkirinê. Mesele, her sal wê rojbûnên wan kesên navdar bêne pîrozkirin, ku li vir heykelên wan hene. Lê heykelê dostanîya gelên ermenî û êzdîyan, ku li vira kaw û kubar bilind bûye, dike bîra me, ku lazim e roja dostanîya gelên ermenî û êzdî jî hebe bona pîrozkirinê.

Çend meh piştî vekirina rêzeheykelan şahîya pêşin pîrozkirina 150 salîya rojbûyîna Zoravar Andranîk bû. Em zanin, ku Zoravar Andranîk ji alîyê êzdîyan va hizkirî ye, him çawa dost û hevalê şervanîyê yê Cangîr axa, him jî wek serdewatîyê dewata wî.

Lema jî wê rojê bi hezaran êzdî hatibûne rêzeheykelên li ziyareta Aknalîçê. Wana tacên gula û kulîlk danîne ber heykelê Zoravar Andranîk û bi wê yekê va qedirê ewledê mêrxas yê gelê ermenî û dostê êzdîyan yê mezin girtin.

Pişt ra bi dua û gotinên metran Sîon Adamyan û Şêx Hesen Hesenyan dest bi şahîyê bû.

(Duayên ruhanî û beşek ji xeberdana wan)

Metran Sîon Adamyan, serekê ruhanî yê devera Armavîrê

-Gelî cimaetê, ermenîno û êzdîno, îro bi rastî jî bo me rojeke

bi nav û nîşan e, ku em bi hev ra berevî ziyaretê bûne bona 150 salîya ewledê ermenîyan yê mezin Zoravar Andranîk pîroz bikin.

Ew li Şapîn Garahîsarê hatîye dinyayê. Em gerekê îsal 100 salîya Komkujîya ermenîyan bidine kivşkirinê, lê em gerekê demekê vegerine li wan waran, ku mêrxasên me bi efatî û mêrxasî şer kirine, yek ji wan jî warê Zoravar Andranîk bû. Dema tirkê bêbext kete wan waran, li wir milet êdî ji hal ketibû, ewana heta çilka xwîna xwe ya dawî jî ber xwe dabûn, bona navê xwe, dînê xwe ji tirkan biparêzin. Her warekî wisa wek kela berxwedanê bû û li gelek waran, wek Wanê, Mûsa Lêrê û cîyên din di şêr da bi ser ketin. Ew fikir şaş e, ku gelê ermenî situyê xwe ber şûrê tirkan tewand.

Gelê ermenî ber xwe da, gelê ermenî şeref û dînê xwe parast û ew yek bi gelên cînarê xwe yê dost ra tevayî kir. Û tiştekî tesedûf nîne, ku em berevî vira – ziyareta êzdîyan bûne, çimkî dostanîya du gelên dost, ermenîyan û êzdîyan ne tenê di rojên fireh da xuya bûye, lê di demên oxirmên giran da jî, di dema Komara pêşin da jî, di şerê Qerebaxê da jî, dema mil dane milên me û dijî dijmin şer kirin, axa me parastin, welatê me rizgar kirin. Û xeyala Zoravar Andranîk jî ji xwe ew bû, ku Ermenîstana azad û serbixwe bibîne.

Şêx Hesen Hesenyan

-Dostên hêja, gelên ermenî û êzdî, îro em bi we ra tevayî 150 salîya Zoravar Andranîk pîroz dikin. Zoravar Andranîk bi Cangîr axa ra tevayî hevalên hev yên berxwedanê bûne, bi hev ra miqabilî dijmin şer kirine. Cangîr axa û Zoravar Andranîk sîmvolên dostanîya du gelên me ne. Em bi wan va kubar dibin, em ber bîranîna Andranîk û Cangîr axa temene dibin. Navên wan wê bi dewranan bijîn, çimkî wana em rizgar kirine, bi saya serê wan em îro şa û bextewar dijîn.

Avtor – Haziran gotinên xwe yên germ û qîmetkirinê anîne vira bona sersalîya Zoravar û lema jî kesên ku xeber didin rola zoravar didne destnîşankirinê bona dostanîya ermenîyan-êzdîyan, di karê mehkemekirin û pêşxistina wê dostanîyê da.

Sêrgo Yêrîtsyan – doktorê zimanzanîyê, profêsor

-Bi rastî jî, em berevî eydekê bûne, ku di alîkî va taybet e, alîyê dinê va jî nêzîkî dilê me her kesî ye, him ermenîyan, him jî êzdîyan.

Wek hûn dibînin, ev du heykel, yên Zoravar Andranîk û Cangîr axa li rex hev in. Ev tiştekî ecêb nîne. Dema berî salûnîvekê min bi Mîrzeyê Çolo Siloyan ra ser meseleya rêzezincîran xeber dida, ka ewê bi çi awahî li rex hev bêne bicîkirinê, ewî got: "Cangîr axa li ku be, Zoravar Andranîk wê li wir be û Zoravar Andranîk li ku be, Cangîr axa wê li rex wî be".

Û hûn vê rastîyê ber çavên xwe dibînin, û lema jî em 150 salîya Zoravar Andranîk li vira pîroz dikin. Ew bi awayekî din ne dibû jî. Di destpêka sedsala buhurî da, sala 1904an bi saya serê wê dostanîyê û biratîyê, ku di nav herdu gelên me da hebû, Zoravar Andranîk û Cangîr axa, ku li Bêrkirîyê, gundê Hazaranê da rastî hev hatin, peymana dostanîyê îmze kirin û ew dostanî heta îro jî zexm û xurt maye.

Avtor – Kesê din yê xeberda Azîz Tamoyan bû, ku zoravar bilind qîmet dike wek sîmvola dostanîya herdu gelan, wî kedî destnîşan dike, ku wî kirîye di nava şerê milet yê bo azadîyê, wan rê û dirban tîne ber çavan, ku ev herdu gel gîhandine hev, him di dema şahîyê da, him jî di dema rojên oxirmên giran da.

Xidir Hacoyan – berpirsyarê rojnameya "Êzdîxane"

-Em – êzdî, xwesma nûnerên nisleta nû, gerekê navê mêrxasên me û karên wan bilind xwey kin û miqate bin. Eger em nikaribin wana biparêzin û karê wan berdewam bikin, bi kêmanî em gerekê wan karan, wî ruhî di nav dilê xwe da xweykin, ku gihîştîye me.

Û hilbet, em mêrxasên xwe yên îro jî ji bîr nakin, ku hinek ji wana li vir hazir in û hereket

Sîyanet û hurmet ji wan êzdîyan ra, ku ermenîyên birayê xwe

bi tenê nehîştin û bi hev ra şerê dijminê xwe kirin, û îro em li vir serbilind sekinîne û eyda xwe ya bedew pîroz dikin.

Eyda te pîroz be, Zoravarê Mezin.

Avtor – Kurê Cangîr axa – Sûrên xemgîn e, çimkî zoravarê mezin û bavê wî dostên hev yên nêzîk bûn. Sûrên wek duayekê wê dostanîyê û pêwendîyên mirovane yên germ bi bîr tine, ku di navbera Zoravar Andranîk û Cangîr axa da hebûne.

Sûrênê Cangîr Xetoyan – kurê Cangîr axa

-Min miletê xwe dîtîye, min gelê ermenîyan dîtîye. Ez ji gelê ermenî û ji gelê êzdî gelek razîme bona wê biratîyê, ku ewledên wan yên mêrxas saz kirine û di nav herdu gelan da bela kirine. Bira sersalîya Andranîk pîroz be. Ew dostekî malbeta me yê mezin bû, serdewatîyê bavê min bû, ez şa me, ku serdewatîyê bavê min mêrxasekî wisa bûye. Gelên ermenî û êzdî vê yekê bilind qîmet dikin.

Avtor – Di nav kesên ku xeberdidin da nivîskarekî ji Armavîrê, rojnamevan Rafayêl Sahakyan jî heye, yê ku ne tenê ew rola Zoravar Andranîk destnîşan dike, ku di karê dostanîya ermenîyan-êzdîyan da kirîye, lê wisa jî li vir kar û şuxulvanîya wî xuya dike û heta bi helbestkî berê xwe dide me.

Rafayêl Sahakyan – pûblîsîst, helbestvan

Sîyanet û hurmet ji wan kesan ra,
Yên ku ji esmanan bo hurmeta gel daketin,
Bûne teyrê baz û şêwr ji pêşîyên xwe hildan,
Ewana – ermenî û êzdî djî dijmin bûne yek,
Bi nav bilind, mêrxas Andranîk û Cangîr axa û Ûsiv beg,
Ewana wek çiyan bûne kubar û bilind
Û bi şêwra wan,
Em li viran e bona îro em wan bi bîr bînin,

Îro dengê xwîna wan digihîje me,

Û emê bi şêwra wan hevgirtî bin, bo rêyên dûrî derez...

Avtor – Di şahîyên ha da ji hemûyan zêdetir dengê sitiran û sazbendîya reqasê yê wisa tê, ku rojên mêrxasîyê yên buhurî tînine bîra me. Artîstê Komara Ermenîstanê yê emekdar Rûbên Sahakyan radibe ser dikê û sitiraneke derheqa bîranîna zoravarê mezin da pêşkêş dike.

(Rûbên Sahakyan distirê)

Avtor – Xortên êzdî pey hev kilaman distirên, ew bi du zimanan pesinê Zoravar Andranîk, Cangîr axa û Ûsiv beg didin. Li vê meydanê di sitiran û miqaman da ruhê şerê ji bo azadîyê, mêrxasîyê, dostanîyê û biratîyê xuya dike.

(sitiran)

Avtor – Piştî sitiranan tevgelên şahîyê dikevine govendê û bi vî awahî jî hezkirina xwe bona sersalîya dostê gelê xwe yê mezin dîhar dikin.

(perçek ji reqasê)

Avtor – Li vir, li ziyareta Aknalîçê ruhê serketinê, şabûnê, pêwendîyên mirovane perwaz dide. Reqasa ji bo bîranînê, dostanîyê, biratîyê û hevgirtinê demeke dirêj dikişîne. Qeydê reqasan ber hev têne guhastinê, û her deman jimara reqasçîyan zêde dibe û ev yek nîşana hizkirina di hindava Zoravar Andranîk da ne. Û meriv dibêje qey Zoravar Andranîk ji wêneyê xwe yê ser kevir li me dinihêre, ew kes, ku ji bo welêt û dostanîyê şuxulî û temirî.

(reqaseke qeşeng)

Avtor – Lê dema ew ji Ermenîstanê diçû, li hewşa dêra ermenîyan ya Êcmîadzînê rastî dostê xwe yê nêzîk Cangîr axa hat. Dû ra dîtindar îzbat kirin, ku ewana demeke dirêj bi hev ra sohbet kirin, bawerîya xwe bi hev anîne, lê ji bo paşeroja Ermenîstanê dilgiran bûne. Di paşdemê da Andranîk paşa her firsend bi kar anîye, slav ji dostê xwe ra şandîye.

Dema dihat plankirin komplêksa rêzeheykelan li Aknalîçê çê

bikin, şika tu kesî tunebû, ku wê di nav heykelan da yên Andranîk paşa û Cangîr axa li rex hev bin, bi heyetîya xwe ya kubar û mêrxas va.

Sêrgo Yêrîtsyan – doktorê zimanzanîyê, professor.

-Li vira berî demekê şahîyeke xweş derbaz bû – ya 150 salîya Zoravar Andranîk, ku li vê ziyaretê hate derbazkirin.

Ew bi reqasa berxwedanê va xilaz bû, ango berxwedan, ku Zoravar Andranîk bingeha wê danîye û di tevaya jîyana xwe da berdewam kirîye. Lê ew berxwedan xilaz nebûye, ne bo gelê ermenîyan, ne jî bo gelê êzdîyan.

Ev berxwedan ya heta-hetayê ye, ew berxwedan e bona xwexwetîya miletîyê, berxwedana bona wê Ermenîstanê, ku em gişk jî di heyra wê da ne. Îro li vira her kes derheqa wê yekê da got, wana ne tenê keda Zoravarê Mezin qîmet dikirin, lê herwiha hewil didan wê berxwedanê bi berxwedana tevayî ya gelên ermenî û êzdî raber bikin.

Avtor – Gava berî çend salan hest û pestên Zoravar Andranîk anîne welêt, êzdîyên Ermenîstanê jî fikirîn, ku wext hatîye, ku em jî hest û pestên cinyazê Cangîr axa ji warê sirgûnê yê li Saratovê bînine Ermenîstanê. Pêkanîna wê armancê her dem dihate paşxistin û ew piştî pîrozkirina 150 salîya Zoravar Andranîk û berî 100 salîya Gelkujîya ermenîyan hate sêrî, mîyaser bû.

Lê bona bigihîjine wê armancê di destpêka meha nîsanê da dêlêgasyoneke biçûk bi kesên wek sazkarê ziyaretê Mîrzeyê Çolo Siloyan, nevîyê Cangîr axa Wezîr Xetoyan, doktorê zimanzanîyê, profêsor Sêrgo Yêrîtsyan berê xwe dane Saratovê. Hetanî ew gihîştine Saratovê, yek ji nûnerê olka ermenîyan ya li Saratovê Sîmon Kaxyan hewil dabû pê bihese ka warên gorên bi kom li kîjan cîyan bûne, ku Cangîr axa jî li wir li sirgûnîyê bû. Heyf, ku warekî goristanan yê kivş li wir nehatibû dîtin, goristanên heyî jî hatibûn cîguhastin, ji ber ku dewsa wan li wan deran avahî gerekê bêne çêkirin. Xênji van her hemû tiştan, malûmatîyên din jî

hebûn, ku ermenî û êzdîyên hatibûn sirgûnkirin û Cangîr axa nas kiribûn, gotine. Yek ji wan gotibû, ku Cangîr axa li gundê Messerê, li navçeya Krasnoarmêyskê, herêma Saratovê, li hewşa dêra Lûtêrîyê hatîye binaxkirinê, ji dêrê weke 50 mêtran ber bi gelî.

Warê sirgûnîyê li Mêssêrê bûye, ku niha navê wê Zolîxa ye, Cangîr axa ji sala 1937an heta mirina xwe – sala 1943an li wir jîye.

Ew war hetanî niha jî warê malhebûna gundîtîyê ye, lema jî kesên sirgûnkirî karên rêncberîyê û xwelîbêcerkirinê kirine.

Sîmon Kaxyan - karsaz, Saratov

-Me ev ax dît, me tebîyeta vira dît, ku ew camêr li vir bêhna tebîyetê hilçinandîye xwe, li vir ew maqûl xebitîye, û ev meriv, hilbet, ne gotîye, ku jîyana xwe ya xweş li vir derbaz kirîye, lê ewî tu caran bawerîya xwe winda nekirîye, ku wê axirîyê vegere Ermenîstanê, welatê kal û bavê xwe, wê bê nevîyên xwe bibîne, wê cem zarên xwe, hevalên xwe be. Wî merivî gumana xwe nebirîye. Belê, wek ku cimeta wira digot, karê wan gelek giran bûye, lê xuya ye merivên serbilnd û kubar bûne. Gerekê sîyanet û hurmeta di hindava wan da bilind bêne xweykirinê, em gerekê wana bîr bînin, derheqa wan da bêjin, xeberdin, sohbetê bikin. Merivên wisa hêja ne, ku demeke dirêj bîra merivan da bimînin.

Avtor – Ev war xwedî dîrokeke hewaskar e, şahidê wî jî dêra Lyûtêrîyê yê bêhempa ye. Ew sedsala buhurî hatîye çêkirin, diha rast – sala 1914an. Û ew tê wê maneyê, ku li vir alman mane. Ewana bi teglîfkirina padîşah Yêkatêrînaya 2an hatine vira bona bêcerkirina xwelîya adan.

Nizanî bo çi di dema zordestîya Stalîn da hema li vî gundî hîmê warê sirgûnkirinê danîne, ku li vir kesên sirgûnkirî bi xwelîbêcrekirinê va mijûl bûne, paşê jî riya xeta hesin çêkirine. Wek ku sirgûnvanên di dema Cangîr axa da dibêjin, ew jî di dema sirgûnîyê da li vira xwelî bêcer kirîye. Kesên der û dora wî zanibûn, ku ew kî ye û qedirê wî gelek digirtin.

Sêrgo Yêrîtsyan – doktorê zimanzanîyê, professor.

-Ewana li van waran xebitîne. Li vira gundê bi navê kevin – Mêssêr warê wanî sirgûnîyê bûye, lê heyf, ku hetanî niha jî li vî gundî warê sirgûnîyê heye, wek ku di sala 1943an bû, wek ku di sala 1937an bû, gava Cangîr axa sirgûnî vira kirin, bi dostên xwe yên ermenî û êzdî ra tevayî.

Avtor – Pêşî me hewil da wî erdî bibînin, ku hevalên şervanîyê yên Cangîr axa destnîşan kiribûn. Di destpêkê da em bi meran û kulingan gerîyan. Me dît, ku wisa nabe, me traktor bi kar anî. Vê carê jî encam ne bi dilê me bûn. Kesên emirmezin dibêjin, ku li vira meriv çal kirine, li cîyên din negerin, çimkî di salên 70î da goristana gund a kevin, ku kesên sirgûnkirî li vir hatine binaxkirinê, cîguhastî cîyekî din kirine. Jina gund a here sere – Galîna Bokatanovaya 84 salî, ku soz dabû me derheqa warên gund yên kevin da malûmatîyan bide me, da pêşîya me, em çûne cîyê mezelên gund yên kevin, ku berî 40-50 salan li wir vîlla-xanîyên hêsabûnê hatibûn çêkirin. Dima em ji goristana komî ya nêzîkî dêra Lûtêrîyê xwelîyê hildin, û ew kar nevîyê Cangîr axa – Wezîr kir, lê me kulîlkên sor danîne dewsa erdê kolayî, û em wisa difikirîn, ku dibe mezelê Cangîr axa hema li vir bûye.

Ev her tişt li rex dêra Lyûtêrîyê dibe heyteholeke taybet û kesên li wir hazir gotina xwe dibêjin:

Sêrgêy Yêrîtsyan - doktorê zimanzanîyê, profêsor.

-Em ji vira ruhê vî gundî dibin, em ruhê Cangîr axa dibin, û hilbet, xwelîya ji mezelê Cangîr axa dibin, ku wê tevî xwelîya ziyareta li Aknalîçê be, wê bikeve binê heykelê wî û wê bi me wisa bê xanê, ku Cangîr axa vegerîyaye Ermenîstanê.

Wezîr Xetoyan – nevîyê Cangîr axa

Ez gelek şa me, ku ez hatim, min ev her tişt dît. Min tim xeyal dikir: "Gelo ew roj wê bê, ku ez herim bibînim, ku kalikê min li ku sirgûnîyê da bûye, xebitîye û mirîye?". Ez gelek şa me, ku ez gihîştime mirazê xwe. Ez van gişkan didime ber çevan û wisa dihesibînim, ku me kalikê xwe birîye, bal me çel kirîye.

Avtor – Çavên nevîyê Cangîr axa – Wezîr ji hêsiran tije bûne, di destê wî da xwelîya ji vira hildayî ye. Bi bejina xwe ya şîşmanî va bê deng sekinîye. Ew jî nizane ji vir şûnda çi bike: di destî wî da tiberkek e, xwelîya ber dilê wî ezîz. Sîmom Kaxyan wê dema giring derc dike û dibêje, ku li vê sirgûnîyê bi hezaran kesên ji miletên cuda-cuda hatine çalkirin, di nav wan da êzdî û ermenî jî, ku sûcê wan tenê ew bû, ku welatparêz bûn, xwe wek Cangr axa pêşkêşî karê miletê xwe û cimaeta xwe kiribûn.

Mîrzeyê Çolo Siloyan nerehet bû, bi sehetan ji wî warî dûr nediket, ku goristana biratîyê li wir bû, lê ew hîvîya tiştekî bû û ew mîyaser bûbû.

Paşê em demeke dirêj bêdeng man. Ez nizanim, tiştên em bêjin tunebûn, an her tişt di bêdengîyê da hatibû gotin. Di wê bêdengîyê da te digot qey kar û jîyana Cangîr axa diherikî, bi gelek rûpelên xwe yên mêrxasîyê va. Gelo Cangîr axayê, ku ji gelek kuştinan filitî bû, dikaribû bifikirîya, ku ewê li qiristanên Rûsîyayê serê xwe dayne ax û berên sar û wê li rex dêra Lyûtêrîyê, di goristana komî da bê çalkirin? Niha endamên dêlêgasyoneke biçûk – nûnerên gelên ermenî û êzdî karê vegera wî mêrxasî li welêt dikin, bona ew li ziyareta Aknalîçê bê çalkirinê.

Li Rewanê, li wezîreta Ermenîstanê ya parastinê da femdarîyeke kûr heye, ku her tiştê bi Cangîr axa va girêdayî bi destî wezîrê parastinê bê kirinê, bi hemû qeyde û qanûnên leşkerîyê va.

Salixên ji Navenda ruhanî ya Êzdîyan li Lalişê sitendî dibêjin, ku di wan rojan da dêlêgasyona wan ya derecebilind wê li Ermenîstanê be, bi serokatîya rêberê ruhanî yê hemû êzdîyên cihanê Mîrê Mîran Tehsîn beg. Li hîvîyê ne, ku wê rojê wê bêhesab gelek meriv bêne ziyareta Aknalîçê bona bîranîna Gelkujîya ermenîyan û çalkirina cesedê Cangîr axa.

Hilbet, bona wê yekê xebata tivdarekdîtinê ya mezin lazim e.

Sêrgo Yêrîtsyan – doktorê zimanzanîyê, profêsor

-Îro me qedirê bîranîna şehîdên Gelkujîya ermenîyan girt, û dibe ew yek ji wan bûyeran e, ku ermenî û êzdî di wan rojên oxirmên giran da bi hev ra ber xwe dane. Û yek ji mêrxasên wê berxwedanê Cangîr axa bûye, ku wan salan xemxurî dibir bona mihacirên ji devê şûrê tirkan filitî bikaribin xwe li çemê Erez xin, derbazî vî berî – Ermenîstana Rohilatê bin, xwe xilaz bikin. Û ewî Ermenîstan welatê xwe hesab kir. Pêşnîyar hatine kirinê: di salên 20î da terka van waran bidin, dema ku tirsa sirgûnkirinê hebû, lê Cangîr axa got, ku ev ax axa welatê wî ye û wê tu caran terka van waran nede.

Avtor – Tiştekî text-bext nîne, ku sersalîya bîranîna 100 salîya Gelkujîya ermenîyan hema li rex kevirê bona bîranîna şehîdên wê dest pê dibe. Pêşî ruhanîyên ermenîyan – bi serokatîya metranê Armavîrê Sîon Adamyan, paşê jî serekê dînê êzdîyan yê hemû dinyayê Mîrê Mîran Tehsîn beg dua-dirozgeyên dînî têne gotinê, paşê ev kes daxwezên dilê xwe dibêjin: Metran Sîon Adamyan û birêz Mîrê Mîran Tehsîn beg. Li her derê ziyaretê dengê dua û dirozgeyan tê bihîstinê.

(perçeyekî dua-dirozgeyê)

Metranê Armavîrê - Sîon Adamyan

-Cimaeta hazir, ev yek ji bîranîna şînê ya dawî ye, ku em bona şakirina ruhê şehîdên Gelkujîya ermenîyan dikin, bira ruhê wan şad be, çimkî wek ku hûn zanin, sibê li dêra ermenîyan ya sereke li Êcmîadzînê wê bi emirê metranê sereke navê melek û milyaketan li wan şehîdan bikin. Û wê ew melek herdem bêne bîranînê. Piştî wê emê dua û dirozgeyên xwe li rex kevirên xaçkirî û heykelên bona gelkujîyê çêkirî bikin. Lê îro em berevî vira bûne bona herdu milet bi hev ra sedsalîya gelkujîya ermenîyan bidine kivşê, du milet,

ku bûne xwedîyê qederekê-yazîyekê. Van dawîyan li bakurê Îraqê gelê êzdî careke din tûşî wê bedbextîyê bû, çi hatibû serê me, hate serê wan jî. Meriv dibêje qey sala 15an careke din di sedsala 21ê da dubare bû, ew jî ber çevê dinya medenî û pêşketî.

Avtor – Dêlêgasyona desteya bilind ya Laişa Nûranî bi serokatîya serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê Mîrê Mîran Tehsîn beg jî li vir e. Nûnerên ruhanîya êzdîyan jî dua-dirozgên xwe dibêjin.

(perçeyek ji bûyer-qewmandinê)

Mîrê Mîra Tehsîn beg – serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê.

-Ez we gişkan silav dikim, wisa jî karmendên dewletê û sipasîya taybet didime gelê ermenî bona ku ew herdem li rex êzdîyan sekinîye. Sala 1915an bi ermenîyan ra tevayî êzdî jî hatine qirê, û wan deman jî ermenîyan û êzdîyan bi hev ra şerê dijminê xwe kirine. Û îro êzdîyên li welatên cuda-cuda dijîn, li her deran jî dostên wan yên ermenî hene, biratîya me berdewam dike û ewê heta-hetê be.

Avtor – Dû ra tevgelên heyteholê yên hurmetlî û mêvan kulîlkan datînin ber kevirê bîranîna Gelkujîya ermenîyan û derbazî ber heykelê Cangîr axa dibin. Li wir di bin dengê sirûda Ermenîstanê û di bin dengê meşa qeşeng ya leşkerên artêşa Ermenîstanê nevîyê Cangîr axa – Wezîr Xetoyan qutîya bi hestûyên kalikê wî va ya ji Saratovê anî datîne bin hîmê heykel. Ew bi kulîlkan va tê nixamtin.

(ruhanîyên êzdîyan qewil û beytaan dixwînin)

Avtor – Dû ra dest bi kivşkirina bîranîna 100 salîya Gelkujîya ermenîyan û qedirgirtina bîranîna Cangîr axa dibe. Berî gişkan welîyê Armavîrê Aşot Xahramanyan haziran silav dike.

Aşot Xahramanyan – welîyê Armavîrê

-Îro careke din hate îzbatkirin, ku dostanîya gelên ermenî û êzdî ya bi dewranan e û şedetîya wê ya geş ev e. Em tu caran jibîr nakin, ku di rojên oxirmên giran da gelê êzdî li rex me bûye. Ji îro pê da bira ruhê Cangîr axa li vê ziyaretê rehet razê.

Dostên êzdî yên qedirgiran, emê bi we ra tevayî welatê xwe şên bikin. Wî welatî, ku wê zarokên me, nevîyên me lê bijîn. Sîyanet û hurmet dostîya herdu miletan ra û silava alavî ji Komara Ermenîstanê ra.

Avtor – Dû ra wezîrê parastinê yê Komara Ermenîstanê Sêyran Ohanyan xeberda. Ewî qîmetekî mezin da vegera cinyazê Cangîr axa û destnîşan kir, ku ew hema niha diqewime, berî roja 100 salîya Gelkujîya ermenîyan.

Sêyran Ohanyan - wezîrê parastinê yê Komara Ermenîstanê

-Me dîroka xwe bi hev ra nivîsîye, di rojên oxirmên giran da xûşk û birayên me yên êzdî li rex me bûne. Di demên şahîyan da em bi hev ra şa bûne, û ez wisa bawer im, ku ew dîrok niha jî berdewam dibe.

Em îro jî, di nav dîroka gelê ermenîyan ya nûdemê da, mecbûr in wî şerî bikin, ku em mecbûr kirine bikin, û me bingehên gelkujîyê da ber çavên xwe û di şerê ji bo Arsaxê da bi ser ketin. Wek Cangîr axa, ku cinyazê wî îro me cîguhastî Ermenîstanê kirîye, xûşk û birayên me yên êzdî jî di şerê bona Arsaxê li rex me bûne. Û îro jî wek leşkerên artêşê bi me ra ne. Leşkerên êzdî yên di artêşê da, ku li Ermenîstanê bi hemûyan ra tevayî wekehev tevî serokatîkirina welêt dibin (ango, Komara Ermenîstanê welatê êzdîyan e), li welêt kar û barên xwe gorî daxwezên îroyîn pêk tînin. Bê şik, di dema her bûyereke ha da em gerekê behsa dostanî û biratîya xwe bikin, û ez ser wê bawerîyê me, ku bi gotinên şêkirdarîyê ra tevayî em gerekê derheqa wan merivan da jî xeberdin, ku ev warê batinî şên

û ava dikin. Bira dostanîya gelên ermenî û êzdî ewqas xurt bibe, ku ev warê batinî – ziyaret her sal, her roj, her sshet, her deqe bedew û ciwan be. Em razîbûna xwe didin hemû kesan, hemû şehîdên bêguneh û bira bijî dostanîya me ya bi dewr û zemanan, ku wê heta-hetê bijî.

(perçeyek ji xeberdanê)

Avtor – Endamên yekîtîya leşkerên rezadil bi serokatîya serokê yekîtîyê, mêrxasê Arsaxê, general-lêytênant, dêlêgeyê palamêntê Manvêl Grîgoryan tevî vê qewmandinê dibin. Beyanname tê xwendinê.

Xaçîk Mkrtçyan – endamê serwêrtîya yekîtîya leşkerên rezadil yên Komara Ermenîstanê

-Dostanîya gelên ermenî û êzdî ji kûraya dewranan tê, em bi hev ra rêyeke dûr û dirêj derbaz bûne. Di şerê bona gelê ermenî biryardar – şerê Serdarevê da, li rex mêrxasên ermenî efatên êzdî jî bi serokatîya Cangîr axa şer kirine. Qedera gelên me di wê pirsê da jî wek hev e, ku ji alîyê eynî hovan da hatine qirkirinê. Bona pêşî li gelkujîyên din bigirin, bona miletên me di sedsala 21ê da serketî bin, em mecbûr in bi hev ra bin, em mecbûr in di her pirsekê da pişta hev bigirin. Ez dixwezim bi şabûn destnîaşan bikim, ku him ermenî, him jî êzdî vê rastîyê rind derc dikin.

Di şerê Arsaxê da jî ewledên êzdîyan yên efat li rex me şer dikirin, şervanên êzdî yên bi serokatîya min jî di wî şerî da mêrxasî nîşan dan û ewana amade bûn her demekê bona rizgarkirina Arsaxê, bona serxwebûna gelê ermenî xwe fîda bikin. Li rex mêrxasên ermenî xwebexşên êzdî jî şehîd dibûn. Silav û rêz ji hemû şehîdan ra.

Rola vê rêzeheykelan gelek mezin e di karê mehkemkirin û kûrkirina dostanîya ermenîyan-êzdîyan û em bona çêkirina wê razîbûna xwe didine dostê gelê ermenî yê mezin, bazirgan Mîrzeyê

Çolo Siloyan. Banga min a bona xweşmêrên ermenî û êzdîyan ev e: em bi hev ra bin. Ermenî û êzdî berî 5 hezar salan bi hev ra vira jîne, berî hezar salî jî wisa bûye, 100 sal berê jî bi hev ra di rojên oxirmên giran da pişta hev sekinîne û berî 25 salan jî. Û emê hela bi hezaran salan li rex hev bijîn, emê bi hev ra ber dijwarîyan ber xwe bidin. Miletên me wê bi hev ra hela gelek rûpelên serketinê binivîsin.

Avtor – Dû ra fermana general-lêytênant, mêrxasê Arsaxê Manvêl Grîgoryan tê xwendinê derheqa wê yekê da ku bona wê keda mezin da ku kirine nava berxwedana gelên ermenî û êzdî ya miletîyê-azadarîyê da pey mirinê ra Cangîr axa Xetoyan bi mêdala "Ermenîstan, brîgada 5an" va xelat bikin û mêdal teslîmî nevîyê Cangîr axa – Wezîr Xetoyan kirin.

Bingehdarê ziyareta Aknalîçê Mîrzeyê Çolo Siloyan ji navê malbeta xwe mêdala "Cangîr axa" teslîmî Manvêl Grîgoryan dike, ku bi alîkarîya wî ev ziyareta Aknalîçê ewqas mezin û fire bûye, yê ku gotîye ku axa ziyaretê tenê tê pêşkêşkirin, ango nayê firotan.

Gênêralê xwedî gelek xelatan got, ku mêdala ser navê Cangîr axa ber dilê wî gelek ezîz e, çimkî ew ne tenê merivekî mêrxas bû, lê wisa jî di karê dostanîya gelên ermenî û êzdî da roleke mezin listibû.

Em bêjin, ku bi mêdala "Cangîr axa" va general-lêytênant Sêyran Saroyan jî hatîye xelatkirin. Dewsa wî lawê wî ew mêdal wergirt. Xên ji wan bi mêdalên "Cangîr axa" û "Ûsiv beg" va karmendên êzdî û ermenî jî hatine xelatkirin, bona keda mezin ku wana kirîye nava mehkemkirina dostanîya ermenîyan û êzdîyan da. Yek ji wana jî dîrokzan Karên Xaçatryan bû.

Karên Xaçatryan – sêkrêtarê zanyarî yê Înstîtûta Dîrokê ya Akadêmîya Zanyarî ya Komara Ermenîstanê

-Ez şêkirdarîya xwe elamî wan hemû kesan dikim, ku ev şahîya gelek xweş teşkîl kirine, mala we gişkan ava be.

Sîyanet û hurmer ji gelê ermenî ra, ji gelê êzdî ra, ji leşkerên me ra. Zef razî me!

Avtor - Di kutasîyê da bingehdarê ziyareta li Aknalîçê Mîrzeyê Çolo Siloyan xeberda. Ew dibêje, ku ev qedirgirtina mirîyên me di nav her êzdîyekî û ermenîyekî da hesînên êşê û hisretê pêşda tînin, çimkî di sala 1915an da wana axa xwe hîştin û ji Erez derbaz bûn, ji qirkirinê filitîn.

Mîrzeyê Çolo Siloyan – bazirgan û xêrxwez, Moskva

-Îro em vira berev bûne bona ne tenê yek û nîv mîlyon şehîdên Gelkujîya ermenîyan bi bîr bînin, lê wisa jî şehîdên ji miletên din, wek êzdîyan, huruman, aşûrîyan, yên ku bûne xurê şûrê tirkan. Ez bawer im, ku temamîya gelê ermenî, ewledên wê yên helal bi edetên xaçparêzîyê yên here hûmanîst va perwedekirî dema 24ê nîsanê li Sîsêrnakabêrdê kulîkan daynine ber heykelê şehîdên Komkujîya ermenîyan, wê wisa jî wan miletên kêmjimar bi bîr bînin, ku ji dest wê qetilê hatine kuştin.

Vê dema şînê da ez gerekê bi dilkovanî bîr bînim, ku perçekî dinyayê heta niha jî ji dest hesretê dilkovan e. Cihana medenî heta niha jî bêdeng e di hindava hinek dewletan da, berî gişkî jî Tirkîyê da, ku bedbextîya di cihanê da here mezin pêk anîye û sûcê xwe hilnade sitiyê xwe, bi sebebê ku xudêgiravî îzbatî lazim in. Min dixwest beyannameyeke zelal ji wan ra bişanda, hilbet ez zanim, ku wê tu bersîveke aqilane neyê sitendin. Karmendên sîyasî û civakî yên qedirgiran, ji kerema xwe ra bêjin, ew 1,5 mîlyon ermenîyên ku li Tirkîyê diman, di ku da winda bûn? Bi sedan hezaran êzdî, hurum, aşûrî çawa bûn, ku li Tirkîyê diman? Ji axa Ermenîstana Roava a îroyîn ra derbaz bin, xwesma herine deverên Qersê, Îdirê, Wanê, hûnê li rex warên ermenîyan usa jî rastî gundên êzdîyan bên, ku hatine wêrankirin û kavilkirin, mezelên wan bi erdê ra rast kirine. Bermayên cinyazê Cangîr axa piştî weke 80 salan ji xerîbîyê anîn û li rex Ziyaretê çal kirin.

Leşkerê miletê min yê bi nav û deng, ji vir şûnda bira ruhê te di nav cinetê da be, bira hatina te ya li ser axa Ermenîstanê biratîya ermenîyan û êzdîyan diha mehkem bike.

Berî xeberdana xwe xilaz bikim, ez berê xwe didime melekê herî zor - Melekê Taus û hîvî jê dikim, ku ew hemû miletên dinyayê di nav aramîyê û aştîyê da xwey bike, di nav wan da miletên ermenî û êzdî jî, wana ji şer û belayan dûr bixe.

Pey ra şagirtên êzdîyan yên gundê Zovûnîyê derketin ser dikê. Ewana sitiran û ezberîyên derheqa Cangîr axa, Ûsiv begê û Zoravar Andranîk da dibêjin, haziran didine bawerkirin, ku ewê bi koka xwe ya êzdîtîyê ra amin bmînin, wê dostnîya ermenîyan-êzdîyan bidine mehkemkirinê

(perçeyek ji hunera zaran)

Avtor – Pey ra artîstê Komara Ermenîstanê yê emekdar Rûbên Sahakyan kilameke derheqa şervanên ji bo azadîya Ermenîstanê distirê.

(perçeyek ji kilama R. Sahakyan)

Avtor – Dengbêjên êzdî bi sitiranên xwe va xemleke bedew didine vê şahîyê. Hewa ji nişkêva sayî dibe, ro diteyîse, pencên xwe davêje ser Masîsan û li ser ziyareta Aknalîçê dihêwire. Lê şabûn û eşqa haziran li vir berdewam dibe.

(perçeyek ji sitirana dengbêjan)

Avtor – Paşê gelê êzdî bi serokatîya şêx û pîrên xwe û kesên ruhanî yên ji desteya bilind ya ji Lalişê hatî berê xwe didine ziyaretê, ku li rex wê yeke teze wê bê çêkirinê. Li cîyê ku wê qubeya teze bê çêkirin, dua têne kirinê. Wê navê Taûsî Melek li ser be. Şabûn û ruhdarbûna êzdîyan bê hed û hesab e. Rastîyê jî, ev rojeke nebîrkirinê ye. Dema a pêşin çê dikirin, qet di fikira wan ra derbaz jî nedibû, ku ewê bona miletê bawermend biçûk be. Ne axir milet dixweze tevî her rê û rizmên milet be, di hundurê qubeyê da be. Û li vira – li ziyareta Aknalîçê, destpêka qedirgirtina her erf û

edetekî qenc e. Ew dibe warê derbazkirina eyd û erefatên milet. Li vira cara pêşin 15ê nîsanê eyda Taûsî Melek pîroz kirin.

Wê rojê yek ji tiberkên Taûsî Melek, ku li gundê Ermenîstanê yê Craratê tê xweykirinê, anîne ziyaretê. Dîrok dibêje, ku weke 100 sal pêşda du qewalên êzdî hatine Ermenîstanê bona rastî ruhanîyên êzdîyan bên, bona dauyên xwe bigihînine Xwedê. Wisa diqewime, ku ew nikaribûne vegerin welêt, çimkî sînorên Sovyet têne girtinê. Paşê, ew li vira dimirin, li gundê Sengerê, navçeya Elegezê têne bianxkirin, û ew tiberk li Ermenîstanê dimîne. Ew tiberk ji qeza û belayên mezin xilaz dibe û ew teslîmî Şêx Ezîz dikin, ew heta niha jî di ocaxa wî da tê xweykirin.

Ezîz Ozmanyan – Şêx

-Îro eyda me ya here mezin e, hêkesor e, ku yek ji cewahirên Taûsî Melek e. Bira Taûsî Melek pîştovanê her kesî be. Bira dinyayê da edlayî hebe, wek ku li ser axa ermenîyan e.

Kalikê kalikê min qulixî vî melekî kirîye, bavê min heta îro qulix dike.

Ew Taûsî Melek ne tenê yê min e, lê yê hemû gelê êzdî ye. Bira ew pîştovanê her kesî be, bira edlayê bîne dinyayê.

Avtor – Gelek kes ji cî û warên dûr û nêzîk, gelek merivên Şêx Ezîz, êzdî û û ermenî hatine Craratê. Ev yek ji wan deman e, gava Taûsî Melek wê ji cîyê xwe derkeve û gerekê wê bibine ziyareta Aknalîçê. Bi wê yekê va girêdayî di mala Şêx Ezîz da textê şahîyê hatîye vekirinê û erefatên dînî têne derbazkirinê.

Dû ra bi heytehol Taûsî Melek ji mal derdixin û rêza makîneyan berê xwe dide Aknalîçê. Li vira kesên ku hatine pêşwazî li Taûsî Melek bikin, bi rêberîya wan dibine qubeya Ziyaretê, bona di nava rojê da mecala milet hebe hezkirina xwe di hindava wî melekî da dîyar bikin.

(parek ji wê erefatê)

Avtor – Bi van hemûyan ra tevayî li rêzeheykelên dostanîya

ermenîyan-êzdîyan dest bi eyda, ku pêşkêşî Taûsî Melek e dibe.

Bi sedan êzdî, ermenî, nûnerên miletên kêmjimar yên Ermenîstanê berevî vira bûne bona tevî şahîya bi Sala teze ra girêdayî bibin.

Taûsî Melek yek ji melekên gelê êzdî ye, di nav wan da jî ew yê sereke ye. Pey wî ra Xwedayê Êzîd û Şêx Adî tên, ku piştî mirinê bûye Xweda. Yê herî kevin Taûsî Melek e û gorî edetê rojbûyîna wî roja çarşemê ye, ku bona êzdîyan roja here ezîz e. Hema roja çarşemê Taûsî Melek peyayî ser erdê bûye, bona karên xwe yên dînî pêk bîne. Gorî rojnîşa Royê bona êzdîyan Sala teze li baharê, di dema wekhevîya roj û şevê dest pê dibe, ya ku bi rojnîşa îro çarşema pey 13ê nîsanê ye, ya ku tê binavkirinê wek "Çarşema Sor". Ango, ji wê rojê bona êzdîyan Sala teze dest pê dibe.

Berî şahîyê cimeta hazir kulîlkan datîne ber heykelê bîranînê yê dostanîya ermenîyan-êzdîyan, ku tê binavkirinê "Heykelê dostanîyê", yê Zoravar Andranîk, Cangîr axa, Ûsiv beg û heykelê bona bîranîna şehîdên Komkujîya ermenîyan.

Serokkomarê welêt – Sêrj Sargsyan bi xwe eyda Taûsî Melek pîroz kirîye. Nûnera kabînêta serokkomarê Komara Ermenîstanê Narînê Gûlyan beyanname xwend.

Narînê Gûlyan - nûnera kabînêta serokkomarê Komara Ermenîstanê

-Nûnerên diyaspora êzdîyan ya Ermenîstanê, ez bi dil û can eyda we ya Sala teze – eyda Taûsî Melek pîroz dikim. Dostanîya ermenîyan-êzdîyan di rojên oxirmên giran da jî alî me kirîye, di nav rojên aş da xurttir bûye û wê dostanîyê alî me kirîye em pêş bikevin.

Sala buhurî û îsal salên giran bûn. Bona êzdîyên ku li Rohilata Nêzîk dijîn, heta niha jî rojên reş in. Bawer bin, ku em di vê rewşê da li rex wa ne û hûn dikarin hêvîya xwe daynin ser piştgirîya me. Taûsî Melek bi xwe ra hêvîyan, pêkanîna xeyalan jî tîne, lema jî ez

dixwezim ku di Sala teze da warên em lê dijîn aş û aram be, em dûrî bela û qezayan bin. Bira Sala we ya teze bextewarî ji we ra bîne, êzdîyên welatîyên me yên ezîz.

Avtor – Bi vê yekê ra girêdayî ruhanîkî êzdîyan – Şêx Hesen Hesenyan gotina razîbûnê dibêje.

Şêx Hesen Hesenyan

-Îro cara pêşin di nav gelê Ermenîstanê da ev eyd tê pîrozkirin û dîsa bi saya serê Mîrzeyê Çolo Siloyan, bi serokatîya wî. Û ez bawer im, ku ji vir şûnda ev eyda sereke wê di nav gelê me da bê pîrozkirin. Îro hemû êzdîyên dinyayê vê eydê pîroz dikin, em jî bi wan ra. Bira eyda we pîroz be. Bira roja Taûsî Melek tevaya dinyayê ra edlayê, bextewarîyê bîne. Bira şer ji ortê rabin, ji gelan ra aştî û bextewarî! Zef razî me.

Avtor – Serokê Yekîtîya welatparêzan ya bi naê "Lorva dzor", doktorê zimanzanîyê, profêsor Sêrgo Yêrîtsyan xêrhatina hemûyan dike û wana silav dike.

Sêrgo Yêrîtsyan, doktorê zimanzanîyê, profêsor

-Bi rastî jî, eyda Taûsî Melek bira hemû telî-tengasî, bedbextî û kul-derdên me bide jibîrkirin, û ji îro şûnda ji me ra aştî, şahîyê, eşqê, açixîyan bîne. Ew, çi ku sala par hate serê nûnerên êzdîyan, ew jî li warê wan, bira tu caran, li tu warekî cihanê neyê serê ne tenê êzdîyan, lê neyê ser tu miletekî. Ez ji we ra serketinê dixwezim, û bona min hurmeteke mezin e ez ji navê Mîrze Siloyan jî xeberdim. Her sal vira wê eyda Taûsî Melek bê pîrozkirin, û pîrozkirina wê eydê wê bibe edet. Ez îro li vira me bona borcekî bi dilê we mîyaser bikim. Malbeta Mîrzeyê Çolo Siloyan 2 mêdal kivş kirine, ku herdu jî ser navê ewledên êzdîyan yên hêja ne û navê wan ev in: "Cangîr axa" û "Ûsiv beg". Ji wan mêdalan weke deh heb ezê ji navê Mîrze Siloyan bidime wan kesan, ku keda wan

di nava karê mehkemkirina dostanîya gelên ermenîyan û êzdîyan heye. Hilbet, ev destpêk e, û ez gerekê wisa jî bêjim, ku bi wê mêdalê va karmendên welêt yên sîyasî û civakî jî hatine xelatkirin. Lê ezê hinekî derengtir wan mêdalan bidime wan, dema firsend çê be. Lê niha ezê wan mêdalan bidime wan kesan, ku layîqî wan in û bawer im, ku piranîya wan li vir in.

Avtor – Pey ra girêdayî vê eydê ra bona keda mezin di karê qewînkirina dostanîya ermenîyan-êzdîyan da mêdalên "Cangîr axa" û "Ûsiv beg" teslîmî ewledên hêja – Şêx Hesen Hesenyan, Emo Şeroyan, Sîabendê Xudo Bekoyan, Rizganê Simo Şemoyan, Azîz Tamoyan, Cindî Emeryan, Sûrên, Miraz, Wezîr Xetoyana dikim.

Bi tevayî, di dema vê eydê meriv gotinên xweş dibêjin, dixwezin, ku dijwarî paşda vekişin û Sala teze ji wan ra bextewarî bîne.

Azîz Tamoyam – sedirê teşkîleta civakî ya bi navê "Yekîtîya êzdîyan ya miletîyê"

Îro sala me ya teze ye. Bira Sala teze li hemû êzdîyên dinyayê pîroz be, û wisa jî sala teze ya mirîyên me. Bal me ha hatîye qebûlkirin: em dibêjin sala teze ya mirîyê me pîroz be, paşê ya zindîyan pîroz be. Em hazir in qulixî miletê xwe bikin, qulixî erf-edetên xwe bikin, wek ku îro em ziyareta ji alîyê Mîrze da çêkirî berev bûne û wêya dikin. Her roj, her sal, her sehet em borcdar in berev bibin, gotina xwe bêjin, eyda hev bimbarek bikin.

Emo Şeroyan – sedirê teşkîleta civakî ya bi navê "Mîdîya-Şengal"

-Ez we gişkan bimbarek dikim. Ez bêjim, ku ew 1ê nîsanê, roja çarşemê tê pîrozkirin, ku girêdayî hatina biharê ra ye. Emir bengzê teze werdigre. Em – êzdî, dibêjin her tiştên xirab li dinyayê bûne, bira bi sala buhurî ra herin û venegerin. Di vê sala teze da em ji hemûyan ra saxlemîyê, bextewarîyê, azadîyê dixwezim, xwesma bona Şengala me.

Xidir Hecoyan – berpirsyarê rojnameya "Êzdîxane"

-Giringîya vê eydê di wê yekê da ne, ku tiberka Taûsî Melek, ku yên wek wê 6 heb li bakurê Îraqê hene, li her deran tê nîşandan û îro ew li Ermenîstanê ye, milet bi ruhdarbûn ew qebûl kir û dua lê kir.

Êsdîyên ezîz, ez we gişkan pîroz dikim, wisa jî hevalên me yên ermenî, yên ku me bîr nakin û herdem li rex me ne. Îro em gerekê çira pîroz vêxin, ya ku wê wisa jî bakurê Îraqê bê vêxistin, bira ew çira rehetîyê bide canê êzdîyên şehîd.

Avtor – Gorî rojnîşa gelê êzdî hemû eydên miletîyê-dînî heta niha hatine xweykirin, di nav wan da ev eyd jî. Ewana piranî eydên malbetî, binemalî ne. Her malbetek hewil dide baş hazirîya wê eydê bibîne. Wê rojê kesên ji hev xeyîdî, dilê wan ji hev mayî li hev tên. Eyd dilê merivan geş dike, kêfa wan bilind dike.

(Dîdemek ji reqasê)

Avtor – Her kes gerekê ha bi hev ra, ziyareta êzdîyan da eyda miletê xwe pîroz bike. Ji bext ra ziyareta Aknalîçê wê mecalê dide me, li vira her tişt heye, bergeh fire ye, navbenda xwendinê-perwerdeyê jî heye û ewê zûtirekê dest bi karê xwe jî bike. Wê demeke dirêj derbaz nebe, vira wê qubeyeke teze hebe, ku wê bi navê Taûsî Melek be. Bi wê yekê va êzdî wê bibine xwedîyê Lalişeke teze, di wir da wê ne tenê deng-olana demên buhurî bê bihîstinê, lê wisa dengê rojên me. Ne axir ewledê milet yê herî hêja êdî heta-hetayê vegerîyaye ziyaretê bona ji nêzîk va haydarê dostanîya ermenîyan-êzdîyan be û ew bi xwe îzbat bike, ku em cimaetek û du milet in.

Sêrgo Yêrîtsyan – doktorê zimanzanîyê, professor.

-Eyda îro ya li Aknalîçê xwedî kemeleke mezin e, çimkî Mîrzeyê Çolo Siloyan, ew bazirganê ku ev ziyaret çê kirîye, got, ku her sal eva eyda wê bi şahîyeke mezin va bê pîrozkirinê. Em gerekê vê

yekê silav bikin, ku erf-edetên berê, erefatên dînî li me vedigerin û emê her tişt bi sazbendîyê û eşqeke mezin va derbaz bikin. Ango, li vir her tişt tê kirinê, ku meriv bêne vira û wê yekê hîs bikin, wê hewayê texmîn bikin, ku navê wê eyda Taûsî Melek e an jî Sala Teze ye. Taûsî Melek bo gelê êzdî yek ji rojên here giring e, û ew bi qilxê taûs her malekê ra aştîyê tîne. Em hatine eyda dostên xwe pîroz bikin, bona îro li rex dostên xwe bin, hilbet, wisa jî bi vî awahî nasîya xwe bidine wî gelî, ku herdem jî di rojên oxirmên giran da, di şahîyan da li kêleka me bûye, êşa me parvekirîye, bi şahîya me ra şa bûye. Werin em careke din jî gelê dostê xwe pîroz bikin, hemû êzdîyên Ermenîstanê jî, yên tevaya dinyayê jî.

Avtor – Em gerekê ha, bi hev ra, li ziyareta êzdîyan eyda miletîyê pîroz bikin. Bextê me lêxistîye, îro bona wê yekê li ziyareta Aknalîçê hemû mecal hene. Ji bext ra ziyareta Aknalîçê wê mecalê dide me, li vira her tişt heye, bergeh fire ye, navbenda xwendinê-perwerdeyê jî heye û ewê zûtirekê dest bi karê xwe jî bike. Wê demeke dirêj derbaz nebe, vira wê qubeyeke teze hebe, ku wê bi navê Taûsî Melek be. Bi wê yekê va êzdî wê bibine xwedîyê Lalişeke teze, di wir da wê ne tenê deng-olana demên buhurî bê bihîstinê, lê wisa dengê rojên me. Ne axir ewledê milet yê herî hêja êdî heta-hetayê vegerîyaye ziyaretê bona ji nêzîk va haydarê dostanîya ermenîyan-êzdîyan be û ew bi xwe îzbat bike, ku em cimaetek û du milet in.

Ziyareta êzdîyan ya li Aknalîçê
Nîsan, sal 2015

EZDIKI.COM

Ji Lalişa Nûranî heta Aknalîçê an jî di duryanên dostanîya ermenîyan-êzdîyan da

Cenabê Mîrê Mîran Tehsîn beg serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê ye. Cîyê wî li merkeza êzdîyan ya ruhanî – Lalişa Nûranî da ne.

Pey navbirîya 100 salan ra serekê ruhanî yê êzdîyan sala 2012an meha îlonê da seredana Ermenîstanê kir, tevî vekirina ziyareta Aknalîçê bû û 29ê îlonê bi fermana resmî ew roj bi nav kir wek Roja ziyaretê. Dema Mîrê Mîran li Ermenîstanê bû, seredana gundên êzdîyan kir, rastî nûnerên olka wana hat, bi jîyan û deba wan ra bû nas. Serekê ruhanî yê êzdîyan bû mêvanê metranê hemû ermenîyan Garêgînê 2an û di navbera wan da sohbeteke xweş derbaz bû derheqa pêwendîyên ermenîyan-êzdîyan da, bi serekwezîrê komara Ermenîstanê û karmendên dewletê yên fermî ra pirsên bi jîyana êzdîyên komarê da hatine gengeşekirin. Dû ra Mîrê Mîran nivîsîye, ku ew li Ermenîstanê hêjayî qedirekî bilind bûye û rastî mêvandarîyeke ji dil hatîye. Ewî razîbûna xwe daye gelê ermenîya ku di hindava gelê êzdî da ewqas dilovan e. Seredana duduyan ya cenabê Mîrê Mîra Tehsîn beg li welatê me di nîsana sala 1915an da qewimî, dema ew bona 100 salîya qira ermenîya hatibû Ermenîstanê bona qedirê bîranîna şehîdên Gelkujîya ermenîyan bigire, bona li ziyareta Aknalîçê tevî bîranîna şehîdên qirkirina ermenîyan û li wir careke din çalkirina hestûyên ewledê gelê êzdîyan yê hêja, dostê ermenîyan yê helal Cangîr axa bibe.

Doktorê zimanzanîyê, profêsor Sêrgo Yêrîtsyan dema seredana serekê ruhanîyê yê hemû êzdîyên dinyayê cenabê Mîrê Mîra Tehsîn beg li Ermenîstanê rastî wî hat û pê ra sohbet kir.

-Mîrê Mîran, ez gelek şa me, ku eva cara dudan e ez li Ermenîstanê rastî we têm. Hûn bi xêr hatine. Ez dixwezim bizanibim pey seredana duduyan ya li Ermenîstanê ra çi hesînên we hene, we çi guhartin dîtin.

-Belê, ez şa me, ku cara duduyan tême Ermenîstanê û dostanîya ermenîyan û êzdîyan wek berê xweş e. Ewana nêzîkî hev in, bi hev ra dost û bira ne. Ez ji hukumeta Komara Ermenîstanê hîvî dikim, ku diha zef guh bide gelê êzdîyan. Ez hela bajêr da ne gerîyame, lê ew tiştên min dît, kêfa min bi wan ra hat.

-Hûn duh çûne ziyareta êzdîyan, we dît ku ziyaret çiqas hatîye guhartin. We çi texmîn kir, gava dît, ku li Ermenîstanê navbendeke xwendinê-perwerdeyê û ruhanîyê saz dibe?

-Şabûna xwe çiqasî jî dîyar bikim, kêm e. Ew tiştên min dît, rastîyek e û merivên wisa, çawa Mîrzeyê Çolo Siloyan e, karê mezin bona gelê êzdî dikin û yên mînanî wî çiqasî zef bin, ewqas baş e, emê bi wan va kubar bin.

-Mîrê Mîran, hûn qîmetên rast didin. Sala par bi daxweza Mîrzeyê Çolo Siloyan li vira heykelê dostanîya ermenîyan-êzdîyan vebû, tevaya komplêksê tê binavkirinê wek rêzeheykelên dostanîya ermenîyan-êzdîyan, li wir heykelên Cangîr axa, Ûsiv beg, Zoravar Andranîk yê bona bîranîna şehîdên Gelkujîya ermenîyan hene. Ango, ew komplêksa heykelan derheqa wê dostanîyê da ne, ku di navbera herdu gelan da eva gelek sedsal in heye. Keda we û malbeta we jî di nav wê dostanîyê da heye, we di salên komkujîyê da ermenî sitar kirîye. Mezinên we, pêşîyên we derheqa wê yekê da çi ji we ra digotin?

-Em behsa welatê we – Îraqê bikin. Em bi alîkarîya we dîroka sitarkirina wan 6 000 jinan, zaran, kal û pîran bîr bînin, ku di nav gel da belav bûye.

-Ez hela ji diya xwe ne bûbûm, dema gelkujîya ermanîyan destpê bûbû, malbeta me, weke gelek malbetên êzdîyan, ermenîyan di malên xwe da qebûl kirin, ocaxên xwe da sitar kirin,

alîkarîya wan kirin. Ez pênc-şeş salî bûm, gava mala me da malbetên ermenîyan dijîtin. Min ji bavê xwe – Sehîd beg pirsî, ku çima wisan e? Û ewî ji min ra şirove kir, ku dema qira ermenîyan hate pêkanînê, ewî serekeşîrên êzdîyan, axa, şêx û pîr berev kirin û ji wan ra got, ku gerekê alî ermenîyan bikin. Êzdîyan 6 000 ermenî malên xwe da sitar kirin, xwedî li wan derketin, heta ew rabûne ser pîyan, bûne mal û hal. Lema jî niha li dor û berên Lalişê gundên ermenîyan hene. Li wira heta îro jî malbetên wan ermenîyan dijîn, ku ji qetilê xilaz bûbûn û em heta îro jî ser hev da diçin-tên, dostanîyê dikin.

-Min tiştekî hewaskar xwendîye, ku çawa tirkan bi her awahî hewil didan ermenîyan ji malên êzdîyan derxin, bibin sirgûn bikin, lê begên êzdîyan bona qedir û hurmeta xwe qirar kiribûn tu ermenîyekî jî nedin tirkan û wê hertim jî wana sitar bikin, alî wan bikin, wê karwanên tirkan talan bikin, bona ermenîyan xurek peyda bikin. Derheqa vê yekê da îro – roja bîranîna 100 salîya Gelkujîya ermenîyan li Ermenîstanê bîr tînin û ez dixwezim bi we ra tevayî derheqa wan da bîr bînin.

-Di malbeta me da gelek caran behsa ermenîyan kirine. Bona kalikê min û bavê min hurmeteke mezin bûye alîkarîya ermenîyan bikin, çimkî em miletên dost in, hevalên hev in, birayên hev in. Sehîd begê bavê min û gelekên din ew yek bona xwe qedir hesibandine. Dibe me gelek tişt ji bîr kiribe, neyê bîra me, lê em şa ne, ku ermenîyên dostên me van yekan ji me çêtir zanin û ew ji nisletên hatî ra dibêjin. Gava ez biçûk bûm, qewal hatine Ermenîstanê, paşê bîranînên xwe ji kesên me ra gotine, ku di wan salan da Cangîr axa jî gelek alî ermenîyên dost kirîye, wana ji qirkirinê xilaz kirîye, em bona wê yekê kubar in û dema gelek caran derheqa tiştên ha da dibihên, em diha nêzîkî hevdu dibin.

-Hûn zanin, ku pey 70 salan ra bi saya Mîrzeyê Çolo Siloyan û hevalbendên wî li hev hat cinyazê Cangîr axa ji cîyê sirgûnîya wî – Saratovê vegerînin û niha mezelê wî yê sîmvolîk heye. Hûn

vê bûyerê û hurmetgirtina eskeran çawa qîmet dikin, ku duh bona bîranîna wî hate teşkîlkirin?

-Ez bi Mîrze, bi kirin û emelên wî ra firnax dibim. Hema bi saya sere wî ye, ku îro li Ermenîstanê mezelê Cangîr axa heye. Em gerekê bîr bînin, gelê êzdî hertim jî piştgirê ermenîyan bûye, ber tu tiştî nesekinîye û bona azadî û serxwebûnê ber xwe daye. Îro em têne Ermenîstanê û emê gelek şa bûna, ku di parlamêntoya Komara Ermenîstanê, organên dewletê da, di karên derecebilind da diha pir nûnerên êzdîyan hebin, û ewê çareserkirina pirsgirêkên êzdîyan bide lezkirinê. Em hinekî ber xwe dikevin, ku nûnerên êzdîyan di parlamêntoya Ermenîstanê da tunene.

-Lê dîsa jî, ez ser wê bawerîyê me, ku ewledên gelê êzdî li vira bîr tînin, mesele, bi navê Cangîr axa odeya dersdayînê heye li Înstîtûta leşkerîyê û li cîyên cuda-cuda heykel hene, û ev kar wê berdewam be, çimkî em nikarin ewledên hev yên navdar hez nekin, qedirê wan negirin, qîmetê nedine wan. Gelo rast e, ku wan salên oxirmên giran da derê qubeya Şêx Adî ber mihacirên ermenîyan vekirî bûye.

-Ne tenê derên Lalişê vekirîne bona ermenî bên li wir bijîn, malbetên êzdîyên ku ji dest wan dihat, malbetên ermenîyan wek merivên xwe qebûl kirin. Ez 20 salan pey gelkujîyê ji diya xwe bûme. Gava ez biçûk bûm, min ew pêwendî û dostanî ber çevên xwe didîtin. Ajovanê erebeya bavê min ermenî bû, navê wî Ohan bû. Ewana dû ra cîguhastî Bexdayê bûn. Gava diya Ohan ber mirinê bûye, gotîye: "Ez dixwezim kurê Sehîd beg bê min bibîne". Ez rabûm çûm Bexdayê. Ber min ewî ji kurê xwe ra got: "Van merivan ra gelek nêzîk be, ewana ber dilê me ezîz in...". Pey ra diya Ohan ruhê xwe da.

-Rastîyê jî, ermenî û êzdî bi hev ra helal in, hertim bi hev ra bûne, xwesma di rojên oxirmên giran da, pişta hev girtine. Eynî tişt îro li Ermenîstanê berdewam e. Gelo berdewamîya dostanîya gelên ermenîyan û êzdîyan wê li Ermenîstanê û ji sînorên wê der wê çawa be?

-Hilbet, biratîya me ji kûraya sedsalan tê û ewê her berdewam be. Gava em dibînin ku êzdî li Ermenîstanê her diçe zêde berbiçev dikevin, em gelekî şa dibin û dilê me baristan dibe. Û çiqasî jî bixwezin navbera me xirab bikin, hesab yek e, ewê ji wan ra li hev neyê, çimkî di navbera me da yekîtî heye. Û, hilbet, ya sereke ew e, ku Ermenîstan wê tu caran ji bîr neke, ku êzdî gelê bi wan ra dost in, û lema jî lazim e hertim alîkarê wan bin û gava em ji Ermenîstanê dûr derheqa vê dostanîyê da dibihên, dilê me bi şabûnê va tije dibe.

-Cara buhurî, gava hûn li Sîsêrnakabêrdê bûn, we Komkujîya ermenîyan şermezar kir û we gelek gotinên xweş derheqa me da gotin. Nêta me heye derheqa wê yekê da fîlmekê çê bikin, ku çawa êzdîyan 6 000 ermenî cem xwe sitar kirine. Em dixwezin hûn bona vî karî dua bikin û pareke xeberdana me wê di fîlmê da bê nîşandan.

-Çi jî hebe, ez amade me piştgirîyê bikim. Meriv tenê dikare van pêşnîyaran silav bike û alîkarî bike, bona ew mîyaser bin. Gerekê nimûnmeyên dîrokê yên here baş bigihînine nisletan. Û tiştê hûn destnîşan dikin, gelekî hewaskar û giring in. Bira kesên niha û nisletên paşwextîyê bi destî kînoyê jî bi serhatîyên wisa ra bibine nas.

-Duh me li ziyareta Aknalîçîê dît, ku çawa hîmê qubeyeke nû tê danîn. Ez bawer im, ku dema seredana we ya din da wê mecala we hebe hûn dua li wê qubeyê bikin. Gelo hûn girêdayî bi wê yekê ra çi difikirin, ku li Ermenîstanê Maleke Xwedê ya din zêde dibe?

-Ez eşqê û kêfxweşîyê texmîn dikim û ezê gelek bextewar bim, hilbet, eger cansaxîya min dest bide, dua li wê qubeyê bikim û wê bikime xizmeta milet da. Bi vî karî va Mîrzeyê Çolo Siloyan şuxulekî bona milet gelekî ferz kir, çimkî qubeya Taûsî Melek wê bibe derîyekî hêvîyê û bawerîyê bona miletê me. Hilbet, ez dixwezim tevî vekirina qubeyê bibim, eger Xwedê hiz bike.

-Seba xatirê wê qubeyê gerekê cansaxîya we baş be. Gelo hûn ji gelê êzdî yê Ermenîstanê ra çi dixwezin bêjin?

-Ez dixwezim, ku organên Ermenîstanê yên dewletê ji bîr nekin, ku êzdî dostên wan in û hazir in hertim jî piştgirîya wan bikin, li rex wan bin, alîkarîya gelê ermenî bikin, bi hev ra derkevin pêşîya dijmin. Bira dostanîya xwe diha qewîn û qedîm bikin, ji Ermenîstanê dûr nekevin, çimkî li vira dostanîyeke me ya bi dewranan heye. Welatê Ermenîstanê û dewleta wê gerekê hertim bizanibe, ku li Ermenîstanê miletek heye, miletê êzdî, û gerekê tu firqîyê daneyne orta ermenîyan û êzdîyan, gerekê navbera wan herdu miletan da wekehevî hebe.

-Hûnê sibê an dusibe herine Sîsêrnakabêrdê, heykelê Komkujîya ermenîyan, dema hûn ber bi heykelê bimeşin, hûnê derheqa çi da bifikirin?

-Ez naxwezim pêşîya wextê kevim, ezê wê demê hîs bikim û bibînim. Berî du salan, gava cara pêşin hatime Ermenîstanê, tiştê pêşin ku min kir, ew bû, ku ez çûme rêzeheykelên Komkujîya ermenîyan û tevaya dêlêgasyona me qedirê bîranîna şehîdên gelkujîyê girt.

-Cihan hela tam Gelkujîya ermenîyan şermezar ne kirîye û encameke wê ew e, ku gelukîya êzdîyan ya 74an hate pêkanînê, ew jî li warê wan, li wetenê wan. Niha piştî wê qirkirinê rewş li wir çawan e?

-Hilbet, eger tevaya cihanê Gelkujîya ermenîyan nas bikira, kareseta êzdîyan ne diqewimî. Belê, em wê gelkujîyê şermezar dikin û em dixwezin, ku dinya gelkujîya ermenîyan qebûl bike, çimkî eger ew yek pêk bê, êdî wê qirkirinên teze wê pêk neyên. Û eger qirkirina ermenîyan, xaçparêzan, hilbet êzdîyan, bêne şermezarkirinê, sibê-du sibe wê qirkirinên teze nebin. Gerekê hemû bi yekdest wê gelkujîya ermenîyan qebûl bikin û çareserîya heq jê ra bibînin. Ji 400 hezarî zêdetir mihacirên êzdî hene, ku li bakurê Îraqê – Kurdistanê ne. Hilbet, Kurdistan alî wan dike, lê ew gelek kêm e û bona gelê êzdî rewşeke gelek xirab saz bûye.

-Niha ez dixwezim gotina we ya bona gelê ermenî bibihêm.

Alîkî va îro rojeke heznî ye, alîkî dinê va jî îro ew roj e, ku dost tên pirsa me dikin, ber dilê me da tên. Dost xwesma di van rojan da gotina xwe bona dostên xwe dibêjin. Gelek xweş e, dema wan gotinan ji zarê dostên xwe dibihêyî.

-Me herdem jî xweşbextîya gelê ermenîya xwestîye û em niha jî dixwezin. Em – êzdî, ku li welatên cuda-cuda kêmjimar bûne, dengê xwe yê şikyatkirinê bilind dikin û dibêjin, ku ew her tiştê ku yên ermenîyan e, bira li wan bê vegerandin, çimkî ew bi rastî jî yên wan in. Xênji ermenîyan gelên din jî hatine qirê, wek aşûrî, hurum û êzdî. Ew hemû gelkujî gerekê bêne şermezarkirinê û dewletên Ewrupayê gerekê di wî karî da ciddî bin û gelkujîyê nas bikin. Em bi gelê ermenî ra ne û Gelkujîya ermenîyan şermezar dikin.

Me dikaribû hema li vir fîlma xwe xilaz bikira, eger em pey dêlêgasyona ku serekê ruhanî yên hemû êzdîyên dinyayê Mîrê Mîra Tehsîn beg serokatî lê dikir, neçûna, ku hatibûn tevî bîranîna 100 salîya Gelkujîya ermenîyan bibin.

Ne cara pêşin bû, ku Mîrê Mîra Tehsîn beg diçû Sîsêrnakabêrdê.

Gava cenabê Mîrê Mîra Tehsîn beg cara pêşin sala 2012an hate Ermenîstanê, got, ku ew berî gişka dixweze here Sîsêrnakabêrdê, û ew daxweza wî hate sêrî.

Niha jî bi nûnerên gelê xwe ra tevayî çû Sîsêrnakabêrdê, qedirê şehîdên Gelkujîya ermenîyan girt, ku di wan deman da di nav kesên hatine qirkirinê da gelek êzdî jî hebûne.

Avtor - Ji bo wî ne hêsa bû wê riyê ra derbaz be, çimkî emirê wî mezin e, lê ewî deynê ruhê xwe hesab kir here û ew yek bi awayekî din nikaribû bibûya. Ewî bi nûnerên êzdîyên Ermenîstanê û ji cî û warên cihanê yên cuda-cuda hatî tacên gulan danî ber heykelê Gelkujîya ermenîyan. Lê dema rojnamevan dora wî girtin, ewî rehet û aqilane bersîva pirsên wan dida.

-Dinya gerekê gelkujîya ermenîyan şermezar bike.

Avtor – Dêlêgasyona ku Mîrê Mîra Tehsîn beg serokatî lê

dikir, rastî serwêrê mûzê-înstîtûta Sîsêrnakabêrdê ya Gelkujîya ermenîyan Hayk Dêmoyan hat. Mîrzeyê Çolo Siloyan ji navê malbeta xwe ew bi mêdalya "Cangîr axa" va xelat kir, bona keda mezin ku ewî kirîye di nav mehkemkirina dostanîya ermenîyan-êzdîyan da.

Dû ra mêvan li serayên nûvekirî gerîyan, bala xwe dane wêneyan û nivîsên teze. Bona mêvanan gelek bûyer teze bûn, û derheqa wê yekê da wana devtera bîranînan da fikirên xwe nivîsîn.

Wek nimûne, kurê Tehsîn begê Mîrê Mîra – Mîr Hazim, ku tê destnîşankirinê wek peyhatîyê bavê xwe, nivîsî: "Gelkujîya ermenîyan gerekê li her çar qulbên dinyayê bê şermezarkirin, bona ew dubare nebe û li tu ciyan. Seredana vê Sîsêrnakabêrda bilindcî û vê mûzêyê bona min weke seredana li ziyareteke li hecê ye, ku li wir qedirê bîranîna şehîdên gelkujîyê yên bê sûc tê girtinê.

Piştra derheqa vê têmayê da me gerekê bi Mîr Hazim ra bipeyivîya, ku kurê Mîrê Mîran Tehsîn beg e.

(Bi wergera lezobezo).

Dîroka pêwendîyên ermenîyan û êzdîyan yên dostanîyê, biratîyê gelekî kevin e, û dema sala 1915an gelkujî hate pêkanînê, malbeta me bi lez bi destî kalikê min û gelek serekeşîrên êzdîyan çi ji dest wan hat, alî ermenîyan kirin. Îro jî em hatine qewata biratîya xwe nîşanî dostên xwe bikin û li rex gelê ermenî bin.

Eger dinyayê qirkirina ermenîyan şermezar bikira, îro wê qirkirina êzdîyan neqewimîya. Weke 430 hezar êzdî mihacir in, ji wana 400 hezar ji Şengalê ne, mal û tevaya hebûna xwe hîştine, hatine di şertên dijwar da, di çadiran da dijîn. Gelek dijwarî peyda bû, serokatîya Kurdistanê alî wan kir, lê ew alîkarî hindik bû. Welatên dereke jî alîkarî dikin, lê ew jî kêm e. Êzdî û xaçparêz êdî li Îraqê bawerîya xwe bi tu tiştî naynin. Bi qeyde û qanûnên berî 1400 salan va berê xwe didine me, em çawa bijîn? Niha 5 hezar keç û jin di destê têrorîstan da ne. Bi hezaran kes jî hatine kuştin.

Cara kutasîyê em berî du salan li vir bûn. Di nav wê demê

da gelek tişt guhêrîye. Me li wira heykelê dostanîya ermenîyan-êzdîyan, peykerên bîranînê yên Zoravar Andranîk, Cangîr axa û Ûsiv begê, yê bona 100 salîya Gelkujîya ermenîyan dîtin. Bona van hemûyan em ji Mîrzeyê Çolo Siloyan ra dibêjin mala te ava. Ziyareteke gelekî bedew e.

Avtor – Ne tenê Mîr Hazim û endamên dêlêgasyonê yên din, lê wisa jî serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê Mîrê Mîra Tehsîn beg bi her tiştên di nav du salan da guhêrîbûn, heyr û hijmetkar man.

Mîrê Mîran (bi wergera yekser)

Ez çiqasî jî bicêribînim şabûna xwe dîyar bikim, ezê nikaribim, çimkî ew her tiştên min dîtin, wek ecêban e. Mîrzeyê Çolo Siloyan ziyaretek çê kirîye, ku bingehê wê dostanî, biratîya herdu miletên me – ermenîyan û êzdîyan danîye. Min bi kêfxweşîyeke mezin va dua li karê wî yê nû – çêkirina qubeya Taûsî Melek kir.

Avtor – Wek me gotibû, di rojên seredana dêlêgasyonê li Ermenîstanê hîmê qubeya Taûsî Melek hate danînê.

Bavê Şêx (wergera yekser)

Em dema ji Lalişa Nûranî hatin, me xwelîya ji wira, ava avilheyatê ya ji Kanîya Zimzimê anî, me ew av bi duayan reşande ser qubeyê, ku wê di paşdemê da bibe qubeya bi navê Taûsî Melek. Tiştên ha wê kubarîya me bin. Bira Xwedê alîkarê Mîrzeyê Çolo Siloyan be, ku bona cimeta me karên ha kêrhatî dike. Mîrê Mîran Tehsîn beg di xeberdana xwe da got, ku em – êzdî û ermenî yekdest in, ku tu kes wê nikaribe biratîya me xirab bike.

Em dua li tifaqa herdu gelan, xwesma xweşbextîya welatê Ermenîstanê dikin. Li vir dostanîya ermenîyan-êzdîyan ya mezin heye. Êzdî û ermenî wê herdem birayên hev bin.

Êzdîyan di wan salên oxirmên giran da ermenîyên birayên xwe sitar kirin. Em wan salan hela ji diya xwe ne bûbûn. Ez û Mîr sala 1933an ji diya xwe bûne, lê mezinên me ji me ra gotine, ku mala

Mîr, ango malbeta Hamê Şero, malbeta me û gelek serekeşîrên êzdîyan alî ermenîyan kirine, li mala xwe da xwey kirine û ew deynê xwe hesibandine. Di dema gelkujîyê da bi fermana Mîr hemû serekeşîr alî hemû ermenîyan kirine.

Pîrka Mîr – Xatûn, di wextê xwe da gotîye, ku wêneyên Ûsiv begê, Cangîr axa û Xetîv axa di malên wan da bûne, tirkan pê hesiyane, xwestine bên şer bikin, wan wêneyan bibin. Em bêjin, ku Xatûn yeke mêrane bûye, time li rex mêrê xwe bûye, rojên çetin da jê dûr neketîye.

(wergera bi lez)

Ziyareta Aknalîçê û heykelên li wir kirine bîra min, ku herdu miletên me çawa pêşberî dijmin şer kirine, xwesma Cangîr axa û Zoravar Andranîk û bi hev ra bûne bira. Hate bîra min, ku wana çawa hev ra biratî kirine, piştgirîya hev kirine, alî wan êzdîyan kirine, ku bi ermenîyan ra tevayî derbazî Ermenîstana Rohilatê bûne. Em dixwezin, ku miletê ermenî me hesab bike wek ewledên Zoravar Andranîk, nevîyên Zoravar Andranîk û bizanibin, ku pêşîyên wana çawa bi hev ra miqabilî dijmin şer kirine. Û wana di rojên oxirmên giran da texmîn kirîye, ku herdu milet gerekê time li rex hev bin.

Sala 1915an gava ermenî ji destê dijmin difilitin û cîguhastî Şengalê û warên mayîn dibin, êzdî alî wan dikin, kê bi çi dikaribû û rê li ber qira wan digirin. Xalê min zareke ermenî yê bêxweyî hildide, xwey dike, bi zarên xwe ra tevayî mezin kirîye, zewicandîye, kirîye xwedî mal û hal û wisa kirîye, ku wek ermenî bimîne.

Mezinên me herdem ji me ra gotine, ku ermenî miletekî zêrîyayî ye, ku dîroka me yek e, herdu miletên me karibûne bi hevra tifaq bijîn, biratîya hev bikin. Ji me ra gotine, ku ermenî xwedî ruhê mezin in. Em di wê yekê da hatine bawerkirinê, dema cara pêşin hatine Ermenîstanê.

Avtor – Endamên dêlêgasyonê di dema mayîna xwe ya li Ermenîstanê him ber xwe diketin, him jî ji kêfxweşîyê ruhdar dibûn. Ber xwe diketin, çimkî her êzdîyek bîranîna gelkujîya ermenîyan ji

xwe ra deyn hesab dike, çimkî êzdî hertim jî hewil daye di rojên çetin da li rex dostê xwe be. Ji kêfxweşîyê ruhdar dibûn, çimkî pêşketina Ermenîstanê û dostanîya di navbera herdu miletan da didîtin.

Sohbetvanê me yê dine cara pêşin hatîye Ermenîstanê. Birê wî berî du salan hatîye vira û gelek tişt jê ra gotîye, gelek tişt jî zêde kirîye. Lê hat û zêdetir dît. Qewal e, xizmetkarê ruhanîyê ye. Ewana di navbera navbenda ruhanî û bawermendan da pevgirêdanan saz dikin. Ew hilbet zane, ku yek ji kesên pîroz û nûranî yên Taûsî Melek li vir e, çimkî ji qewalên hatî yek dikare bi riya Brîtanîya Mezin derkeve der va, lê yên din li vir dimînin û li vir dimirin.

(wergera yekser, Qewal)

Her tişt li vir balkêş û hewaskar e. Gava min li ziyaretê heykelên Andranîk paşa, Ûsiv beg, Cangîr axa dîtin, wana tesîreke mezin li ser min kirin. Lê heykelê dostanîyê dilê min hingavt, bi bilindayî û bedewîya xwe va.

Heytehola bi Cangîr axa va girêdayî ya bi tevbûna leşkerên ermenî va gelek balkêş e. Tenê ermenî dikarin qedirekî ha bidine mêrxasê gelê bira. Em bona van hemû tiştan zef razî ne. Em sipas dikin, ku ermenîyan dengê xwe yê şikyatkirinê bilind kirin himberî qira êzdîyan li Îraqê.

Rastîyê jî, dinya gerekê bi temamî Gelkujîya ermenîyan şermezar bike, bona ew dubare nebin, ew yek neyê sere tu miletekî din.

Em bona ruhê şehîdên Gelkujîya ermenîyan dua dikin, em ji gelê bira ra sebirê dixwezin. Mîyaserkirê qetilê gerekê cabê bide, û gerekê her tiştê birîye, vegerîne, û ya sereke jî, gerekê axa ermenîyan ya bi 1,5 mîlyon şehîdan va avdayî, bê vegerandin. Ez gelek şa me, ku di şerê miqabilî tirkan da emekê êzdîyên mêrxas jî heye, yên wek Cangîr axa, ku me îro qedirê wî bilind girt.

Avtor – Têlman Fêroyan nûnerê êzdîyên Rûsîyayê ye. Li bajarê Îvanovoyê dijî û dixebite. Tevî hemû eyd û şahîyên li Aknalîçê bûye.

(Têlman Fêroyan, wergera bi lez)

Ermenîstan welatê me ye, û ez bi kubarî dikarim bêjim, ku ez salê carekê tême vira, carina du caran jî. Wisa qewimîye, ku 29ê îlonê roja Ziyaretê ye û wê rojê Mîrzeyê Çolo Siloyan 5 heykel pêşkêşî me kir. Ew dîrok e û di rastîyê da Andranîk paşa, Cangîr axa û Ûsiv beg in ew dîrok, ku îro em xwedîyê wê ne. Em îro kubar in, ku seredana heykelên xwe dikin. Mîrzeyê Çolo Siloyan îro ji min ra got, ku di fikira wî da heye dibistana sazbendîyê ya bona zara û navbenda civakî-çandî bide sazkirinê.

Duh jî rojeke bi nav û nîşan bû: hîmê qubeya teze hate danînê. Eva sê sal e, ku li Ermenîstanê ziyareta pêşin hatîye çêkirinê. Û bingehdarê wê ziyaretê Mîrzeyê Çolo Siloyan qirar kir razîbûna ruhanîya êzdîyên Lalişê bistîne û mirazê wî hate sêrî û zanibû, ku wê ziyareta dudan jî çêke.

Taûsî Melek kesê me yê pîroz û nûranî ye û em ber wî temene dibin û pante didin. Çiqas ku min fêm kir, îro Mîrê Mîra Tehsîn beg razîbûna xwe da, ku li vira qubeya me ya teze hebe bona hemû êzdîyan. Ewê qewmandineke dîrokî û hêjayî bîranînê be bona hemû êzdîyan, bona heval û dostên wan yên ermenî.

Hîmdanîna Taûsî Melek wê bibe bîranîneke xusûsî bona rojên buhurî. Ermenî û êzdî xwedî qederekê bûne. Mixabin, qira êzdîyan îro jî – di sedsala 21ê da berdewam dike. Ev hemû nakeve nava femdarîya merivayê.

Seredana dêlêgasyona ruhanî ya bilind ji Lalişê li Ermenîstanê bona 100 salîya gelkujîya ermenîyan, îzbata wê yekê ye, ku wek herdem, gelên ermenî û êzdî hevgirtî ne, nêzîkî hev in û xweşîya hevdu dixwezin.

Seredana Tehsîn beg, Bavê Şêx û yên din li Ermenîstanê germaya di navbera me da da xuyakirin. Me dît, ku bona Tehsîn beg çiqas dijwar bû bê vira, lê ew hat bona nîşan bide, ku îro, roja şînê ew li rex gelê ermenîyan e.

Avtor – Berî ku cenabê Tehsîn beg ji Ermenîstanê here, me dûr û dirêj pê ra qise kir. Ewî jî derheqa gelek pirsan da behs

kir. Bo nimûne, şabûna xwe elam kir bona her tiştê ku li Aknalîçê diqewime. Ewî xwest ku nûnerên êzdîyan zêde bikevine nava karê serokatîkirinê. Ewî xwest, ku çandeya miletîyê jî pêşda here. Lê, ya here sereke, ew dostanî destnîaşn kir, ku di navbera herdu miletên me da heye. Û ew gerekê wek ronahîya çevên xwe biparêzin, xwedîtîyê lê bikin û derbazî nisletên paşwextîyê bikin.

Li jêr wergera bersîva wê pirsa axirîyê ye, ku Tehsîn beg di dema hevpeyvînê daye.

(werger bi hahanga hatîye kirinê)

Me hertim jî qencî bona miletê ermenî xwestîye û em niha jî dixwezin. Em – êzdî, ku li welatên cuda-cuda bi jimara xwe va hindik in, dengê xwe yê şikyatkirinê bilind dikin û destnîaşn dikin, ku ew her tiştê ermenîyan, bira li ermenîyan vegerînin, çimkî ew bi rastî jî ya wan e. Xênji ermenîyan aşûrî, hurum, êzdî jî hatine qirkirin. Ew hemû gelkujî gerekê bêne şermezarkirinê, û dewletên Ewrupayê gerekê di wî karî da ciddî bin. Em bi gelê ermenî ra ne û em gelkujîya ermenîyan şermezar dikin.

Avtor – Gava min xatirê xwe ji dostên me yên êzdî dixwest, min pê ra dûr û dirêj qise kir. Me derheqa pirsên cuda-cuda da xeeberda, şabûna xwe dîyar kir derheqa her tiştê ku bi ziyareta Aknalîçê va girêdayî. Ewî xwest ku nûnerên miletê êzdî di serkarîkirina welêt da cîyê xwe bigirin, bona çandeya miletîyê zêde pêşda here. Dû ra min pirsî, gelo Mîrê Mîra Tehsîn beg wê careke din bê Ermenîstanê, gava qubeya Melek Taûs bê çêkirinê? Bersîva wî kurt bû: "Bi destûra Xwedê, ezê bixwezim bêm".

Yêrêvan, Sîsrênakabêrd, Ziyareta Aknalîçê,
Nîsan, sal 2015.

EZDIKI.COM

Riya ku ber bi ziyaretê dibe. Pey du salan ra

Ez nizanim çawa bêjim, ji bext ra, an jî ji telebext ra, wext pir zû derbaz dibe û carina pê ra nagihînî tiştên buhurî bi hûrgilî parzûn bikî, bidî ber hev. Niha ji 29ê îlonê sala 2014an demeke dirêj derbaz nebûye. Lê fikir û bîr û bawerî gelek in. Lê di bin van fikirên dagirtî da meriv dikare tam fem neke, ka di rastîyê da çi qewimî. Niha, gava gilî tê ser wê yekê, ez wek berê di wî halî da me, çimkî bûyer û fikir ewqas pir in, ku ne dixwezî bersîva wan bidî, ne jî dixwezî derheqa wan da tiştekî bêjî.

Ez di nav van fikiran da bûm, dema dostê min – Sêrgo Yêrîtsyan, ku bi koma xwe ya efrandarîyê ya bi navê "Kartsik" va bûye salnivîsarê taybet ji bo qewmandinên li ziyareta me ya li Aknalîçê dibin, ez teglîf kirim bona fîlma wî ya vîdêoyê ya bi navê "Riya ku ber bi ziyaretê dibe. Pey du salan ra" mêze bikim. Gava me film nihêrî, kuta kir, min fem kir, ku di vê fîlmê da ne tenê bersîva hemû pirsên xuliqî hatîye dayîn, lê usa jî bi kurtî hatîye xuyakirin, ka di 29ê îlonê da çi qewimî. Hilbet, dijwar bû di nav bi hezaran kesan da meriv bikaribe her tiştî fêm bike û derc bike. Di vî karî da ew aparatên fîlmkişandinê karekî mezin kirin, ku ji jor va her tişt dikişandin. Ji wana xuya bû ka di rastîyê da wê rojê li ziyaretê çi diqewimî. Carina wisa xuya dibe, ku em li ser erdê pir in, gelek pirsgirêkên me hene, lê ji bilindahîyê em diha sade û zelal in, kêm-zêde têne femkirin. Ango, hema em in, ku dikarin him şa bibin, him ber xwe kevin, him jî biêşin...

Ji telebext ra, wê rojê wisa qewimî, ku ez westîyayî bûm û berî destpêka şahîyê pirsgirêkên min yên tundurustîyê hebûn, lê dîsa jî ez hatim, gihîştime meydana şahîyê, li ser kursî rûniştim. Wê demê ez difikirîm, rewşa min çawa be jî, ez qe na li rex mêvanan bim.

Hilbet, 3-3,5 mehên xebata ser hev tesîra xwe li min kiribûn û wisa xuya dikir, ku niha gerekê dema kêfê bûya, lê wisa derneket.

Bi dîyarkirina vê surê dixwezim razîbûna xwe bidime dostên xwe yên nexweşxaneya Êcmîadzînê – bizîşkan, yên ku her tişt kirin, ku cansaxîya min zirarê nebîne, û ne tenê wê rojê, lê di rojên pêşdemê da jî. Dema wextê xeberdana min hat, ez zêde tevlihev bûm, min hewil da wan tiştan bêjim, ku ez difikirîm. Ji bextê min ra min fikirên xwe ji pêşda nivîsîbûn û xwendina wan ez xilaz kirim. Ez li vir xeberdana xwe raberî we dikim:

- Amadekarên ezîz, welatîyên min!

Çavên me melûl in û ruhên me bi xem in, çimkî rastîya bêbext ya sedsala 21ê careke din merivan da bawerkirinê, ku peyçûyên îslamê yên tundraw, ku ji her tiştên merivatîyê dûr in û gorî edetên pêşîyên xwe yên hovîtîyê emel dikin, heta niha jî li ser riya medenîyeta cihanê bûne asteng, tenê dewsa şûr û mertalan, îro reşaş û avtomatan bi kar tînin, lê dewsa hespan makîneyên "Hamêr" in.

Van rojan, cihana wa gotî "pêşketî", bêxem e, wek ku berî sedsalekê bû, bêdeng e û nabîne ka li navçeya Lalişê ya li Îraqê çi diqewime, bêxem e di hindava qetilkirina bi hezaran welatîyan, li wir jin û keçan direvînin û dişuhurînin, nesla nû dikin qûlên xwe û ev her tişt bona wê ye, ku ew merivên bê sûc dixwezin ser dînê xwe bimînin.

Eva qirkirina eynsî ye. Ew dengvedana wê bedbextîyê ye, ku gelê ermenî yê bira dîtîye û dengê xwe yê şikyatkirinê bilind dike û ew deng ji zarê serekên herdu komarayên ermenîyan – birêz Sêrj Sargsyan û Bako Sahakyan, Metranê temamîya ermenîyan Garêgînê 2an li tevaya cihanê belav dibe. Şêkirdarîya me ya ji dil ji wan ra û bi serî wan ji temamîya gelê ermenî ra.

Em herwiha razîbûna xwe didine dengbêjê di cihanê da bi nav û deng Şarl Aznavûr, yê ku di van rojên ji bo êzdîyan qirardar da dengê xwe bilind kir dijî destdirêjayên îslamîstan û kesên ku helanan didine wan.

Birayên me yên ermenî yên Ermenîstanê di rewşa welêt ya aborî ya dijwar da jî ne tenê alîkarîya xwe ya moralî nîşanî welatîyên me yên li Lalişê didin, lê herwiha alîkarîya peretî û yên mayin jî dişînin. Ez dixwezim wê yekê jî destnîşan bikim, ku di van rojên bona miletê me reş da him êzdîyên Ewrupayê, him jî yên Rûsîyayê bi alîkarîya peretî û bi eşîyan va dixwezin alî wan wan welatîyên xwe yên li Îraqê bikin, ku di rewşeke "cehnemî" da ne, hewil didin bi xwe tevî wan mecalan bibin, ku têne kirinê bona parastina xwîşk û birayên me.

Rewş li Lalişê ha ye. Ev rewşa dikare warguhêzî belayeke hemcihanî be. Ji ber wê yekê jî em ji vî warê ber dilê me ezîz bangî ewrupîyan û amêrîkîyan dikin, ku ji xewa hingorê hişyar bin, çimkî daxwezên îslamîstan, ku dewleta îslamîyê – xalîfatê saz bikin, wê bi Îraqê û Sûrîyê va xilaz nebin, û rojeke nav û nîşan jî wê Ewrupa û Amêrîka mecbûr bibin bi qanûnên şerîetê va bijîn.

Welatîyên min, ezîzên min!

Bi gotina şayîrê ermenîyan yê mezin – her tişt axirîyê dibe xwelî an jî kozî, her tişt, xên ji bîranînê. Em bi deqeyeke kerrbûnê va qedirê bîranîna şehîdên fermana 74an yên bê sûc û guneh bigirin, bira Taûsî Melek bê hewara wan û bona ew bikaribin himberî vê bedbextîyê ber xwe bidin, ku usa jî ji bo temamîya merivayê xeta ye.

Gelî merivên hazir!

Lê emir pêşda diçe. Îro 29ê îlonê ye, û em dîsa li vî warê ziyaretî da berevî ser hev bûne. Wek ku min li jorê destnîşan kir, bîranîn herdem dimîne, ji neslekê derbazî nesla din dibe. Îro em li ziyareta xwe ya hemêza xwe vekirî da heykelên kesên ber dilê xwe ezîz, ku nûnerên ermenîyan û êzdîyan in, vedikin. Yên Ûsiv begê, Cangîr axa, Zoravar Andranîk, mêrxas, ku herwiha bi saya serê têkoşîna wan e jî, ku em gerekê li ser vê axa delal heta-hetayê bijîn.

Van dehsalîyên axirîyê derheqa emir, mêrxasî û karê welatparêzîyê yên Zoravar Andranîk û Cangîr axa da, derheqa

biratîya wan ya germ û ji dil, ku îro bûye nimûneya zindî ya dostanîya herdu miletan, gelek caran hatîye xeberdan û nivîsar. Ev mezinayên, ku bona me bûne lêgênd, ji vir şûnda wê li rex hev wek du melek sînorên Ermenîstanê biparêzin, wê me û nesletên me ruhdar bikin vî erdê biçûk mînanî ronahîya çavan biparêzin û bi hêvî bin, ku rojek ji rojan wê xewna herdu miletan bibe rastî – herine welatê kal û bavan, ne wek tûrîst an jî mêvan, lê wek xwedîyê malê herine wetenê kal û bavan – gundê Kullikê, gundê Cangîr axa – Çîbûxlûyê, gundê Ûsiv beg - Eslanlûyê, behra Wanê ya bedew an jî Anîya bi hezar û yek dêran va, ku em van axirîyan lê qesidîn.

Niha ez dixwezim derheqa ewledekî miletê me yê hêja û bi nav û deng da xeberdim, ku heykelê wî jî wê virhada li ser axa ziyareta me be.

Ûsiv beg Têmûryans. Serekeşîrê êla Hesinîyan yê 26an Ûsiv beg sala 1869an li Ermenîstana Roava, li navçeya Surmelîyê, gundê Eslanlûyê da ji diya xwe bûye. Kalikê Ûsiv – Têmûr axa, paşê jî bavê wî – Hesen axa, ku cîgirê qiralê Kavkazê mîrlaw Voronsov rind ew nas dikirin û qedirê wan digirt, rind derc dikirin, ku di nav sînorên împêratorîya osmanîyê da bijîn, tê maneya ku herdem bêne zêrandin û tirsa kuştinê li ser wan hebe, wek ku hate serê ermenîyan, asorîyan, huruman. Û gelên xwedî qederekê û daxweza, ku bi hev ra ber xweserîtîyên tirkan ber xwe bidin, dostanîya heyî xurttir dike, ku bi sedsalan di navbera ermenîyan û êzdîyan da hebû: herdu jî parastvanên erf-edetan, Xwedêtirs û Xwedênas.

...Derê Hesen axa hertim jî ber ermenîyên diçûne Surmelîyê û Îdirê vekirî bû. Wek nimûne, ronahîdarê ermenîyan yê mezin Xaçatûr Abovyan li devera Surmelîyê gerîyaye, bûye mêvanê Hesinîyan, û derheqa van hemû tiştan da lêkolînek nivîsîye bi sernavê "Êzdî". Abovyan herwiha texmîn kirîye: "Ji miletên cînarên xwe ewana bi tu yekî ra ewqas nêzîk nînin, ewqas baş bi hev ra kar nakin, çiqas ku bi êzdîyan ra û ew wana wek bira dihesibînin".

A bona wê yekê jî, gava pirsa xwendina Ûsivê biçûk hate meydanê, bavê wî – Hesen axa bêy ku zêde bifikire, qirar kir kurê xwe bona xwendinê bişîne zaniştgeha Gêvorgyan ya li rex dêra ermenîyan ya sereke. Bi vî awahî Ûsivê êzdî (an jî Hovsêp, ku bi ermenî wisa wî bi nav dikirin) ber metranê hemû ermenîyên cihanê disekine û bêy ku tu gotinekê bi ermenî bizanibe, zanişgehê da tê qebûlkirin. Lê ne ew tenê di wê rewşê da bû. Ewledekî ermenîyan - Soxomon jî, ku paşdemê da bû Komîtasê bi nav û deng, di wî halî da bû, yê ku gelek xweş distira, lê ne bi ermenî. Qederê du mezinên me – Ûsiv beg û Komîtas hevdu ra kire nas, dû ra jî ew kirine dostên hev yên nêzîk. Û tiştekî ji nişkê va nîbû, ku xebata dîplomîyê ya Komîtas di dema xwendina wî ya li Ewrupayê sazbendîya êzdîyan ya miletîyê bû. Di paşdemê da jî Komîtas gelek caran behsa sazbendîya êzdîyan kirîye, ew berev kirîye, şimşat kirîye, notayên wan nivîsîne û bi wê yekê va bi dehan nimûneyên ji xezîneya sazbendîya me ji windabûnê dane xilazkirinê.

Ûsiv serhevdu 27 salî bû, gava pey wefatbûna bêwede ya bavê xwe – Hesen axa, karê serekeşîrtîyê hilda ser milên xwe û êdî ne tenê zimanê dê zanibû, lê usa jî zimanên ermenî û rûsî zanibû û wek serekê Hesinîyan, gorî êzdîzan Soxomon Yêxîyazaryan, ji alîyê malbeta xwe, hemû endamên êlê da dihate hizkirin û qedirê wî digirtin.

Lê xwesma kar û barê Ûsiv beg yê di destpêka sedsala 20an da diha berbiçav û hêjayî bîranînê ye. Êdî prîskên alava şerê hemcihanê yê pêşin xuya dibûn. Ermenîyan û miletên ne musulman êdî ketibûne ber derbên hemîdîyan, texmîn dikirin, ku ew şerê mezin bi xwe ra mirinê tîne. Cangîr axa û Andranîk Ozanyan cara pêşin li gundê Hezerana Bêrkirîyê hev nas dikin û dibine dostên hev. Dû ra ewana bi hev ra gelek caran dibine mêvanê Ûsiv begê û ew dibin sisê. Dostanî û biratîya wan di paşdemê da di şerên bo Qersê, Sarîqamîşê, Baş Aparanê û li warên din xurttir bû û kemilî.

Sala 1914an. Leşkerên artêşa Rûsîyayê ya li Kavkazê, ku di wê da desteyên ermenîyan û êzdîyan yên rezadil bi mêrxasî

şer dikirin, pêşda diçûn ber bi kûraya Tirkîyê, hêvî dikirine dilê ermenîyan û êzdîyan, ku wextê azadîyê nêzîk e. Lê şoreşa bolşêvîkan li pêşenîya Kavkazê rewş ji binî va guhart. Qiralîyeta Rûsîyayê felişî, û axa Ermenîstana Roava ya biçûk ma di bin destê hovên osmanîyan da. Şerê li Serdaravê (di gulana sala 1918an da) bû şerê man-nemanê. Ûsiv beg bi sedan siyarîyên xwe va tevî wî şerî bû. Piştî serketinê, li bakurê çemê Erez, li ser axeke biçûk 28ê gulana wê salê Komara Ermenîstanê ya pêşin hate damezirandinê, ku usa jî bi saya serê ewledên gelê me yên mêrxas pêk hat. Bi îlankirina komarê ra girêdayî Ûsib beg bi xwe ji navê hemû êzdîyên Ermenîstanê têlêgrameke pîrozbahîyê şande Tbîlîsîyê – ji serekê hukumeta Ermenîstanê Hamo Ohancanyan ra û tê da dida bawerkirinê, ku ewana ji vir şûnda jî wê her tişt bikin bona gulvedaana welêt. Hêja ye bîr bînin, ku di paşdemê da jî Ûsiv beg bi sonda xwe ra amin ma û tu caran ber qeydên Sovyet çok veneda. Li Ermenîstana serbixwe parlamêntoya pêşin ya komara sosîalîst bi 46 parlamêntaran va hate sazkirinê, ku yek ji wana Ûsiv beg Têmûryans cîyê xwe yê layîq girt, wek endamê komîsyona kar û xemxurîyê. Parlamêntarîya wî ji alîyê êzdîyên Ermenîstanê yên 27 olkan da hatibû piştgirîkirinê. Mirovên wan deman destnîşan kirine, ku Ûsiv beg di dema karê xwe yê parlamêntarîyê da guhdarîyeke taybet daye ser xwendin û nivîsara êzdîyan, pirsgirêkên perwerdeyê, û ew hemû bû yek ji pirsên rojeva wê kongreya êzdîyan ya pêşin, ku bi înîsîatîva wî 20ê tebaxê sala 1920î li Alêksandrapolê hate derbazkirinê.

Lê çirîya paşin ya sala 1920î dawî li pêkanîna hemû meremên Ûsiv begê anî. Dîwana teze ne tenê di hindava wan da bêxem bû, herwiha ji berê va dest pê kir zor li wan kesan kir, ku tevî şerên miletîyê-azadîyê bûbûn û ew bê bingeh sûcdar dikirin. Ji wan kesên, ku bi dû wan ketibûn, di lîsteyê da navê Ûsiv begê serê jorîn hatibû nivîsar, ne tenê wek tevbûyê tevgera ji bo azadîyê, lê usa jî bona wê, ku nav û dengê wî di nav milet da gelek bû, mirovekî aqilmend bû.

Di dawîya sala 1929an da dîwana nû wî mehkeme dike û sirgûnî Kyeverê dike, lê du salan şûnda wî cîguhastî hebisa Rewanê dikin. Di rastîyê da, Ûsiv beg bi saya serê serekê Ermenîstanê yê wê demê Axasî Xancyan ji sûcê diha giran û ji kuştinê xilaz dibe. Ew di havîna sala 1932an da navçîgarîyê dike bona wî ji hebisê azad bikin. Lê sirgûnî, hebis û ya sereke jî – rewşa derûnî tesîra xwe li ser cansaxîya ewledê gelê me yê hêja û dostê gelê ermenîyan yê rasteqîn hîştibûn. 12ê çileya paşin sala 1934an Ûsiv begê 65 salî xatirê xwe ji vê dinyayê xwest û ji bo neslên tê navekî qenc, riya jîyanê ya paqij hîşt û bû nimûneyeke baş bona xizmetkirina ber welêt û milet.

Îro karekî me yê pîroz jî heye. Biratîya gelên ermenî û êzdî ya bi sedan salan îro bi heykelekî bedew û pirfikir va hate jîyandin û îzbatkirinê. Ez wê îzbatîyê tiştekî sîmvolîk dihesibînim, ku dostanîya herdu gelên me di sîmvolên wan da jî xuya dibe – di royê û xaçê da, ku herdu jî jîyanê didin, herdu jî heta-hetayê ne. Em bawer in, ku çawa ro û xaç jîndar in, eynî wisa tu kes wê nikaribe yekîtîya me têk bibe. Ez usa jî bawer im, ku çiqas riya ku ber bi ziyaretê dibe paqij û zelal e, ewqasî jî ev heykelê nîşana dostanîya gelên me wê ji bo wan kesan bibe eşaretî, yên ku bicêribînin dostanîya me xirab bikin.

Cimeta qedirgir, sedsalîya gelkujîya ermenîyan ya mezin nêzîk dibe. Di wê gelkujîyê da bi hezaran êzdî jî hatine qirê. Berî roja 100 salîya dîrokî, nesla êzdîyan ku berî sedsalekê li ser axa ermenîyan hêwirîbûn û îro li Ermenîstanê dijîn an jî belayî welatên cihanê yên cuda-cuda bûne, deynê sitiyê xwe hesab dikirin bona bîranîna şehîdên bê sûc yên ermenîyan heykelekî bidine sekinandinê.

Tiştekî text-bext nine, ku ew heykel li ser mezîla ziyaretê hate danînê, li ziyareta wî miletî, ku wî jî ji wê bedbextîyê para xwe dîtîye, şehîd dane û heta îro jî di rûyê dînê xwe û miletîya xwe da tê zêrandin û kuştin. Em bawer in, ku ev heykel wê dengê xwe tevî dengê wan bi hezaran heykelan bike, ku li cî û warên cuda-cuda bona bîranîna şehîdên Gelkujîya ermenîyan ya Mezin bi

bangawazîya "Merivno, haj ji xwe hebin, ku li cihanê li tu cîyan êdî zulma wisa neqewime" hatine sekinandinê.

Ez we hemûyan pîroz dikim bona vê eyda me ya edetî, 29ê îlonê, roja sersalîya vekirina ziyareta me, em ji we ra serketinên mezin, cansaxîyê û açixîyan dixwezin boy navê pêşketin û gulvedana welatê me.

Ez di dema xwendina nivîsa xwe da gelek lez diketim, dibe jî bona wê, ku min dixwest zû xilaz bikim. Ya giring ew e, ku min tiştên dixwest, got û gotinên min diha zef bûn û derheqa gelek kesan da bûn. Hûn zanin, ku bi sedan kes tevî çêkirina ziyareta Aknalîçê û heykelê bîranînê yê "Dostanîya ermenîyan-êzdîyan" bûne û kê derheqa vê îdêayê da bihîstibû, hewil dida anegorî karebûnên xwe alîkar be.

Lê di van karan da dijwarî ne hindik in, ji peydakirina kevirên bona nexşkarîyê girtî heta dîtina fikirên efrandarîyê yên bêqusûr. Minaqeşe û rastkirinên me di dema xebatê da dibûn û me hewil dida karê xwe heta 29ê îlonê xilaz bikin. Dema di mehên tîrmeh-tebaxê da li Şengalê fermana êzdîyan ya 74an qewimî, çawa dibêjin, dilê min şewitî, saxlemîya min tevlihev bû. Ez fikirîm, min got belkî em van karan paş bixin, çimkî ez destxweda ser heftêyekê çûme Îraqê, min bi xwe ra alîkarîya peretî ya bi cema mezin bir bona welatîyên min yên ku di rojên oxirmên giran da ketibûne rojeke teng. Min her tişt ber çevên xwe dît - malên wêranbûyî, merivên ku ew qetil ber çevên xwe dîtibûn.

Kêfa me êdî ne ya berê bû, gelek welatîyên me jî pêşnîyar dikirin vekirina heykelan paş bixin, digotin ku ne wextê wan e. Gava min derheqa vê yekê da fikira dostê xwe yê nêzîk Sêrgo Yêrîtsyan pirsî, ewî gelekî rehet got:

- Her tişt gerekê wek ku hatîye plankirinê bibe. Emê bi vekirina van heykelan va şehîdên vê qetilê bîr bînin. Li vir kevirê bîranînê yê bona 100 salîya şehîdên gelkujîya ermenîyan jî heye.

Paşê em ser va çûn, ku di vî karî da hesînên me dikarin zirarê bidine karê me.

Em hatine ser wê bawerîyê, ku ev hemû wê bona bîranîna şehîdan be, û ev yek wisa jî hate kirinê. Û ne tenê di dema derbazkirina sersalîya ziyaretê da, lê dû wê ra jî, gava dest bi beşa sitiranên nivatinê bû, ku koma kilam-reqasê ya miletîyê "Akûnk", artîstê Ermenîstanê yê emekdar Rûbên Sahakyan, dengbêjên êzdî tevî wê bûn.

Sitiran û reqasên zelûl, qeşeng û yên welatparêzîyê ew der hildabûn. Ruhên bi hesînan va tijî li wir perwaz didan. Her kes direqisî, him mezin, him biçûk, bi wê yekê va wana şikyatê xwe dijî wan kuştinan elam dikirin, ku li colanga gelê me diqewimî, di hindava xelqên bê çek, zaran, mezinan, jinan da. Ruhê miletîyê li ziyaretê bilind bû û pey kutabûna heyteholê ra jî meriv dîsa dihatin, bi malbetan va, bi zar û salmezinan va, ji warên Ermenîstanê yên êzdî lê diman, ji Rûsîyayê, Ewrupayê. Ziyaret her kesî ber bi xwe dikişîne, gazî wan dike.

Ez şa me, ku me temamîya şahîya xwe bi dost û birayên xwe yên ermenî ra derbaz kir. Xeberdanên wan yên germ û ji dil, piştgirî û xêrxwezîya wan em ruhdar kirin û karmendên derece bilind yên hazir ew yek ji navê serekê welêt Sêrj Sargsyan, serekwezîr û serekê parlamêntoyê kirin. Meriv çawa dikare sipasdar û şêkirdar nîbe? Bi rastî jî, em dikarin wan hemû karan berdewam bikin, ku mezinên miletê me wek wesyet ji me ra hîştine – herdem bi hev ra bin, wî çaxî emê bikaribin ber her destdirêjayîkê ber xwe bidin.

Ez şa me, ku yek ji armancên min jî pêk hat û îro kêfa min cî ye, ku îro ne tenê ziyaret, lê komplêksa heykelan jî bona merivan bûye cîyê seredaneke xweş.

Gava min ev xet dinivîsîn, ji min ra gotin, ku kurê Cangîr axa – Sûrên, nevîyên wî, qewim û pismamên wî hatine seredana komplêksa heykelan, heykelê Cangîr axa û heykelên din.

Van rojan anegorî edetê miletê me eyda Siltan Êzîdê Sor tê derbazkirin. Bona êzdîyan bûye edet, ku di rojên eydan da seredana mezelan û warên ziyaretî bikin – niha jî ziyareta me û komplêksa heykelan. Ez wê jî bêjim, ku ji min ra bi hûrgilî derheqa

vê seredanê da şrove kirine. Ez him bi duayên şêx, him jî ji kesên ku xeberdan û derheqa min da gilîyên xweş û şêkirdarîyê gotin, zef razîme. Ez dixwezim vê firsendê bi kar bînim û bêjim, ku min ev her tişt ne bona wê yekê kirîye, ku pesinê min bidin û min qîmet bikin, lê min bona wê yekê kirîye, ku ev hemû bi dilê milet be, lema jî min xwe li vê rê girt. Berî mehekê jî merivên yek ji ewledên miletê me yê hêja Ûsiv beg qesta ziyaretê û komplêksa heykelan kiribûn, wî çaxî jî dua, qîmetkirin, daxwazên xweşbextîyê hebûn. Niha hewa sar e, lê ew nabe menî, ku meriv seredana ziyareta me û komplêksa heykelan nekin.

Rastî mala Xwedê, ev her tişt min ruhdar dike, min mecbûr dike ser karên paşerojê bifikirim. Û pêkanîna wan gavan tê maneya, ku wê heykelên teze bixuliqin, bi ruhê teze va.

24ê nîsanê sala 2015an, temamîya dinyayê wê 100 salîya Gelkujîya ermenîyan bide kivşê. Me bi wê rojê ra girêdayî 29ê îlonê sala 2014an li ziyareta xwe kevirê bîranînê danîye û di planên me da heye, ku 24ê nîsanê heyteholeke mezin teşkîl bikin. Wê rojê wê mêvanên me hebin ji Şengalê, Rûsîyayê, Ewrupayê. Ji wê rojê demeke dirêj wê derbaz nebe û wê careke din roja 29ê îlonê sala 2015an bê. Lê berî wê em ji bîr nekin, ku emê têksta vîdêofîlma dostê min Sêrgo Yêrîtsyan ya bi sernavê "Riya ber bi ziyaretê dibe: pey du salan ra" raberî we bikin, ku bi awayekî zelal tîne ber çevan, ka di rastîyê da 29ê îlonê sala 2014an li ziyareta Aknalîçê çi qewimî.

EZDIKI.COM

BINGEHÊN PAQIJ YÊN DOSTANÎYA QEWÎN Û BIRATÎYA DILGERM

Çar mezinayên dostanîyê an jî Rêwîtîya ber bi welêt

Ez gelek şa me, ku mecala min heye ez tevî 2 salîya roja bingehdanîna ziyareta me bibim. Demek dirêj ser 29ê îlona sala 2012an derbaz nebûye, gava bi serokatîya serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê Mîrê Mîran Tehsîn Beg bi heyteholeke mezin dua li ziyareta êzdîyan ya li Aknalîçê hate kirinê. Em sala par berev bûn, me yeksalîya ziyaretê da kivşê. Wê demê jî me eyda xwe bi hezaran bawermendên êzdî û ermenî ra tevayî derbaz kir.

Zûtirekê 2 salîya ziyaretê temam dibe. Emê wî çaxî jî bi miletî berevî dora ziyareta xwe bin, bi duayên xwe, bi fikirên xwe, bi xeyalên xwe va.

Gava sala par karê pîrozkirina yeksalîya ziyaretê xilaz bû, dostê minî hêja Sêrgo Yêrîtsyan di nava xeberdana xwe da destnîşan kir, ku em gerekê ji niha va karê pîrozkirina sersalîya tê bikin, çimkî karê me daye pêş xwe, karekî gelek dagirtî û heralî ye.

Gava min xeberdana wî bihîst, ez fikirîm, ku hela salek heye, çima dostekî gelê me yê herî nêzîk ewqas ber xwe dikeve. Lê wexteke dirêj derbaz nebû, min fem kir, ka Sêrgo Yêrîtsyan çima wisa ciddî berê xwe dide vî karî. Ji bîra min çûbû, ku gava me hazirîya yeksalîya ziyaretê dikir, min derheqa paşeroja ziyaretê da jê ra hinek gilî gotibûn. Min gotibû, ku ez dixwezim li ziyaretê heykelê dostanîya ermenîyan-êzdîyan hebe. Wê dostanîyê, ku di nava sedsalan da qal bûye û îro xwedî hêz û qewateke mezin e.

Di rasthatinekê da yek ji hevalên me yê ermenî gote min: "Mîrze, em cimetek in, lê du milet in". Pêşî meriv difikire, ka evî çi got, paşê texmîn dike, ku ew fikireke gelekî kûr e. Rastîyê jî, ew di zûda wisan e. Gava proêkta heykel dihate amadekirin, min ji heykelterêş Tîgran Yûxanyan ra got, ku ew heykel gerekê bibe sîmvoleke taybet ya dostanîya ermenîyan-êzdîyan. Lema jî di bingehê heykel da xaça ermenîyên xaçparêz ya 5-6 mêtrê û jora wê Şemsê êzdîyan-teva bi nexş-nemûran va ew xaç hemêz kirîye. Fêza heykel da sîmvola ermenîyan yên Zvartnosê û sîmvola êzdîyan teyrê taûs e, ku nîşana Taûsî Melek e. Di rastîyê da kompozîsyoneke kûrfikir e. Dibe eva heykela vî cûreyî ya tek-tenê ye û ji wê dostanîya herdu miletan ya bi sedsalan tê ber çavan.

Ez gelek bawer im, ku ev heykel wê bona wan kesan bibe mîna ziyaretekê, yên ku dostanîya herdu miletên me bilind qîmet dikin û dixwezin, ku ew heta-hetayê wisa bûya û berê xwe bida sedsalan.

Kesên ku dostanîya ermenîyan-êzdîyan parasine, ewledên herdu miletan bûne. Hema ew in, ku wê dostîyê mînanî ronahîya çavên xwe parastine, lê miqate bûne.

29ê îlonê sala 2014an hûnê li ziyareta Aknalîçê ne tenê heykelê dostanîya ermenîyan-êzdîyan bibînin, lê wisa jî hûnê komplêksa heykelan binînin, ku bona wê dostîyê gelek karên mezin kirine.

Derheqa dostanîya Cangîr axa û Zoravar Andranîk, Ûsiv beg û Komîtas da gotinên ecêb xweş hene. Û me xwest, ku li rex heykelê "Dostî" heykelên wan hebin. Li ser milê çepê wê heykelê Ûsiv beg bê bicîkirinê, li ser milê rastê yê Zoravar Andranîk, lê li rex Andranîk wê heykelê kevirî yê Cangîr axa be, ku heykelterêş, şikilkêşê komara Ermenîstanê yê emekdar Gêtîk Baxdasaryan çê dike. Li rex heykelê dostîyê wê dêm û dîdemên wan yên mêrxasîyê bêne bicîkirinê.

Dostanîya kal û bavên herdu miletên me gerekê bona nisleta nû bibin nimûne û ew dostanî gerekê diha mehkem bibe. Ez rast bêjim, gava dixwezim fem bikim ka hevalên min yên herî nêzîk kê ne, ez dibînim, ku piranîya wan ermenî ne, ew ji miletên din, heta ji

êzdîyan jî pirtir in. Û nimûneyên wisa gelek hene û ew tiştekî ecêb nîne. Em bi hev ra çûne mektebê, me tevayî xwendin sitendîye, xebitîne. Bawer bikin, ku li Moskvayê û ji sînorên Ermenîstanê der jî wisan e. Li Moskvayê, li merkeza kirînfirotanê ya bi navê"Şengal", ku ez serokatî lê dikim, piranîya xebatkaran ermenî û êzdî ne. Em ne bi zanebûn vê yekê dikin, ew xweber wisa dibe.

Heykelê bona bîranîna şehîdên Gelkujîya ermenîyan wê bibe parek ji komplêksa me ya heykelan. Ewê hilbet, pêşkêşî 100 salîya Gelkujîya Mezin be. Bi ermenîyan ra tevayî bi sedan hezaran êzdî jî ketine ber devê şûrê tirkên zulmkar. Di vî alî da em cimetên xwedî bextekê-qederekê ne, di salên dijwar da em herdem jî pişta hev sekinîne. Nimûneyeke eyan heye, dema malbeta serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê û welatîyên me di malên xwe da 6 000 ermenî sitar kirine, ji destê tirkan xilaz kirine, paşê jî me xemxurî dîhar kirîye, ku ne alman biryara qedera wan bidin, lê îngilîs bidin, bona alman wana teslîmî tirkan nekin. Ev îzbatî hatîye çapkirinê, lê nimûneyên wisa gelek in û ew ji nislekê derbazî nisla din bûne, gava xwe ji tirkan parastine, alî hev kirine, mil dane milên hev. Bavê min – Çolo, derheqa wê dostanîyê da gilî dikir, ku navbera malbeta wan û ermenîyan da li welêt hebû, li herêma Surmelîyê, gundê Kullik da.

Bê şik, windabûnên miletê bira di sala 1915an da gelek zêdetir bûn. Ango, kevirê bîranînê, ku me danîye, berî gişkî bona bîranîna şehîdên ermenî ye. Bi sedan hezaran êzdî jî ketine ber devê şûrê tirkên barbar. Tirkan miletên din jî qir kir, wek huruman, asorîyan. Ev heykelê em datînin, wisa jî bona bîranîna wan e. Bi gotineke din, ew heykel wê qirê gunehkar dike, bona careke din jî derheqa wê qetilê da bike bîra cihanê, ku tirkan di hindava ermenîyan û miletên mayîn da mîyaser kirin. Bi kurtî, îro ber derê ziyareta me komplêksa heykelan heye, ku di wan da hesînên herdu miletan xuya dibe him di demên şahîyê da, him jî di rojên oxirmên giran da. Em bawer in, ku her kesê, ku mecal bikevê seredana ziyaretê bike, gelek tiştên fikirandinê wê serê wî ra derbaz bin. Di nav

demeke kurt da li rex komplêksa heykelan wê warekî hêsabûnê hebe bi rûnişţekan va, bi şadirwanên avê va, bi erdekî bi şînkayê va dewlemend.

Li der û dorê ziyaretê wê gul û şînahîyê va bê xemilandin. Kesên ku qesta warê ruhanî dikin, gerekê bikaribin hinekî hêsa bin, rehetîya xwe bibînin.

Bernameyên min yên din jî hene:

Sala 2014an bona me êzdîyan sala sersalîyan e. Sersalîyên du mezinên miletê me temam dibe: 140 salîya Ûsiv beg û 145 salîya Cangîr axa. Em borcdar in jîyana du merivên me yên bi nav û deng ji her kesî ra eyan bikin, lê ez dixwezim destnîşan bikim, ku di vî karî da berê jî hinek gav hatine avîtinê (derheqa vê yekê da emê paşê xeberdin). Lê nasandina wan û kivşkirina sersalîyên wan gerekê herdem bibe, çimkî di demên buhurî da ew zêde hatibûne jibîrkirinê, ne ku bîranînê.

Her kes zane, ku di salên Sovyetê da merivên mêrxasên milet nikaribûn heta navên wan jî bianîna ser zaran, lê gelek bîranîn û tiberk winda bûn. Vegera wan bi cûrê heykelên kevirî li rex ziyareta êzdîyan, bi bawerîya min, wê qewmandineke berbiçav be bona me hemûyan, çimkî bi wê yekê va emê qedirê wan bigirin û emekê wan qîmet bikin.

Warên ha bi mezinên milet va diha zêde dibine warên ziyaretî yên ber dilê me ezîz. Kesên, ku îro seredana ziyaretê dikin û dibînin, ku ewqas heykelên bîranînê hene, ji ber xwe va pirs dikin: "Gelo paşê wê çi bibe?".

Wê heykelên gelek ewledên ermenîyan yên hêja, ku dostên miletê me ne, li ziyaretgehê hebin.

Pey vê xeberdana xwe ra ez dixwezim bawerî-xîyalên xwe raberî we bikim, ku min bi nav kirîye "Çar mezinên dostanîyê: Ûsiv beg-Komîtas, Cangîr axa-Zoravar Andranîk".

Van demên axirîyê wisa qewimî, ku çend kitêb ketine destê min, ku derheqa ewledên miletê me yên layîq û dostên wan yên ermenî da nin. Bi vê yekê ra girêdayî ez dixwezim navê rojnamevanê bê

wext ji nav me barkirî Manûk Mûradyan bîr bînim, yê ku bi zimanên ermenî û rûsî kitêbên derheqa Ûsiv begê da amade kirin bona çapê.

Çend gotarên cuda-cuda jî gelek hewaskar bûn, ku bi vê yekê va girêdayî dostên min dane min. Xwesma kitêba "Di nav bîranînên tevgelên şerê gulana sala 1918an da" hewaskar bû, ku ji alîyê mûzêya Ermenîstanê ya êtnografîyê û dîroka têkoşîna miletîyê da hatîye weşandinê.

Dostekî min yê herî baş, doktorê zimanzanîyê, profêsor Sêrgo Yêrîtsyan jî derheqa gelek îzbatîyan û qewmandinan da got. Koma efrandarîyê ya bi navê "Karsik", ku ew serokatî lê dike (bi xebatkarên xwe Hraçya Papîkyan, Karînê Tîtanyan, Samvêl Galstyan) xebatên mezin kirine bona peydakirina nimûneyên dostanîya ermenîyan û êzdîyan da. Min fîlmkişandinên wan yên weke 40 sehetê mêze kir, gelek tiştên teze pê hesiyam û ezê hewil bidim di nav xeberdana xwe ya paşê da wan fîlman û lêgerînan bi kar bînim.

Meriv nikare bi tu avtorekî ra qayîl nebe, ku dostanîya gelên ermenî û êzdî ji demên qedîm û buhurî da tê, dema li rex hev dijîtin û tu caran xatirê hev ne ketin, leke li dostanîya di navbera xwe da sazbûyî nexistin. Hela di ser da jî, ew dostanî kirin biratî. Bi hev ra şa bûn û tu caran dijminatîya hev nekirin û di rojên oxirmên giran da li rex hev sekinîn, şerê neyar û dijminên xwe kirin, wek ku ew di dema Gelkujîya ermenîyan da bû. Û ew hemû bû kul û bîranîn, lê herdem herdu gelên me li rex hev bûne, ew dostanî ji nislekê derbazî nisleke din bû, bû biratî û hogirtî. Û ermenî û êzdî li ku jî bûne, ew dostanî berdewam bûye.

Metranê tevaya ermenîyan Gêvorgê 4an, nizanibû çi bike, dema li rex zanîştgeha Gêvorgyan du xort dîtin û herduyan jî ermenî nizanibûn bipeyivîyana. Yek ji wana Ûsivê êzdî bû, ku ermenîyan jê ra Hovsêp digot, yê dinê Soxomon bû, ku di paşdemê da bû mamosta Komîtas. Metranê ruhmezin qirareke bi cesaret derxist. Herdu jî ketine Zanîştgeha Gêvorgyan û di nava demeke kurt da

ne tenê fêrî ermenî bûn, lê di xwendinê da jî pêş ketin. Xênji wê, di navbera herdu xortên ermenî û êzdî da dostanîyake germ saz bû, ku paşdemê bûne ewledên miletên xwe yên hêja. Dû ra Soxomon xwendina xwe li Ewropayê berdewam kir, di nav ulmê sazbendîyê da kûr bû, û xebata xwe ya dîplomîyê sazbendîya miletê hevalê xwe – Ûsiv beg hilbijart. Û sazbendîya miletê dost berev kir, hel kir, şimşat kir, bi notayan nivîsî û bela kir.

Ji wê jî zêdetir, mamosta Komîtas dema ji Ewrupayê vegerîya, pêwendîyên xwe bi miletê ji xwe ra dost û bira ne birrî, gelek caran seredana Ûsiv beg – hevalê xwe yê xwendkarîyê Hovsêp kir, ku wê demê êdî serekeşîrê êla Hesinîyan bû, bi nav û paşnavê Ûsiv beg Têmûryans û qedir û hurmeta wî li Surmelîyê gelek bû. Wênekêşê ermenîyan yê bi nav û deng Panos Têrlêmêzyan qewmandina derheqa rasthatina bi Komîtas ra ji dîrokê ra hîştîye bi nivîsa xwe ya bi navê "Em bi wî ra tevayî çûne gundê êzdîyan – Eslanlûyê, ku salê carekê qewal (sazbendên ruhanî) ji merkeza êzdîyan ya ruhanîyê – Mûsilê dihatin vî gundî bona sitiranên xwe yên kevinare bistirên û bi wê yekê va wana eşîra xwe bi merkezê va didane girêdan û ji bo wan pêşkêş berev dikirin".

Serekeşîrê êzdîyan, ku li zanîştgehê hîn bûbû, bi Komîtas ra bûbû heval. Ûsiv beg bi dilgermî û hizkirin wana qebûl dike. Bi hev ra li gundan digerin. Komîtasê mezin bi dengbêj û sitiranên êzdîyan va heyr û hijmekar dimîne, di deftera xwe da careke din tiştên dîtî dinivîse, not dike, lê Panos Têrlêmêzyan li warekî herêma Surmelîyê yê herî bedew, ber kanîyê wêneyê Komîtas û Ûsiv beg dikişîne. Wênekêş bi xwe di nivîseke xwe da destnîşan dike, ku ew wêne li temaşegeha Konstantînopolê têne firotan. Heyf, ku me ew wêne êdî ne dîtîye. Ew bona êzdîyan û ermenîyan mînanî tiberkê ye. Dibe rojek ji rojan ew wêne ji cîkî derkeve?

Gelek îzbatî û dîtindar dibêjin, ku Komîtas kême-kêm 4-5 caran seredana Surmelîyê kirîye, li gundê Ûsiv begê hevalê wî yê xwendkarîyê Eslanlûyê bûye mêvanê wî. Û her caran bona Ûsiv beg eyd bû gava rastî hevalê xwe yê zanîştgehê dihat. Temamîya

gund radibû ser pîyan, ahil û cahil ne tenê bona pêşwazîya wî bikin şa dibûn, lê wisa jî bona wê germayê texmîn bikin, ku Komîtas di hindava êzdîyan da dîhar dikir. Em binihêrin ka nivîskarê êzdî Eskerê Boyîk di serpêhatîyeke xwe ya bi navê "Padşayê sitiranan li çiya" derheqa seredaneke Komîtas da çi dibêje:

"Bona mêvanên beg gelek hazirî hatibû dîtin, mecal hatibûne pêkanîn. Bi fermana wî goma gund ya here mezin paqij kiribûn, ku li wir wek edet dewatên gund dikirin. Di orta gomê da kursî danîbûn, hemû dengbêj û zarbêjên bi nav û deng teglîf kiribûn. Bona mêvan lezeteke baş bibînin, bi fermana beg dewat bê sazbendîyê derbaz dibû, bona Komîstasê heyra sitiranan bi dengê dengbêjan va zêde biheyîre û şa bibe".

"Komîtasê heyrî mayî bi xwe jî texmîn ne kir çawa ji cîyê xwe rabû, pêşa kincên xwe yên mamostatîyê da hev, destê xortê dengbêj girt û pê ra sitira...".

Dengê Komîtas yê mîna zengilan ew warê dewatê hilgirt. Kesê pê ra distira, bê hemdî xwe dengê xwe birrî: ji dengê Komîtas yê xweş şerm kir. Gundî di cîyê xwe da bûbûn risas, wana guh dida Komîtas û dengbêja gund, ku keçeke kezî bû, û bi wî ra distira, sitiran lê vedigerand.

Ûsiv beg hertim razîbûna xwe dida Komîtas bona ewî her tişt dikir bona pêşketina sazbendîya me ya miletîyê. Komîtas jî bersîv dida, ku ew sazbendî gelekî nêzîkî dilê wî ye. Ew derheqa sazbendîya miletê dost da ser fikireke gelekî bilind bû û destnîşan dikir, ku tebîyetê tesîreke gelekî mezin lê kirîye, lê naveroka sitiranan jî ji cûrê jîyîna milet e.

Ûsiv beg zanibû dostanîyê bi ermenîyan ra bike û dostanîya bi Komîtas ra îzbateke wê yekê bû. Gelo Ûsiv beg kê bû, bi çi rê ra derbaz bûbû û gihîştibû kêderê? Berî her tiştî ew ewledê miletê xwe yê hêja bû û wî ji pêşîyên xwe hîn bûbû, ku miletê wî, ku ew bi xwe jî serekeşîrê pareke wî miletî – êla Hesinîyan bû, di wê rê da dikare tenê bi ermenîyan ra here, bi wan ra dijwarî û zehmetîyên

demê parva bikin û wisa jî serketin û şabûnên xwe jî. Ew, ku serekeşîrê êla xwe yê 26an bû, ne tenê ew pêwendî parastin, ku ji alîyê pêşîyên wî da bi ermenîyên cînar ra hatibû sazkirinê, lê wisa jî ew pêşda bir û gîhande ser dereceyeke bilindtir. Yek ji sebaban ew e, ku ew di zarotîyê da, bi malbeta xwe va xwe nêzîkî gelê ermenîyan kiribû, ji navçeya xwe Surmelîyê, ewledên wê yên baş hiz dikir.

Bijartina cîyê xwendinê ya li zanîştgeha Gêvorgyan ya li rex Dêra ermenîyan ya mezin li Êcmîadzînê ne ji ber xwe va bû. Ew li malbetekê mezin bûbû, ku her ro danûsitendinên wê bi ermenîyan ra hebûn û mêla ber bi xwendinê derbazî malbeta Têmûryansan bûbû.

Kalikê wî – Tîmûr axa, û bavê wî Hesen axa, herdem di nav wan qewmandinan da bûn, ku li herêmê diqewimî, ew li rex ermenîyan û rûsan bûn. Gelek mêvanên qedirbilind ji Surmelîyê, Îdirê dibûne mêvanên vê malbetê, wek nimûne, Xaçatûr Abovyan, ku dû pêwendîyên bi wan ra kitêbeke hewaskar nivîsî, bi sernavê "Êzdî". Di wê berhemê da Abovyan dinivîse: *"Ewana ji miletên cînar bi tu kesî ra ewqas nêzîk nînin, çiqas ku bi ermenîyan ra û ji wan ra dibêjin bira".*

Em destnîşan bikin, ku dijwar e bêjin, ka dostanîya me çend sedsal e dikişîne. Dibe ji wê rojê be, dema ermenî û êzdî rastî hevdu hatin û bûne cînarên hev. Eger wisa nîbûya, ermenî û êzdîyên, ku li cî û warên Ermenîstana Roava yên cuda-cuda da dijîtin, wê ew cînartîya xwe ya qenc di rojên oxirmên giran da diha mehkem nekirana. Û ji wana yek jî binemala Hesinîyan û serekeşîrên wan bûn, xwesma Ûsiv beg.

Li vira ez dixwezim bi dilekî şa bêjim, ku van axirîyan ji min û hevalên min ra, ku em xwe nebîyên Ûsiv begê û Cangîr axa dihesibînin, li hev hat em herine Ermenîstana Roava, warên jidayîkbûyîna ewledên miletê me yên hêja. Dema me xwe li riya gundê jidayîkbûna Ûsiv beg – Eslanlûyê girtibû, min Komîtas û giregirên gelên herdu miletên me bi bîr anî, ku li vî gundî bûbûn

mêvan. Navê Eslanlûyê li her deran bela bûbû. Ew rastîyê jî ber dilê her êzdîyekî navekî ezîz bû, çimkî bi navê Ûsiv beg û malbeta wî va girêdayî bû. Em ji riya, ku ber bi Îdirê dibe dadigerin û berê xwe didin ber bi çîyê.

Em bi hemdî xwe ber bi wê rê ra diçin, ku dibe çîyê. Li berpala çîyê gundên mezin û biçûk xuya dikin, ku berê têda ermenî û êzdî diman, lê îro kurd tê da dimînin.

Em zanin, ku Eslanlû li vê deverê gundê herî kutasîyê ye, ango hela gelek rê heye. Em bi sebir in û hewil didin wan gundan bijimêrin, ku em jê derbaz dibin. Û axirîyê gundekî bedew li me xuya dibe, ku li berpala çîyê ye. Tiştekî zehmet nîne meriv di nav gund da bi pirs-pirsyaran bizanibe ka mala Ûsiv begê kîjan bûye, çimkî arkêolog Aşxarhbek Lorîs Kalantar ji berê da çend wêne girtibûn, dabûne me, ku em riya xwe şaş nekin. Di nav 100 salan da li vir kêm tişt guhêrîye. Me mala Ûsiv begê bi hêsanî dît. Xwedî-xudanên vê malê yên niha kurd in, wana bi dil em qebûl kirin, teglîfî malê kirin.

- Hûn bi xêr hatine mala xwe,- ewana dibêjin,- em zanin, ku li vir merivekî navdar jîye, navê wî Ûsiv beg bûye. Carina em wisa texmîn dikin, ku ew ji vira neçûye. Ruhê wî bal me maye, ew alî me jî dike.

Dû ra hemû ber bi pêlekanan tên – nizanim bona wêneyekî bigirin yan bona bi hevdu ra sohbet bikin. Lê fotokêş, opêrator wê firsendê bi kar tînin û çend wêneyên balkêş digrin, ev qewmandin dikin dîrok bona paşerojê, lê xweyê dengê xweş Miraz Siloyan, ku birazîyê min e, hahanga dest bi sitirana derheqa Ûsiv beg da dike.

Kilam pesinê Ûsiv begê dide. Lê hûn zanin ka ew çawa hewas tê gotin û diçe digihîje çiya û banîyên nêzîk, ku bê şik li wir rêça lingên Ûsiv begê û neferên malbetên eşîreta wî, ruhê wan li wir hene. Miraz di sitiranê da dîroka bedewîya van waran û mêrxasîya Ûsiv begê dihûne, ku li vir jîye. Miqamê sitiranê dilê merivan diso. Meriv dibêje qey ji van çiyayên nêzîk Ûsiv beg wê li hespê boz siyar bê û bêje: "Me zû da hevdu ne dîtibû. Hûn bi xêr hatine". Ewî

wisa digot, dema dihatin gundê Eslanlûyê mêvanîya wî.

Eslanlû gundekî biçûk e, tê da sed mal hene, dibe hinekî zêde jî, mal kevin û teze ne, li rex wan qelax hene, ku hinkûfî her gundekî wisan e. Mala kalikê Ûsiv beg li rexê gund e.

Arkêolog û êtnograf Aşxarhbek Lorîs-Kalantar jî dîdemeke ha ber me vedike, ku sala 1912an hatibû vira bona li ser jîyan û deba êzdîyan lêkolînan bike û di wî karî da Ûsiv beg alî wî kiribû. Xwedîyên malê digotin, ku wana ji dema buhurî heta îro guhartinên mezin ne kirine, tenê ew dîwarên, ku ji xwelîyê bûne, dewsa wan kevir lê kirine. Meriv texmîn dike, ku cûrê jîyanê û deba milet jî zêde ne guhêrîye. Zaro û bûkên teze ji malê ne gelekî dûr bala xwe didin ka ber derê mala wan çi diqewime, ew kê ne, ku hatine mala wan, ji kîderê ne, çi pirsan dikin, derheqa kê da dipirsin. Lê mêvanên hatî jî hewil didin vî warî, van merivan rind fem bikin. Gişk di nav mitaleyan da ne. Hilbet, ev hemû bona nebîçirkê Ûsiv begê – Kerem Ûsûbyan gelekî balkêş û hewaskar in.

Ew dibêje, ku xeyala wî ya sereke pêk hat. Ew ji navê temamîya eşîreta xwe hatîye vira. Ewî texmîn ne dikir, ku rojek ji rojan wê bê van deran.

Sohbeta me bi xwedîyên malê yên nû ra her diçe xweş û geş dibe. Merivên dilgerm û dilovan in, hîmlî bi heywanxwedîkirinê va mijûl dibin, weke 400-450 pezî xwedî dikin. Dixwezin pezekê ji me ra serjê bikin, ji me ra hurmet bikin. Em dibêjin na, çimkî wextê me hindik e.

Hela du karên me yên din jî hene. Ya pêşin, em gerekê ji goristana gund ya kevin xwelîyê hildin, bona paşê bikine nava hîmê wî heykelî, ku wê bê çêkirinê, yek jî em gerekê ji kanîya Ûsiv begê avê hildin. Em çiqasî jî lez in, Şêx Zadeyê ruhanî bi hemdî xwe, bêy ku lez bikeve, bi dengê bilind dua dike. Ava kanîya Ûsiv beg ji çiyê dizê, ne zêde gurr e, lê şûşeyên me zû têne dagirtin, ku em gerekê wana bînin, bigihînine Ermenîstanê. Paşê Şêx Zade bêy lez bikeve, bi me ra berê xwe dide çiya himber, ku goristana gund ya kevin û teze li wir e. Şikir ji Xwedê ra, goristan xirab nebûne,

tu kesî di nava sed salan da dest ne dayê. Li ser kevirên mezelan nivîs tunene, lê rêberên me goristana kevin nîşanî me didin. Û bi pêşnîyara şêx em ji mezelekê xwelî hildidin. Dibe mezelê bavê Ûsiv begê be, an jî yê kalikê wî? Meriv nikare bêje. Lê gundî bi bawerî dibêjin, ku ew mezelên giregirên gund in. Di rastîyê da, ew ne zêde ferz e. Ya ferz ew e, ku ew xwelîya Eslanlûyê ye, ku warê hizkirî yê Ûsiv beg û temamîya malbeta wî ye, warê jidayîkbûna wan e, ku wextekê hêvî û bawerîya hemû binecîyên êzdî yên navçeya me bû. Û dibe pêşîyên Ûsiv beg ewqas bilind bûne, xwe dane çiyan bona xwe biparêzin, û eger çare tunebe jî, bikaribin bi her awahî ber xwe bidin. Fikirên me ewqas tevlihev in, ku em nizanin ka ewê me di ku da bibin. Lê em tiştekî jî zanin, ku wextê me pir kêm e.

Em gerekê pê ra bigihînin herina warê jidayîkbûna Cangîr axa jî. Xên ji wê, daxwezeke min jî heye, ku herime gundê kal û bavê xwe.

Rêyeke dirêj ber me ye, lê vê carê emê pêberjêr herin. Di serê me da hezar û yek fikir hene. Em ji alîkî va gelek şa bûn, ku mala bav û kalên yek ji serekên miletê me, mezelên pêşîyên me hatine parastin, ji alîkî dinê va jî em xemgîn in, ku ew çiya û banîyên kaw û kubar êdî ne yên me ne. Eva êdî 100 sal in ne yên me ne. Em çi jî bêjin, kesên xerîb li vir in. Berê, gava derheqa vê yekê da ermenîyên mihacir û kal û bavên me xeber didan, dibe me kul û derdê wan tam fem ne dikir, berê wan herdem li wî berî Erez bû. Lê pey vê seredanê ra ev hemû ne tenê zelal û ferih tê femkirinê, lê hela di ser da jî, ev xwelî me zêde ber bi xwe dikişîne. Em jî gerekê bikaribin xwe nêzîkî wê axê bikin, bikin axa xwe. Û bona wê yekê gerekê hidûd bêne vekirin, bona zû-zû herin-bên. Tirk û kurd jî dixwezin bêne Ermenîstanê. Bona wana hewaskar e, ka ji wî berê sînorên wan welatekî çawa heye. Li Bazîdê em rastî malekê hatin. Mêrik kurd bû, jina wî Mîhrîcana keça Zakarê ermenî bû, ku hatibû misilmankirin, ewê navê keçên xwe danîbû Dêdanûş û Hayanûş. We bidîta ew bi çi çavên hisretî va li me – kesên ji Ermenîstanê hatî dinihêrî, ewê pirs-pirsyar ji me dikir, digot, ku wê

bavê wê gelek şa be, eger em herin mêvanîya wî. Heyf, ku wextê me tunebû û em ne çûne mêvanîya bavê wê û em bona wê yekê ber xwe ketin.

Em li Mûşê jî rastî hinekan hatin. Ewana jî ji nisla ermenîyan bûn û dixwestin derheqa Ermenîstanê da zêde malûmatîyên wan hebin. Wana jî dixwest bêne Ermenîstanê, bi welatîyên xwe ra bidin û bistînin.

Emê paşê derheqa rêwîtîya xwe, derheqa rasthatinên xwe yên hewaskar da dûr û dirêj ji we ra şirove bikin, lê niha em vegerine ser Ûsiv beg û bicêribînin malbeta wî raberî we bikin.

Ya here sereke çi ye? Gava me behsa Ûsiv beg an jî Cangîr axa dikir, sohbetvanên me navê serekeşîrên berî wan bîr dianîn, wek nimûne navên Hesen axa an jî Xetîf axa. Ew dide kivşê, ku ew eşîretên êzdîyan, ku hatine wan waran, bi kar û xebatên xwe va rêçeke baş û navekî qenc hîştine. Hela di ser da jî, zêdeyî qurneyek derbaz bûye, lê tu kes mêrxasî, mêranîya wan ji bîr ne kirîye. Wan çaxan wisa bû, bi sebebên cuda-cuda di navbera eşîretan da şer û pevçûn dibûn, û di van şertan da wana gerekê bikaribûya bi awayekî xurt pişta eşîreta xwe bigirtana. Ji bo wê yekê, ewana gerekê eskerên baş, şervanên bêqisûr û serekqumandarên cêribandî bûna.

Helbestvanê rûsan yê mezin Alêksandr Pûşkîn derheqa Hesinîyan da malûmatîyên balkêş çap kirîye.

Di dema şerê Rûsîyayê-Tirkîyê yê salên 1928-19an da helbestvan di mehên hezîran-tîrmehê yên sala 1929an da diçe enîya şêr, derheqa siyarîyên mêrxas da dibihê, bala wî dikişîne, ka ew kê ne, ku li her deran di cêrgên pêşin da nin. Ewana bê tirs û xof in, bi xurtî û mêranî ber xwe didin. Alêksandr Pûşkîn di konê Rayêvskî da rastî Hesen axa tê, hîvî jê dike derheqa dînê êzdîyan da jê ra malûmatîyan bide. Alêksandr Pûşkîn dixwest bizanibûya ka Hesen axa çi milet e, esilê wî, dînê wî, erf-edetên miletîyê çawan in. Piştî xeberdana bi Hesen axa ra û şirovekirinên wî ra ew ha dinivîse: "Ez ji van şirovekirinan rehet bûm. Ez bona êzdîyan gelekî

şa bûm, ku ewana bawerîya xwe bi şeytan naynin, û nezelalîyên di hindava wan da têne gotinê, bona min ne tiştekî ferz bûn".

Em bikine bîra we, ku Hesen axayê mezin kalikê bavê Ûsiv beg bû – serekeşîrê êla wan yê 23an. Femdarî ye, ku êzdî nikaribûn dervayî wî şerî bimana û ew şervanên navdar bûn û navbera wan û rûsan jî êdî xweş bûbû. Rastîyê jî êzdî amin in, dikarin heta xilazîyê şer bikin. Û ew yek jî tiştekî text-bext nîne, ku di dema şerê rûsan-tirkan yê di salên 1877-78an da bavê Ûsiv – Hesen axayê biçûk, ku serekeşîrê êzdîyên êla Hesinîyan yê 25an bû, pêwendîyên xurt saz dike bi qumandarên ermenî – gênêral-lêytênant Arşak Têr-Xûkasov, gênêral-lêytênant Hovhannês Lazarêv û gênêral Mîxayîl Lorîs-Mêlîkov ra. Bi serokatîya van qumandaran di meha çirîya pêşin ya sala 1877an da taxbûra rûsan ya li Rewanê tevî wî şerî dibe, ku berbi Êrzurumê geş bûbû û di wê taxbûrê da siyarîyên Hesen axayê biçûk jî hebûn.

Ewana li vira jî di xeta pêşin da bûn, gava rewşeke dijwar hatibû sazkirinê. Salnivîsarzan dibêjin, ku êzdîyan tenê bona serketinê şer dikirin, û ew yek ji wan ra li hev dihat. Tirkan herdem jî ji wan siyarîyan saw dikişand, gelek windayî didan û paşda vedikişîyan. Bona mêrxasîyê serekeşîrê êzdîyan bi ordên-mêdalyaya Rûsîya Qeyserîyê va tê xelatkirin. Bona wê yekê jî wan salan qîmetekî mezin dane Hesen axayê biçûk. Dilrehmîya wî yek ji xeysetên wî yê herî baş bû, lema jî gelekan qedirê wî digirt. Metran Mkrtîç Zakaryan sala 1914an di kovara "Ararat" da dinivîse: *"Ew him li herêma Yêrêvanê, him jî li cî û warên dûr bi xeysetê xwe yê paqij va deng dabû".*

Serekeşîr tê maneya serkarê milet. Êzdîzan Soxomon Yêxîazaryan bi vê yekê ra girêdayî dinivîse: *"Serekeşîr ji malbetên berê yên torinan in, eşîrên wisa hene, ku çend sedsalan serkarî li qebîlên eşîra xwe dikin. Ji malbetên kevinare malbeta bavê Hesen axa – Temir axa di cîyê pêşin da ne".*

Soxomon Yêxîazaryan gotinên êzdîyan yên silavkirinê bona serekeşîrê xwe tîne: "Tu serkar û serê me yî, lê em xulam û

xizmetkarên te ne, tu hêvîya me yî, lê hêvîya te Xwedê ye, em xwe teslîmî te dikin û te teslîmî Xwedê dikin".

Ûsiv beg edetê eşîreta xwe berdewam kir û pêwendîyên bi ermenîyan û rûsan ra, ku hebûn, gîhande ser dereceya here bilind. Dema ew sala 1896an bû serekeşîr, serhevdu 27 salî bû, lê ne tenê zimanê dê zanibû, wisa jî ermenî û rûsî zanibû, merivekî pêşketî, zane, xwendî bû. Ewî di wî temenî da pêra gîhandibû pevgirêdanên dostanîyê bi merivên ermenî yên here bi nav û deng û karmendên naskirî ra saz bike. Bavê wî – Hesen axa, kurê xweyî Yûsif hazir dikir bona cîyê xwe, lê nizanibû, ku mirina bêwext wê wî ji nav miletê wî bibe, û kurê wî wê di salên emirê xwe yê ne mezin da karê serekeşîrîyê bike. Hesen axa bû şehîdê xayîntîyê. Ew gerekê bi tirênê biçûya Tîflîsê, ji wir jî Sankt Pêtêrbûrgê, bona rastî padşê Rûsîyayê bê û hêjayî qebûlkirina hurmetlî bibûya. Lê di destpêka rê da, li hêwirgeha stasyona Ûlûxanlûyê (Masîs) merivên qelp texmîn kiribûn, ku ewê bibe merivekî naskirî, bi qahweyê ew jerdadayî kirin. Dema ew pê hesîya, ku ew hatîye jehrdadayîkirinê û heta mirina wî wextekî kin maye, ji rêvebirên xwe hîvî dike wî bi lez vegerînine gundê wî – Eslanlûyê. Dema gihîşte mal, ruhê xwe da. Temamîya herêmê di nav şînê da bû. Ev yek windabûneke mezin bû. Lê qewmandinên wê demê li benda tu tiştekî ne disekinîn. Lazimaya hilbijartina serekeşîrekî teze hebû. Ûsivê cahil gerekê şuxulê bavê xwe pêşda bibira. Serekeşîrê genc dest bi karê xwe kir û berî her tiştî fem kir, ku xwendin û pêşketin bona miletê wî tiştên gelekî kêrhatî ne.

Ewî di vî karî da şuxulekî mezin kir û gihîşte wê yekê, ku rûs razî bûn dibistanan vekin, ferq ne dikir, ku xwendina li wir wê bi rûsî bûya. Ya ferz destpêkirin bû, bona bikaribin zarokên êzdîyan fêrî xwendinê bikin. Bi înîsîatîva Ûsiv begê di salên 1900-1904an da bi pereyên hukumeta Rûsîyayê li gundên Bacalûyê li Qersê, Qundexsazê li Aparanê (niha navê gund Rya teze ye) û Zorê li Surmelîyê dibistan hatine vekirinê.

Ûsiv beg derc dikir, ku kilîta pêşketina milet berî her tiştî

xwendin e. Lema jî dema kurê serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê Mîr Îsmayîl sala 1909an hate Ermenîstanê û rastî Metranê hemû ermenîyên dinyayê hat, li ser pirsên xwendina êzdîyan jî sekinîn û biryar hate girtin zarên êzdîyan bidine ber xwendinê. Metran bi biryareke xwe va Ûsiv beg îlan dike wek serekê hemû êzdîyên Kavkazê. Gorî rojnameya"Taraz" dema Mîr Îsmayîl rastî Katoxîkosê hemû ermenîyan Gêvorg Sûrênyan tê, wa dibêje:

- Cenabê cîgirê metranê hemû ermenîyan Gêvorg Sûrênyan, ez dixwezim, ku her êzdîyekî ku tê bal te, wî wek ermenî qebûl bikî û firqîyê daneynî ka ew ermenî ye, an êzdî ye. Ez dixwezim temîyekê li êzdîyan bikim, ku herdem qulixî dêra ermenîyan bikin, wê wek mala xwe, wek mala Xwedê bibînin. Ez ji Xwedê rica dikim, ku ew mal qewîn û qedîm be, him bona ermenîyan, him jî bona êzdîyan. Û ez Ûsiv beg Têmûryans îlan dikim çawa serekê êzdîyan û wekîlê min.

Çimkî gilî hate ser Mîr Îsmayîl, em bêjin, ku ew ne carekê hatîye Ermenîstanê. Mesele, sala 1912an careke din jî tê Ermenîstanê, li gundê Ûsiv begê – Eslanlûyê dibe mêvanê wî. Wê demê Ûsiv beg êdî hatibû testîqkirinê wek serekê êzdîyên Kavkazê, û femdarî ye, ku xeberdana wan wê li ser pirs û pirsgirêkên êzdîyan bûya. Mîr Îsmayîl, ku 4-5 salan haj pê tunebû ka halê êzdîyên Ermenîstanê û Ûsiv begê çi ye, sala 1919an dêlêgasyoneke ji ruhanîyan dişîne Ermenîstanê, nameyekê dide wan, ku tê da malûmatîyên hûrgilî hebûn derheqa pêwendîyên ermenîyan û êzdîyan da. Ev belge 14ê çirîya pêşin sala 1919an hatîye nivîsar.

Li vir wisa jî tê gotin, ku malbetên êzdîyan 6000 ermenîyên ji dest zulma tirkan xilazbûyî sitar kirine, tu kesî teslîmî tirkan ne kirine, ew bi nan û av kirine. Derheqa vê yekê da serekê ruhanî yê dînê êzdîyan Mîrê Mîran Tehsîn Beg jî digot, dema berî du salan hatibû Ermenîstanê û bi hazirîya wî dua li ziyareta êzdîyan ya Aknalîçê hate kirinê.

Bi rastî jî, qewmandineke nebîrkirinê bû. Serekê me yê ruhanî jî hat, dît, ku welatîyên wî edil û rehet dijîn, bi ermenîyan ra dost û bira

ne, û ev yek pêşîyên wî herdem jî xwestine. Serekê me yê dînî got, ku tiştên wî dît, ji xeyalên wî derbaztir bûn, û bona wê yekê pir şa ye.

Hilbet, me bi wî ra tevayî mezinên êzdîyên Ermenîstanê bi bîr anîn, wan merivan, ku keda wan pir e him di karê mehkemkirina dostanîya bi ermeîyan ra, him jî di karê parastin û bilindkirina xwexwetîya me ya miletîyê da. Û îro navên wan geş têne bîranînê û em bona wê yekê firnax dibin. Kar û emelê mezinên êzdîyan bona me nimûne ye û hema ew yek e, ku me mecbûr dike em ji nêzîk va wana nas bikin.

Em vegerine ser bîranînên Mîr Îsmayîl.

Di bîranînan da salnivîsarî û qewmandinên dijî Tirkîyê yên 4-5 salên dawî, ango di salên 1914-1918-19an da hatine hilgirtin, ku derheqa wan da dixweze gelê ermenî yê bira û êzdîyên Ermenîstanê jî bide hesandin. Em mêze bikin ka derheqa vê yekê da Sîmon Vrasyan çi dinivîse: *"Di bîranînan da bi zimanê ermenî yê sade derheqa wan tevlihevîyan da tê gotinê, ku di dema şer da tirkan di hindava ermenîyan û êzdîyan da pêk anîne"*. Li parlamêntoyê, di dema qebûlkirina fermî da, pey xeberdana silavkirinê ya serekê parlamêntoyê Avêtîk Sahakyan ra Yûsif axa boxçeya bîranînan ji destê qasidê xwe hilda, paç kir, da serekê parlamêntoyê. Nayê bîra min ka kê ew bîranîn wisa bi hemdî xwe û bi dilovanî xwend. Êzdî bi guhdarîyeke taybet guhdarîya bîranînên zêrîn yên serekê xwe yê ruhanî kirin.

Dirêjaya wê belgeya Îsmayîl Beg ya bi sernavê "Ji bo miletê min û ewledên wî", ku qîmetê wê yê dîrokî heye, 5 mêtr û 5 santîm e, beraya wê 27 santîm e, boxçeyekî bi rûpelên kaxezan yên li hev pêçayî bû. Ew li Matênadarana Rewanê da tê parastin. Ev nivîs bona serekê êzdîyên Kavkazê Hesen axa zade Yûsuf beg hatibûn nivîsar (li hinek cîyan ji bo hinek kesên din in jî). Heyf, ku li hinek cîyan destnivîsar nayêne xwendinê. Ew berî her tiştî îzbatîyek e, ka tirkan çawa li Ermenîstana Rojava gelkujî pêk anîne. Çend serekên ruhanî yên êzdîyan û çend serekeşîr ew nivîs qol kirine û mohr kirine.

Gelek kes dibêjin, ku dêlêgasyona êzdîyên ruhanî li parlamêntoya Ermenîstanê û li hukumeta Ermenîstanê bi dilgermî ha-

tine qebûlkirin. Zêrkerên Wanê yên destemel medalyake bedew û xusûsî çê dikirin û hazir dibûn ji navê hukumetê wê dîyarî serekê dêlêgasyonê bikin, lê her endamekî dêlêgasyonê ra wê qirmeyeke maûzer û pêşkêşên din bidanê.

Ûsiv beg gelek şa û razî bû, ku nûnerên ji merkeza ruhanî ya milet hatî hêjayî hurmeteke ha dibûn. Lê ya giring ew belge bû, ku tê da gelek îzbatî hebûn derheqa wê yekê da, ku tirkan çawa xûna ermenîyan û êzdîyan rêtîye, ku ev herdu milet çawa bi mêranî himberî dijmin kirine şer, derheqa biratîya herdu miletan da, ku wê biratîyê emirê bi hezaran kesan xilaz kir, çimkî ermenî û êzdî di wan salan da pişta hev sekinîbûn. Êzdîyan ermenîyên bê cî û sitar heta birine li ziyareta xwe, li qubeya Şêx Adî da jî bi cî kirine.

Mîr Îsmayîl di wê boxçeya nivîsan da hestên xwe ha tîne ser zaran: "200 ermenî an jî xaçparêz, kesên ji destê eskeran (yên Osmanîyê) revîbûn, ji hukumeta Osmanîyê hatine parastin, wana bi nan û av kirin û xwedî li wan derketin".

Di destpêka sedsala buhurî da nav û hurmeta Ûsiv beg her diçû zêdetir dibû. Di sala 1909an da ji 30 gundên Sînekê zêdetir di bin serokatîya wî da bûn, bi axa xwe, bi çêre û milkên xwe va. Hurmeta Ûsiv beg usa jî li devera Surmelîyê û merkeza wê – bajarê Îdirê jî hebû. Wek edet, ewî zivistanan li warê jidayîkbûna xwe – gundê Eslanlûyê derbaz dikir, li wir mêvanên qedirbilind qebûl dikir. Û ne tenê li zivistanan. Hemû lêkolîner, arxêolog, dîrokzan dema li herêmê diqesidîn, ji alîyê wî da hêjayî mêvanperwerîya ser dereceya bilind dibûn. Ew yek wextê seredana Aşxarhbêk Lorîs-Kalantar jî qewimî. Di vî alî da ev bûyer balkêş e.

Sed heyf, ku wêneyên Cangîr axa û Ûsiv beg zêde tunene, ew nehatine parastinê. Piranîya wan wêneyên kevinare ne, ku xeyîrîne, lê dû ra hatine paqijkirin û rengekî teze wergirtine. Van axirîyan 4 wêneyên Ûsiv beg hatine dîtin, ku li fondeke arşîva miletîyê ya Ermenîstanê ya dewletê da hatibûn parastin. Ev wêne xwedî dîroka xwe ne, di wan da xeysertê Ûsiv beg û karkirina wî xuya dibin. Sala 1912an xebatkarê zanyarî yê mûzêyeke Rûsîyayê,

arkêologê naskirî Aşxarhbêk Lorîs-Kalantar şandibûne devera Surmelîyê. Armanca wî ew bû, ku li ser warên kevinare, heykelên dîrokî yên herêma Rewanê û devera Qersê lêkolînan bike, aletên debê yên gelê Pişkavkazê berev bike, wêneyan bigire. Aşxarhbêk Lorîs-Kalantar şagirtê Nîkoxayos Mar bû û tevî karê erdvekolanên Anîyê bûye. Ûsiv beg wî zanyarî bi cî kirîye, mecal saz kirîye bona ew bikaribe bi hêsanî ji warekî here warekî din, pê ra çûye warên kevinare yên Surmelîyê, li mala xwe kirîye mêvan, alet û amanên debê yên ermenîyan û êzdîyan dîyarî wî kirîye. Ûsiv beg ewqas bi dil ew qebûl kirîye û xizmetî wî kirîye, ku dema arkêologê zanyar vegerîyaye Pêtêrbûrgê, dest xwe da derhqa wê yekê da ji serwêrê mûzêyê Gêorgî Mîxaylovîç ra gotîye. Wî jî sipartîye, ku razîbûneke taybet bidine serekê hemû êzdîyên Kavkazê bona wê alîkarîyê.

Lorîs Kalantar di wan deman da wêneyê Ûsiv begê jî girtîye. 4 wêne di arşîva miletîyê da, li fonda Aşxarhbêk Lorîs Kalantar da hatine parastin.

Zanyarê bi nav û deng 19ê sibatê sala 1939an bi qelema sor du wêneyan destnîşan kirîye, ku yek ji wan kesên di wêneyê da Ûsiv beg bûye û bi zimanê rûsî li ser nivîsîye "Ûsiv beg", lê li pişta wêneyekî din, dîsa bi rûsî ha nivîsîye:

"Sala 1912an ji alîyê Akadêmîya Zanyarî û mûzêya Rûsîyayê da ez şandime cem Kurdên êzdî, bona ez li ser deb û ola wana lêkolînan bikim, usa jî bona mûzêyê qinyatên debê berev bikim. Wî çaxî êzdî li devera Surmelîyê diman. Serekê deverê ez ji Îdirê bi rêvebirîya du pişmêran verêyî Baş-Sînekê kir, cem Ûsiv begê, ku ji berê da jê ra hatibû gotin alîkarîya min bike.

Di wêneyê da* ez û Ûsiv beg in. Em ber derê mala wî ne. Di destê min da çeka min e (di nav kaxezên min da destûrnameya şaredarê Tîflîsê heye, ku îzina min heye çeka min hebe), lê li rex Ûsiv beg tivinga pişmêrê min e.

Min usa jî wêneyê koma merivan girtîye, di nav wan da pişmêrên min yên çekdar û Ûsiv beg bi qewm û pismamên xwe va".

19.02.39 A.Kalantar.

Li vir em Ûsiv begê 43 salî dibînin bi wergirtina miletîyê, ku gelek li bejin û bala wî tê. Ew mala, ku me sûretê xwe ber girtîye, ji keviran hatîye çêkirin, xanîyekî bilind e, bi pencereyên mezin va. Ew wêne dide xuyakirin ka serekeşîr çawa jîye: bi awayekî bedew, ku wergirtina wî ne tenê hinkûfî serekê malbeta torinan e, lê usa jî hinkûfî zar û merivên wî ne. Di du wêneyan da Aşxarhbêk Lorîs-Kalantar û Ûsiv beg in, bi çek û sîlihên xwe va.

Ji cî û warên kevinare ewana çûne Zorê jî.

*Wêneyan li dawîyê dikarin mêze bikin. Dêra gund, bi rêvebirên xwe ra li ber derê dêrê pante dane. Di wan wêneyan da xuya dibe, ka ew çi dem e, çi war e û çi merî ne.

Em wê jî bêjin, ku dema em çûne Eslanlûyê û me bê şikberî got ew mala han mala Ûsiv begê ye, di wî karî da wêneyên Aşxarhbêk Lorîs-Kalantar alî me kirin. Rast e, xwedîyên malê digotin, ku gelek tişt ne guhartine, tenê dîwarên ji xwelîyê bi dîwarên bi keviran va guhastine. Tiştên din wek xwe mane. Îro di xanîyê Ûsiv begê da du derîyên bona ketina hundurê xanî hene û li wir du malbetên cuda dijîn. Xwedîyên xanî yên nû karê heywanxwedîkirinê dikin. Herdem jî bi dilovanî xwedîyên malê yên berê yên bi nav û deng bi bîr tînin. Hilbet, ev maleke dîrokî ye û ber dilê her êzdîyekî ezîz e, çimkî ew mal bi ewledekî gelê me yê din va – Cangîr axa va jî girêdayî ye.

Cangîr axa gelek caran dibû mêvanê Ûsiv beg. Zanyar dinivîsin, ku dostanîya Cangîr axa û Andranîk Ozanyan jî hebû, ew bi wî ra tevayî jî dibû mêvanê Ûsiv begê û hema di wan rasthatinan da jî ew dostanîya dilgerm xuliqî. Û ew dostanî sala 1904an destpê bû, di dema rasthatina wan ya pêşin da, li gundê ermenîyan – Hazaranê, ku li herêma Berkrî bû.

Eger derheqa wê rojê da îzbatî jî tunebin, meriv gerekê texmîn bike, ku sohbeta Cangîr axa û Zoravar Andranîk gerekê li ser hevkarîya şerê çekdarî bûya, şerê tevayî yê dijî dijmin bûya. Li wan herêman bi awayekî geş tevgerên dijî ermenîyan, daxwezên tirkan yên bona rojên paşdemê dihatine xuyakirin, û tirkan hewil dida di wî karî da kurdan û êzdîyan wek alet bi kar bînin. Tirkan

hezar û yek soz ser Cangîr axa da dişandin bona bikaribin wî bînin alîyê xwe. Lê Cangîr axa haj ji fend û fêlên tirkan hebû û ser wê bawerîyê bû, ku dostanî û hevkarî tenê bi ermenîyan ra dikaribû hebûya. Ez ser wê bawerîyê me, ku rasthatina li gundê Hazaranê pir giring e. Teze 30 salên Cangîr temam bûbûn, êdî dergîstî bû, nîşankirî bû û wî ber Zoravar Andranîk pêşnîyar kiribû, ku ew bibe serdewetîyê wî. Paşdemê da ew qayîl bû. Gerekê bê gotinê, ku dostanîya du mezinan bû dostanîya ermenîyan û êzdîyan, ku di paşerojê da di rojên oxirmên giran da diha qewîn û mehkem bû û gihîşte rojên me.

Xeysetê Cangîr axa yê milahîm û sade li Zoravar Andranîk gelek xweş dihat. Ewana hema di rasthatina pêşin da qedir û hurmeta hev girtin. Hema ji wê rasthatinê dest bi dostanîya wan ya ji dil bû, ku di şerê mêrxasîyê yê himberî dijmin da xuya bû, bi xwînê hate qewînkirinê, li ser riya mihacirîyê, di dema wêrankirinan da diha mehkem bû. Êzdî jî tevî leşkerên rûsan-ermenîyan di şerê Qersê û Sarîqamîşê da şerekî mêrxasîyê kirin.

Cangîr axa sala 1874an ji diya xwe bûye, li gundê Çîbûxlûyê, devera Berkirîyê, wilayeta Wanê, di mala serekeşîrê êla Mendikîyan Xetîf axa da. Ew hînî emirê nerm û têr-tije ne bû. Di zarotîyê da ew bi zîrekî, mêranî û aqilê xwe va berbiçev diket. Li temamîya herêmê tu kesî wek wî nikaribû hesp bibezanda û gulle bikira.

Li vira ez dixwezim dawî li dîroka jîyana Cangîr axa bînim û behsa rêwîtîya me ya li Ermenîstana Roava bikim.

Armanca me ya din ew bû, ku em herine warê jidayîkbûna Cangîr axa, ku li wilayeta Wanê ye, ji şadirwana Bêrkirîyê ne gelekî dûr.

Em bêjin, ku li vir bajarê ermenîyan – Bêrkirî ye, bi gelek baxçeyên xwe yên rezan va (niha navê bajêr Meredî ye). Wextekê, dema binecî rastî hev dihatin, ji hev ra digotin: -bêrkirî, ango şa be, beşerxweş be. Ka mêze bikin bê çiqas bedewî, şênayî, dar û gul li vir hebûne, ku gotina "roj baş" rengekî din wergirtîye. Ev herêm berê di bin destê Gnûnîyan da bûye, paşê ketîye bin destê ereban,

ji sedsala 9an destpêkirî ew ketîye nava padşatîya Bagratûnîyan. Li vê herêmê gelek warên dîrokî hene – kela Bêrkirîyê, dêra Sûrb Stêpanos, kilîseya Sûrb Astvatsatsin, pira Şeytan, şadirwana Bêrkirîyê. Dema em diçûne Çîbûxlîyê, me ev bedewîya tebîyetê ya batinî dît. Çemê Bêrkirîyê piştî 65 kîlomêtran ji çiyê berjêr dikişe û vê şadirwanê saz dike. Heyf, ku malûmatîyên me yên derheqa gundê Çîbûxlûyê da ne zêde ne. Cîyekî batinî ye, em li pêşberî gund rûdinên û heyrî dimînin, dilê me şa dibe, ruhê me rehet e. Meriv li vir bi rastî ecêb dimîne, ku tebîyet jî dikare ewqas kaw û kubar be. Meriv naxweze ji vî warê bedew dûr keve. Her dar û tûmeke vira nimûneya dîrokê ne, bîranînên rojên buhurî ne. Cangîr axa û Ûsiv beg dema seredana hev kirine, li vî warê bedew hêwirîne, hêsa bûne, paşê riya xwe berdewam kirine. Demekê bîranînên dîrokê dixeyîrin, lê pêlên zelal yên çêm ronahîyê didine me.

Rêvebirê me dibêje, ku gund ji texmînên me dûrtir e. Emê çi bikin, em pê ra razî dibin, xuya ye riya me hesab kiribû, riya rasterast bû. Çend rê me ber bi jor dibin, lê vê carê rê rast û dûz in û em li rex çend warên jîyanê derbaz dibin. Li hewîrdorê deşt û zevîyên genim in. Nevîyê Cangîr axa – Miraz bîr tîne, ku bavê kalikê wî - Xetîf axa xwedî bi hezaran hêktar zevîyên gênim bûye û ew yek bi heywanxwedîkirinê ra tevayî jê ra hebûneke pir dianî. Em li ser rê demekê disekinin.

Miraz dixwest nav zevîyan ra biçûya, ku berê yên kalikê wî bûn. Ji nislekê heta nisleke din tiştên cûre-cûre derheqa wê yekê da têne gotin, ku 12 gundên wan deran di bin hukumê binemala wan da bûye û heta bona gundên dûr jî nan ji vira derxistine.

Em di nav van mitaleyan da bûn, me hew dît gundê Çîbûxlûyê himberî me ye. Em li vir disekinin. Opêrator gerekê bona fîlma xwe ya paşwextîyê çend dîdeman bigire, em jî gerekê hinekî serhêsa bin û bi bedewîya berpala çiyê va heyr-hijmekar bin. Serê berpalê heye, binê wê tune, xuya nake. Gund di nav çiya û banîyan da ne, meriv dibêje qey dervayî vî gundî tu warekî jîyanê tune. Warekî

bilindcî ye, xuya ye ekinê hîmlî li vir hebê nên e. Li warên diha bilind kulîlkên çiyayî merivan dilbaristan dikin, ewqas reng-rengî û kaw in, yek ne mîna yeke din e, ji hev cuda ne. Meriv dibêje qey wênekêşekî hosta ew bi firçeya xwe bi rengên bedew va neqişandîye-nitirandîye. Ew reng çiqasî bedew bin jî, em hewil didin zû xwe bigihînine gund.

Pey demekê ra em êdî li gund in. Em dest bi pirs û pirsyaran dikin. Çi tê bîra we? Ji berê va meriv berev dibin û her yek ji wana tiştê zane dibêje. Xetîf axa û kurê wî Cangîr, merivên efat û mêrxas bûn, xebathiz bûn, ji keviran nan derdixistin. Dû çend deqeyan ra em ber derê wan in. Li vira jî di nav sedsalekê da kêm tişt hatîye guhartin. Hilbet, xanî hatine nûjenkirin, lê zêde neguhêrîne, tenê dewsa xalî kevir bi kar anîne, lê dîsa jî avahîyên ji xwelîyê çêkirî jî hene. Nevîyê Cangîr axa – Miraz ji kanîya kalikê xwe avê vedixwe. Xemgîn e, nikare xeberde, ji çavên wî hêsirên şabûnê dixulxulin, lê navsereyên gund behsa Xetîf axa û kurê wî – Cangîr axa dikin.

"Di gundê me da hertim jî wana bi bîr tînin,- yek ji wana dibêje,- heta niha jî dibêjin "kanîya Xetîf", "odeya Xetîf, "mala Xetîf".

Em zanin, ku li vira qetil bûye, dijminatî kirine nava êzdîyan, tirkan û kurdan da. Lê êzdîyan dikaribû xwe biparasta, bêy ku bidine ber çavan ka kê derdikeve pêşberî wan, tirk an kurd. Hema bona vê yekê ew hêjayî qedirgirtinê ne. Merivne mêrxas bûn. Cangîr axa bona êla xwe ji qetilê xilaz bike, dema dît çare tune, ji vir derket.

Her kes zane, ku wana kurd jî kuştine, lê ew wê demê bûye, gava hewil dane zorê li wan bikin. Ewana belasebab xwîn ne rêtine, merivên xwedî qedir bûn.

Xwedîyên malê yên îro Miraz teglîfî odeya mêvanan dikin. Sohbet dikin, rojên buhurî bîr tînin, her kes tiştên zanibû digot. Miraz ser hev xeber dida, bi wê ra tevayî jî dixwest ew jî tiştan bêjin derheqa kalikê wî, pêşîyên wî da. Paşê Miraz Xetoyan dibine wî warî, ku odeya Xetîf axa ya bona mêvanan bû, gundî dihatin wir şevbihêrîya xwe dikirin. Meriv dibêje qey ev hemû xewn û çîrok in. Meriv fem nakin ka çi qewimîye, ku em dixwezin rojên buhurî bîr

bînin. Ewana nizanin, ku xwelîya welêt em ber bi xwe kişandine. Niha li vira xanima melleyê gund yê rehmetlêbûyî û keça wî tevî zar û zêçên xwe dimînin. Du jinên beşerxweş ne tenê bi dilgermî me – rêwîyên ji Ermenîstanê qebûl dikin, lê usa jî hinek tiştan bîr tînin û ji me ra dibêjin.

"Em zanin, ku em li mala kê dijîn,- ew dibêjin.- Ruhê wan heta niha jî li vir perwaz dide. Em tu caran ji bîr nakin, ku ew merivên mêrxas bûne, ku miletê xwe parastine, lê dema dîtine dijmin sist e, zor lê nekirine. Kal û bavên me digotin, ku ewana tu caran destdirêjayî nekirine, hertim hiz kirine bi cînartîya qenc va bi hev ra bijîn. Lê gava yekî bixwesta xatirê wan keta, xilazbûna wan tunebû. Qewmandineke ha dibe: yek ji begên kurdan çend êzdî dikuje. Cangîr axa roj nava rojê diçe û heyfê hildide. Kurê begê kurd dikuje û tîne li vê hewşê darda dike. Û tenê pey ricayên merivên xwe ra cinyaz teslîm dike.

Lê ewana usa jî merivên dilrehm bûn. Dema xelayî dest pê dike, dijmin-xêrxwaz cem wan dibin yek, alîkarîya her kesî dikin û li wan xwedî derdikevin".

Sohbeta me ya bi vê naverokê dirêj dikişîne, nimûneyên ji hev cuda tînin, ew dibine pirsên minaqeşekirinê, ka wana pê ra gîhandîye hemû zêrên xwe bibin, yan hinek ji wana mane? Dibe hatine zêrên mayî bibin? Beşeke kesên hazir dixwezin bizanibin ka Ermenîstan li ku ye, çi welat e, kê li wir dijîn, gelo halê êzdîyan li wir xweş e, gelo li Ermenîstanê kurd jî hene? Em hewil didin çiqas ji me tê bersîva wan pirsan bidin. Piştî van her tiştan ji me dimîne, ku em dîsa bi duayên Şêx Zade ji hewşa Xetîf axa axê û avê hildin û xatirê xwe ji yên mayî bixwezin.

Seredana me li gundîyan hinek ecêb hat, gelek kes jî ji hatina me şaş û metel mabûn. Bona çi bi hezaran kîlomêtr erd birîne û qesta vira kirine? Dibe hisreta ber bi welêt ji bo van kesan tiştekî xerîb e, ku ji nislekê derbazî nisleke din bûye û xurttir bûye. Ew gerekê rojekê mînanî tendûrekê biteqîya, dibe jî bi vî cûreyî û bi vî rengî. Em êdî rehet in, me borcê xwe qedand.

QUBEYA TAÛSÎ MELEK LI ZIYARETA AKNALÎÇÊ



Qubeya Taûsî Melek wê ha be (ev dîdema proêktê ye)



Qubeya ziyareta ku niha li Aknalîçê heye



Dîdema qubeya Taûsî Melek (ji alîyekî din va)

HEYTEHOLA BINGEHDANÎNA QUBEYA TAÛSÎ MELEK
22Ê NÎSANÊ, SALA 2015



Serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê Birêz Mîrê Mîran Tehsîn Beg bingehdanîna qubeya Taûsî Melek pîroz dike



Mîrê Mîran Tehsîn Beg dua li wî nanê tiberk dike, ku ji Lalişê anîne



Qubeya Taûsî Melek bi 7 qubeyên biçûk va, ku berê xwe dane jor



Erefatên dînî berî heytehola dualêkirina bingehdanîna qubeya Taûsî Melek



Nûnerê ruhanî yê ji Lalişa Nûranî Bavê Şêx dua-dirozgeh li bingehdanîna qubeyê dike



Qubeya Taûsî Melek wê xwedî taybetmendîyên arkîtêktûrîyê yên teze û bedew be



Qubeya Taûsî Melek bi temamîya bedewîya xwe va

EZDIKI.COM

BÎRANÎNA ŞEHÎDÊN BÊ SÛC YÊN GELKUJÎYA ERMENÎYAN, SAL 2015, NÎSAN



Sal 2015, 24ê nîsanê, rêzeheykelên Sîsêrnakabêrdê



Nûnerên gelê êzdî li rêzeheykelên Sîsêrnakabêrdê



Qedirgirtina bîranîna şehîdên Gelkujîya ermenîyan





Tacê gulan ji alîyê serekê dînê êzdîyên dinyayê, birêz Mîrê Mîra Tehsîn beg



Mîrê Mîra Tehsîn beg caba pirsên rojnamevanan dide



Dêlêgasyona êzdîyên ji Lalişa Nûranî bi serwêrê mûzê-înstîtûta gelkujîya ermenîyan ya li Sîsêrnakabêrdê Hayk Dêmoyan ra



Mîrzeyê Çolo Siloyan mêdala bîranînê ya bi navê "Cangîr axa" dide Hayk Dêmoyan



Mêvanên êzdî di dema seredana mûzêya rêzeheykelan ya li Sîsêrnakabêrdê





Li mûzêya rêzeheykelan ya li Sîsêrnakabêrdê



Kurê Mîrê Mîra Tehsîn beg – Mîr Hazim di deftera mêvanên hurmetlî da bîr û bawerîyên xwe dinivîse



Li rêzeheykelên dostanîya ermenîyan-êzdîyan ya li Aknalîçê



Kevirê bîranînê bona bîranîna şehîdên Gelkujîya ermenîyan



Mêvanên qedirbilind di dema bîranîna şehîdên Gelkujîya ermenîyan



Metranê Armavîrê cenabê Sîon Adamyan bona bîranîna şehîdên Gelkujîya ermenîyan dua dike



Birêz Mîrê Mîra Tehsîn beg gotinên serxweşîyê ji haziran ra dibêje



Rêzbûna eskeran ya hurmetgirtinê di dema xwelîyê sipartina cinyazê ewledê gelê êzdî yê hêja û qumandarê mezin Cangîr axa



Bermayên meytê Cangîr axa



Bermayên meytê Cangîr axa, ku ji devera Mêssêrê anîne (niha – Ûst-Zalixa), ji herêma Saratovê



Nevîyê Cangîr axa – Wezîr, bermayên cinyaz dike di bingehê heykelê Cangîr axa da



Heykelê Cangîr axa li ziyareta Aknalîçê



Wezîrê parastinê yê Komara Ermenîstanê Sêyran Ohanyan ber hazira xeber dide



Karsaz û xêrxwez Mîrzeyê Çolo Siloyan xeber dide



Dîdemên ji duakirina di dema bingehdanîna qubeya Taûsî Melek





Di destê Bavê Şêx da zoraya tiberk ya dînî heye, ku ji Lalişê anîne



Bawermendên, ku tevî heytehola bingehdanîna qubeya Taûsî Melek bûn, dua li wan tê kirinê û ava ji Lalişa Nûranî anî didine wana





Şahîya fermî ku bona 150 salîya rojbûna Zoravar Andranîk e, li ziyareta êzdîyan ya li Aknalîçê tê pîrozkirin. Serekê ruhanî yê Armavîrê metran Sîon Adamyan xeber dide.



Şêx Hesen Hesenyan xeber dide.



Xeber dide serwêrê rêxistina civakî ya bi navê "Yekîtîya êzdîyan ya miletîyê" Ezîz Tamoyan



Wêneyê bîranînê ber heykelê Andranîk Paşa



Dengêbêjên êzdî di şahîya 150 salîya Zoravar Andranîk da kilaman distirên



Govenda miletîyê bona bîranîna Andranîk Paşa

SAL 2014, 29Ê ÎLONÊ



Her sal roja ziyareta Aknalîçê êzdîyên ji cî û warên cuda hatî berê xwe didine rêzeheykelên Sîsêrnakabêrdê





Baqên gula datînin li ser rêzeheykelên Sîsêrnakabêrdê yên bona bîranîna Gelkujîya ermenîyan





Li rêzeheykelên Sîsêrnakabêrdê





Li kînotêatroya"Moskva" yê fîlmên vîdêoyê yên koma efrandarîyê ya bi navê "Kartsîk" bi sernavên "Çar mezinayên dostanîyê an jî heca ber bi welêt" û "Berbanga edil ya behra Wanê" nîşan didin.



Sêrgo Yêrîtsyan meseleya pêşin ya pirtûka Mîrzeyê Çolo Siloyan ya bi sernavê "Riya ku ber bi ziyaretê dibe: pey du salan ra" teslîmî wî dike



Wextê pîrozkirina kitêba "Riya ku ber bi ziyaretê dibe. Pey du salan ra"



Malbeta Mîrzeyê Çolo Siloyan: wêneyê bona bîranînê





Mîrzeyê Çolo Siloyan û neferên malbeta wî





Aknalîç, sal 2014, 29ê îlonê:
Destpêka şahîyê, rêvebirê şahîyê Garêgîn Êvoyan



Lêvon Sargsyan, Mîrzeyê Çolo Siloyan û Aşot Xahramanyan spîçala ser heykelê dostanîya ermenîyan-êzdîyan tînine xwarê



Heykelê dostanîya ermenîyan-êzdîyan



Ber heykelê Cangîr axa sekinîne kurê wî – Sûrên û nevîyê wî Miraz



Heykelê Cangîr axa li ziyareta Aknalîçê





Dîrokzan Aşot Mêlkonyan heykelê Ûsiv begê vedike



Mêvanên qedirgir yên şahîyê





Heykelê Andranîk Paşa tê vekirinê



Xeber dide Mîrzeyê Çolo Siloyan



Koma folklorî ya gelêrî ya bi navê "Akûnk" tevî şahîyê dibe





Şahîya gel li ziyareta Aknalîçê, gişk direqisin





Gişk li saz û def û meyê dixin, jin direqisin





Distirê artîstê emekdar yê Komara Ermenîstanê Rûbên Sahakyan



Zarên êzdîyan tevî şahîyê dibin.



Ziyaret bi cimetê va kimkimî ye



Kurê Cangîr axa di nava milet da dua dike

ÇAR MEZINAYÊN DOSTANÎYÊ



Cangîr axa



Zoravar Andranîk



Komîtas



Ûsiv beg



Ûsiv beg Têmûryans (1869-1934)



Xunedar Komîtas (Soxomon Soxomonyan) (1869-1935)

EZDIKI.COM



Cangîr axa Xetoyan (1874-1943)





Zoravar Andranîk (1865-1927)



Ûsiv beg Têmûryans bi miletzan Aşxarhbek Lorîs-Kalantar ra

HEYKELÊN BÎRANÎNÊ YÊN LI REX ZIYARETA ÊZDÎYAN YA LI AKNALÎÇÊ



Ûsiv beg



Zoravar Andranîk



Cangîr axa



Kevirê buhurti yê êzdîyan li Aknalîçê, heykelê "Dostanîyê û biratîyê"



Kevirê bîranînê, ku pêşkêşî 100 salîya gelkujîya ermenîyan e

HECA BERBI ERMENÎSTANA ROJAVA













Rêwîyên hecê li ber kenarê çemê Erez



Hecî li warê jidayîkbûyîna Ûsiv begê – li gundê Eslanlûyê



Ûsiv beg bi miletzan Aşxarhbêk Lorîs-Kalantar ra:
li hewşa mala xwe ya li Eslanlûyê, di sala 1912an da



Mala Ûsiv beg pey 100 salan ra, sal 2014



Dîdemek ji gundê Eslanlûyê



Eslanlû: nevîyê Cangîr axa – Miraz, nevîçirkê Ûsiv begê – Kerem û Şêx Zade li ser pêpelîngên mala Ûsiv beg



Eslanlû: rasthatin tevî xwedîyên îro yên mala Ûsiv beg



Eslanlû: Miraz Siloyan kilameke derheqa Ûsiv begê da distirê



Eslanlû: kesên hatine hecê ji kanîya Ûsiv begê avê hildiçinin



Eslanlû: jîyana keç û jinên kurd di bin kon da



Binecîyên gundê Eslanlûyê



Eslanlû: Ev zaro heyrî maye ka li hewşa wan çi diqewime



Qers: dêra Sûrb Arakêlots ku bûye mizgeft



Qers: pira Vardan



Qers: hecî li ber avahîyê, ku berê zanîngeha ermenîyan bû



Wêneyê bona bîranînê:
Mîrzeyê Çolo Siloyan, Andranîk Artênyan, Dmîtrî Hambarzûmyan



Mîrzeyê Çolo Siloyan li ser pira ser çemê Erez



Qers: hecî Mîrzeyê Çolo Siloyan, Andranîk Artênyan û Taçar Vardanyan li ber mala Çarênts



Gundê kal û bavan – Kullik ji pencereya makîneya
Mîrzeyê Çolo Siloyan



Nava gundê Kullik: hêsabûna di bin siya daran da



Mîrzeyê Çolo Siloyan li gundê kal-bavê xwe



Mala ku bona Mîrzeyê Çolo Siloyan ziyaret e. Dîwarê mala kalikê wî



Wêneyê bîranînê bi Sîmon Tsatûryan ra



Mirazê Çolo Siloyan mala kalikê xwe digere



Mîrzeyê Çolo Siloyan bi birazîyê xwe – Miraz ra

EZDIKI.COM



Mîrzeyê Çolo Siloyan bi nevîçirkê Ûsiv begê – Kerem ra



Mîrzeyê Çolo Siloyan bi gundîyên Kullikê ra ketîye sohbetê



Hecî xatirê xwe ji gund dixwezin



Qersa îroyîn: panorama



Qersa ermenîyan: avahîyên ku mane

Hilbet, bona me çetin e em destê xwe ji warê jidayîkbûna Cangîr axa bikin, lê bona em bigihîjine Wanê, rêyeke dirêj ber me ye. Bi hêvîya, ku emê dîsa hevdu bibînin em xatirê xwe ji dostên xwe yên nû dixwezin. Miraz Siloyan dike bîra me, ku taybet bona vî meremî sitiraneke wî heye. Em hinekî ji gund derdikevin û mecalê didine wî bistirê, çimkî ew sitiran wê beşeke fîlma me be.

Lê bona vê yekê rinf fem bikin û derc bikin, cîyê herî xweş şadirwana Bêrkirîyê ye, ev ecêba tebîyetê ya xweş, ku li wir em dikarin xemên xwe bidine bêrîyê, xeyal û fikirên xwe ji hev bela bikin.

Li vira jî serekê komela tûrîstan ya "Anî-tûr" Volodya Arûşanyan rastî nas û dostên xwe yên kevin û teze tê. Ewana careke din didine xuyakirin, ku ewana û gelekên mînanî wan bi esilê xwe va ermenî ne û dem hatîye derheqa wê yekê da bi dengekî bilind bêjin. Ewana êdî pê ra gîhandine, hatine Ermenîstanê, heta hewil dane li merivên xwe bigerin.

Ez ser wê fikirê me, ku ev qewmandineke gelek baş e, çimkî meriv dixwezin vegerin ber bi koka xwe, esilê xwe. Ev yek dikare fire bibe û kûr bibe, ji ber ku me li hemû warên em lê qesidîn bûyerên ha bihîstin, an jî me ew yek ber çevên xwe dîtin.

Ev qewmandin careke din îzbat dike, ku vekirina sînorê Ermenîstanê-Tirkîyê wê alî gelek tiştan bike, hilbet tiştên erênî. Ez bawer im, ku bona kesên bi esilê xwe va ermenî, lê dînguhastî, seredana welatê kal û bavan wê gelek tiştî biguhêre, û dema ew vegere Tirkîyê, ewê ne merivê berê be. Lê niha hatine Ermenîstanê gelek dûr û dirêj e, û gava sînorê li rex Margarayê vebe, wê demê meriv destê xwe dirêj bike, herdu alî jî xwelîya ber dilê me ezîz e.

Em xeberdana xwe ya li ser Cangîr axa berdewam bikin.

Gava li rex şadirwana Bêrkirîyê gilî hate ser Cangîr axa, yekî kurd got, ku dikare ne tenê derheqa wî da xeberde, lê dikare bistirê jî. Pêşî ev yek li me ecêb hat: kilamekê bistirê ser serekê dijminê xwe. Lê dostê me yê teze ser ya xwe ma û hazir bû ne tenê bona kesên di bin siya darê da sitiranê bêje, lê usa jî bona wan kesan, ku fîlmê dikişînin.

Çiqasî jî dijwar bûya, ew hazir bû ji bin siyê derê, ber tava sincirî bisekine, bi me ra qise bike. Nasê me yê teze – Ahmed, dibêje ku ew kurd e, lê ferqî tune, bira meriv meriv be, ya ferz meriv hevdu fem bikin. Ew zane, ku li van deran ermenî û êzdî mane. Niha ew ne li wir in, û ew bona wana xemgîn e. Zane, ku di sedsala derbazbûyî da li vira qewmandinên giran bûne, qir û kuştin bûne. Lê niha şa dibe, ku li vira carina tûrîstên ermenî dibîne û cara pêşin e, ku êzdîyan dibîne. Çi jî hebe, meriv nikare bîranînan ji bîr bike. Pêşîyên me derheqa dostanîya bi ermenîyan, êzdîyan ra ji me ra gotine, ku çawa bi cînartîyeke qenc bi hev ra jîyane, di rojên oxirmên giran da hatine hewara hev, di dema şahîyê da jî bi hev ra bûne. Dû ra desthilatê di nav me da dijminatî saz kir, wisa kirin, ku me şerê hevdu kir, hev qir kir. Ez gelek caran derheqa wê yekê da difikirim û bawer dikim, ku em bikaribin her tişt daynine alîkî û bi aştî bi hev ra bijîn. Çimkî tu rêyeke me ya din tune. Gotineke ha heye: "Meriv cînaran hilnabijêre". Eger sînorên me vekirî bin, emê di nav çend sehetan da bikaribin seredana hevdu bikin, emê bêne Rewanê, hûnê bêne Wanê. Çima mecala merivan tunebe bên vê şadirwana bedew, vê ciwanîya tebîyetê bibînin, usa jî behra Wanê, ku meriv dikare jê lezeteke baş bibîne û li wir hêsa be? Lê dewsê sînoran di bin hezar kilîtan da digirin. Ew ji kê ra lazim e? Ji sedî sed e, ne bona kurdan, ne tirkan, ne êzdîyan, ne jî ermenîyan ra lazim e. Eger du cînar bi hevdu ra napeyivin, her sibe silavê nadine hev, wê demê pêwendîyên wan wê ne baş bin. Niha dewsa em cînartîyeke qenc bi hev ra bikin, em wê cînartîyê bi cînarê sisîyan va girê didin. Ne axir dibe cînarê sisîyan naxweze em bi hev ra baş bin, belkî dixweze em dijminên hev yên heta-hetayê bin. Bona me çûyîn-hatin, hev naskirin, hev femkirin lazim e. Wê demê emê gavên pêş bavêjin û emê ji hevdu fem bikin.

Em gelek dûr çûn. Em vegerine ser Cangîr axa.

Merivên di çaxê wî da digotin, ku ew ji emirê xwe zûtir mezin dibû, gelek guhdar û hişyar bû, bi aqil û zîrek bû. Ewî zarotî ne dît, gelek zû bû xort û genc.

Di şevên zivistanê yên dirêj da hiz dikir di odeyan da guh bide çîrok, evsene, hikyatên derheqa merivên mêrxas û bi nav û deng da.

Ewî bi awayekî sade û ji dil got, wî destdirêjayî û wehşîtîya hukumeta Tirkîyê di hindava gundîyan da qebûl ne dikir û şermezar dikir. Pêwendîyên wî xort-gencê ku zef zû mezin bûbû bi ermenîyan ra gelek nêzîk bûn. Orta wî û malbetên navdar yên wilayeta Wanê gelek xweş bû. Bi heftîyan di malên wan da dibû mêvan, bi ewledên wan ra bûbû dost. Wana teglîfî gundê xwe dikir, bi jîyan û deba êzdîyan ra dikir nas. Bi xwe kesên navdar û mêrxas yên gundên cînar yên ermenîyan nas dikir. Gelekî qedirê serekê taxbûran Mûşêx, Gêvorg, Dalî Xazo, jina wî Marîam xanimê zanibû, ya ku kincên mêran li xwe dikir û bi mêrê xwe ra diçû şer...

Dostanîya bi ermenîyan ra ji kal û bavan dihat. Bavê kalikê wî – Bişar paşa hevalbendê cindîyê devera Sxêrdê ya nîvserbixwe Şêx Mîrze bû. Derheqa mêlgirtina wî ya di hindava rûsan da, hizkirin û hurmetgirtina wî ya ber bi ermenîyan da ermenîzan Lêyard û bingehdarê edebîyeta ermenîyan ya nû Xaçatûr Abovyan nivîsîne. Şêxê bajarê Rindewanê bi pereyên xwe bona olka ermenîyan dêrekê çê dike, zarên xwe ber destê mamostayên ermenî dide ber xwendinê. Ew bi destî ermenîyan ji cîgirê qeyserê Rûsîyayê yê Kavkazê ra nameyek dinivîse, di wê da aminaya xwe di hindava hukumeta Rûsîyayê da dîhar dike û hazirîya xwe elam dike bona bi siyarîyên xwe va tevî leşkerên rûsan bibin. Hukumeta Tirkîyê wê nîvserbestîya Sxêrdê tehmûl nake, eskeran dişîne bona zorê li deverê bikin. Hêzên Şêx Mîrze bi ser dikevin. Serekê Dîyarbekirê yê tirk pelepistûkîyê dike. Şêx gazî dîwana xwe dike û bi nemamî wî dikuje. Dest bi şerê rûmetê yê Rindewanê dibe. Bajar û gundên şên û ava dibin kelefe.

Bişar paşa jî bi gelek leşkeran va derbazî Farizistanê dibe. Li vira bi daxweza tirkan hemûyan darda dikin.

Kalikê wî - Midûr axayê mêrxas, ji alîyê welîyê Wanê yê tirk va tê jehrîkirin. Serekeşîrê devera Bêrkirîyê yê herî dewlemend

Xetîf axa berî mirina xwe temîyê dide kurê xwe – Cangîr axa, ku bi hebûna xwe berî her tiştî çekan û hespan bikirin, mêrên eşîreta xwe bi çek bikin, ku bikaribin li wî welatê zulm da olka xwe û dînê xwe biparêzin. Cangîr axayê li wî warî mezinbûyî xwedî hestên cuda bû û derheqa wê yekê da serekeşîrên der û doran, dostên wî yên ermenî û paşayên tirkan ew yek rind zanibûn. Tirkan gelek soz dane wî, her firsend bi kar anîn bona wî bînine alîyê xwe, lê tiştek jê derneket, Cangîr axa ser ya xwe dima. Ewî zanibû, ku gerekê heta dawîyê şerê tirkan bike û li ser wê rê tenê hevalbendek heye, ew jî ermenî ne, û bûyer jî dane îzbatkirin, ku Cangîr axayê bi eşîra xwe ra amin çiqas rast bû. Û rasthatinên bi Zoravar Andranîk ra bawerî kirine dilê wan, ku lazim e bi hev ra şerê tirkan bikin.

Hilbet, ev fikirên mişterek dibine bingeh, ku Cangîr axa û Ûsiv beg bi hev ra hereket bikin. Dostanîya êzdîyan-ermenîyan ya germ gelek caran tirkan mecbûr dikir di hindava ermenîyan da fesal bin. Lê şerê hemcihanê yê yekê û destdirêjayên li Ermenîstana Roava rewş ji binî va guhêrandin. Li vê herêmê Ûsiv beg hewil dida xemên wan mihacirên ermenîyan bide sivikkirinê, yên ku ji dest zulma tirkan xwe xilaz kiribûn û hewil didan li Ermenîstana Rohilatê sitar bibin.

Li vira ez dixwezim hinekî bi bîr bînim, ku bavê min û merivên sere yên eşîreta min çi digotin. Ez li Ermenîstana Roava çûme gundê bavê xwe, Kullikê, ku ji sînorê Ermenîstanê-Tirkîyê serhevdu çend kîlomêtran dûr e.

Merivên ji eşîreta me yên di emir da mezin digotin, ku eger em ji vira, ber sînor, ji cîyekî bi semt bisekinin û li wî berî mêze bikin, gundê me wê xuya bike. Ewana rast bûn. Gund rastî jî ji sînor ne dûr bû, ew bi bax û baxçe va wergirtî bû. Texmîn bikin, ku tam mînanî deşta Araratê ye. Xanî û avahî jî bi kêm tiştan va ji hev cuda dibin. Nîvro li gund gelek germ e û her kes hewil dide cîkî sî bibîne, xwe bide ber. Li nav gund meriv gelek in. Kome merivên kal û navsere li ser kursîyan rûniştine û sohbet dikin. Hilbet, gava çev li me ketin, sohbeta wan geş bû. Me silav da hev, em bi fesal

pirs-pirsyaran ji hev dikin, bersîvê didin. Lê di serê min da wext û demên buhurî ne, salên sedsala derbazbûyî, windayîyên bi hezaran merivan yên mînanî bavê min û merivên min.

Kal û bavên me herdem jî behsa du şihitandinan-mihacirbûnan dikirin. Ya pêşin di salên 1914-15an da bû, ya din diha dereng – di salên 1918-19an da. Bi kurtî, di salên 1914-15an da her kesî zanibû, ku xilazbûna wan tenê derbazbûna wî berî Erez e, û kal û bavên me wisa jî kirin. Mesele, merivên min pêşî hatine berpala çiyayê Arayê hêwirîne. Wan çaxan navê wê Qerecoran bû. Eger ez ne şaş bim, ew Aragyûxa niha ye. Hatine, bi cî bûne, di nav du salan da bûna mal û hal. Lê dibe hisreta di hindava welêt da ewqas pir bûye, ku di salên 1914-15an da hinek vegerîyane, lê demeke kurt şûnda careke din revîne, ji mirinê xwe xilaz kirine, û wek merivên me digotin, gelek kes ketine çemê Erez û jê derneketine.

Em şeva pêşin li Ermenîstana Rojava li Qersê derbaz dikin. Berî wê em çûbûne kela Qersê, li warên ermenîyan qesidîbûn. Dilê min tevlihev bû, gava min dît, ku dêra ermenîyan li binê kelê kirine mizgeft.

Paşê em çûne mala Yêxîşê Çarêns, ku nêzîkî pira Vardan bû, ber xanîyê dibistanê. Em peya li kolanên merkezî gerîyan, ku li wir çend nimûneyên jîyana bajarê ermenîyan hatibûne parastin û tu ferqîya wê bi bajarê Gumrîyê ra tunebû, ku ji wir 60-70 lîlomêtr dûr bû. Qers jî, Gumrî jî bajarên sinetkaran e, ewana sinetkarên destemel, faytonçîyên bêqusûr û xwedî pêşekên cuda-cuda ne û heta bi hev ra ketine qoşê jî.

Di serê min da hertim himberîhevkirin dixuliqî, ew jî wê demê, ku ez berî hatina vir çûbûme Gumrîyê û min li wir gelek tiştên wisa dîtin, ku li vir jî hene. Niha ez hatime mêvanxaneya Qersê ya bi navê "Anî" û nikarim rehem bim – ji hêlekê va ji tiştên dîtî, ji hêleke din va jî, ku ezê sibê herim gundê bavê xwe. Me bi rêvebirê xwe yê kurd ra hema bêje her tişt li hev kirîye – emê ji Qersê 120-130 kîlomêtran herin û nêzîkî Îdirê gundê me ye – Kullik. Roj tunebû, ku bavê min û merivên me behsa gundê xwe nekirana. Roj tunebû,

ku gundê wan nehata xewna wan û ji me ra negotana, ka di xewnê da di ku da çûne û çi kirine. Êdî ew gund ber dilê me jî ezîz bû. Niha ez ji navê merivên xwe – yên dijîn jî, yên çûne rehmetê jî, hatime seredana gundê me, ez ne ku ji wî berî sînor, ji cîkî dûr hatime, lê ji cîkî gelekî nêzîk hatime, bona ocaxa kal û bavên xwe bibînim. Ez wisa texmîn dikim, ku ezê mala me, hewşa me, baxçê me bi xwe bibînim, çimkî kesên me heram dihesibînin gerekê xwe dûrî destkeftîyên me bigirtana.

Em berbangê bi rê dikevin, wextekê şûnda em êdî li rex Erez ra derbaz dibin.

Em li ber wî cîyê sînor disekinin, ku zêde nêzîkî Ermenîstanê ye, li ber çemê Erez, ku li wir Bagaran û Êrvandaşên digihîjine hev. Li vir ew çem du welatan ji hev cuda dike. Gundê ermenîyan li ber çevê te ye, di nav dar û şînkahîyê da windabûyî. Heta xanîyê serotayîya gund jî xuya dike bi alaya sê rengî va. Meriv dibîne, ku gundî çawa diçin-tên. Gelo em ewqas nêzîk û ewqas dûrî hev in? Tu tişt ji dest me nayê, xên ji wê yekê ku di hundurê xwe da hêrs bibin û wêneyekî xwe bigirin. Li vir gotin têrê nakin.

Em pêşda diçin. Çemê Erez hertim bi me ra ne. Hey fire dibe, hey teng dibe. Ew çemê ber sînor e. Wî berî Ermenîstan e, welatê me, ax û ava ber dilê me ezîz. Lê ev jî ya me ye. Eger wisa nîbûya, pêşîyên me wê ewqas bi zehmetî ev war terk nekirana. Ji riya ku ber bi Îdirê dibe, em xwe li milê çepê digirin, û ew rê me ber bi Kullik dibe, gundê kal û bavan. Çi jî hebe, ev demek ji xewnên min e, ku êdî pêk tê.

Rast e, dilê min tevlihev bûye, ez nerehet im, lê bi min va wisa tê, ku Kullik yek ji gundên deşta Araratê ye, bi her tiştî va. Binecî riya ku dibe ber bi orta gund nîşanî min didin. Bîstekê şûnda serekê gund tê, ji me ra "Hûn bi xêr hatine" dibêje. Em bi riya bi selan va çêkirî û bi komeke mezin va pêşda diçin, muxtarê gund hinek tiştan ji me ra dibêje, ku li vir ji destpêka sedsala buhurî azirîyên tirk dijîn. Karê wan xwelîbêcerkirin û heywanxwedîkirin e. Li der û dorên me malên kevin û teze ne. Em pirs-pirsyara malên kevin dikin.

Em zanin, qesta me malên ermenîyan û êzdîyan in, ku turk-azirî 100 sal û zêde li wan da najîn, çimkî wan malan heram dihesibînin. Hema ew mal in, ku rêça me li ser wan heye. Malên ji xwelîyê çêkirî, bi hewşên mezin û fire va, li wir xanîyên cuda-cuda xuya dikin. Orta gund da malek nîşanî me didin, dibêjin, ku ew mala ermenîyekî bûye. Li vir jî derî girtî ye. Malên girtî ne hindik in, li ser hinekan ji wana kilît-zirzeyên kevin yên zengarî hene. Em fem dikin, ku xwedîyên wan, ango, kal û bavên me berî sedsalekê ji vir çûne, lê dibe jî binecî difikirin, ku zû an dereng ewê vegerin?

Lê em vir da, wê da diçin û tên, em ji hewşekê derdikevin, dikevine yeke din, eger derên wan vekirî bin.

Axirîyê ez ser mala kalikê xwe vebûm, ew jî li ser bingehê gotinên merivên me yên bi emirê xwe va mezin, ku ji min ra gotibûn. Ruhê min tevlihev dibû, lê min hewil dida nedime der. Mînanî qeytana fîlmê ew hemû tişt ber çevên min ra derbaz dibûn, ku bavê min û neferên malbeta min ji min ra gotibûn. Min hewil dida dengveger-alana gotinên wan bibihîsta, ji her kevirekî û tûmekê, her malekê û hewşekê fêm bikira, texmîn dikim ka ev çi gundekî şên, têr û tije û ava bûye.

Ya sereke ew bû, ku ez li warê kal û bavên xwe gerîyam, ez li dû rêçên çend bavên xwe gerîyam, û bawer bikin, min dît, çiqasî jî helwesta dijminan di hindava me da ya dijminatîyê bû, û min bi duayeke bêdeng hisreta binemala xwe ji wan ra got. Ez di nav gund da gerîyam, min bi gelek kesan ra sohbet kir. Dêmên ji wan her kesî te digot qey ji me dipirsin: hûn çima hatine? Yekî-duda jî pirs dikir – hûn hatine zêrên xwe bibin? Lê ewana, ku hatine di nav rojekê da bûne xwedîyên mal û milkên kesên din, fem ne dikirin, ku goristanên pêşîyên me ber dilê me çiqas ezîz in. Û mezelên pêşîyên me bûbûn xirabe. Me bi dilekî xemgîn xatirê xwe ji warê jidayîkbûna bavê xwe, kalikê xwe xwest, ku ji Erez çend kîlomêtran dûr bû û eger sînor tunebûya, emê di nav çend deqeyan da ji Ermenîstanê bigihîştana vira.

Gava em ji gund derketin, me xwest em bîranînên rojên buhurî

fem bikin. Xwesma salên 1915-16an serketinên leşkerên rûsan li Kavkazê hêvî dikirin dilê me, ku ermenî, êzdî, aşûrî, hurum (yûnan) û yên din, ku li çend warên Ermenîstana Rojava mabûn, wê ji qetilê xilaz bin, lê şorişa meha sibatê, paşê jî ya oktobirê rewş li enîya şêr dane guhartin, û Tirkîya bi ser ket. Leşkerên rûsan ji Kavkazê derketin, li wir tenê çend taxbûrên ermenîyan man. Lê tirkan guh nedane peymanên agirbestê, ku di meha çileya pêşin sala 1917an hatibûn îmzekirinê, careke din êrîş kirin û Ermenîstana Rojava zevt kirin û şer derbazî Ermenîstana Rohilatê bû. Êzdî ji bo têkoşînê bi ermenîyan ra bûn yek dest. Hemû serekeşîrên êzdîyan kefîltî dane Ûsiv beg ji navê wan li rex ermenîyan be. Sala 1917an Ûsiv beg êdî endamê parlamêntoya Ermenîstanê bû. Ew yek mecal dida wî haj ji halê şêr hebe, dema lazim bibe êzdîyan jî tevî wî şerî bike. Li vê herêmê Cangîr axa bi desteya xwe va berbiçev ket.

Bihara sala 1918an tirkan Qers zevt kirin, ketine Alêksandrapolê, Qerekilîsê, Baş-Aparanê. Dîsa dest bi mihacirîyê, qetilê, kuştinê bû. Hemû ermenî û êzdîyên deverê bi pira Qereleyê ya li Îdirê derbazî wî berî Erez kirin. Paşê bi topa Tatos va ew pira hate teqandin û tirk êdî nikaribûn ser çemê gurr ra derbaz bin. Hema wê şevê, hêzên di bin serokatîya Cangîr axa da, bêy ku li benda fermanê bisekinin, li rex gundê Molebayazêtê êrîş birine ser eskerên tirkan, ku hewil didan êrîş bikin. Hicûma ji nişkêva ne tenê êrîşa dijmin da sekinandinê, lê usa jî zirareke mezin gîhande tirkan, mecal kete leşkerên ermenîyan, ku hazirîya xwe bikin û êrîşî wan bikin. Cangîr axa alîyên dijmin yên sist zanibû, mesele, zanibû, ku tirk şevê nikarin şer bikin, lema jî hema şevê êrîş birine ser wan. Di wan şeran da Cangîr axa navê "Hogirê ji dil yê gelê ermenî" qazanc kir.

Ji cî û warên nêzîkî Baş-Aparanê, ku eskerên dijmin zevt kiribûn, deng û behsên dilsotîn dihatin, dijmin ser riya xwe her tişt kaf-kûn dikir, talan dikir, tirs dikire dilê her kesî, ku wê Rewan bê zevtkirin û ji piştê wê li Serderavê xin. Qumandarî biryar dike siyarîyên Cangîr axa jî bişîne Baş-Aparanê. Siyarîyên Cangîr axa, ku bi serketina Serderavê va ruhdar bûbûn, bi rêberîya êzdîyên

Elegezê va, ku warê xwe baş nas dikirin, bi riya çiyê ya kurt xwe digihînine Baş-Aparanê û gundê Kulîceyê, rê li ber dijmin digire. Şerekî giran dest pê dibe. Ordîya tirkan her tişt dikir bona wê parastinê biqelêşe, bona bikaribe ber bi Rewanê va bimeşe. Lê Aparan bûbû kela mêran. Desteyên rezadil, binecîyên gundên der û dorê, siyarîyên Cangîr axa, heta komên mihaciran jî, mînanî mertala polayî ber eskerên tirkên devbixûn sekinîbûn. Desteyên Cangîr axa li vir jî saw û xof kiribûne dilê dijmin. Êrîş ji nişkêva dibûn. Tirk bona ji vî halê giran derkevin, heta bi alayên sipî va jî, bona aştîyê dêlêgasyonek şandine Baş-Aparanê, bal qumandar Dro (Drastamat Kanayan) bi bahaneya, ku xudêgiravî li Batûmîyê di navbera dêlêgasyonên ermenîyan û tirkan da peymana aştîyê hatîye girêdan û xûnrêtin wê ji tu alîyekî ra karê neyne. Heta wî çaxî aştî tunebû. Dro bi wê pêşnîyazê ra razî dibe. Lê Cangîr axa bi serekên ermenî yên deverê ra tevayî guh nedane fermanê, derbeke xeder digihînine ordîya tirkan û wana radiqetînin, berê wan didine Alêksandropolê...

Heta van axirîyan jî derheqa tevbûna Ûsiv begê di şerê Serderavê da malûmatîyên zêde tunebûn. Lê çavkanîyên cuda-cuda didine xuyakirin, ku ew ne tenê tevî wî şerî bûye, lê usa jî rola wî ya giring li wir hebûye. Ji bo nimûne, Harûtyûn Tûşçyan dinivîse, ku êzdîyên Sînekê, ku wê demê di bin destê rûsan da bû, usa jî ew êzdîyên, ku bi ermenîyên Qersê ra revîbûn û hatibûn li berpala Çiyayê Elegezê hêwirîbûn, hazir bûn bi serokatîya Ûsiv beg şerê dijminên xwe bikin. Ev malûmatî dide îzbatkirin, ku rastîyê jî Ûsiv beg bi siyarîyên xwe va tevî wî şerî bûye. Qumandarê desteya siyarîyan ne tenê bi leşkerên xwe va hazirîya şerê zûtirekê dibîne, lê usa jî tevî karê amadekarî û teşkîlkirina şerên himberî dijmin dibe. Ûsiv beg wek serokê êzdîyan bi bangawazî berbirî miletê xwe dibe, ku bikevine nava wan taxbûrên ermenîyan, ku haziraya şêr dibînin, bi her awahî alî şervanan bikin, çi destê we tê bikin. Bi banga serekeşîr va bi sedan êzdî berê xwe didine pêşenîya şêr. Di nav wan da usa jî merivê Ûsiv beg yê nêzîk Şamil Têmûrov jî

hebû, ku di şerê Serderavê da navê mêrxasîyê qazanc kir.

Bi vî awahî, Ûsiv beg Têmûryans bi desteya xwe ya siyarîyên êzdî va di şerê meha gulanê da, xwesma di şerê Serderavê da mêrxasîyek mezin kirîye, layîqî pesindayînên qumandarê girseyî Danîêl Bek-Pîrûmyan û qumandarê taxbûra Rewanê Movsês Sîlîkyan bûye.

Bona şerê egîtîyê û mêrxasîyê xelata şervanîyê ya bi hurmet dane Ûsiv begê.

Ji fermana gênêral Sîlîkyan em pê dihesin, ku di dawîya sala 1918an di dîvîzyoneke ermenîyan ya cuda da taxbûreke ji êzdîyan sazkirî hebûye, ku berê jî, di sala 1918an da bi mêrxasî tevî şerê dijî tirkan bûye. Qumandarê wê Yûsif beg Têymûrov bi fermana dîvîzyonê ya 7ê meha çirîya paşin sala 1918an va bi mêdalyaya "Xaça Gêorgîyê" ya dereca 4an va hatîye xelat kirin, bona piştgirîkirina pareskerên Rewanê di şerê Serderavê da.

Eva ne xelata pêşin ya Ûsiv beg bû, ku ewî bona şerê serketî sitendîye. Hela 9ê tebaxê sala 1879an ew bi fermana qeyserê rûsan bi ordêna dereceya 3an ya "Stanîslavlê Buhurtî" va hatîye xelatkirin bona mêrxasîya di şerê dijî tirkan ya sala 1877an da, ku wê demê ew di nav desteya siyarîyên Rewanê da bû.

Piştî wê, sala 1880an 16ê nîsanê ew bi ordêna dereceya 3an ya "Annaya Buhurtî" va tê xelatkirin, bona wê yekê, ku bi mêrxasî himberî tirkan şer kirîye.

Jimarên xelatan dû ra zêdetir dibin, bo nimûne, ew odrêna "Stanîslavlê Buhurtî" ya dereceya 2an, mêdala zêrîn ya "Bona efatîyê" û mêdala zîvîn ya "Bona mêranîyê" distîne.

28ê gulanê sala 1918an li Rewanê ev banga dîvîzyona leşkerî ya Rewanê hate belavkirinê: *"Tirk piştî şerê 3 rojan hatine şikestinê û bi lez paşda direvin... Taxbûrên me gav bi gav didine dû wan. Ruhdarbûneke wisan e, ku nayê gotin".*

Ûsiv beg ji serketinan gelek kêfxweş bûbû, lê windakirin jî ne hindik bûn. Xwelîya welêt ya wî berî Erez ji dest çûbû. Ya ku merivan dilbaristan dikir ew bû, ku Şêwra ermenîyan ya miletîyê di 28ê

gulanê sala 1918an da li Tîflîsê, li mala dewlemendekî welatparêz Mîkaêl Aramyans serxwebûna Ermenîstanê îlan kir. Dewleta ermenîyan ya bi hezaran salan windabûyî careke din ava bû. 4ê tîrmehê, piştî mohrkirina peymana Batûmîyê ya di navbera Tirkîyê û Ermenîstanê da li welêt dest bi xebata avakirina dewletê bû. Bi serokatîya Hovhannês Kacaznûn hukumeta Ermenîstanê hate sazkirin, ku 19ê tîrmehê seredana Rewanê kir û di wan demên bona welêt dijwar da dest bi erkê xwe kir. Parlamêntoya Ermenîstanê jî hate damezirandin û di roja vekirina wê da – 1ê tebaxê sala 1918an, navnîş-lîsteya endamên parlamêntoyê hate raberkirin: 46 parlamêntar - ji 4 partîyan, ji kesên ne endamên partîyê û ji miletên kêmjimar. Di nav eva dawî da Ûsiv beg Têmûryans jî hebû, ku bû parlamênterê êzdîyan yê parparlamêntoya Ermenîstanê ya pêşin da. Ango, ew bû nûnerê êzdîyan di parlamêntoyê da.

1ê tebaxê sala 1918an, seheta ji 11 derbazbûyî 30 deqe, civîna pêşin ya parlamêntoya komara Ermenîstanê dest bi karê xwe kir, di nav 46 parlamênteran da Ûsiv beg jî hebû, û femdarî ye, ku karê wî ji boy gulvedana Komara Ermenîstanê bû. Ewî pêşketina gelê êzdî û paşeroja wê di nav dewletbûna Ermenîstanê da didît. Û lema jî Ûsiv beg karê parlamêntarîyê pir bi aktîvî dikir, gelek caran dengê wî bona çareserkirina pirsgirêkan dibû ya biryardar.

Bo nimûne, sala 1919an di şertên xelayê da, pirsek serî hilda, ka berê xwe bidine kîjan dewletê bona alîkarîya xurek bistînin..

Parlamênto bûbû du beş, hinekan digot ji Dewletên Amêrîkayê yên Yekgirtî, hinekan jî digot ji Îngilîs. Ûsiv beg piştgirê alîkarîya Amêrîkayê bû. Û parlamêntoyê biryareke wisa derxist û dîsa dengê Ûsiv beg rola biryarkirinê lîst.

Piştî, ku parlamêntoya pêşin ji hev bela bû, destxweda ya duduyan hate hilbijartin û di wê da Ûsiv beg dîsa cî girt.

Ew li parlamêntoyê bû endamê komîsyona xebatê û xemxurîyê û di nav karkirina xwe ya herroje da her tişt dikir bona sivikkirna xemên mihaciran û bona rewşa sosîalîyê ya gundên êzdîyan bê xweşkirinê.

Kesên wan deman jîne destnîşan dikin, ku parlamênter Ûsiv beg Têmûryans di nava kar û barên parlamêntoyê da hertim jî karên serketî kirine, her tişt kirîye bona xweşbextîya welêt û çareserkirina pirsgirêkên miletîyê. Ewî rind derc dikir, ku niha pirsa here sereke mehkemkirina welêt, safîkirina pirsgirêkên aborî û civakî ne. Ûsiv beg rind haj ji pirsgirêkên gelê êzdî yên miletîyê hebû, hema firsend diketê, derheqa wan da xeber dida û ji nav wan pirsgirêkan ya xwendinê hesab dikir çawa ya pêşin.

Nûnerê gelê êzdîyan yê bi rûmet, ku kêm-zêde xwendin dest anîbû û herdem bi merivên xwendî û zane ra dida û distend, rind fem dikir, ku miletê me wê pêş nekeve, eger em jî xwedî gelek merivên xwendî nebin. Û bavê wî jî ha fikirîye, yê ku her tişt kirîye bona kurê wî xwendinê bistîne, rastî metranê hemû ermenîyan hatîye û jê hîvî kirîye, ku kurê wî li medreseya Êcmîadzînê ya ruhanî da hîn bibe. Em zanin, ku di destpêka sedsala buhurî da xwendina zarên êzdîyan heta guneh dihate hesibandin. Ango, ewî gerekê ew fikirên hêna berê yên paşdamayî bişkênanda, ji holê rakira.

Di 22ê îlonê sala 1920î bi hereketê wî li Alêksandrapolê hemcivîna êzdîyan ya pêşin derbaz bû. Hemcivîn çend rojan kişand û li wir biryarên giring hatine qebûlkirin, armanca wê ya sereke ew bû, ku bona êzdîyan elfaba bê sazkirin û di hêla xwendin û kûltûrayê da gavên pêşin bêne avîtin.

Lê komara Ermenîstanê ya pêşin nikaribû ev hemû pêk banîya, çimkî hevkarîya tirkan-bolşêvîkan û ew yek, ku Ermenîstan bû ya Sovyetî gelek daxwez, bername, armanc û xewnên Ûsiv begê nîvcî hîştin, çimkî bi çemê Erez va welat perçe bû û li wî berî çêm êdî Ermenîstan tunebû. Êzdîyên bi serokatîya serekeşîrê xwe Ûsiv beg jî mînanî bi hezaran mihacirên ermenî mecbûr man xwe li çemê Erez xin, li vî berî çêm – li deşta Araratê û warên din bihêwirin. Ew bi gelek merivên xwe va li gundê Şamîramê bi cî bû, bangî wan dikir dernekevine dijî dîwana teze, hela di ser da jî, alî wan bikin bona şênkirina welêt, bona malhebûna gund pêş bikeve, sîstêma

xwendinê bê avakirinê. Lê tu karekî, ku wî û dîwana nû bi hev ra bikira, nemabû. Ewana jî di hindava xwe da te digot qey serekeşîrê xwedîyê hurmeta pir ne didîtin.

Dema sala 1923an hemcivîna êzdîyan ya nû pêk hat, dîsa Ûsiv beg bîr neanîn. Careke din derheqa wan pirsgirêkan da xeberdan, ku berê îdî behs kiribûn, lê vê carê bi îdêologîya Sovyetî. Te digot qey ew pirs berê nehatibûn minaqeşekirinê. Û wîya tu caran bîr ne anîn. Hela di ser da jî, buxdan avîtine wî û di dawîya sala 1929an da ew mehkeme kirin û sirgûnî Kyeverê kirin.

Ûsiv begê xwedîyê zanebûn û cêribandinên pir heta sala 1929an, ango heta sirgûnkirina wî, derc dikir, ku êdî wê ji destê wî neyê "zirarê" bigihîne milet û xwe, eger xwe li riya bi destî zorê îzolekirinê bigire, lema jî ew merivê mezin xwe li riya gundê Şamîramê girt û li wir wek merivekî sade jîyana xwe berdewam kir. Lê berê gelê êzdî timê jî li serekê xwe bû, bi kêmanî di pirsên eşîretê da nikaribû bêxem bûya û ev yek ne bi dilê desthilata komarê bû. Hilbet, ne bi dilê desthilatê bû, ku qedirê Ûsiv begê nav milet da pir e. Û nikaribû qedirê wî bilind nîbûya, çimkî miletê ji êla Hesinîyan rind zanibû ku çi jî bûye, serekên wan herdem jî li rex gelê xwe bûne.

Sirgûnîya wî ne zêde zehmet bû, lê karmendê milet û dewletê ji her karî der mabû, ew bêhurmet kiribûn jî, lê ewî ji miletê xwe ra digot, ku hînî vî halê xwe yê teze bibin, sebir bikin. Li vira jî di nava demeke kurt da ji alîyê binecîyên Kyeverê da hate hizkirin, çimkî ew jî ji welêt mihacir bûbûn û derheqa eşîretê û serekeşîr da gelek tişt bihîstibûn. Nav û dengê wî gihîştibû vira jî. Merivan zanibûn, ku ew kesekî xwedîyê jîyaneke mêrxasîyê ye û ewledê layîq yê miletê bira ye û ew yekî berbihêr û dilovan bû.

Piştî du salan di sirgûnîya azad da ma, wî cîguhastî hebisa Rewanê dikin û 8 mehan li wir dimîne. Di havîna sala 1932an da wî azad dikin. Ûsiv beg vedigere gund. Yek ji kesên wan çaxan bi bîr tîne: *"Bi siyarî hate gund, çiqas êzdî hebûn, hatin dîtina wî. Her kes derheqa rewşa wî da difikirî. Em biçûk bûn, me nizanibû ka ew*

merîkî çiqasî mezin e, çi emirekî dagirtî derbaz kirîye, beg çiqas karên baş kirine. Rûyê wî mînanî rûyê milyaketan bû, rengê wî, bedewîya wî cuda bû. Wê rojê ewî gotibû, ku Axasî Xancyan alî wî kirîye, ku vegere mal".

Sirgûnîyê, hebisê û ya sereke, rewşa wî ya ruhî êdî tesîr li wî kiribûn. Ewledê mezin yê gelê êzdî û dostê gelê ermenî yê ji dil bi cansaxîya xirab va ber bi kalbûnê va diçû, 65 salî jî tunebû. Sala 1934an, rojeke zivistanê, 12 ê çileya paşin ew merivê mezin ji vê dinyayê bar kir, û pey xwe ra ya here ferz hîşt – navê xwe. Cinyazê wî li goristana Şamîramê hate definkirin û tenê sala 1982an firsend kete kurê wî, ku li ser mezelê wî heykelê wî çêke. Piştî mirina Ûsiv beg mezelê wî bû wek ziyaretekê, çimkî merivê herî bi nav û deng di nav milet da ew bû – Ûsiv begê Têmûryans. A ji kesên ha ra dibêjin – nemirîya piştî mirinê. Ew nemir ew kes e, ku ji Ermenîstanê hiz kir, temamîya emirê xwe bi prînsîpa "Boy navê Ermenîstanê kar kir". Û îro temîyên wî gerekê derbazî nisletan bin. Di vî karî da rojnamevanê ji wext zûtir rehmetlêbûyî Manûk Mûradyan karekî baş kirîye, yê ku bi alîkarîya du zuretên Ûsiv begê - Wezîr û Bedo Ûsûbyanan du pirtûkên gelekî baş çap kirine, ku derheqa jîyan û karkirina Ûsiv beg da nin.

Îro jî Şamîram gundê zuretên wî ye. Nevî û nevîçirkên wî li vira dijîn. Li vira li her deran rêça wî xuya dike. Û her tiştê, ku Ûsiv beg bîr tîne, li vira ziyaretî ye.

Ji bext ra, malbeta Ûsiv begê per vedaye. Bona merivên wî dijwar bû neferan bijmêrin: gihîştine heta 500î. Hilbet, îro ne hemû li Şamîramê dijîn, lê di ku da jî herin, yek e, ew di salê da mehekê hêsabûna xwe li Şamîramê dibînin. Îro nevîyê Ûsiv beg, kurê Elîxan - Mecîd begê 84 salî karê serekeşîrîyê berdewam dike. Ew bi xwe dibêje, ku ew karê serekeşîrîyê berdewam dike, ku ji nislekê derbazî nisleke din dibe. Dibe di van demên nû da karê wan guhêrîye, lê ya sereke û hîmlî wek berê aştî, hogirtî, rehetîya di nav milet da ne, hilbet, dostanîya bi gelê bira - ermenîyan ra jî.

Bona me êzdîyan edet xwedî hêzeke xurt e. Wisa xuya ye, ku

di demên me da tu kes hewcê serekeşîrtîyê nîne. Lê ne wisan e. Nûnerên miletê me hertim jî hewcê temî û şîretên mezinên miletê xwe û merivên ruhanî ne. Îro serekeşîrê Hesinîyan Mecîd beg e, merivekî xwey qedir û hurmet. Ez zanim, ku îro jî nûnerên gelê min bi pirsên cuda-cuda va berê xwe didine wî, bona di nava qebîlên eşîretê da hertim aştî û edilayî hebe. Û Mecîd beg jî, ku di emirê xwe da mezin e, borcê xwe dihesibîne, ku bi merivan ra xeberde, qise bike, pirsan minaqeşe bike, wextê lazim be, dikare here nav milet, bona dilsarî di nav milet da tunebe.

Îro çi ku bi navê Ûsiv begê ra tê girêdan, tiberk e him bona şamîramîyan, him jî bona wan hemû kesan, ku têne warê wî, ku li wir di salên 15-20an yên sedsala buhurî ne tenê êla Hesinîyan ya bi serkarîya Ûsiv beg saz bû, lê usa jî qebîlên din ketine navê. Hêvî û gumana wan Ûsiv beg bû bi fikirên xwe yên fîlosofî û berfireh va.

Bîranîna Ûsiv begê li Şamîramê zindî ye. Her roj, dema şagirt diçine dibistanê, li rex heykelê ku sîmvola dostîya Ûsiv begê û Komîtas e ra derbaz dibin. Li vira her zarokek ne tenê derheqa wê dostanîyê da rind zane, lê usa jî hewil dide sazbendîya Komîtas rind fem bike.

Di nav êla Ûsiv begê da pevguhastina neslan ji demên gelek dûr tên. Ew qedir, hurmet, xêrxwazî ji neslekê derbazî nesleke din dibe, bûye cûrê jîyana wan. Di vî karî da kurên Mecîd beg – Wezîr û Bedo nimûne nîşan didin.Bi alîkarîya wan pirtûkên derheqa Ûsiv begê yên bi zimanên ermenî û rûsî çap bûne. Bi hereketê wan bû, ku heykelê Ûsiv beg, ku Sêrj Mêhrabyan çê kirîye, di nav rêzeheykelên Sarderavê da ne.

Hilbet, zureta Ûsiv begê dixweze zêde tiştan bibîne, ku wê mecalê bide navê serekeşîrê 26an bilind xwey bikin û derbazî nesiletan bikin. Wek ku ew dibêjin, 70 salan derheqa mêrxasên wan – Ûsiv begê, Cangîr axa û yên mayîn da bêdengî hebûye, lê niha dxwezin, ku derheqa wan da zêde tiştan bizanibin, usa jî karê wan yê bona rizgarkirina axa ermenîyan da qîmet bikin. Ne axir ewana mêrxas û efatên rasteqîn in.

Malbeta Ûsiv beg malbeteke giran bû. Heft zarên wî hebûn, du kur û pênc qîz. Nuxurîyê wî, ku li Înstîtûta Moskvayê ya zimanên Rohilatê ya ser navê Lazaryan da xwendibû, di paşdemê da dewsa bavê xwe girt, zarên mayîn jî merivên wisan in, ku karekî mezin dane warên xwe. Elîxan beg merivekî pêşketî û zane bû. sala 1936an wî jî sirgûnî Sîbîrê kirin.

Kurê Ûsiv beg yê dinê – Qulîxan, birine şerê Wetenîyê yê Mezin û ew li Kêrçê, di nava pareskerên ermenîyan da şehîd ket. Elîxan ji eskerîyê birine nav leşkerên taxbûra pêşenîyê bona ew li desteya paletîyê-çêkirinê da qulix bike. Sala 1944an ew ji eskerîyê aza kirin û wê demê ew êdî 42 salî bû.

Piştî şer Elîxan bû serwêrê fêrma pezxwedîkirinê ya Şamîranmê. Ew sala 1959an, di 57 salîya xwe da wefat bû.

Ez wê jî bêjim, ku bîranînên min yên zarotîyê hene derheqa Elîxan beg da. Em li gundê Zvartnosê diman, ku ji Rewanê ne gelekî dûr bû. Dostanîyake Elîxan begê ya germ bi bavê min ra hebû, carina dihate mala me. Dema ew dihat, me zanibû, ku wê rojê mêvanekî meyî ezîz hatîye û me hazirîya xwe didît, texte rast dikir. Mêvanên me yên din jî hebûn, wek edet ji gund an jî ji gundên der-dorê. Sohbetên me gelek dirêj bûn, herdem hinek pirs minaqeşe dikirin. Ez rast bêjim, wan çaxan min fem ne dikir ka ew derheqa çi da ewqas qise dikin. Derheqa hal û wextê demên me da jî xeber didan, lê ew xeberdan rehet bû, zêde germ ne dibû. Tê bîra min, digotin çi bûye, bûye, niha me nakujin, lê em di nav tirs û xofê da nin. Wan çaxan Elîxan beg ji rojnameyên rûsî bi dengekî bilind tişt dixwendin û ji me ra werdigerandin. Me zanibû, ku wî li Moskvayê xwendîye. Paşê ez pê hesiyam, ku ew Înstîtûta ser navê Lazaryan ya zimanên Rohilatê bû. Min ew qedirê mezin jî didît, ku eşîra me di hindava wî da dîyar dikir. Her caran, gava Elîxan beg dixwest ji mala me here, bavê min digot, ku ji kûçê derbaz bike û bi otobûsê verêke. Dikana gund himberî rawestgeha otobûsê bû. Carekê, wexta min Elîxan beg verê dikir, wî ji min pirsî: "Kurê min, şîrinayî dixwezî?". Min serê xwe bir-anî, got erê. Em tevayî ketine

dikanê. Pakêteke mezin şîrinayî kirî. Ji şabûna lingên min erd ne digirtin û min derheqa verêkirina wî da ji bîr kir. Ew bi xwe çû, li otobûsê siyar bû. Bona min şîrinaya here tem û xweş ya Elîxan kirî bû, ku ez tu caran ji bîr nakim.

Bîranînên ha yên dilgerm hene derheqa Ûsiv begê û zureta wî da, çimkî bona wana tiştê herî ferz ew bû, ku karên baş bikin û rêçeke qenc bihêlin.

Pêwendîyên Ûsiv begê û tevaya binemala Têmûryansan li Surmelîyê bi mala Kanayanan ra di nava pêwendîyên dostanîyê da bûn. Kanayanan ji dewlemendên Îdirê bûn, merivne xwendî û zane bûn. Orta Ûsiv begê û Drastamat Kanayan gelek xweş bû. Ew dostanî ji bavên wan derbazî wan bûbû. Martîros û Hesen axa dostên hev yên nêzîk bûn. Li Îdirê ew gelek caran rastî hev dihatin, di şahîyên hev da hazir dibûn. Martîros axa hiz dikir ji Hesen axa ra bêje: "Gava Ûsiv bizewice, Dro gerekê serdewatîyê wî be". Ûsiv dibe bona wê yekê dereng – di 31-32 salîya xwe da - zewicî, ku bavê wî zû mir û xem-xerêqên malê ketibûn sitiyê wî. Lê serdewatî dîsa Drastamat Kanayan bû. Di paşdemê da ev dostanîya bi Kanayanan ra berdewam dibe. Li vira ez dixwezim di nav parantêzan da bêjim, ku eger li hinek bajarên Ermenîstana Rohilatê çend tiştên ermenî yên miletîyê mane, lê li Îdirê ne mabûn. Me xwest em hema xanîyên kevinare bibînin, lê me ne dît. Yan ew tunebûn, yan jî ewqas hatibûn guhartinê, ku rêça wan ne mabû. Lê bawer dikim, ku li wir rêçên mezinên ermenîyan û êzdîyan mane. Qesta min Drastamat Kanayan û Ûsiv beg in. Ew mezinên wisa bûn, ku gerekê ne tenê li Îdirê navdar bûna, lê usa jî gerekê karên mezin bikirana bona parastina xwexwetîya ermenîyan û êzdîyan, boy navê dostanîya wan ya herdemî.

Li Şamîramê serhatîyeke mînanî zargotina miletîyê tê bîra min. Di salên şerê Wetenîyê yê Mezin da binecîyê Şamîramê Mecîd Xûdoyan dîl tê girtin. Dro – Drastamat Kanayan bi zabitekî alman ra tevayî tê lagêra konsentrasyonê, ku dîl li wir bûn. Ew dibêje, ku hemû ermenîyan cuda bikin û bi cêrge bidine sekinandin. Mecîd jî

dikeve nava ermenîyan. Dro di nav cêrgeyan ra derbaz dibe, bi dîlan ra qise dike. Gava digihîje Mecîd, disekine û zûrbûyî li wî dinihêre. Dipirse:

-Tu jî ermenî yî?

Bersîvê dide, ku êzdî ye.

Vedibeşire, bi Mecîd ra bi zimanê wî yê dê xeber dide. Dipirse ka ji kîjan êlê ye?

Mecîd bersîvê dide:

-Ji êla Hesinîyan,- û di ser da zêde dike, ku axayê wan Ûsiv beg e.

-Wê demê kurên wî kê ne û navên wan çi ne? –Kanayan jê dipirse.

Mecîd cabên rast û bi hûrgilî dide, û Dro wî dike xizmetkarê xwe. Ew bi Dro ra dimîne heta azabûna xwe.

Dostanîya Ûsiv begê usa jî bi Pîrûmyanên bira, Garêgîn Njdêh, Andranîk, serkarên Komara pêşin ra hebûne.

Di wan dostanîyan da ewî hertim hewil daye alî pêşketina Ermenîstanê, mehkemkkirina pêwendîyên ermenîyan-êzdîyan bike, gelek caran miletê xwe û gelê xwe daye agahdarkirinê, ku tenê li Ermenîstanê dikarin xwexwetîya xwe û dêmê xwe yê miletîyê paqij biparêzin.

Demên buhurî jî dane xuyakirin, ku Ûsiv beg bi karkirin û temîyên xwe yên aqilmend va wan deman çiqas berbiçev ketîye.

Em gerekê derheqa wê dostanîyê da jî ji bîr nekin, ku di navbera Ûsiv beg û Cangîr axa da hebû.

Ew dostanî ne tenê ya qewimtîyê – xinamtîyê bû, lê ewana bi dinêdîtin, bawerî û armancên xwe va li ser rêyekê bûn.

Hema bi temî û şêwrên Ûsiv beg Cangîr axa derkete dijî çeteyên tirk û ji gefên wan netirsîya.

Hema wan deman jî dest bi dostanîya Cangîr axa û Zoravar Andranîk bû. Rasthatina wan ya pêşin di sala 1904an da qewimî bû, li gundê Hezeranê, li devera Wanê.

Merivên me yên di emir da mezin hertim derheqa vê rasthatinê da gilî dikin. Hilbet, ew rasthatina Zoravar Andranîk û Cangîra axa ya pêşin bû û herdu alî jî bi leşkerên xwe va hatibûn. Dibêjin, ku pêşda tu tiştek nehatibû plankirin. Lê her tişt ji ber xwe va bû. Li warekî bedew yê li gundê Hazaranê, ku gerekê ew rasthatin pêk bihata, desteyên Cangîr axa û yên Zoravar Andranîk ketibûne rêzê. Gava Cangîr axa çev bi Zoravar Andranîk ket, bi tilîya xwe leşkerên xwe nîşan da û got: "Evana leşkerên te ne, tu çawa bixwezî, emir bike". Kêfa Zoravar Andranîk ji vê gotinê hat, Cangîr axayê ji xwe 10 salan biçûktir hemêz kir û got: "Em ji vir şûnda birayên hev in... Leşkerên min jî yên xwe hesab bike". Pey vê rasthatinê ra tam hate femkirinê, ku eger sozê çiya jî bidin, hesab yek e, Cangîr axa wê li rex ermenîyan be.

Wî çaxî Cangîr axa xortekî serxweyî 30 salî bû. Dostanîya wan di nav gelek cêribandinan ra derbaz bû. Ewana hertim jî wek hevalên leşkerîyê û dostên baş man.

Merivên wê demê digotin, ku Cangîr axa hertim bi hisret rasthatinên xwe bi Zoravar Andranîk ra bi bîr dianî, xwesma rasthatina wan ya xatirxwestinê, ku di adara sala 1919an da qewimî. Andranîk ji Zangêzûrê hate Dêra Êcmîadzînê, çekên xwe teslîmî metranê hemû ermenîyan kir û bi 20 leşkerên xwe va çû Batimê, ji wir jî çû welatên dereke.

Cangîr axa wî çaxî li gundê Cercerîsê, li navçeya Elegezê dima. Axa zanibû, ku zoravar li Êcmçadzînê ye. Tê wira bona wî bibîne. Di hewşa dêrê da hev dibînin. Ewana bi hev ra dirêj qise dikin, dikevine nava bîranînan. Paşê Zoravar Andranîk dibêje:

"Ez diçim, wisa qewimî. Hisreta min di dilê xwe da diçim, tu rêyeke din nabînim. Ez zanim, ku tu dimînî û tu tiştekî din jî nafikirî. Ez bawer im, ku tuyê ber ecêbên paşdemê ber xwe bidî. Bi xatirê te, ez diçim, qederê ha li me pirsî, lê axa ermenîyan qewîn û qedîm biparêzî, ew hewcê wê yekê ye".

"Andranîk, qeder e, ku em – êzdî jî, bi birayên xwe yên ermenî ra bi reza Xwedê li vê axê hêwirîne û tu rêyeke me din tune. Ji vira

tenê bi destî zorê dikarin me – êzdîyan derxin. Ji vir şûnda wek te, welatê min ev axa biçûk e. Ez ji vira di tu cîyakî jî da naçim. Ez çawa dikarim merivan bi tenê bihêlim, yê ku bawerî bi min anîn û ji gundê Çîbûxlîya dûr yê nêzîkî Wanê hatin, li vir bi cî bûn?".

Du mezinên milet li ber hev sekinî demekê bêdeng man û hêsirên wan rijîyane ser sûretên wan. Tu kesî nedîtibû, ku ew bigirîn. Lê ew hêsirên xatirxwestinê bûn. Paşê Zoravar deste çeka giranbiha pêşkêşî Cangîr axa kir û ew ji hev qetîyan. Sed heyf, ew rasthatina wan ya kutasîyê bû.

Ew wê jî bêjin, ku dostanîya Zoravar Andranîk û Ûsiv begê jî germ bûye. Ewana carina rastî hev dihatin, gelek caran li gundê Eslanlûyê, di destpêka sedsala buhurî da. Heta dibêjin, ku rasthatina Zoravar Andranîk û Cangîr axa ya pêşin bi dilxwezî û teşkîlkirina Ûsiv begê qewimîye. Lê ez dixwezim pêwendîyên Ûsiv begê, Zoravar Andranîk û Cangîr axa bi nav bikim wek sêgoşeya dostanîyê, ku bi ruh û giyana xwe va heta îro jî geş maye di nav gelên me da wek nîşanên merivayê yên here baş – nîşanên welatparêzîyê, milethizîyê û hûmanîzmê.

Bona me hewaskar bû em bi dû rêça Cangîr axa da herin û gundê Cercerîsê (niha navê gund Çarçakîs e) bibînin. Di rê da em înformasyonên di bin destên xwe da dinihêrin. Warekî kevinare ye, di gund da kelefeyên dêra ermenîyan ya sedsala 5an heye. Ew li berpala çiyayê Pambakê ye, fêza çemê Cercerîsê da. Ew war li ser bilindaya 2180 mêtran ser dereceya behrê ra ne. Em çiqas ranêzîkayî dikin, ewqas dêmê vî warî tam tê ber çevên me. Dibe hema ev bedewî bû, ku di salên 1918-19an da Cangîr axa xwe li vira girt û bi malbeta xwe û bi eskerên xwe va 6 mehan li vira ma. Gund bi hurmetgirtineke mezin va mêrxasê xwe qebûl kirîye. Binecîyên cî – ermenî û êzdî di hindava wî da xemxur û dilovan bûne.

Ji bext ra, heta niha jî ew xanî hatine parastin, ku Cangîr axa tê da maye û pez-dewarên xwe tê da xwedî kirine.

Ew mala ji xwelîyê û keviran çêkirî êpêce mezin e, çend ode

tê da hene. Wek ku di wan salan da bû, li rex malê goma pêz û merek hebû.

Malxwêya malê, ku di dema seredana me li wir bû, got, ku ewana zanin, ku ew xanî yê merivekî navdar bûye û dibe hema bona wê yekê ye, ku naxwezin wî xanîyî xirab bikin û yekî teze çê bikin.

-Carinan tên, dipirsin, em jî testîq dikin,- jinik dibêje.

Bedewîya Çarçakîsê di hêla xwe da, lê dibe sebebeke mayîna Cangîr axa li vira ew bû, ku merivên wî li vir diman, ku ji gundê Çîbûxlûyê, Ermenîstana Roavayê hatibûn vira hêwirîbûn. Dibe qumandarê ji şeran westîyayî hewcê tebîyeta bedew û pêwendîyên bi merivên xwe ra bû? Çawa li her warekî, li vira jî em behsa dostanîya ermenîyan-êzdîyan dikin, xwesma dostanîya Cangîr axa û Zoravar Andranîk.

Min hela di zarotîyê da derheqa wê yekê da bihîstibû, lê herdem jî li rex navê Cangîr axa. Di salên Sovyetê da, ku navê herduyan jî meriv dikare bêje qedexe bûn, di malên êzdîyan da hertim bi dizî navê wana anîne ser zaran. Min dîtîye, ku di malên êzdîyan da xalîçeyeke bi wêneyên Zoravar Andranîk û Cangîr axa dardakirî bûne. Em dûr neçin, gava em çûne Çarçakîsê, merivên Cangîr axa xalîçeyeke wisa derxistine derva û gotin, ku ew tiberka ocaxê ye û wêya bi ziyaretî xwey dikin. Û di gelek malan da wisa bû. Gava di fkira me da daxweza li ziyareta me ya Aknalîçê heykelê dostanîya ermenîyan-êzdîyan saz bikin, bêy şikberî min got, ku li rex heykelê sereke wê heykelê Zoravar Andranîk be, bi wergirtina xwe ya leşkerîyê û mêrxasîyê va. Ez bêsebir li bendê me, ka heykelterêş Gêtîk Baxdasaryan wê heykelekî çawa çêke, lê ez wisa texmîn dikim, ku ewê bi hêz, kubar û mêrxasî be.

Heyf, ku ew dostanîya di navbera Andranîk û Cangîr axa da hebûye, heta niha jî tam nehatîye eyankirin.

Gerekê jîyan û karkirina mêrxasên me hertim ji nisletên hatî ra bêne şirovekirin. Di salên Sovyetî da ne dihîştin em mezinên miletên xwe, mêrxasîyên wan baş nas bikin. Û em, çiqas ji destê

me hat, me di salên paşwextîyê da mezinên miletên xwe baştir nas kir. Lê jîyan û karkirina wan mêrxasan gerekê bibe kitêbeke taybet. Rast e, niha sedsala 21ê ye, lê bêy welathizîyê nikarî welatê xwe û axa xwe biparêzî, xwe bidî naskirin, bi ruh û can bi miletê xwe ra bî. Sala tê, sala 2015an 150 salîya Zoravar Andranîk e. Eva gerekê bibe firsendeke baş bone em careke din vegerine ser pirsên jîyan, milethizî û welatparêzîya wî.

Van rojan, dema em 140 saliya Cangîr axa û 145 saliya Ûsiv begê didine kivşkirinê, em dibînin, ku malûmatîyên derheqa wan da ne zêde ne. Eger derheqa Ûsiv begê da kêm-zêde malûmatî hene, lê derheqa Cangîr axa da malûmatî ne pir in. Çend gotar hene û xilaz. Ez fem dikim, ku niha kesên di çaxê wî da ne mane, lê gava bernameya "Kartsik" eva fîlma dikişand, wana gelek tişt kişandin û di nav wan da gelek malûmatîyên kêrhatî hene.

Mesele, min bi hewaseke mezin va guh da gotinên bûka Cangîr axa – Gevezê, xwesma derheqa wê karkirinê da, ku ewî piştî li Ermenîstanê bi cî bû, dikir, meriv dikare bêje, ku wî wan deman di gundê Çobankareyê, li navçeya Armavîrê da hema bêje karê serekeşîrîyê dikir. Li vira ew mecbûr bû li rex binecîyan be, dema lazim be alî wan bike û pişta wan bisekine. Û derheqa mayîna wî di sirgûnê da jî malûmatî kêm in. Derheqa tevbûna wî di şerên Serderavê û Baş-Aparanê da jî wisa. Dîrokzanên, ku di fîlmê da hatine pirsyarkirinê, îzbatî û tiştên bûyî yên hewaskar dibêjin. Lê, telebext ra, ev hemû nehatîye berhevkirin, tamkirinê û min dixwest, ku pirtûkeke bi serecem û têr-tije derheqa Cangîr axa da bihata nivîsar, ku xwendevaan bikaribûya tevaya karê wî fem bikira û bianîya ber çevan. Lê derheqa malbeta wî, xeysetê wî da dikarin ew bîranînên kesên zindî kardar bin, ku niha dijîn û li rex me ne, mesele, kur, qîz, nevî û merivên wî. Ez bawer im, ku dîrokzan wê lêkolînên kûr û dûr bikin, îzbatîyên arşîvê derxin, li ser bisekinin, lê hûr bin, ku rûpelên dîrokê yên nenas rastîya wê dostanîyê derxine meydanê.

Em vegerine ser Aparanê.

Em xatirê xwe ji gundê di bin dîdema çiyayê Elegezê da pervedayî dixwezin, bi fkiran hewil didin hûrgilîyên şerê Baş-Aparanê bi bîr bînin. Hela di ser da aparata opêratorê fîlma me çiya û banîyan, deştan, heta warên jîyînê dikişîne û li wir rêçên wan merivan digerin, ku bi axa Ermenîstanê ra amin in, diha rast îz û toza wan bi sedan siyarîyan, ku di nav tirkan da tevlihevî çê kirin û serketin ji me ra anîn. Cangîr axa binecîyên gundên dorê jî kire nava şêr, yên ku alî wî kirin û di dema êrîşên şevê da saw û xof kirine dilê dijminan.

Ya hewaskar ew e, ku kesên behsa wî dikirin, digotin ku bi dostanî ji Cangîr axa ra digotin "kuro" û destnîşan dikirin, ku ew gelek caran wek şervan, stratêg, bi hêz û xurt berbiçev ketîye û kesekî wisa bûye, ku hertim jî hatîye hewara hevalan.

Dema Cangîr axa ser demekê li Cercerîsê dima, bi rêberîya siyarîyên xwe va dikete ser riya Şamîramê, bi ruh û can dixwest serîkî li yek ji serekên milet Ûsiv beg bide, ku dost û xêrxwazekî wî bû. Bona wî ew rasthatin pir giranbuha bûn, û tenê wan deman ewî li mala xwe ya li Cercerîsê rehetîya xwe didît. Di paşdemê da, gava nêzîkî Garnîyê an jî li deşta Araratê dima, firsend ji destê xwe bernedida û dihate Şamîramê bona seredana Ûsiv begê bike. Xwesma wê demê, gava pêşî wî sirgûnî Zangêzûrê – Ermenîstana çiyayî, paşê jî di mehên hezîran-tîrmehê da sirgûnî Farizistanê kiribûn, Ûsiv beg di meha îlonê da dîsa vegerîyabû Ermenîstanê, çimkî ewî derc kiribû, ku îdî karê wî li xerîbîyê nema û nikare miletê xwe tenê bihêle. Ewana xên ji ku hevalên hev bûn, usa jî merivatîya wan bi hev ra hebû. Jina Cangîr axa ya dudan – Cemîle, birazîya Ûsiv beg bû. Gava Cemîle birayê xwe yê genc mirî dibîne û ji nişkêva bi xwe jî dimire, bi reza serekeşîr, meriva wî ya nêzîk Zadînê didine Cangîr axa, bona dostanîya wan tu caran raneweste û zarên wî sêwî nemînin.

Ji bextê min ra, min karibû rastî zureta ewledên ji her sê jinên Cangîr axa bûyî bêm. Ewana li Armavîrê, Rewanê dijîn, nav û hurmeta kalikê xwe bilind xwey dikin. Hela di ser da jî, kurê

Cangîr axa – Sûrên niha jî sax e û li Rewanê dijî, yek jî qîza wî – Asya, ku li gundê Zartonkê, navçeya Armavîrê dimîne. Ji min ra li hev hatîye nevîyên wan jî bibînim. Li vira dibêjin: merivne qenc in. Rasthatina min ya axirîyê bi Sûrên ra ber heykelê bavê wî – Cangîr axa bû, ku li Nor Norkê ye. Rastîyê jî, ew heykelekî layîqî mêrxas e. Ez zanim, ku her sal berevî vira dibin, bîranîna Cangîr axa didine kivşê. Sûrên di emir da mezin e jî, lê bi her tiştê, ku bi mehkemkirina dostanîya ermenîyan-êzdîyan va girêdayî ye, şa dibe, çimkî ew daxwweza Cangîr axa bû jî. Û ew gelekî şa ye, ku li ziyareta Aknalîçê wê heykelê bavê wî daynin. Çend nevîyên Cangîr axa li gundê Zartonkê, navçeya Armavîrê dimînin, merivne bi keda helal in, bi xûdana enîya xwe nanê xwe dixun, bi av û axa xwe va girêdayîne. Li gund gelek kes nizanin ka ew nevîyên kê ne. Di van hemû malbetan da bi ziyaretî navê kalikê xwe bîr tînin, yê ku payê emirê xwe yê pirê li rex warê stasyona atomê derbaz kirîye. Bûka Cangîr axa – Gevezê digot, ku Cangîr axa merivekî serbilind, bedew û mêrxas bû. Carina jimara mêvanên wî ewqas pir dibû, ku li odeyên mêvanan da carina 45-50 cî-nivîn radixistin. Gorî bûka wî, ji warên cuda-cuda dihatin cem wî û derê wî bona gişkan vekirîbû: her kesî sitar dikir, nan û av dikir, guh dida kul û derdên wan, paşê verê dikir. Çiqasî em texmîn dikin, ne tenê ji Ermenîstanê, lê wisa jî ji Gurcistanê, heta sînorên Tirkîyê jî derbaz dibûn, dihatin, çimkî wana zanibû ku ew merivekî rast e. Di çend cîyan da warên wî yên hêwirînê hebûn. Li der û dorê Garnîyê jî hebû, xwesma di mehên havînê da diçû wir. Havîngeha wî jî li wir bû. serekê milet nikaribû rehet bisekinîya, ew jî wî çaxî, gava rewşa sîyasî û navnetewî jî ne rehet bû.

Mezinên milet, ku piştî Sovyet hat ser hukum, mixabin ji desthilatê hatine dûrxistin, nikaribûn rastî hev nehatana, bîranînên xwe negotana. Û rojên buhurî jîyanek bû bi têkoşînê û mêrxasîyê va dagirtî. Meriv dibêje qey welatparêzên milet hinek pirs çareser kiribûn, nûnerên miletên wan, ku bi hev ra bûbûn dost û bira, îdî li vî berî Erez hêwirîbûn. Ji ocaxa xwe dûr bûn, lê îdî tirs li ser wan

nemabû, li cîkî rehet bûn, xofa bi destê tirkên decal bêne kuştin tunebû.

Lê dîwana Sovyet her diçû zêde derdikete dijî qîmetî û destkeftîyên berê. Zordarî her diçû zêde dibû, lê gelên ermenî û êzdî wek berê qedir û hurmeta Ûsiv beg û Cangîr axa digirtin. Lê di nav merivên der û dora wan da merivên wisa peyda dibûn, ku hewil didan îzbatîyan bigerin derheqa wê yekê da, ku ewana xudêgiravî di nav êzdîyên Ermenîstanê da karên dijî şorişê pêk tînin, dixwezin koma dijî şorişê ya têrorîstîyê saz bikin. Xudêgiravî sala 1927an li gundê Şamîramê civînek hatîye derbazkirin, ku Cangîr axa jî tevî wê bûye, koma dijî şorişê hatîye sazkirin û armanca wê ew bû, ku karê dijî dîwana Sovyetê bike û otonomîya miletîyê bide sazkirinê. Usa jî dihate destnîşankirinê, ku Ûsiv beg Têmûryans, Egît beg û yên mayîn jî tevî wê civînê bûne.

Tiştên ha wan deman dikaribûn hebûna. Dîwana teze nikaribû tehmûl bike, ku li rex wan merivekî ji alîyê milet da qedirgir û hizkirî – Cangîr axa heye. Lê Cangîr axa jî, Ûsiv beg jî rind fem dikirin, ku çiqas ji dest wan tê, gerekê xwe dûrî wan xin û usa jî dikirin. Lê wana tiştek nikaribûn bikirana: serekeşîr nikaribûn xwe dûrî milet, xem-xerêqên wan bigirin. Û ev yek ne bi dilê teşkîletên taybet bû. Him Cangîr axa, him jî Ûsiv beg didîtin, ku xeleqa li dor wan tê tengkirinê, lê serokên milet nikaribûn xwe ji milet bêrî bikirana. Cangîr axa ev hemû dabû ber çevên xwe, lema jî her carê li cîkî dima. Lê ew jî bêfeyde bû...

Ev hemû dida xuyakirin, ku wextê sirgûnkirina Cangîr axa û Ûsiv beg, dûrxistina wan ji miletê hizkirî nêzîk dibe, lê Axasî Xancyan hewil dida pêşî li van hemû tiştan bigire, çimkî ewî zanibû, ku herdu jî dost û xêrxwezên gelê ermenî yê herî nêzîk in. Û gava Axasî Xancyan texmîn kir, ku îdî hew dikare pêşî li ber makîneya Sovyet ya xurt bigire, ji wî ra li hev tê usa bike, ku Cangîr axa û Ûsiv beg sirgûnî yek ji warên sirgûnê yê li ser axa Ermenîstanê – Kyeverê bikin.

Li vira di hindava ewledên hêja yên gelê êzdî û dostên ermenî

yên ji dil da xêrxwaz bûn, lê milet jî qedir û hurmeta wan digirt. Hela di ser da, kurê Cangîr axa yê ji jina 3an – Sûrên sala 1937an hema li Kyeverê ji diya xwe bû. Piştî kuştina Axasî Xancyan Cangîr axa gerekê xwe li riya sirgûnîyê ya gelekî dûr bigirta, ber bi Rûsîyayê. Ewî sirgûnîya xwe li warê Mênsêrê, navçeya Krasnoarmêyskîyê, herêma Saratovê derbaz kir. Li vira ermenîyên sirgûnkirî jî hebûn, du êzdîyên xort jî hebûn – Evdî û Waso. Wana karê malhebûna gund dikir, carina erqên biçûk dikolan. Derheqa van hemû tiştan da Vahan Manûkyan dibêje, ku ew jî li sirgûnê bû. Ewî 11ê çirîya pêşin sala 1991ê li rojnameya "Daşnaksûtyûn" bîranînên xwe yên derheqa Cangîr axa da çap kiribû. Bixûnin, ka ew çi dinivîse:

-Payîza sala 1943an bû. Em bi koma xwe va diçûne deştê, bona kar bikin. Me dengê gulleya tivingê bihîst. Koma me sekinî. Xortekî genc ketibû ser rê: leşkeran ew kuştibû, çimkî ji cêrgê derketibû bona gula berbiro biçine. Cangîr axa gava ew yek dît, got: "Ew leşker ji tirkan xirabtir in, lawên min, hevza xwe ji wana bikin".

Min biryar kiribû ji warê sirgûnîyê birevim û min derheqa wê yekê da ji Cangîr axa ra got. Ewî şêwreke ha da: "Tuyê ji dest vana di ku da birevî? Wê te bigirin û di cî da gulle kin". Min guh da wî û êdî tu caran derheqa revê da nefikirîm.

Meha çirîya pêşin ya sala 1943an bû, rojeke payîzê ya sar, em li deştê dixebitîn. Min hinek garis dest xistibû. Min nava beroşê da xwerin çê kir û ber Cangîr axa pêşnîyar kir, ku bixwe. Ewî ancax du kevçî xwer û got, ku bêkêf e, medê wî diêşe. Em hatine warê xwe, cîyê sirgûnîyê. Berbangê dema diçûme xebatê, min berê xwe da wî. Ew îdî nikaribû bixebitîya. Li odeya xwe ma. Şik kete dilê min, min destê wî guvaşt û derketim derva. Rasthatina me ya kutasîyê ev bû. Wî biribûne nexweşxanê û ew li wir wefat bûbû. Min hevalê xwe yê baş winda kir".

Cangîr axa li goristana biratîyê binax kirin, lê wek ku dîtindar dibêjin, wî wisa çal kirine, ku piştî salan bikaribin meytê wî vegerînine Ermenîstanê, wek ku ew yek ji bo hevalên wî yên

leşkerîyê – Andranîk, Dro – Drastamat Kanayan, kirin. Ew jî wê demê, ku îsal 140 salîya bûyîna Cangîr axa û 70 salîya mirina wî temem dibin. Hêja ye, ku ew piştî 7 deh salan vegere wê axê, ku bona azadîya wê têkoşîn da û bû mêrxas. Em careke din bikine bîra wê, ku îsal bona Ûsiv begê jî saleke xêrê ye, ew îdî 145 salî ye û 80 salîya mirina wî temam dibe.

Îro ji zureta Cangîr axa kêm kes li Ermenîstanê ne. Pareke wan li welatên dereke ye – li Rûsîyayê, an jî li welatên Ewropayê. Berî gişkan em rastî kur û qîza Cangîr axa hatin. Sûrên 77 salî ye, Asya 86 salî ye. Sûrên bavê xwe ne dîtîye, lê Asya bavê xwe rind bîr nayne. Diha rast, gava kurê wî bûye, ew li sirgûnîyê bûye. Rind nayê bîra Asyayê, lê dibêje, ku tilîyên destên wî dirêj bûn û yekser tilîyên xwe jî nîşanî me dide. Ewana derheqa bavê xwe da ji diya xwe – Zadînê, bihîstine, ku jineke xanim-xatûn e, û ewê bi "dijminê gel" Cangîr axa ra tevayî hemû zehmetî kişandîye. Gava ew derheqa mêrê xwe da xeber dide, dilê wê rehet dibe, û dayka Zadîne tu firsend ji dest bernedida bona jîyan û berxwedana mêrê xwe bigihîne neslên tên. Heyf, ku ew her tişt nehatîye nivîsar. Sûrên, xûşkên wî Asya û Refo ew demên buhurî yên bi teşqeleyan, neheqîyan va tije ne dîtin.

-Ne tenê bavê min, lê diya min jî mêrxas bû,- di dema sohbeteke me da Sûrên got,- em bi serhatîyên derheqa bavê xwe da mezin bûn. Em şaş diman, gelo diya me naweste, ewqas derheqa bavê me da xeber dide. Paşê me ruhê dayka xwe ya Zadîne fem kir, ku yek ji nevîyên ewledekî miletê me yê hêja Ûsiv beg bû. Dayka me, xwesma di salên emirê wê yên xilazîyê da, hertim bi mêrê xwe – Cangîr axa ra "xeber dida" an jî bê sekinandin derheqa wî da qise dikir. Hizkirineke mezin ber bi bavê me hebû. Dayka me ew hizkirin û qedir derbazî nav me jî dikir. Û dîdema bavê me berî gişkî bi riya dayka me nav me da hatîye parastin. Hilbet, dayka me zehmetîyên mezin kişandin, lê tu kes haj ji êşa wî tunebû, wê tu caran ne dida xuyakirin. Hela di ser da, bona wê eyd bû bi riya Şamîram-Kyeverê ra here-were, pareke wê rê jî meriv gerekê peya biçûya.

Îro li Rewanê şadirwana avê ya bona bîranîna Cangîr axa ya bi nexş-nemûrên bedew va heye. Her sal, 28ê gulanê, êzdî û ermenîyên Ermenîstanê berevî vira dibin bona bîranîna roja serketina di şerên Serderavê û Baş-Aparanê da, rehme ji mêrxasan ra dixwezin, di nav wan da ji Cangîr axa û Ûsiv beg ra jî.

Bavê Sûrên nayê bîrê, çimkî ne dîtîye. Lê xûşka wê – Asya ew dîtîye, ku niha îdî 86 salî ye, malxwêya mala giran e. Hilbet, niha zehmet e bi wê ra li ser gelek pirsan xeberdin, û qîza wê – Laûra tê hewara me. Asya dayka me digot, ku bavê wê yekî bejinbilind, dest û pê, qeşeng bû, tilîyên destan dirêj bûn. Zêde ew roj bi bîr dianîn, ku newestîyayî bû û wana hemêz dikir, quloz dikir, hisreta xwe ji wan distend û digot: bira zarên min xweş bin.

-Di mala me da hertim navê Axasî Xancyan dihate ser zaran û ew nav ber dilê me gelek ezîz bû. Û hûn zanin bona çi? Ew xwedî li bavê min derdiket, hertim ji zêrandinan xilaz dikir, ne dihîşt wî ji Ermenîstanê derxin. Wî ermenîyê mezin rind zanibû, ku bavê min bona miletên me çi kirîye û ew yek dida ber çevan û jê ra dibû alîkar. Dema rojên zordestîyê yên giran hatin, bona bavê min sirgûnî Ûrisêtê nekin, ew şande Kyeverê – gundê Sarûxanê.

Bona malbeta me salên dijwar bûn, lê hêvî hebû, ku bavê me wê vegere mal. Xancyan kuştin, û me fem kir, ku wê bavê me sirgûnî warekî gelekî dûr bikin, û wisa jî bû, ew birine Saratovê. Em bi diya xwe ra li gundê Şamîramê diman, mala xalê xwe – Egît begê. Kalikê meyî Ûsiv beg jî mir, li sirgûnîyê û hebisê nexweş ketibû. Piştî bavê min sirgûnî Saratovê kirin, em cîguhastî Şamîramê bûn û herdem ji Rûsîyayê hîvîya malûmatîyan bûn. Em wisa bê bav mezin bûn, paşê hevalên Cangîr axa yên sirgûnîyê ji me ra gotin, ku bavê me mirîye.

Hûn dipirsin, ka karê min çi bûye? Ez heywanxweykir bûm. Ez hertim li çiyan bûme. Hertim jî qedirê me wek zureta Cangîr axa girtine. Ne tenê mala me da, lê usa jî nava miletê me û ermenîyan da me derheqa mêrxasîya bavê xwe da herdem bihîstîye û pê ra şa û firnax bûne.

Pîrka Asya hewil dide hûrgilîyan bike bîra xwe. Laûra hewil dide hinek tiştan bike bîra wê, lê gelek tişt îdî ji bîrê çûne. Hela di ser da jî, pîrika Gevez jî tê hewara Asyayê, ku jina birê Asyayê ye û îdî 93 salî ye.

-Ez Xaylaz im, xanima kurê Cangîr axa yê ji jina pêşin,- ew dibêje. –Cangîr axa piştî mihacirî Ermenîstana Rohilatê bû, li gundê Çobankerayê, li deşta Araratê bi cî bûbû. Malbeta wî mezin bû. Di odeya wî da bi carekê va ji çilî heta pêncî dest nivîn dihate danîn. Êvaran ewqas meriv, usa jî mêvan berevî vira dibûn, ku tu caran ji vê malê kêm ne dibûn. Merivekî mêvanhiz bû, di hindava her kesî da guhdar bû, gelek caran merivên dîwanê jî dihatin vira. Tu kes ji bal wî nerazî dernediket. Ji her kesî ra her tişt şirove dikir, dida bawerkirinê, eger ji dest wî bihata, ji sedî sed alî dikir, ew jî wê demê, ku mecalên wî jî ne zêde pir bûn. Ew çiqas dilrehm bû, ewqas jî berk bû. Wisa qewimî, ku kurê wî wexta bi min ra zewicî, qayîlîya bavê xwe ne sitendibû. Bi wê sebebê pêşî di hindava min da sar bû. Lê gava dît, ku ez gelek xebathiz im, xemxur û guhdar im, wî helwesta xwe di hindava min da guhart. Jina wî, ango xasîya min – Almast, gelek dilovan bû, morî-tiberkek ji min ra hîşt, ya ku heta niha jî nexweşan qenc dike. Çiqas sext, ewqas jî berbihêr bû, yeke ser xwe bû: pê ra digîhand rojê hezar şuxulî bike. Yeke gelekî rastgo û ciddî bû. Tu kesî ji bîr ne dikir. Hemûyan nav bi nav zanibû, koka wan zanibû, heta navên zaran jî. Giregirên cuda-cuda dihatin cem wî. Tu kesî ji me ra ne digot ka ew kê ne, lê me ji wergirtina wan fem dikir, ku giregir in. Hurmeta her kesî digirt, pez serjê dikir. Gelek caran behsa Xetîfê bavê xwe û gundê Çîbûxlûyê dikir. Behsa şênahîyên xwe, zevîyên xwe dikirin. Li vir jî nan diçand. Digot – nanê te hebe, tuyê bijî. Timê jî alî feqîran dikir, ermenî bûya, êzdî bûya, hesab yek bû. Digot – kê tê mala me, gerekê destevala neçe. Me nan dida hinekan, goşt û den jî dida hinekên din. Merivekî xebatkar bû, hiz ne dikir, ku yek betal rûdinişt. Her kesî ev yek zanibû û hertim bi şuxulekî va mijûl dibûn. Ji merivê xebatkar hiz dikir, hewil dida bi tiştekî va ber keda wî va

derê. Merivekî xwedîyê dilê mezin bû.

Wezîr dûmahîyê dide xeberdana diya xwe. "Kesên, ku kalikê min dîtine, dibêjin, ku ez gelekî mînanî wî me. Wêne jî hinekî dişibe min. Lê Sûrênê apê min zêde mînanî wî ye, herdem qeşeng û şitaf e, jar û dest û pê. Heyf, berê gelek tişt zanibûn, lê bi piste-pist digotin. Dibêjin, ku gelek xerîbdost bûye, merivên wî li ku jî bûna, seredana wan dikir, barê hespê tije xurek ji wan ra dibir, alî wan dikir. Ku îro derheqa wî da lêgêndan dibêjin, ew yek qîmetê kar û jîyana wî ye. Nizanim çima ez ser wê bawerîyê me, ku Cangîr axa hela tam venegerîyaye ne nav miletê me, ne jî nav miletê ermenî".

Ez ser wê fikirê me, ku gerekê qîmetê merivên ha bê dayîn. Dibe gotina min sûbyêktîv e, lê gerekê heqê wan nexun. Nimûneya Cangîr axa, hilbet, alî wê yekê kir, ku şervanên ji miletê êzdî jî tevî şerê mêrxasîyê yê Arsaxê bûn, ji wana 30 kesî zêdetir şehîd ketin.

Wisa qewimîye, ku gelek kesên ji malbeta Cangîr axa li Zartonkê hêwirîne. Dibe jî bona wê yekê, ku ew war îdî nemabûn, ku Cangîr axa lê dima. Û kurê wî û qîza wî ji warên din hatine vira.

Nevîyê wî – Wezîr Xetoyan dibêje, ku heyf, ji wêneyên Cangîr axa tenê yek-dudu mane. Ji wana yê balkêş ew e, ku ew bi xanima xwe, kurê xwe û kesên din ra ne. Di wêneyê da ne bêlî ye ka kesê ser milê rastê kê ye.

* * *

Sohbetçîyên me yên din nevîyên Cangîr axa ne. Meriv dibêje, ku tiştekî ew di ser da zêde bikin, tune ye, fikirên derheqa mêrxasîya kalikê wan Cangîr axa û kalikê wan yê mezin Ûsiv begê da îdî têra xwe hatine gotin. Em bêjin, ku di ser van hemû tiştan da berbirîbûna wan ermenîyan ya germ û ji dil zêde dibe, ku di gundekî bi hev ra da diman.

-Nevîyên Cangîr axa merivne dilovan û xebathiz in. Gelek kes nizanin ka ew ji kîjan esilî ne, ji kîjan malbetê ne,- serekê gundê Zartonkê Norayr Sargsyan dibêje. Ez wê jî bêjim, ku Cangîr axa

demekê li gundê me da jî maye. Yanî, gundê me navdar e û bi Cangîr axa va serbilind e.

Em destnîşan bikin, ku bona bîranîna du ewledên gelê êzdî li mûzêya Serderavê da jî qulçek heye.

Li Înstîtûta leşkerîyê ya wezîreta parastinê ya Komara Ermenîstanê odeyeke xwendinê ya ser navê Cangîr axa heye. Li vira nîvheykelê Cangî axa danîne.

Du ewled û dostên herî baş yên gelê êzdî wê hertim li rex hev bin li warê ziyareta li Aknalîçê, ku li wir baxçeyê dostanîya ermenîyan-êzdîyan heye û li wir wê heykelên Cangîr axa, Ûsiv beg û Zoravar Andranîk hebin. Dibe di paşdemê da heykelên Komîtas û Drastamat Kanayan jî di ser da zêde bibin.

Li wî baxçeyî wê heykelê şehîdên ermenî û êzdî yên sala 1915an jî hebe, bi wêneyê dêra ermenîyan ya mezin û ziyareta êzdîyan va, bi kotikê darîn yê dostanîya herdu gelan va.

Sala par, dema yeksalîya ziyareta me dihate pîrozkirinê, cîgirê parlamêntoya Ermenîstanê Êdvard Şarmazanov û wezîrê parastinê yê Komara Ermenîstanê Sêyran Ohanyan jî hatibûn. Wana qîmetekî mezin dane tevaya gelê êzdî, xwesma du ewledên wê yên hêja Ûsiv beg û Cangîr axa wek karmendên dewletê û leşkerîyê. Êdvard Şarmazanov destnîşan kir, ku jînenîgarîya Ûsiv begê ne tenê aminaya di hindava dostanîya gelên êzdî û ermenîyan da ne, lê usa jî aminaya di hindava parlamêntarîzma Ermenîstanê ye, lê xewna Cangîr axa ya derheqa Ermenîstanê da ew bû, ku welatekî bi hêz, xurt û jîyanxweş ava bikin. Heyf, ku wext ne hîşt ewana vê yekê bibînin. Ez gelekî şa me, ku wezîrê Ermenîstanê yê parastinê Sêyran Ohanyan hertim jî qîmetekî mezin dide Cangîr axa. Lê li Înstîtûta leşkerîyê ya ser navê Vazgên Sargsyan da hebûna odeya xwendkarîyê ya ser navê Cangîr axa nîşana wê yekê ye, ku dewleta me qîmetekî mezin dide ewledên miletê xwe yên hêja. Û text-bext nîne, ku qumandarê ermenîyan Tovmas Nazarbêkyan derheqa Cangîr axa da ev gotinên pesindayînê nivîsîne: "Navê wî gerekê li rex navên mêrxasên ermenî yên bi nav û deng be".

Em wê jî bêjin, ku ji heykelan zêdetir dostanî û biratîya herdu gelan giring e. Û ew dostanî du kesan afirandine – bi kar û şuxulvanîya xwe va. Ev hemû îzbatîyên dîrokê ne.

Bi rastî jî, îro dostanî û biratîya me ya wisa heye, ku di nav kûra êgir ra derbaz bûye, di ber gelek ecêban ber xwe daye. Gerekê wêya wek ronahîya çavên xwe biparêzin, wek ku ew yek Cangîr axa û Zoravar Andranîk, Ûsiv beg û Komîtas dikirin, ku ewledên ermenîyan û êzdîyan yên layîq in. Lema jî em carina dibêjin: "Em îdî cimaetek in, lê du milet in".

Gotineke kûrfikir e. Gilî ne derheqa wê yekê da ne, ku em yek in, lê derheqa wê germayê û dilovanîyê da ne, ku di nav miletên me da hene. Îro ne tenê êzdî seredana ziyareta me dikin, lê ermenî jî. Gelek caran dipirsin: em jî dikarin bên? Em dibêjin, ku derîyên me hertim jî ber hev vekirî ne. Êzdî gava diçine dêrên ermenîyan, mûman vêdixin. Dibe jî xên ji Lalişê li tu cîyan ziyareteke ha nehata çêkirin. Û ew di dilê deşta Araratê da ne, di bin çevdêrîya herdu Masîsan, nêzîkî dêra ermenîyan ya sereke li Êcmîadzînê. Niha em hemû hatine 2 salîya salvegera ziyareta xwe pîroz bikin. Û em dikarin bêjin, ku di sala derbazbûyî da me kevir danî ser keviran, me ziyareta xwe ya li Aknalîçê diha bedew û tam kir.

Ermenîstana Roava, gundên Eslanlû, Çîbuxlî, Bullek, tîrmeh-îlon, sal 2014.

Berbanga edil ya behra Wanê

Bernameya rêwîtîya me ya li Ermenîstana Roava ewqas six û dagirtî bû, ku meriv ne dikaribû westandinê texmîn bike, ne jî dikaribû xwe ji zewqa sitendî xilaz bike, ku bal me hemûyan xuliqî bû. Hela di ser da, fîlmkişandina koma efrandarîyê ya bi navê "Kartsik" hewil dida karê xwe di nav demeke kurt da serhevda bîne û her tiştî bikişîne. Xortan herdem gazinê xwe dikirin: "Hinek wext bidine me... Em pê ra nagihînin, me hema bêje hevpeyvîn jî nekirine".

Meriv dikare wan jî fem bike, camêran karê xwe dikin û wî karî bi dil û can dikin.

Di vê rewşê da gerekê çareyekê bibînin, belkî jî berbangan, dema rêwî hela hêsa dibin û derneketine seyranê, wê demê gerekê hevpeyvînan bikin. "Çima na?",- dostê min Sêrgo Yêrîtsyan got.

Û rojekê jî me biryar kir berbangê zû ji mêvanxaneyê derkevin û herine kela Wanê, usa jî ber kenarê behra Wanê hinekî sohbet bikin, û li wir meriv dikare wê bedewîyê bibîne, ku li tu cîyan nikarî bibînî. Pêşî em diçine ber bi Derîyê Mhêr. Eva zaxa, herwiha tevaya Kela Wanê, bedewîyeke batinî ye. Ev hemû ecêbên destnivîsar û yên bê destxet in. Dibe berê ava behra Wanê hatîye heta ber pîyên kelayê? Lê alîyê kelayê yê din bax û baxçe ne - "Baxçeyên Şamîramê" û baxçeyê Wanê.

Nivîsên kevinare yên ser keviran me tînin digihînine dem û dewranên buhurî. Argîştî padişa jî derheqa rêwîtîyên xwe da behs dike. Ka texmîn bikin, bê ew destxetên kevinare çiqasî giranbuha ne.

Bi van fikirên tevlihev va bi dostê xwe ra digerim, tiştên hîs dikim bi dengekî bilind û bê deng dibêjim. Rastî jî, merivayî ecêbên mezin kirîye. Vê berbanga li rex behra Wanê em hewil didin tiştekî

fem bikin, li vira rêçên lingên ermenîyan, welatîyên xwe bibînim. Ji bilindaya kela Wanê tevaya bajêr xuya dibe, Wana kevin ya ermenîyan, Wana bi binecîyên xwe yên efrandar û sazkar va, ku îro li vir tunene. Heta em ketibûn nava van mitaleyan, opêrator Samvêl Galstyan cîkî bi semt dîtîye bona fîlmkişandinê û me teglîf dike bona fîlmkişandina xwe pêk bîne, çimkî nîv sehet şûnda emê xwe li riya ber bi Bîtlîsê, Mûşê û Êrzurumê bigirin.

Kişandina fîlmê dest pê dibe. Sêrgo Yêrîtsyan hevpeyvînê dike:

-Birêz Mîrzeyê Çolo Siloyan, gelo hûn îro çi hîs dikin, vê berbangê, ber kenarê behra Wanê?

- Ber kenarê vê behra bedew ez berî her tiştî dê û bavên xwe bîr tînim, hisreta wan hildidim. Wana ev war welatê xwe dihesiband û xewn û xeyalên wan ew bû, ku vegerine welêt. Wana ev war ne dît, lê min zanibû, ku ewana bi dizî dihatin ber devê sînor û dûr dinihêrîn. Dibe her kesî di fikira xwe da li wî warî gundê xwe didît. Bextê wana lê ne xist, wana ocaxa kal û bavan ne dîtin, û ev rêwîtîya min mecalek e, ku ez dewsa wana û ji navê wana li van deran biqesidim. Ez li welatê dê û bavê xwe, pêşîyên xwe me, ez him şa dibim, him jî xemgîn im. Ez çûme gundê me, ku tesîreke dilkeser li min kir, min mezelên me yên ber dilê min ezîz dîtin, ku xirab kiribûn, kiribûn erd-xwelî. Meriv eger meriv be, wê nikaribe tiştên ha bike, ez nikarim nebêjim, ku ev karê heywanan e, heywan jî dibe tiştên ha nekirana. Ez hinekî sert dibêjim, çimkî wana pêy li warên ber dilê min ezîz kiribûn. Niha tirkên azirî li gundê me dimînin. Wana warên me yên ziyaretî kirine erd-xwelî, mezelên me hilşandine û li rex wan mezelên xwe çê kirine. Evê yekê kulek kire dilê min, û kêfa min gelek ket. Alîkî va jî şa me, ku min warê kal û bavan dît. Kalên min, bavê min jî vira bûne. Ji vira jî mihacirî Ermenîstana Rohilatê bûne. Bavê min wî çaxî 20-21 salî bû û derheqa gundê xwe da wisa xweş qise dikir, ku hela ez nehatibûm vira, min bi gotinên bavê xwe gundê Kullik êdî nas dikir. Em usa jî çûne gundên êzdîyan yên berê, ku niha li wir kurd dijîn. Gundên êzdîyan li warên usa bêsemt bûn, ku zivistanan meriv nikaribû

hilkişîya wir, lê Ûsiv beg hemû êzdî berevî hema warekî ha emîn kiribû. Ez niha difikirim, ku berî her tiştî ew yek bona xweparastinê bû, bona wê yekê jî berevî wira bûbûn, ku bikaribin xwe ji dijmin biparêzin.

- Ez derheqa hesînên we yên di hindava mezinahîyên miletê we da nizanim. Ev rêwîtîya we çi tiştên ruhî dane te, dema we ew mala Ûsiv beg dît, ku ji bext ra di wêneyan da hatibû parastin û dîroka wan zêdeyî 100 salan e? We mala Xetîf axa jî dît. Gava te seredana mezelên mezinên miletê xwe dikir, te çi texmîn dikir?

- Rastî jî, rêwîtîya me ya hisretê ye. Ez gelek êşîyam, gava min xanîyên Ûsiv begê û Xetîf axa dîtin. Ewana 300-350 kîlomêtran dûrî hev bûn, lê guhê wan hertim li ser hev bû. Wan deman ne pergirêdana têlêfonê hebû, ne jî Întêrnêt hebû. Lê wana xwesma di dema qezîyayê ser wê riya dirêj jî hevdu texmîn kirine. Gava ez çûme wan gundan, mînanî qeytanên fîlman dîdemên kal û bavên min, cûrê jîyana milet, erf-edetên me hatine ber çavên min. Îro diêşim, ku di wan malan da merivên xerîb dijîn. Lê em çi bikin? Em dildimîyê bidine ber dilê xwe, ku qe na kurd miqatî li mezelên êzdîyan dikin, di nav wan da merivên usa hebûn, ku digotin: "Em îzinê nadin heta heywan ber bi wir herin, bikevine nava mezelan". Bona merivên zane rastî jî gerekê usa be, kesê mirî îdî pirsa dîn nake, dixwezî xaçparêz be, musulman be, an jî êzdî be, ew tu rol nalîze. Eger meriv bi dînê xwe ra amin e, qedirê mezelên xwe digire, gerekê di hindava dînekî din, mezelên kesên ji bawerîyeke mayîn da jî usa be. Sed heyf, min ew yek li ocaxa kal û bavê xwe, gundê xwe ne dît, hêrsa min gelek rabûye û ez xemgîn im.

- Wan deman him Ûsiv beg, him Xetîf axa, him jî Cangîr axa derketine himberî kurdan jî, lê hewaskar e, ku derheqa mêrxasîya wan, camêrîya wan da heta roja îro jî bi qedir û hurmet xeber didin. Me li ber şadirwana Bêrkirîyê merivek dît, yekî şêkirdar bû, digot Xetîf axa hertim jî alî merivên di derê teng da kirîye. Digotin, ku dema li vir xelayî bûye, ewî nan

belayî her kesî kirîye. Û ew yek di bîra merivan da maye. Ango, dengê bîranînan li vira maye. Ne her tişt e, ku hatîye kuştin, qirkirin, xezakirin.

- Belê, mînanîhevbûna rabûn-rûniştina me û kurdan, zimanê mişterek hinekî rola xwe lîstine. Axir sitiran û reqasên me jî mînanî hev in! Dibe ev in sebeb, ku ewana di hindava cîyên ber dilê me ezîz da dilovan in. Nayê bîra we, ku malên Ûsiv beg, Hesen axa yên ji axê çêkirî xirab kiribûn û dewsê xanîyên ji keviran çê kiribûn, hema bêje dîsa wek berê? Lê wana ji bîr nekiribû û zanibûn, ku ew xanîyê Ûsiv begê bûye. Ewana li rex hev jîne. Wextê da şerê dîn bû, lema jî di navbera miletên me da bîntengî dibin. Lê bi wê ra tevayî dostanî û merivatî jî hebû. Me jî, wana jî fem dikir, ku tirk navbera me xirab dikin, ku me jî tevî qirkirinan bikin. Nisletên tên jî vê yekê zanin, û lema jî ewana heta niha jî qedirê malbetên Ûsiv begê û Hesen axa zanin.

Him malbeta Cangîr axa, him jî ya Ûsiv beg, xwesma serekeşîrên wan, dema dijminaya dînî hebû, wexta li herêmê xelayî bû, pirs ne dikirin ka kê êzdî ye, kê ermenî ye, kê kurd e, kê tirk e: alî hemûyan dikirin. Texmîn bikin, ku ev hemû ji neslekê derbazî nesleke din bûye û meriv wê yekê ji bîr nakin, û derheqa wan da serhatî û kilam hatine sêwirandin.

- Û li ser van duryanên dîrokê, bê şik, ya here sereke û giring ew dostanî bûye, ku di destpêka sedsala buhurî û di dawîya sedsala berî wê ya 19an da xuliqîye, wek nimûne, di navbera Ûsiv beg û Komîtas da, Cangîr axa û Andranîk da. Ango, dostanîya ermenîyan û êzdîyan li ser vê axê xwedî rehên qewîn û qedîm in. Û eger ew reh ji kokê hatibin rakirin û anîbin li vir, Ermenîstana Roava, hesab yek e, ew reh bi cûrê bîranînan careke din şîn bûne, reng û rewşeke din wergirtine. Em haj ji gelek nimûneyên wê dostanîyê hene, ku di navbera du ewledên êzdîyan yên bi hêz û ermenîyan da hebûye. Em çûn û me dît, ku Komîtas li kîjan gundî hêwirîye, Aşxarhbêk Lorîs-Kalantar li ku wêne girtine û Xetîf axa wana li kîjan

warên di nav çiyan da wek mêvan qebûl kirîye. Hûn van hemû tiştan di dema seredana xwe da çawa dibînin, hûn derheqa dostanîya ermenîyan û êzdîyan da, ku bi sedsalan e heye, lê di van 100 salên dawî da xurttir bûye, çi difikirin?

- Ez serê sêrî da bêjim, ku dostanîya me ne duh, ne jî pêr dest pê kirîye û ew dostanî ne tenê bi saya serê Ûsiv beg, Xetîf axa û Cangîr axa bûye. Ji sedsalên 10-11an destpêkirî êzdî bi ermenîyan ra tevayî li vê herêmê mane. Esilê me ji bakurê Îraqê ye. Di sedsalên 10-11an da em ji herêma bakurê Îraqê hêdî-hêdî hatine vî warî û bi ermenîyan ra tevayî zêdeyî 1000 salan jîne. Ez tiştekî zêde dibînim derheqa dostanî û biratîya ermenîyan û êzdîyan da dirêj xeberdim. Her tişt ber çevan e. Em li vir jî bi hev ra bûne. Em bala xwe didine gundên ermenîyan, bajarên ermenîyan, warên me yên dîrokî: tu ferqek tunebûye. Li vira ewana bi biratî şerê dijminên xwe kirine, bi hev ra ji van waran hatine mihacirkirinê û cîguhastî Ermenîstana Rohilatê ya îroyîn bûne. Eger me xwexwetîya xwe ya miletîyê parastîye, ew yek bi saya serê gelê ermenî bûye, bi saya merivatîya wan. Em mînanî hevalên qenc, birayên ber dilê hev ezîz bi hev ra jîne. Ermenîstana Roava çawa bona ermenîyan welat e, usa jî ber dilê me ezîz e. Ez dixwezim, ku gencên me gelek caran bêne vir – Ermenîstana Roava, û welatê kal û bavên xwe bibînin. Ez wisa bawer im, ku wê demê wê gelek tişt di nav psîkologîya mirov da biguhêre, û dem hatîye, ku ew dijminatîya berê heyî niha sisttir bibe, kêm bibe, genc bira bên û herin, pêwendîyên mirovan yên germ bibînin. Wê demê emê xwe nêzîkî welatê xwe, pêşîyên xwe, warên Ermenîstana me ya Roava bikin. Bi kîn û nefretê pirs çareser nabin. Wê diha baş be, ku gelê me here-were, dostanî û biratî bike. Duh em bi binecîyên vira ra ketibûne sohbetê: "Ser çevan, werin, malan bikirin, bijîn, tu pirsgirêk tune". Em gerekê xwe li wê rê bigirin, bi dijminayê û kîngirtinê meriv nikare bigihîje tiştekî.

- Hûnê ji vira, ji kenarên behra Wanê ya bedew çi bibine ziyareta xwe ya Aknalîçê? Piştî hûn çend rojan li vira man, hûnê li ziyareta xwe çi duayan di ber xwe da bêjin? Ez zanim,

ku hûn ji gundên Çîbûxlûyê û Eslanlûyê ax û avê dibin, bona rehên heykelan bi ava ji warên jidayîkbûna Ûsiv begê û Cangîr axa va bêne têwardan û axa anî jî tevî axa heyî bibe.

- Ezê nexwezim em bi hisret li welatê xwe binihêrin. Minê bixwesta, ku miletê me zû-zû here van deran. Merivên me diçin li Rûsîyayê karê heywanxweykirinê dikin, li wir 8 meh zivistan e, 4 meh havîn e. Lê li vira hewa mîna ya Ermenîstanê ye, ewana wan pirsgirêkan dikarin li vira çareser bikin. Ez bawer im, ku li vir wê tu pirsgirêkeke di hêla dînî û miletî da tunebe. Em ji welatê xwe yê dîrokî, ji koka xwe hatine birînê, em gerekê bere-bere vegerine ser koka xwe ya kevin û dest pê bikin li wir kevirekî teze daynin, ku ew bona me hisret nîbe û em ji vira ax û avê nebin. Bi wê yekê va em ji ax û ava xwe, ji axa xwe ya dîrokî diha dûr dikevin. Pêşîyên hevalê min ji vira – Wanê bûne, ew mînanî zaran digirîya. Minê nexwesta, ku nevîyên wî wek wî bigirîyana. Bira ewana herin-werin, cîyê pîyê xwe li vî welatî bikin, li vir bijîn, milkê wan û bîznêsa wan li vira hebin. Rastî jî, eva pirsgirêka gerekê bê çareserkirinê. Pirsdanîna me ya sereke gerekê ew be, ku em pêwendîyên dostanîyê saz bikin. Emê îro vegerine Ermenîstanê. Em gerekê 800-1000 kîlomêtran ser Gurcistanê ra herin, lê ji Wanê heta Êcmîadzînê rê kurttir e. Heta Margarayê 230 kîlomêtr e, ji wira jî heta Êcmîadzînê 18 kîlomêtr e, ango, 248 kîlomêtr heta Êcmîadzînê. Bona wê yekê ez dixwezim, ku sînor û rê vebin, û gelê me bê welatê xwe, ne tenê bona hisreta xwe jê hilde, lê bona wê yekê jî, ku kar bike, hewil bide wê xwelîyê bike ya xwe. Ez bawer im, ku bi wê yekê va emê bigihîjine armancekê. Em gerekê ne tenê behsa wê yekê bikin, ku ew dijminên me ne. Em gerekê fikirandina xwe biguhêrin, gerekê bi gelê cînar ra ziman bibînin.

- Lê, hilbet, gerekê dîroka derbazbûyî tu caran ji bîr nekin. Li ziyareta we wê heykelê şehîdên bê sûc bê danînê. Ango, tu caran wextê buhurî ji bîr nekin û berê xwe bidine rojên pêş me?

- Belê, ew wisan e, me dikaribû ew heykel li vira jî danîya,

wek bîranîn. Lê niha em gerekê wisa nefikirin, ku em wî heykelî bona xwe çê dikin, em wêya bona rojên buhurî datînin, lê em rojên îro gerekê biguhêrin û berê xwe bidine rojên pêş me. Gerekê ew pirs ji sedî sed bê çareserkirin, bona hisreta gelê me û dijminatî xweber va ji ortê rabin. Min dixwest îro li ber kenarê behra Wanê ya bedew û kaw tenê ewqas bigota. Û bira Xwedê bike, ku em careke din ne ku bi riya Gurcistanê, lê ser Êcmîadzînê ra bihatana vira bona gerê û hêsabûnê. Duh hevalekî min, ku ji Mûsa Lêrê ye, gote min: "Ezê neçime Rewanê. Ezê herim çi wira? Ezê erebeya xwe bajom, bême Îdirê, kirîn û firotana xwe bikim û vegerim". Em gerekê bigihîjine wê yekê, ku ji vira birina axê û wênegirtina li warên kal û bavan bêne kêmkirinê. Ez bi bînfireyî li vê pirsê mêze bikim. Ez ser wê bawerîyê me, ku di navbera me, tirkan û kurdan da wê tu pirsgirêkeke miletîyê tunebe. Em gerekê berbirîbûna xwe biguhêrin, ku ewana jî di hinvdava xwe da biguhêrin.

- Gelek sipas.

Ermenîstana Roava, kenarê behra Wanê,
tîrmeh, sal 2014.

EZDIKI.COM

"Di rojên oxirmên giran da gelê ermenî li rex me ye"

Dibe hewcedarîya vê hevpeyvînê tunebûya, eger esman cara 74an reş girêneda, agir li ser gelê min da nebarîya, hema li warê wan, Îraqê. Lazim bû bi lez xwe bigihînime Îraqê, bajarê Hewlêrê, ku ji warê qetilê ne gelekî dûr e, bona ji nêzîk va fem bikim, ka çi tê serê welatîyên min. Bona min pir dijwar e ew her tişt bîr bînim, ku min di nava çend rojan da dîtibû û bona wê rewşê ketibûme tefekûrîyê. Gava ez vegerîyame Rewanê, ajansa "Mediamaks"bi min ra hevpeyvînek kir, û ez dixwezim wêya bi temamî, heta bi hinek serdazêdekirinan va raberî we bikim (21ê tebaxê, sala 2014an).

"Ev qirkirina êzdîyan ya 74an e"

Bazirgan, binecîyê Moskvayê Mîrze Siloyan, ku usa jî li Aknalîçê ziyareteke êzdîyan çê kirîye, teze ji Îraqê vegerîyaye. Ew çûbû wira bona bi olka êzdîyan û desteya ruhanî ya bilind ra tevayî rewşa sazbûyî minaqeşe bikin, bala xwe bidine halê mihaciran, usa jî alîkarîya wan bikin. Mîrze Siloyan bersîva pirsên "Mediamaks"ê dide.

- Di wan rasthatinan da çi biryar hatine girtin?

-Em çûne warên mihaciran, li wir kesên bê war mayî di bin germaya 45-50 dereceyî da xwe di bin çadiran da diparastin û kêmasîya av û xwerin jî hebû. Îro pirsa sereke ew e, ku alî van merivan bikin, pêdivîyên wan yên herî lazim pêk bînin. Komîsyonek hatîye sazkirin, ku bi van pirsan va gîro ye, heta dewleta Îraqê bikaribe bê hewara wan, bi kêmanî wana sitar bike. Li her çar perçên dinyayê dest bi berevkirina alîkarîyê kirine, ku wê xem

û kêmasîyên mihaciran hinekî bide kêmkirinê. Ew kesana her tiştên xwe winda kirine – mal, milk, gelek malan jî ezîzên ber dilê xwe winda kirine. Qet şika min tune, ku êzdîyên Ermenîstanê û Rûsîyayê jî wê alî welatîyên xwe bikin. Ya sereke ew e, ku ji van her tiştî dersan hildin bona rojên paşdemê.

Eva qetilkirina êzdîyan ya 74an e.

- Birêz Siloyan, we destnîşan kir, ku eva qetilkirina êzdîyan ya 74an e. Ji destpêka meha tebaxê li wir çi diqewime?

- Di rastîyê da tiştên li wir qewimî gelkujî bû, qirkirina miletekî bû. Merivan gulle dikin, dikujin, çimkî ew xwedî dînekî din in, musulman nînin, mehmedî nînin. Mêran dikujin, lê jinan dişuhirînin, dikin qûl. Eynî tişt di hindava zaran da jî dikin. Bona hukumê xelîfata xwe zêde bikin, ber tu tiştî nasekinin û di sedsala 21ê da karê hovane û heywanane dikin. Lê ne axir ev hêza gemarî ber çevên cihana pêşketî hate sazkirin û bi hêz bû û îro wisa bûye, ku pêşî lê nayê girtin. Gelek pirs hene, ku bersîvên wan ji alîkî va dijwar in, ji alîyê din va jî hêsa ne. Gelo tu rê tunebû, ku van qatîlan ewqas germ nekirana, ku roj di nava rojê da merivan dikujin û li her deran tirs û xofê bela dikin. Ew jî ne kêm, ne zêde, di destpêka sedsala 21ê da. Mêrên gundan berevî li cîyekî dikin, pêşnîyaz dikin dînê xwe biguhêzin û bibine musulman, lê eger razî nebin, di cî da wana gullebaran dikin. Lê bi wê va jî têr nabin, gulleya kontrolkirinê berî serê her kesî didin, ku bêne bawerkirinê ew hatine kuştin. Lê jinan û zaran wek eşîya di sûkên dîlgirtîyan da difiroşin.

- Meriv dikare bêje, ku 100 sal piştî gelkujîya ermenîyan tu tiştek nehatîye guhastin. Esker dîsa esker e, bêy ku bidine ber çevan ka ew ji çi miletî ye.

- Eger tevaya cihanê heta îro gelkujîya ermenîyan şermezar bikira, tiştên ku îro li Îraqê dibin, ango qirkirina êzdîyan, wê nebûya. Mêze bikin ka çi diqewime. Sed sal e, ku bi kuştinê çareserkirina pirsan heta niha jî ji holê ranebûye. Û heta beşa misilmanan ya pêşketî jî ketîye tora îslamîstan.

- Dema serokê Ermenîstanê rastî serekwezîr hat, ne tenê

piştgirîya êzdîyan kirîye, lê sipartîye, ku alîkarî bidine gelê ji bo me bira – êzdîyan, ku îro di rewşeke giran da nin.

- Em zanin, ku dema serokkomarê Ermenîstanê ji betlanê vegerîya, di rojeke ku ne roja kar bû, rastî serekwezîrê welatê xwe hat, pêşî ew bûyerên, ku li Îraqê dibûn şermezar kir û paşê sipartîye wezîreta karên der va ku çi ji destê wan tê bikin bona aramkirina rewşê. Usa jî hatîye gotinê, ku: "Komara Ermenîstanê anegorî qewata xwe wê alîkarîya gelê ji bo me bira bike". Ez dixwezim vê firsendê bi kar bînim û rezadilîya xwe elamî serokkomarê welêt, temamîya gelê ermenîyan bikim bona vê helwesta dostane. Ev yek jî îzbata dostanî û biratîya herdu gelên me ye.

- Birêz Siloyan, çi kar tê kirinê bona alîkarîya gelê ji dest zulmê xilazbûyî bikin?

- Bê şik, ev hemû bûne sebebê dijwarîyên mezin. Bona çareserkirina vê pirsgirêkê gelek welatan hazirîya xwe elam kirine, di nav wan da Ermenîstan jî. Rêxistinên navnetewî yên xizmetguzerîyê jî dest bi alîkarîyê kirine. Li temamîya dinyayê pere berev dikin bona alîkarîyê. Bi sedan hezaran mihacir hene, ku îslamîstan warên wan zevt kirine, talan kirine, xirab kirine û hilweşandine. Pirsa bicîkirin û sitarkirina wan kesan serî hildaye. Heta niha gelek welatan daxwez kirine wana wek mihacir bal xwe qebûl bikin. Bi vê yekê ra girêdayî helwesta ermenîyê mezin Şarl Aznawûr gelek balkêş e, ku bang dike li ser axa Fransîyayê wana qebûl bikin, usa jî bona wê yekê, ku ewana bikaribin gundên Fransîyayê rakine ser pîyan, şên bikin.

- Lê hûn derheqa wê yekê da çi difikirin, ku di van salên axirîyê da gelek êzdî ji Ermenîstanê derketine, di gelek gundên êzdîyan da malên vala pir in. Dibe pareke wan mihaciran dikarin bên vira û di wan malan da bi cî bin?

- Ez dixwezim bêjim, ku gotinên berdevkê çapemenîyê yê serokkomarê Qerebaxa Çiya Davît Babayan em şa kirin, ku Komara Arsaxê amade ye gorî qewata xwe alî mihacirên êzdî bike. Ez rast bêjim, ez wek ewledekî gelê êzdî ji van gotinan

gelekî dilxweş bûm. "Gelê ermenî nikare di hindava wan bûyeran da bêxem be, ku tê serê gelê êzdî. Gelê êzdî gelê tek tenê ye, ku bûye pareke gelê me: ew miletekî din e, xwedî dînekî din e, lê bûye beşeke ermenîyan. Qedera me herdu miletan yek e, me bi sedsalan himberî dijminê xwe yê tomerî şer kirîye. Lema jî, tiştên ku têne serê êzdîyan, weke ku tê serê ermenîyan, ez wisa zanim, çimkî em nikarin qederên xwe ji hev cuda bikin. Lema jî, gava li Îraqê êzdîyan qir dikin, em nêzîkaya wî miletî bi me ra didine ber çavan û wisa hesab dikin, ku ew qirkirina ermenîyan e. Em her tiştê ku tê serê êzdîyan, şermezar dikin. Em bangî civaka navnetewî û hemû dewletan dikin, hukumê xwe bi kar bînin û alî gelê êzdî bikin".

Dema daxwezeke ji dil hebe, wê demê pirsên mihaciran dikarin bi erênî bêne çareserkirin. Xemxurîya serokkomarê Ermenîstanê destûrê dide me bifikirin, ku eger mihacir bixwezin li Ermenîstanê bi cî bibin, daxweza wan dikare pêk bê. Hilbet, êzdîyên cîşihitî bûyî wê bixwestana li welatê kal û bavan bimana, ji wir derneketana, lê ji ber ku gelek ecêb hatine serê wan, ewana mecbûrî cîyên aram ji xwe ra digerin. Şik tune, ku bona êzdîyan Ermenîstan warê herî aram e, ez dikarim bêjim, ku welatê dudan e. Dibe bi reza Xwedê bû, ku me berî du salan li Aknalîçê ziyareta xwe çê kir. Nêta me heye em îsal li wir heykelê dostanîya ermenîyan-êzdîyan daynin, dora wê heykelên Ûsiv beg, Zoravar Andranîk û Cangîr axa jî wê hebin, ku bona wê dostanîyê gelek kar kirine. Me biryar kirîye em li wira kevirê bîranînê yê bona 100 salîya qira ermenîyan bi cî bikin. Li rex van heykelan wê yekî dinê jî hebe – ya ji bo bîranîna qira êzdîyan ya tebaxa sala 2014an li Îraqê. Sed heyf, ku wext wisa bêbext e, ku planên me tevlihev dike.

Hevpeyvîn Karînê Tîtanyanê derbaz kir
Tebax, sal 2014.

EZDIKI.COM

Riya ku ber bi ziyaretê dibe: pey salekê ra

Ez şa me û ji Xwedê razî me, ku koma efrandarîyê ya bi navê "Kartisk" bûye salnivîsara karên me. Ewana bi dil û can her tiştî dikişînin, diparêzin, derheqa ziyareta me da malûmatîyan digihînine temaşevanan û nesletên dahatû. Û karê wanî herî mezin ew e, ku ew hemû dibine fîlm, ku tê da hemû karên me yên bi ziyareta me va girêdayî têne ber çevan. Ez behsa fîlma "Riya ku ber bi ziyaretê dibe: pey salekê ra" dikim, ku derheqa wan her tiştî da ne, ka 29ê îlona sala 2013an li ziyareta Aknalîçê çi qewimîbû. Ez bawer im, ku ew fîlm wê firsendê bide her kes derheqa qewmandinên wan rojan da hayadar be. Ez dixwezim careke din razîbûna xwe bidime "Kartisk"ê û li vira fikirên xebatkarên wê komê raberî we bikim.

Xudanê – Teşkîldar rast fikirîbûn, ku bûyerên bi yeksalîya ziyareta Aknalîçê va girêdayî bi du vîdêoyan va dest pê bikin. Ya pêşin, wek ku sernivîsar destnîşan dike, "Riya ku ber bi ziyaretê dibe", şirove dike, ka ziyareta Aknalîçê çawa xuliqî, bîr û bawerîyên destpêkir û tevgelên wî karî çi ne, usa jî hûrgilîyên bingehdanîn, çêkirin û duakirina ziyaretê bi hazirîya serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê, Mîrê Mîran Tehsîn beg û desteya bilnd ya ruhanî ya ji Lalişê hatî.

Vîdêoya dinê jî behsa derheqa wan êzdîyan dike, ku ji welêt dûr dijîn û kar dikin, û dijwarîya wan ya here mezin hisreta di hindava warê jidayîkbûna xwe ye.

Sêrgo Yêrîtsyan (doktorê zimanzanîyê, profêsor) – Fîlm him derheqa wê yekê da ne, him jî derheqa dostanîya ermenîyan-êzdîyan, kok û rehên me, pêwendîyên me da ne.

Avtor – Van rojan herwiha pirtûka Mîrzeyê Çolo Siloyan ya bi sernavê "Riya ku ber bi ziyaretê dibe" çap bûye, ku bi temamî

derheqa xuliqîna fikira bona çêkirina ziyaretê, lêkirina wê, pirsên bi wê va girêdayî, dostanîya ermenîyan û êzdîyan da ne. Para pirtûkê ya dudan hatîye binavkirinê "Mîyaserbûna xewna dizîka va" û di wê da tê şirovekirin, ku Mîrze Siloyan çawa berbi wê yekê cedandîye û gihîştîye armanca xwe.

Mêvanên ji Lalişê hatî ruhdar bûbûn, him ruhanî, him jî mirîd. Wana texmîn ne dikir, ku wê cejineke ha ya hemmiletî bibe. Tevgelên şahîyê bi fikiran va hela li ziyareta Aknalîçê bûn, lê fikirên hinekan li ser kar û barên sala tê bû, ka wê çi bikin.

Hesen Hesenyan (serekê ruhanî yê êzdîyên Ermenîstanê) – Dostanîya me dikare bi miletên mayîn ra hebe, lê em û ermenî bira ne, çimkî biratîya me her kesî dîtîye, him li meydana şêr, him ser textên şahîyê, him jî di nava jîyana îroyîn da. Tiştekî şabûnê ye, ku fîlmeke ha kişandine, û em nîşanî temamîya dinyayê dikin, ku êzdî hemwelatîyên tam in, ne tenê li Ermenîstanê, usa jî di nav diyasporê da.

Avtor – Nuxseyên pêşin yên pirtûkê dane bazirganê ji Moskvayê Mîrzeyê Çolo Siloyan û kurê rêberê hemû êzdîyên dinyayê, Mîrê Mîran Tehsîn beg – Hazmîr Hazim, ku parlamênterê Parlamêntoya Herêma Kurdistanê ye. Pey dîtina fîlmê ra hemûyan teglîf kirin bona pîrozkirina pirtûka Mîrze Siloyan.

Knyaz Hesenov (serekê olka kurdên Ermenîstanê) – Eva ne tenê bona gelê êzdî, lê usa jî bona hemû miletên komarê, bona hemû tûrîstan wê bibe ziyaretek, wê bêne vira duayên xwe bikin û wê usa jî dua li wî camêrî bikin, ku ew çê kirîye.

Robêrt Şahparyan (Sankt Pêtêrbûrg) – Bona me şahîyeke mezin e. Her yek ji me ji warekî hatîye – ji Rûsîyayê, welatên dereke, em berev bûne bona cereke din jî dostên xwe pîroz bikin, bona eyda miletê êzdî, ku ewana bi saya serê Mîrzeyê Çolo Siloyan bûne xwedîyê vê ziyaretê.

Avtor – Rasthatinên ha mecalê didine me em hev nas bikin, rastî hevdu bên, sohbet bikin. Li vira piranî dostên kevin û teze ne. Gelek ji wana sala par hema li vir, li Ermenîstanê, di dema

duakirina ziyaretê bi hevdu ra bûne nas. Pareke wan jî cara pêşin hatine Ermenîstanê.

Doktor Cemîl (wezîrê Kurdistanê yê aborîyê û malhebûna gund) – Em bi sipartina serekê xwe yê ruhanî Tehsîn beg hatine Ermenîstanê bona tevî şahîya ziyareta êzdîyan bibin, usa jî tevî vê eyda dostanîya gelên ermenî û êzdî bibin.

Avtor – Gelek caran minaqeşe saz dibe, ka salek, yan jî 365 roj, wextekî gelek e, yan na? Dijwar e meriv bersîveke tam bide, dibe ne lazim e jî. Lê tiştekî îzbat e, ku di nav salekê da li ziyareta êzdîyan ya Aknalîçê gelek tişt guhêrîye, xwesma bona wan kesan, ku berî salekê hatibûne vira û niha jî li vir in. Der-dorê wê mezintir bûye, xanîyê navbenda perwerdeyê-kûltûrayê bilind bûye. Bi hezaran hecî hatibûn ne tenê van hemûyan bibînin, lê usa jî bona seredana ziyaretê bikin, ku sala par ji alîyê rêberê ruhanî yê êzdîyan dua lê hat kirin. Hela sala par, 29ê îlonê hate îlankirinê wek roja ziyareta Aknalîçê û ew dide kivşê, ku her sal, hema vê rojê, meriv wê berev bin ne tenê bona duayên xwe bikin, lê usa jî yekîtî û hevgirtina xwe nîşan bidin û bidine kivşê, ku dikarin pirsgirêkên miletîyê bi aştîyane û aqilane çareser bikin. Li vira ne tenê êzdî hene, lê bi jimareke mezin ermenî jî hene, yên karmend jî. Li vir in cîgirê parlamêntoya Ermenîstanê Êdûard Şarmazanov, wezîrê parastinê Sêyran Ohanyan. Û bi vê dorê jî piştî vekirina vê heyteholê, van kesan xeberdan.

Êdûard Şarmazanov (cîgirê parlamêntoya Ermenîstanê) – Li Komara Ermenîstanê bona hemû miletên kêmjimar, di nav wan da bona gelê êzdî her mecal hene bona pêşketinê, xebatê, pêşdabirina mîrata xwe ya kûltûrî û ruhanî. Îro bona me hurmeteke mezin e, ku em tevî vê şahîya xweş ya gelê bona me dost û xwedî qederekê dibin.

Sêyran Ohanyan (wezîrê Komara Ermenîstanê yê parastinê) – Ez ji navê tevaya xebatkarên wezaretê û herwiha ji navê xwe hemû tevgelên vê heyteholê silav dikim û ji bo sersalîya pêşin ya vekirina ziyaretê we pîroz dikim. Eva ziyareta ne tenê

ware ruhanîya êzdîyan e, lê herwiha warê hevgirtina êzdîyan û ermenîyan e. Li vira emê careke din dîroka xwe bi bîr bînin, emê dîsa wan riyan bikine bîra xwe, ku jê derbaz bûne, emê bona heyteholên duwerojê jî bernameyan çê bikin.

Avtor – Wezîrê parastinê yê Komara Ermenîstanê wisa jî bona karekî dinê hatibû vira – bona şervanên êzdî xelat bike. Her kes zane, ku êzdîyan bi ermenîyan ra tevayî mil dane milên hev û ji bo Arsaxê bi mêranî şerê azadîyê kirin, gelek ji wana şehîd bûn û bûne mêrxas. Li vira gelek kes ne tenê ji Ermenîstanê ne, lê wisa jî ji welatên Yekîtîya dewletên serbixwe, Ewrupayê, Rojhilata Nêzîk in. Ew meriv hatine tevî şahîya me bibin.

Sêrgo Yêrîtsyan (doktorê zimanzanîyê, profêsor) – Ev roj – 29ê îlonê hate elamkirinê wek roja hecê. Di rastîyê da hecîyên pêşin yên pey duakirina ziyaretê ra hûn in. Hûn bi duayên xwe va hatine, bi armancên xwe va hatine, hûn hatine daxwezên xwe li vê ziyaretê bînine ser zaran.

Avtor – Bona vê bûyera ber dilê êzdîyan ezîz nûnerên civakî yên cûre-cûre hatine – mamosta û çêkirçî, ruhanî û ronakbîr.

Metranê sere Artak Sîmonyan (ji beşa Armavîrê) – Dîrok me hîn dike, ku gelek caran milet him erdên xwe winda dikin, him jî deroder dibin, dibin mihacir, lê bi xwe ra du qîmetîyên giring dibin, ku bona berdewamkirina jîyanê roleke mezin dilîzin – ew bawerî û ziman e. Çimkî li vira êzdîyên li dinyayê belavbûyî yên xwedî zimanekî û xwedî dînekî berev bûne, ev rasthatina me ya Xwedêdayî ye. Ez hêvîdar im, ku ev duayên me wê bigihîjine Xwedê, ro wê me tevan germ bike, lê dilê me bi hizkirinê û biratîyê va dagire.

Lîparît Sargsyan (helbestvan) – Bona miletan bi kesên ruhanî ra tevayî ronakbîr jî bûne rêvebir û rênîşandar, yên ku bi hunermendîya xwe, sitiranên xwe va pesinê dostanîya gelên êzdî û ermenî dane, ku heta îro jî berdewam e. Bawermendên ji hemû warên Ermenîstanê û ji welatên cuda-cuda hatine vira.

Ezîz Temoyan (serekê olka êzdîyan) – Gava yek bona miletê

xwe karekî ha dike, ez ber wî temene dibim. Em bi rê û rizmên xwe va têne naskirin, bi sazkirina herf û edebîyeta bona zaran va.

Avtor – Li vira ew meriv jî ne hindik in, ku ji warên gelek dûr hatine Ermenîstanê, ji diyaspora êzdîyan ya hevgirtî, wek nimûne, ji bajarên Rûsîyayê yên cuda-cuda, ji welatên dereke.

Pîr Mirazê Koçer Mistoyan (Kalînîngrad) – Bi hezaran salan em zêrandine, xwestine me dînguhastî bikin. Sed heyf, ku gelek kes di wê rê da derbaz bûne, lê ez îro şa û bextewar im, ku ez 37 salan li Rûsîyayê mame, lê li Ermenîstanê dipeyivim, çimkî ez li vira ji diya xwe bûme, li vira mezin bûme, gihîştime, û ew hêza ku di nav me da dijî, bawerî ye. Gelek kes hene, xwesma li Rûsîyayê, ku rind fem nakin ka em bona çi bilêtan dikirin, bi balafirê bi hezaran kîlomêtran derbaz dibin, fem nakin, ku çima em salê çend caran têne Ermenîstanê. Lê em xwedî wê hêzê, wê bawerîyê ne, ku kal û bavên me di nava bi hezaran salan da dane me.

Avtor – Wek ku em li bendê bûn, di sersala pêşin ya ziyaretê da nûnerên desteya ruhanî ya bilind ji Lalişê, bi serokatîya kurê serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê Mîrê Mîran Tehsîn Beg – endamê Parlamêntoya Herêma Kurdistanê Mîr Hazim û endamên desteya bilind ya ruhanî amade ne. Hilbet, Mîr Hazim pîroznameya serekê ruhanî anîbû. Di bîra gişkan da maye, ku sala par, gava ew li Ermenîstanê bû, saxlemîya wî ne gelek baş bû jî, lê bi ciddî û bi hurmetgirtin tevî hemû rasthatinên bi karmendên derece bilind, heyteholan dibû, diçû warên êzdî lê dimînin û bi welatîyên xwe ra qise dikir. Mîr Hazim dixweze silavên êzdîyên Îraqê jî bigihîne bi hezaran kesên amadebûyî. Çawa sala par, vê carê jî, hîmdarê ziyaretê, bazirganê ji Moskvayê Mîrzeyê Çolo Siloyan gelek ber xwe dikeve, dixweze her tişt ser dereceya bilind be.

Lê xeberdana wî gelek zelal û dagirtî ye: xeyala wî ya bi salan mîyaser bûye û îro ber ewqas merivan dixweze rezalixîya xwe bide wan hemû kesan, ku bi hereketê wan ne tenê zyaret hate çêkirinê, lê usa jî karên paşdemê hatine destnîşankirin, bona li rex ziyaretê hemû mecal hebin, ku meriv bikaribin bifikirin, hêsa bin, duayên

xwe bigihînine Xwedê, bona ew di rojên oxirmên giran da li rex wan be.

Mîr Hazim (Endamê parlamêntoya Kurdistanê) – Gelê ezîz, ez careke din dixwezim destnîşan bikim û bikime bîra we derheqa dostanîya ermenîyan-êzdîyan ya bi sedan salan da, û ew dostanî ne tenê li Ermenîstanê ye, lê herwiha li Îraqê û gelek warên dinyayê yên din da ne jî. Ez êzdîyên li vira berevbûyî silav dikim, yên ku ji Rûsîyayê, Gurcistanê, welatên dereke hatine. Ez birayên xwe yên ermenî silav dikim. Em hemû berevî vira bûne bona yeksalîya ziyaretê pîroz bikin, wê ziyaretê, ku Mîrzeyê Çolo Siloyan daye çêkirin. Ez îro gelek şa me, ku bi saya ziyaretê êzdîyên ji temamîya dinyayê berevî vira bûne. Ew karê, ku Mîrze Siloyan kirîye, ne karekî biçûk e. Ewî ev her tişt bona dînê xwe kirîye. Bira Xwedê piştovanê wî be. Eva cara dudan e, ku em ji Îraqê tên bona bi jîyan, xem û dijwarîyên êzdîyan ra bibine nas, bi wan ra bidin û bistînin, qise bikin.

Mîrê Mîran Tehsîn beg rast berî salekê li vira bû – Ermenîstanê, û berî em bêne vira, ewî ji me hîvî kir, ku paşê em her tiştê li welatê bira dîtî jê ra şirove bikin, xwesma ka di nav saleke axirîyê da li vira çi guhêrîye. Eva cara dudan e, ku em têne vira. Emê ne tenê bala xwe bidine emir û kar û barê êzdîyên vira dijîn, lê emê jî ji wan ra şirove bikin, ka welatîyên me yên êzdî û ermenî li Îraqê çawa dijîn. Ez dixwezim bêjim, ku li Îraqê halê êzdîyan, ermenîyan û xaçparêzên din baş e. Ez dixwezim, ku ne tenê jîyana me ya aborî baş be, lê usa jî pevgirêdanên kûltûrî diha mehkem bin. Em hertim bi kûltûra hev ra bibine nas.

Îro eydeke mezin e û eydên ha bira zêde bin.

Avtor – Hilbet, Mîrze Siloyan bona yeksalîya ziyaretê rind karê xwe kiribû. Ya pêşin, çûyîn-hatina wî ji Moskvayê ber bi Ermenîstanê gelek zêde bûye, wextê mayîna wî ya li Ermenîstanê jî pir bûye. Lê van axirîyan ew kêm caran ji Ermenîstanê diçû Moskvayê. Diha pir bûbû çêkirçî û wisa çê dikir, ku mezîla ziyaretê her diçû zêdetir dibû, bona ew bibe warê hêsabûnêyî xweş.

Mîrzeyê Çolo Siloyan (bazirganê xizmetkar) – Bi tevgelîya gelê bawermend me li ser axa ermenîyan ziyareta xwe – Lalişa teze çê kir, dua lê kir û vekir. Ez dixwezim bi dilekî baristan bêjim, ku nerehetî, berxweketinî û cabdarîya wan rojan meriv dibêje qey xwe paşda vekişandibûn. Rastîya rojê ketibû pêşîya her tiştî, ew jî ew e, ku em bi hev ra dîroka dostanîya xwe tînine ber çavan û bi wê emê sedsalan buhurînin. Hema bêje her rojeke sala par pirtir ez, merivên min û hevalên min didane bawerkirinê, ku me bi rastî jî xwe li riya rast girtîye.

Avtor – Wek edet, Mîrzeyê Çolo Siloyan hiz nake derheqa karên xwe yên paşdemê da ji wext zûtir bi hûrgilî xeberde. Û dibe ew rast dike, çimkî plan zû-zû diguhêrin, dema armanc pir mezin e – bibine xwedîyên navbendekê, ku wê him bona ermenîyan, him jî bona miletê wî hurmetê bîne.

Mîrzeyê Çolo Siloyan (bazirganê xizmetkar) – Emê bi vî cûreyî xwexwetîya xwe biparêzin, emê ha bimînin çawa ewledên hêja yên Rojê, ku jîyanê dide me.

Avtor – Ev cûrê karkirina Mîrzeyê Çolo Siloyan derbazî gelekan dibe, û ewana li rex wî disekinin. Mînanî gênêral Manvêl Grîgoryan, yê ku bersîveke kurt da hîvîkirineke Mîrze Siloyan: "Bona ziyaretê xwelîyê nafiroşin, lê pêşkêş didin". Û mêrxasê Arsaxê hema usa jî kir. Û hema ev sidqê qenc bû bingeh, ku ziyaret ber bi başîyê guhêrîye, hatîye firekirin û hêdî-hêdî paşeroja ziyaretê tê ber çavên me.

Heytehola rojê bi duakirina ruhanîyên ji Lalişê hatî xilaz dibe. Dû ra desteya ruhanî duayên xwe di hundurê ziyaretê da dike. Ketin-derketina mêvanên hatî nasekine. Ewana ji warên dûr û nêzîk hatine, hatine hecê, û ew yek dide xuyakirin, ku wana duayên xwe, daxwez û xewnên xwe anîne vira û bawer in, ku duayên wan wê mîyaser bin.

Borîs Lazgîyan (Yaroslavl) – Temamîya olka me ya êzdîyan û êzdîyên diyasporê, ku îro him li Rûsîyayê ne, him li Ewrupayê ne, biryar kirine di roja sersalîya ziyareta me da hazir bin.

Zado Cindoyan (Tvêr) – Ev hemû bona gelê me yê êzdî xwedî kemaleke mezin e, bona dînê me û miletê me nas bikin. Eva tê maneya roja hecê, ku wê rojê temamîya gelê me yê zêdî bi gelê ermenîyan ra tevayî berevî vira dibe û eyda xwe ya ezîz li ser axa ermenîyan pîrox dike.

Rizganê Simo Şamoyan (doktorê ulmên bizîşkîyê)- Bi jimareke mezin ruhanîyên me hebûne, yên ji mala Hadîyan, yên ku di ocaxên xwe da em qebûl kirine, wana karibûye ruhê miletîyê, dînê me biparêzin. Îro, şikir ji Xwedê ra, ku ziyareta me ya ha heye. Wê heca me vir şûnda bibe edet, emê her sal li vira berevbin.

Îşxan Madoyan (herêma Araratê) – Niha êdî warekî ber dilê me ezîz – ziyareta me heye, ku li ser axa ermenîyan ya tek-tenê ye.

Avtor – Ew her tişt gelekan zendegirtî dihêle, yên ku pey salekê ra li vira dibînin. Mezîla dora ziyaretê ya firebûyî nîşan dide, ku paşeroja wê geş e. Û paşeroj wisa xuya dike, ku meriv wê bêne vira ne tenê bona hecê, duayan, lê wisa jî bona hevdu nas bikin, bi hevdu ra bikevine nava sohbetê. Û ew yek, gorî Mîrzeyê Çolo Siloyan, wê li xasbaxçeyê li rex ziyaretê be, ku tê çêkirinê, li wir wê rêyên bi daran va dorgirtî, kursî û cîyên bona sohbetê hebin.

Borîs Temoyan (endamê şêwra rêxistina yekîtîya ciwanan ya êzdîyaye miletîyê ya bi navê "Sincar") – Bona êzdîyên li Ermenîstanê dijîn tiştekî şabûnê ye bibine xwedîyê avahîyekî ruhanî yê ha, çimkî her kes zane, ku milet bêy jîyana ruhanî, bêy çandeya ruhanî dibe ber xetera helandinê û windabûnê here. Karên ha di olka êzdîyan da jî têne kirinê, lê bi hebûna vê ziyaretê meriv fem dike, ku jîyana ruhanî wê xwe li rêke geştir bigire. Gava em di nava salekê da dihatine vira, me texmîn dikir, ku milet seredana ziyaretê dike, bona rojên şahîyê û xweşîyê qurbanan dide.

Memê Amîryan (endamê şêwra rêxistina yekîtîya ciwanan ya êzdîyaye miletîyê ya bi navê "Sincar") – Ez dixwezim hestên xwe ji we ra parvekim. Bona vê rojê ez dixwezim razîbûna xwe bidime teşkîldarê van hemû yekan – Mîrzeyê Çolo Siloyan. Keda wî di nava jîyana gelê êzdî da pir e, lê karê kirî wê bi dewranan bê

bîranînê. Ev roj wê tu caran neyê jibîrkirinê û wê di rûpelên dîrokê da bê nivîsar.

Avtor – Çawa ku êzdî bi xwe dibêjin, bona êzdîyên li Ermenîstanê ji diya xwe bûyî û mezinbûyî ew li ku jî bijîn, Ermenîstan dimîne wek welatê wan, ew şemdanek e, ku herdem wana gazî ber bi warê jidayîkbûna wan – Ermenîstanê dike. Ew hesîn ji wê rojê dubare bû, dema ev warê bawermendîyê – ziyaret, hate çêkirinê û dua lê hate kirinê.

Di mehên salê yên cuda-cuda da, xwesma di mehên havînê da, me li vir gelek êzdîyên li Rûsîyayê dijîn dîtine. Hilbet, her kes şa û serbilind e, ku ziyaretê di fikir û mejûyên wan da gelek tişt guhêrandîye. Bona wê yekê jî bi dil tên, her kes tê, emirê wan çend salî be, karê wan çi be, qulixa wan çi be, ferq nake. Mesele, werzandçîyê êzdî yê bi nav û deng, gulaşgir Roman Amoyan jî li vir bû, ku hertim ji Ermenîstanê ra sîyanetê tîne. Ew çêmpîyonê Ewrupayê yê ducare ye, xelatgirê gelek caran yê dinyayê ye, xelatgirê mêdala tûnc ya lîstikên olîmpîyê ye.

Roman Amoyan (gulaşgir, xelatgirê pêşvanîyên dinyayê û Ewrupayê) – Ez miletê xwe pîroz dikim û dixwezim hûn hertim saxlem û bextewar bin, ez we şa bibînim. Ez dixwezim vê firsendê bi kar bînim û ji we ra bêjim – bira miletê me her sal vê rojê berevî vira bibe û em bi hev ra yekdest bin.

Avtor – Gorî bawermendên êzdî, ziyaret qewatê dide wan. Îdî bûye edet, ku him bona şahîyê, him jî di demên dijwar da têne ziyaretê, dema gelekî hewcê alîkarîya yê Jorîn dibin. Ew ziyaret dergehê bawermendîyên êzdîyan e, ku hêvî û bawerî dike dilê wan.

Sîabend Sadoyan (şervanê azadîyê) – Hurmet û sîyanet ji Mîrze Siloyan ra, yê ku ev ziyaret da çêkirinê û êzdîtîya me bi hev va da girêdanê. Ez razîbûna xwe ya kûr didime gênêral Manvêl Grîgoryan, yê ku mezîla ziyareta me da zêdekirinê û got: "warê ziyaretê nayê firotan, tê pêşkêşkirin". Îro mezîla ziyareta me bi saya serê wî camêrî hatîye firekirinê.

Ûsib Etarî (şervanê azadîyê) – Wezîrê parastinê Sêyran Ohanyan bi wê sersalîyê ra girêdayî xelat dane şervanên me û merivên hevalên me yên şehîdbûyî. Em bona qîmetkirina karê me razîbûna xwe didine wezîrê parastinê û serokê komara me.

Avtor – Hilbet, him di nav ermenîyan da, him jî di nav êzdîyan da şahîyên ha bêy mêvandarîyê, nandayînê, eşqvexwerinê xilaz nabin. Wek sala par, vê carê jî cêrgeya xwerinxaneyên bi navê "Mûsalêr" bi sedan mêvanên wê şahîyê qebûl kir.

Hilbet, di qewmandinên ha da gerekê usa jî çend salixîyên edetî pêk bînin, berî her tiştî ya dostanî û biratîya herdu miletan. Vê kasê tamade pêşnîyar dike. Pey ra dest bi sitiranê û sazbendîyê dibe. Pêşî artîstê Ermenîstanê yê emekdar Rûbên Sahakyan sitira. Paşê koma folklorî ya bi navê "Akûnk" reqasên xwe yên ciwan raberî haziran kir. Li ser dikê dû ermenîyan ra dengbêjên êzdî hunurê xwe nîşanî amadekaran dikin, yek ji wana dengbêjê naskirî Cangîr e, an jî Cangîr Broyan, yê ku bi taybetî ji bo vê armancê ji Moskvayê hatîye vira, bona şabûnê bike dilê birayên xwe yên ermenî û êzdî.

Wek ku gelek caran dibe, di şahîyên êzdîyan da reqas cîyê sereke digire. Ya here sereke jî "Govend" e, ku yekîtî û hevgirtina milet dide kivşê. Ew reqaseke wisan e, ku hertim jî ber dilê êzdîyan ezîz bûye û me dibe ber bi reh û koka vî miletî.

Emê dîsa vegerine "Mûsalêr"ê, ku mêvandarî warguhêzî sitiranbêjîyê û sazbendîyê bûye, bûye warê leca bi tevgelîya hunermendên ermenî û êzdî. Û mêvan ji Lalişa Nûranî – navbenda ruhanîya êzdîyan, ji warên Îraqê yên cuda-cuda, ku êzdî zêde lê dijîn, usa jî ji Bexdayê hatine. Ewana roja hatina xwe ya Rewanê ya pêşin da seredana Sîsêrnakabêrdê kirîye, ku li wir warê bîranîna şehîdên gelkujîya ermenîyan e.

Sala par, hema xût vê rojê, gava serekê ruhanî yê êzdîyên temamîya dinyayê gihîşte Rewanê, yekser çû ber heykelê bona bîranîna gelkujîya ermenîyan û hema li vir – li Sîsîrnakabêrdê, rojnamevanan bi wî ra hevpeyvîn kirin û wî got, ku kula wê qirê bi ermenîyan ra tevayî êzdî jî dikişînin.

Mîrê Mîran Tehsîn beg – Min êdî ji Ermenîstanê lezeteke baş dîtîye û ez şa me, ku kêfa êzdîyan ji vira gelekî tê. Ev seredana me li Sîsêrnakabêrdê careke din wan rojên bi qetil tîne bîra me, ku wan deman ne tenê ermenî hatine qirê, lê usa jî êzdî û aşûrî. Xwedê mezin e, û daxweza me ew e, ku ecêbeke usa tu caran li tu cîyan dîsa neyê serê miletan û di dîrokê da bedbextîyên ha dubare nebin.

Avtor – Bona mêvanên ji Lalişê hatî nimûneyên ku li mûzêya Gelkujîya Mezin da hatibûn nîşandan, pir balkêş û hewaskar bûn. Ewana li vira gelek tişt cara pêşin dibînin. Ewana ne tenê bi guhdarî şirovekirinan dibihên, lê usa jî pirsan didin, fikirên xwe bi hev ra diguhêrin.

Em careke din bikine bîra we, ku malbeta Mîrê Mîran di salên gelkujîya ermenîyan da sitar daye zêdeyî 6 hezar ermenîyên mihacirbûyî.

Mêvan di pirtûka "Ji bo mêvanên qedirgir" da bîranînên xwe dinivîsin, di wan da ne tenê hurmet û sîyanet heye di hindava gel da, herwiha haziraya wan tê elamkirinê, ku pirsa naskirina gelkujîya ermenîyan pêşnîyarî parlamêntoyên Herêma Kurdistanê û Îraqê bikin. Bi bawerîya wan hovîtîyên usa gerekê temamîya dinyayê bihese, bona ew tu caran dubare nebin. Êzdî jî miletekî wisan e, ku hatîye qirkirin, kuştin, mal û milkên wan hatine wêrankirin û talankirin, û ewana kul û derdê bêderman yê gelê ermenî diha rind fem dikin. Niha jî, dîsa bi sipartina serekê ruhanî yê êzdîyan dêlêgasyona ji Lalişê hatî li vir e – bi serokatîya Mîr Hazim, yên ku borcê xwe dihesibînin dema bêne Ermenîstanê, berî gişkî herine Sîsêrnakabêrdê, ber heykelê şehîdên qira ermenîyan temene bin, bejina xwe bitewînin. Bi bawerîya Mîr Hazim, ne dûr e, ku parlamêntoyên Kurdistanê û Îraqê qira ermenîyan nas bikin. Mîrzeyê Çolo Siloyan û Mîr Hazim tacê kulîlkan datînin ber heykelê li Sîsêrnakabêrdê, paşê kulîlkan dibin ber heykelê agirê netemirî jî.

Pîr Hamo – (wezîrê pêwendîyên bi civaka sivîl ra li hukumeta Îraqê) – Bi hayadarîya serekê ruhanî û şêxê me em hatine tevî şahîya ziyaretê bibin. Em dostanîya xwe ya bi sedsalan

ji bîr nakin û em borcê xwe dihesibînin, ku wek nûnerên gelê êzdî tevî heyteholên li ziyaretê têne kirin bibin.

Avtor – Gava sala par mêvanên ji ziyareta Lalişê hatibûne Ermenîstanê, gelek rasthatinên wan yên fermî hatine derbazkirin, wana seredana gundên êzdîyan kirin û gelek kêm wext ma bona bi Rewanê û Ermenîstanê ra bibine nas. Bona wê yekê jî wana vê carê hewil dida çiqas ji dest wan tê zêde bi Rewanê ra bibine nas. Vê carê wana pê ra gîhand herine Matênadaranê. Li vira mêvan bi germî hatine qebûlkirin, ewana bi vê dezgeha parastina destxetên kevinare û bi qedera destnivîsarên ermenî ra bûne nas, wana wisa jî bala xwe dane destxetên bi zimanên din.

Pîr Memo – Em ji Lalişa Nûranî 29ê îlonê sala 2013an, li vê roja bi nav û nîşan, hatine vira. Van rojan me gelek tişt dît, bi gelekan ra sohbet kir, em bi kûltûra xwe ra bûne nas. Me li Matênadaranê fem kir, ku ermenî miletekî kevinare ye û xwedî kûltûrake balkêş û hewaskar e. Niha ez êdî zanim, ku ermenî berî Îsa jî xwedî kûltûrake dewlemend bûne, dewleta wan hebûye û hemû dewletên dorê di nav teşkîla wê da bûne, welatekî ji behrê heta behrê bûye. Artêşa wan ya bi hêz, cebirxane, leşker û pereyên wan hebûne. Wana xaçparêzî qebûl kirine, wergera pêşin ya "Încîl"ê kirine. Di karê heykelterêşîyê, sitêrkzanîyê, dinêzanebûnê, bizîşkîyê da gihîştine serketinên mezin. Ermenîstan piştî qebûlkirina xaçparêzîyê ra jî pêş ketîye û tesîra wê li ser pêşketina medenîyetê pir bûye.

Bavê Çaûş (endamê desteya bilind ya ruhanî li Lalişê) – Kêfa min hat gava min ber ziyaretê bi hezaran êzdî dîtin, û ew ne tenê ji Ermenîstanê bûn, lê usa jî ji Rûsîyayê, Gurcistanê, welatên Ewrupayê bûn. Ev hemû bi saya serê Mîrzeyê Çolo Siloyan e, yê ku bi pereyên xwe û yên neferên mala xwe ev ziyaret da çêkirinê.

Ez dixwezim razîbûna xwe ji Mîrzeyê Çolo Siloyan ra bêjim bona her tiştê wî kirîye û bangî wan kesan dikim, ku çav bidine wî, yê ku mal û milk di destê wan da heye û dikarin kêrî gelê xwe bên. Em berî demekê li Matênadaranê bûn, me nivîsên bo xwe kêrhatî dîtin. Em gelek şa bûn, dema gotin, ku di wan da derheqa

êzdîyan da jî gelek malûmatî hene. Li vira heta di çavkanîyên kurdî da jî derheqa êzdîyan da malûmatî hene. Û ez dixwezim berê xwe bidime wan hemû kesan, yên ku dikarin bi lêkolîna van çavkanîyan va mijûl bibin, ev hemû gerekê derxine meydanê, bikine milkê milet.

Avtor – Bona mêvanên me ruh û heyetîya ermenîyan bi vî awahî jî tê dîyarkirin, û ji ber wê jî gelek pirs-pirsyar dikirin. Her tişt hewaskar û balkêş bû bona wana, û ewana dû ra çend caran dubare kirin: "Em bi hezaran salan li rex hev dijîn, lê em derheqa hev da gelek tiştan nizanin, xwesma nesila nû ya herdu miletan hewcê wê yekê ye, ku ji nêzîk va hev nas bikin".

Ecîm Kerîm Silêmanî (Irak) – Eva cara dudan e ez tême Ermenîstanê. Cara pêşin ez hatibûm bona vekirina ziyaretê û min wê demê lezeteke baş dît, ku ziyareta me li welatê we heye. Li Rewanê, di dema rasthatinên bi karmendên derece bilind ra me Ermenîstan baş nas kir. Me wî çaxî got, ku emê dîsa bên. Û îro em dîsa hatine bona tevî şahîya sersalîya ziyaretê bibin û me bi xwe ra duayên Lalişa Nûranî anîne. Vekirina ziyaretê bûyereke mezin e di jîyana Ermenîstanê û di dîroka gelê êzdî da.

Gelek êzdî ji Ermenîstanê derketine û çûne dewletên cuda-cuda yên Sovyeta berê, çûne Ewrupayê. Bi texmîna min, ev ziyaret wana digihîne hev. Heta wana jî, ku terka gund kirine, lê rehên xwe li vir hîştine. Warên jidayîkbûnên wan li vir in. Van rojan li Ermenîstanê em çûne warên dîrokî yên cuda-cuda, me bala xwe da heykelên ermenîyan yên dîrokî-kûltûrî, em bi mîrata kûltûrî ra bûne nas û li her deran me lezeteke baş dît, dema me nasîya xwe dida Garnîyê, Gêxardê, Xor Vîrapê, Êcmîadzînê.

Em bi wan her tiştan va kubar dibin, ku yên dostên me – ermenîyan in.

Avtor – Warê seredana mêvanên qedirbilind yê dinê kela Garnîyê ya pûtperestîyê ye. Dostên me yên êzdî ne tenê heyr-hijmekar, lê usa jî zendegirtî û şaş-metel dimînin. Lema jî lez dikevin herin him kelayê bibînin, him jî wargehê wê, ku li rex gêlî ye, bi wê yekê va qedirê gelê ermenî û dîroka wî yê kevinare bigirin. Bona

wana her tişt balkêş û hewaskar e. Di nava dêlêgasyonê da kesên derece bilind, wezîr, şêwirmend hene û ewana hewil didin ji nêzîk va hevdu nas bikin.

Dema mêvanên me dikevine komplêksa dêrên li Garnîyê, ecêb dimînin. Li vira ewana bi pêşîyên me va heyrî dimînin. Di tiştên dîtî da wana aqilmendîya pêşîyên gelê me didîtin.

Doktor Mîrze Dina (Îraq) – Ez razîbûna xwe ya pir elamî Mîrze dikim, ku ev her tişt daye çêkirin û ew yek gelê me digihîne hev, nav me da yekîtîyê çê dike. Ez razîbûna xwe didime ermenîyan û dewleta ermenîyan, ku destûr dane van her tiştan çê bikin. Em li vira rastî ronakbîrên êzdîyan hatin û gelek şa bûn, ku li Ermenîstanê merivên ha xwendî û pêşketî, zaneyên dîroka xwe hene û daxweza me ew e, ku ew bêne Îraqê, bi welatîyên xwe ra bidin û distînin.

Em çûne Matênadaranê, me ji nêzîk va nasîya xwe da destxetan, dîroka ermenîyan û me rola ermenîyan di nav pêşketina medenîyetê da texmîn kir. Em pir kêfxweş in, ku dostên me yên ha hene. Ez dixwezim em hemû ji dîrokê dersan hildin, herdem bi hev ra, alî hev bikin, piştgirîya hev bikin.

Avtor – Gêxard ji bo serekên ruhanî yên Lalişê warekî ber dilê wan ezîz e, ji ber ku li wir jî bi sedan salan ruhê miletîyê yê ruhanî tê parastinê. Hema komplêksên ruhanî yên ha dibine bingehê nivîsar û edebîyetê, serkanîya ruhê miletîyê, warên parastina kûltûrayê.

Yek ji serekên ruhanî yê Lalişê Bavê Çaûş eva cara dudan e, ku li vir e, û wek ku ew bi xwe dibêje, ewî vê carê bi çavekî din li Ermenîstanê, li dîroka wê, li gelê wê, wisa jî li êzdîyên bira nihêrî. Nasîhevdan û seredanên ha ji bo gelê li vira dijî pir giring in. Hema ji bo wê yekê jî dema çûyînê gotin: heta hevdîtineke din. Ji ber ku axa Ermenîstanê wisan e, ku her kesî ber bi xwe dikişîne, lê miletê li wir germ û mêvanperwer e. Ango, wê dîsa bêne vira, bi kêmanî salê carekê, bona seredana ziyaretê bikin.

Doktor Cemîl (Îraq) – Eva cara dudan e, ku ez li Ermenîstanê me. Sala par wextê vekirina ziyaretê jî ez li vir bûm. Min zêde ji

vî welatê xweş, bi merivên wî yên germ û dilovan va, hiz kir. Ez ji Ermenîstanê gelekî hiz dikim. Welatekî bedew, mêvanhiz e, her kesî ber bi xwe dikişîne. Ez şa me, ku ev welat bi dilê welatîyên min e jî. Ez ji gelê ermenî pir razî me bona vê helwestê. Lê Mîrze li vir ecêbek kirîye rastî, li vir ziyaret çê kirîye. We dît, ne, çend hezar kes hatibûn? Bernameyên wî yên paşerojê jî yên pesindayînê ne, ku li vir ne tenê wê ziyaret hebe, lê usa jî ziretgeh, bi der û dorên xwe yên bedew û hijmekar va. Em şa ne, ku hatine Ermenîstanê, em hatine cem pareke cimaeta xwe, me bala xwe da hal û demên wan, em bi wan va firnax bûn.

Em şikirîyê ji Xwedê ra bînin, em ji Ermenîstanê ra xweşbextîyê bixwezin, bira dostanîya ermenîyan û êzdîyan ya heta-hetayê be. Gava em têne Ermenîstanê, em zoraya wê dostanîyê texmîn dikin. Em zef razîne, gelê ermenî, ku we mecal saz kirine bona Mîrze bikaribe vê ziyaretgehê çêke. Xwedê me gişka sitar bike.

Îvo Waweş (Îraq) – Ez ji Mîrze Siloyan gelekî razîme, ku ziyareteke ha çê kirîye. Ew êzdîyên ji welatên cuda-cuda digihîne hev. Gava em vegerîyane Îraqê, emê ji êzdîyan û ermenîyan ra şirove bikin, ka me li vira çi dît. Êzdî miletekî bi hejmara xwe va biçûk e, û ev ziyareta li Ermenîstanê çêkirî wana digihîne hev. Ez weke vê dinyayê ji Ermenîstanê razî me bona van her tiştan.

Avtor – Em careke din dema xatir dixwezin û berê xwe didine "Mûsalêr"ê û li ser vê axa ermenîyan du miletên bira şa dibin, kêf dikin, hunermendên êzdî û ermenî kilama dibêjin, direqisin, di nav wan da ye usa jî dengbêjê êzdî yê teze xuliqî Artûr Safoyan. Pey ra Cangîr Broyan bi qiseyên xwe yên hewaskar va dest bi sitiranan dike. Em wê jî bêjin, ku malbeta Siloyanan jî xweyşuret e, dengê neferên wê malbetê jî xweş e. Birazîyê Mîrze Siloyan, Miraz çîroka xwe dibêje, ya derheqa evînê û aminayê da, hêvîyê û bawerîyê da, dostanîyê û biratîyê da, qewmtîyê û pêwendîyên merivan yên here qenc da.

Dibe eva reqasa xatirxwestinê be? Lê heta sala tê, hema vê rojê, dema dîsa wê bi hezaran meriv berevî ziyareta li Aknalîçê bin, bona aminaya xwe ya di hindava dînê xwe da, derheqa dostanîya

ermenîyan-êzdîyan da dîhar bikin, ku ber dilê me hemûyan ezîz in. Em gişk xatirê xwe ji hev dixwezin. Û li vira hêja bû em wêneyê xwe bi hev ra bikişînin.

Û gişk dibêjin: heta rasthatineke din li Aknalîçê, sala 2014an li ziyareta êzdîyan, ya nûjenkirî û mezinbûyî.

Usa qewimî, ku pey çend rojan ra me dîsa seredana ziyareta êzdîyan ya li Aknalîçê kir. Û li vir dîsa gelek meriv berev bûbûn. Li wir du dewat hebûn. Yek ji wana ji gundê Kaxsraşênê, navçeya Araratê hatibûn. Bûk û zava gelek şa bûn, ku şahîya wan li warekî bawermendîyê, li ziyaretê derbaz dibe. Wek ku wana digot, pey wê yekê ra, ku horî-melekan dua li wan kir, şahîya xwe li warê li rex ziyaretê berdewam kirin. Ew war bûbû meydana reqasê. Her kesî direqisî – mezin û biçûk, jin û mêr. Hela di ser da jî, li wî warê ber dilê wan ezîz şabûn ketibû dilê her kesekî.

Miraz Mûradyan (serdewatîyê şahîyê) – Em ji Mîrze Siloyan gelek razî ne bona çêkirina vê ziyareta me. Em hemû têne vira û şa dibin.

Avtor – Hela me pê ra ne gîhandibû bi avabûna royê va heyr û hijmekar bimana, me hew dît li vira dewateke din dest pê dike, vê care ji gundê Artaşatê, navçeya Armavîrê hatibûn. Kesên li vira digotin, ku ji warên Ermenîstanê yên cuda cuda, ku êzdî lê dijîn, têne vir. Usa jî ji Gurcistanê, ji welatên Sovyeta berê jî tên. Bona heyteholên cuda-cuda tên, bona hecê, bona seredanê. Şabûna tevbûyên şahîyê ber ziyaretê bi reqasên qeşeng va xemleke bedew dida wî warî.

Ziyareta Aknalîçê bi vî awahî roj bi roj gul vedide, kaw û bedew dibe û bi sedan bawermendan gazî cem xwe dike. Niha li vira çêkirina xanîyê navbenda perwerdeyê-kûltûrayê pêşda diçe. Bi wê ra tevayî wê der-dorên ziyaretê bê tundurustkirinê. Çend meh wê derbaz bibin, û ev warê fire yê dora ziyaretê wê di nav gul û gîha û baxan da winda be, wê bibe warekî ber dilê ermenîyan û êzdîyan ezîz, û pêkhatina xewna Mîrzeyê Çolo Siloyan ya bi salan wê diha geş xuya bibe.

Aknalîç-Rewan-Garnî-Gêxard,
Îlon, sal 2013.

EZDIKI.COM

Riya ku ber bi ziyaretê dibe. Pey du salan ra

Ez nizanim çawa bêjim, ji bext ra, an jî ji telebext ra, wext pir zû derbaz dibe û carina pê ra nagihînî tiştên buhurî bi hûrgilî parzûn bikî, bidî ber hev. Niha ji 29ê îlonê sala 2014an demeke dirêj derbaz nebûye. Lê fikir û bîr û bawerî gelek in. Lê di bin van fikirên dagirtî da meriv dikare tam fem neke, ka di rastîyê da çi qewimî. Niha, gava gilî tê ser wê yekê, ez wek berê di wî halî da me, çimkî bûyer û fikir ewqas pir in, ku ne dixwezî bersîva wan bidî, ne jî dixwezî derheqa wan da tiştekî bêjî.

Ez di nav van fikiran da bûm, dema dostê min – Sêrgo Yêrîtsyan, ku bi koma xwe ya efrandarîyê ya bi navê "Kartsik" va bûye salnivîsarê taybet ji bo qewmandinên li ziyareta me ya li Aknalîçê dibin, ez teglîf kirim bona fîlma wî ya vîdêoyê ya bi navê "Riya ku ber bi ziyaretê dibe. Pey du salan ra" mêze bikim. Gava me film nihêrî, kuta kir, min fem kir, ku di vê fîlmê da ne tenê bersîva hemû pirsên xuliqî hatîye dayîn, lê usa jî bi kurtî hatîye xuyakirin, ka di 29ê îlonê da çi qewimî. Hilbet, dijwar bû di nav bi hezaran kesan da meriv bikaribe her tiştî fêm bike û derc bike. Di vî karî da ew aparatên fîlmkişandinê karekî mezin kirin, ku ji jor va her tişt dikişandin. Ji wana xuya bû ka di rastîyê da wê rojê li ziyaretê çi diqewimî. Carina wisa xuya dibe, ku em li ser erdê pir in, gelek pirsgirêkên me hene, lê ji bilindahîyê em diha sade û zelal in, kêm-zêde têne femkirin. Ango, hema em in, ku dikarin him şa bibin, him ber xwe kevin, him jî biêşin...

Ji telebext ra, wê rojê wisa qewimî, ku ez westîyayî bûm û berî destpêka şahîyê pirsgirêkên min yên tundurustîyê hebûn, lê dîsa jî ez hatim, gihîştime meydana şahîyê, li ser kursî rûniştim. Wê demê ez difikirîm, rewşa min çawa be jî, ez qe na li rex mêvanan bim.

Hilbet, 3-3,5 mehên xebata ser hev tesîra xwe li min kiribûn û wisa xuya dikir, ku niha gerekê dema kêfê bûya, lê wisa derneket.

Bi dîyarkirina vê surê dixwezim razîbûna xwe bidime dostên xwe yên nexweşxaneya Êcmîadzînê – bizîşkan, yên ku her tişt kirin, ku cansaxîya min zirarê nebîne, û ne tenê wê rojê, lê di rojên pêşdemê da jî. Dema wextê xeberdana min hat, ez zêde tevlihev bûm, min hewil da wan tiştan bêjim, ku ez difikirîm. Ji bextê min ra min fikirên xwe ji pêşda nivîsîbûn û xwendina wan ez xilaz kirim. Ez li vir xeberdana xwe raberî we dikim:

- Amadekarên ezîz, welatîyên min!

Çavên me melûl in û ruhên me bi xem in, çimkî rastîya bêbext ya sedsala 21ê careke din merivan da bawerkirinê, ku peyçûyên îslamê yên tundraw, ku ji her tiştên merivatîyê dûr in û gorî edetên pêşîyên xwe yên hovîtîyê emel dikin, heta niha jî li ser riya medenîyeta cihanê bûne asteng, tenê dewsa şûr û mertalan, îro reşaş û avtomatan bi kar tînin, lê dewsa hespan makîneyên "Hamêr" in.

Van rojan, cihana wa gotî "pêşketî", bêxem e, wek ku berî sedsalekê bû, bêdeng e û nabîne ka li navçeya Lalişê ya li Îraqê çi diqewime, bêxem e di hindava qetilkirina bi hezaran welatîyan, li wir jin û keçan direvînin û dişuhurînin, nesla nû dikin qûlên xwe û ev her tişt bona wê ye, ku ew merivên bê sûc dixwezin ser dînê xwe bimînin.

Eva qirkirina eynsî ye. Ew dengvedana wê bedbextîyê ye, ku gelê ermenî yê bira dîtîye û dengê xwe yê şikyatkirinê bilind dike û ew deng ji zarê serekên herdu komarayên ermenîyan – birêz Sêrj Sargsyan û Bako Sahakyan, Metranê temamîya ermenîyan Garêgînê 2an li tevaya cihanê belav dibe. Şêkirdarîya me ya ji dil ji wan ra û bi serî wan ji temamîya gelê ermenî ra.

Em herwiha razîbûna xwe didine dengbêjê di cihanê da bi nav û deng Şarl Aznavûr, yê ku di van rojên ji bo êzdîyan qirardar da dengê xwe bilind kir dijî destdirêjayên îslamîstan û kesên ku helanan didine wan.

Birayên me yên ermenî yên Ermenîstanê di rewşa welêt ya aborî ya dijwar da jî ne tenê alîkarîya xwe ya moralî nîşanî welatîyên me yên li Lalişê didin, lê herwiha alîkarîya peretî û yên mayin jî dişînin. Ez dixwezim wê yekê jî destnîşan bikim, ku di van rojên bona miletê me reş da him êzdîyên Ewrupayê, him jî yên Rûsîyayê bi alîkarîya peretî û bi eşîyan va dixwezin alî wan wan welatîyên xwe yên li Îraqê bikin, ku di rewşeke "cehnemî" da ne, hewil didin bi xwe tevî wan mecalan bibin, ku têne kirinê bona parastina xwîşk û birayên me.

Rewş li Lalişê ha ye. Ev rewşa dikare warguhêzî belayeke hemcihanî be. Ji ber wê yekê jî em ji vî warê ber dilê me ezîz bangî ewrupîyan û amêrîkîyan dikin, ku ji xewa hingorê hişyar bin, çimkî daxwezên îslamîstan, ku dewleta îslamîyê – xalîfatê saz bikin, wê bi Îraqê û Sûrîyê va xilaz nebin, û rojeke nav û nîşan jî wê Ewrupa û Amêrîka mecbûr bibin bi qanûnên şerîetê va bijîn.

Welatîyên min, ezîzên min!

Bi gotina şayîrê ermenîyan yê mezin – her tişt axirîyê dibe xwelî an jî kozî, her tişt, xên ji bîranînê. Em bi deqeyeke kerrbûnê va qedirê bîranîna şehîdên fermana 74an yên bê sûc û guneh bigirin, bira Taûsî Melek bê hewara wan û bona ew bikaribin himberî vê bedbextîyê ber xwe bidin, ku usa jî ji bo temamîya merivayê xeta ye.

Gelî merivên hazir!

Lê emir pêşda diçe. Îro 29ê îlonê ye, û em dîsa li vî warê ziyaretî da berevî ser hev bûne. Wek ku min li jorê destnîşan kir, bîranîn herdem dimîne, ji neslekê derbazî nesla din dibe. Îro em li ziyareta xwe ya hemêza xwe vekirî da heykelên kesên ber dilê xwe ezîz, ku nûnerên ermenîyan û êzdîyan in, vedikin. Yên Ûsiv begê, Cangîr axa, Zoravar Andranîk, mêrxas, ku herwiha bi saya serê têkoşîna wan e jî, ku em gerekê li ser vê axa delal heta-hetayê bijîn.

Van dehsalîyên axirîyê derheqa emir, mêrxasî û karê welatparêzîyê yên Zoravar Andranîk û Cangîr axa da, derheqa biratîya wan ya germ û ji dil, ku îro bûye nimûneya zindî ya

dostanîya herdu miletan, gelek caran hatîye xeberdan û nivîsar. Ev mezinayên, ku bona me bûne lêgênd, ji vir şûnda wê li rex hev wek du melek sînorên Ermenîstanê biparêzin, wê me û nesletên me ruhdar bikin vî erdê biçûk mînanî ronahîya çavan biparêzin û bi hêvî bin, ku rojek ji rojan wê xewna herdu miletan bibe rastî – herine welatê kal û bavan, ne wek tûrîst an jî mêvan, lê wek xwedîyê malê herine wetenê kal û bavan – gundê Kullikê, gundê Cangîr axa – Çîbûxlûyê, gundê Ûsiv beg - Eslanlûyê, behra Wanê ya bedew an jî Anîya bi hezar û yek dêran va, ku em van axirîyan lê qesidîn.

Niha ez dixwezim derheqa ewledekî miletê me yê hêja û bi nav û deng da xeberdim, ku heykelê wî jî wê virhada li ser axa ziyareta me be.

Ûsiv beg Têmûryans. Serekeşîrê êla Hesinîyan yê 26an Ûsiv beg sala 1869an li Ermenîstana Roava, li navçeya Surmelîyê, gundê Eslanlûyê da ji diya xwe bûye. Kalikê Ûsiv – Têmûr axa, paşê jî bavê wî – Hesen axa, ku cîgirê qiralê Kavkazê mîrlaw Voronsov rind ew nas dikirin û qedirê wan digirt, rind derc dikirin, ku di nav sînorên împêratorîya osmanîyê da bijîn, tê maneya ku herdem bêne zêrandin û tirsa kuştinê li ser wan hebe, wek ku hate serê ermenîyan, asorîyan, huruman. Û gelên xwedî qederekê û daxweza, ku bi hev ra ber xweserîtîyên tirkan ber xwe bidin, dostanîya heyî xurttir dike, ku bi sedsalan di navbera ermenîyan û êzdîyan da hebû: herdu jî parastvanên erf-edetan, Xwedêtirs û Xwedênas.

...Derê Hesen axa hertim jî ber ermenîyên diçûne Surmelîyê û Îdirê vekirî bû. Wek nimûne, ronahîdarê ermenîyan yê mezin Xaçatûr Abovyan li devera Surmelîyê gerîyaye, bûye mêvanê Hesinîyan, û derheqa van hemû tiştan da lêkolînek nivîsîye bi sernavê "Êzdî". Abovyan herwiha texmîn kirîye: "Ji miletên cînarên xwe ewana bi tu yekî ra ewqas nêzîk nînin, ewqas baş bi hev ra kar nakin, çiqas ku bi êzdîyan ra û ew wana wek bira dihesibînin". A bona wê yekê jî, gava pirsa xwendina Ûsivê biçûk hate meydanê,

bavê wî – Hesen axa bêy ku zêde bifikire, qirar kir kurê xwe bona xwendinê bişîne zaniştgeha Gêvorgyan ya li rex dêra ermenîyan ya sereke. Bi vî awahî Ûsivê êzdî (an jî Hovsêp, ku bi ermenî wisa wî bi nav dikirin) ber metranê hemû ermenîyên cihanê disekine û bêy ku tu gotinekê bi ermenî bizanibe, zanişgehê da tê qebûlkirin. Lê ne ew tenê di wê rewşê da bû. Ewledekî ermenîyan - Soxomon jî, ku paşdemê da bû Komîtasê bi nav û deng, di wî halî da bû, yê ku gelek xweş distira, lê ne bi ermenî. Qederê du mezinên me – Ûsiv beg û Komîtas hevdu ra kire nas, dû ra jî ew kirine dostên hev yên nêzîk. Û tiştekî ji nişkê va nîbû, ku xebata dîplomîyê ya Komîtas di dema xwendina wî ya li Ewrupayê sazbendîya êzdîyan ya miletîyê bû. Di paşdemê da jî Komîtas gelek caran behsa sazbendîya êzdîyan kirîye, ew berev kirîye, şimşat kirîye, notayên wan nivîsîne û bi wê yekê va bi dehan nimûneyên ji xezîneya sazbendîya me ji windabûnê dane xilazkirinê.

Ûsiv serhevdu 27 salî bû, gava pey wefatbûna bêwede ya bavê xwe – Hesen axa, karê serekeşîrtîyê hilda ser milên xwe û êdî ne tenê zimanê dê zanibû, lê usa jî zimanên ermenî û rûsî zanibû û wek serekê Hesinîyan, gorî êzdîzan Soxomon Yêxîyazaryan, ji alîyê malbeta xwe, hemû endamên êlê da dihate hizkirin û qedirê wî digirtin.

Lê xwesma kar û barê Ûsiv beg yê di destpêka sedsala 20an da diha berbiçav û hêjayî bîranînê ye. Êdî prîskên alava şerê hemcihanê yê pêşin xuya dibûn. Ermenîyan û miletên ne musulman êdî ketibûne ber derbên hemîdîyan, texmîn dikirin, ku ew şerê mezin bi xwe ra mirinê tîne. Cangîr axa û Andranîk Ozanyan cara pêşin li gundê Hezerana Bêrkirîyê hev nas dikin û dibine dostên hev. Dû ra ewana bi hev ra gelek caran dibine mêvanê Ûsiv begê û ew dibin sisê. Dostanî û biratîya wan di paşdemê da di şerên bo Qersê, Sarîqamîşê, Baş Aparanê û li warên din xurttir bû û kemilî.

Sala 1914an. Leşkerên artêşa Rûsîyayê ya li Kavkazê, ku di wê da desteyên ermenîyan û êzdîyan yên rezadil bi mêrxasî şer dikirin, pêşda diçûn ber bi kûraya Tirkîyê, hêvî dikirine dilê

ermenîyan û êzdîyan, ku wextê azadîyê nêzîk e. Lê şoreşa bolşêvîkan li pêşenîya Kavkazê rewş ji binî va guhart. Qiralîyeta Rûsîyayê felişî, û axa Ermenîstana Roava ya biçûk ma di bin destê hovên osmanîyan da. Şerê li Serdaravê (di gulana sala 1918an da) bû şerê man-nemanê. Ûsiv beg bi sedan siyarîyên xwe va tevî wî şerî bû. Piştî serketinê, li bakurê çemê Erez, li ser axeke biçûk 28ê gulana wê salê Komara Ermenîstanê ya pêşin hate damezirandinê, ku usa jî bi saya serê ewledên gelê me yên mêrxas pêk hat. Bi îlankirina komarê ra girêdayî Ûsib beg bi xwe ji navê hemû êzdîyên Ermenîstanê têlêgrameke pîrozbahîyê şande Tbîlîsîyê – ji serekê hukumeta Ermenîstanê Hamo Ohancanyan ra û tê da dida bawerkirinê, ku ewana ji vir şûnda jî wê her tişt bikin bona gulvedaana welêt. Hêja ye bîr bînin, ku di paşdemê da jî Ûsiv beg bi sonda xwe ra amin ma û tu caran ber qeydên Sovyet çok veneda. Li Ermenîstana serbixwe parlamêntoya pêşin ya komara sosîalîst bi 46 parlamêntaran va hate sazkirinê, ku yek ji wana Ûsiv beg Têmûryans cîyê xwe yê layîq girt, wek endamê komîsyona kar û xemxurîyê. Parlamêntarîya wî ji alîyê êzdîyên Ermenîstanê yên 27 olkan da hatibû piştgirîkirinê. Mirovên wan deman destnîşan kirine, ku Ûsiv beg di dema karê xwe yê parlamêntarîyê da guhdarîyeke taybet daye ser xwendin û nivîsara êzdîyan, pirsgirêkên perwerdeyê, û ew hemû bû yek ji pirsên rojeva wê kongreya êzdîyan ya pêşin, ku bi înîsîatîva wî 20ê tebaxê sala 1920î li Alêksandrapolê hate derbazkirinê.

Lê çirîya paşin ya sala 1920î dawî li pêkanîna hemû meremên Ûsiv begê anî. Dîwana teze ne tenê di hindava wan da bêxem bû, herwiha ji berê va dest pê kir zor li wan kesan kir, ku tevî şerên miletîyê-azadîyê bûbûn û ew bê bingeh sûcdar dikirin. Ji wan kesên, ku bi dû wan ketibûn, di lîsteyê da navê Ûsiv begê serê jorîn hatibû nivîsar, ne tenê wek tevbûyê tevgera ji bo azadîyê, lê usa jî bona wê, ku nav û dengê wî di nav milet da gelek bû, mirovekî aqilmend bû.

Di dawîya sala 1929an da dîwana nû wî mehkeme dike û

sirgûnî Kyeverê dike, lê du salan şûnda wî cîguhastî hebisa Rewanê dikin. Di rastîyê da, Ûsiv beg bi saya serê serekê Ermenîstanê yê wê demê Axasî Xancyan ji sûcê diha giran û ji kuştinê xilaz dibe. Ew di havîna sala 1932an da navçîgarîyê dike bona wî ji hebisê azad bikin. Lê sirgûnî, hebis û ya sereke jî – rewşa derûnî tesîra xwe li ser cansaxîya ewledê gelê me yê hêja û dostê gelê ermenîyan yê rasteqîn hîştibûn. 12ê çileya paşin sala 1934an Ûsiv begê 65 salî xatirê xwe ji vê dinyayê xwest û ji bo neslên tê navekî qenc, riya jîyanê ya paqij hîşt û bû nimûneyeke baş bona xizmetkirina ber welêt û milet.

Îro karekî me yê pîroz jî heye. Biratîya gelên ermenî û êzdî ya bi sedan salan îro bi heykelekî bedew û pirfikir va hate jîyandin û îzbatkirinê. Ez wê îzbatîyê tiştekî sîmvolîk dihesibînim, ku dostanîya herdu gelên me di sîmvolên wan da jî xuya dibe – di royê û xaçê da, ku herdu jî jîyanê didin, herdu jî heta-hetayê ne. Em bawer in, ku çawa ro û xaç jîndar in, eynî wisa tu kes wê nikaribe yekîtîya me têk bibe. Ez usa jî bawer im, ku çiqas riya ku ber bi ziyaretê dibe paqij û zelal e, ewqasî jî ev heykelê nîşana dostanîya gelên me wê ji bo wan kesan bibe eşaretî, yên ku bicêribînin dostanîya me xirab bikin.

Cimeta qedirgir, sedsalîya gelkujîya ermenîyan ya mezin nêzîk dibe. Di wê gelkujîyê da bi hezaran êzdî jî hatine qirê. Berî roja 100 salîya dîrokî, nesla êzdîyan ku berî sedsalekê li ser axa ermenîyan hêwirîbûn û îro li Ermenîstanê dijîn an jî belayî welatên cihanê yên cuda-cuda bûne, deynê sityuê xwe hesab dikirin bona bîranîna şehîdên bê sûc yên ermenîyan heykelekî bidine sekinandinê.

Tiştekî text-bext nine, ku ew heykel li ser mezîla ziyaretê hate danînê, li ziyareta wî miletî, ku wî jî ji wê bedbextîyê para xwe dîtîye, şehîd dane û heta îro jî di rûyê dînê xwe û miletîya xwe da tê zêrandin û kuştin. Em bawer in, ku ev heykel wê dengê xwe tevî dengê wan bi hezaran heykelan bike, ku li cî û warên cuda-cuda bona bîranîna şehîdên Gelkujîya ermenîyan ya Mezin bi bangawazîya "Merivno, haj ji xwe hebin, ku li cihanê li tu cîyan êdî zulma wisa neqewime" hatine sekinandinê.

Ez we hemûyan pîroz dikim bona vê eyda me ya edetî, 29ê îlonê, roja sersalîya vekirina ziyareta me, em ji we ra serketinên mezin, cansaxîyê û açixîyan dixwezin boy navê pêşketin û gulvedana welatê me.

Ez di dema xwendina nivîsa xwe da gelek lez diketim, dibe jî bona wê, ku min dixwest zû xilaz bikim. Ya giring ew e, ku min tiştên dixwest, got û gotinên min diha zef bûn û derheqa gelek kesan da bûn. Hûn zanin, ku bi sedan kes tevî çêkirina ziyareta Aknalîçê û heykelê bîranînê yê "Dostanîya ermenîyan-êzdîyan" bûne û kê derheqa vê îdêayê da bihîstibû, hewil dida anegorî karebûnên xwe alîkar be.

Lê di van karan da dijwarî ne hindik in, ji peydakirina kevirên bona nexşkarîyê girtî heta dîtina fikirên efrandarîyê yên bêqusûr. Minaqeşe û rastkirinên me di dema xebatê da dibûn û me hewil dida karê xwe heta 29ê îlonê xilaz bikin. Dema di mehên tîrmeh-tebaxê da li Şengalê fermana êzdîyan ya 74an qewimî, çawa dibêjin, dilê min şewitî, saxlemîya min tevlihev bû. Ez fikirîm, min got belkî em van karan paş bixin, çimkî ez destxweda ser heftêyekê çûme Îraqê, min bi xwe ra alîkarîya peretî ya bi cema mezin bir bona welatîyên min yên ku di rojên oxirmên giran da ketibûne rojeke teng. Min her tişt ber çevên xwe dît - malên wêranbûyî, merivên ku ew qetil ber çevên xwe dîtibûn.

Kêfa me êdî ne ya berê bû, gelek welatîyên me jî pêşnîyar dikirin vekirina heykelan paş bixin, digotin ku ne wextê wan e. Gava min derheqa vê yekê da fikira dostê xwe yê nêzîk Sêrgo Yêrîtsyan pirsî, ewî gelekî rehet got:

- Her tişt gerekê wek ku hatîye plankirinê bibe. Emê bi vekirina van heykelan va şehîdên vê qetilê bîr bînin. Li vir kevirê bîranînê yê bona 100 salîya şehîdên gelkujîya ermenîyan jî heye.

Paşê em ser va çûn, ku di vî karî da hesînên me dikarin zirarê bidine karê me.

Em hatine ser wê bawerîyê, ku ev hemû wê bona bîranîna

şehîdan be, û ev yek wisa jî hate kirinê. Û ne tenê di dema derbazkirina sersalîya ziyaretê da, lê dû wê ra jî, gava dest bi beşa sitiranên nivatinê bû, ku koma kilam-reqasê ya miletîyê "Akûnk", artîstê Ermenîstanê yê emekdar Rûbên Sahakyan, dengbêjên êzdî tevî wê bûn.

Sitiran û reqasên zelûl, qeşeng û yên welatparêzîyê ew der hildabûn. Ruhên bi hesînan va tijî li wir perwaz didan. Her kes direqisî, him mezin, him biçûk, bi wê yekê va wana şikyatê xwe dijî wan kuştinan elam dikirin, ku li colanga gelê me diqewimî, di hindava xelqên bê çek, zaran, mezinan, jinan da. Ruhê miletîyê li ziyaretê bilind bû û pey kutabûna heyteholê ra jî meriv dîsa dihatin, bi malbetan va, bi zar û salmezinan va, ji warên Ermenîstanê yên êzdî lê diman, ji Rûsîyayê, Ewrupayê. Ziyaret her kesî ber bi xwe dikişîne, gazî wan dike.

Ez şa me, ku me temamîya şahîya xwe bi dost û birayên xwe yên ermenî ra derbaz kir. Xeberdanên wan yên germ û ji dil, piştgirî û xêrxwezîya wan em ruhdar kirin û karmendên derece bilind yên hazir ew yek ji navê serekê welêt Sêrj Sargsyan, serekwezîr û serekê parlamêntoyê kirin. Meriv çawa dikare sipasdar û şêkirdar nîbe? Bi rastî jî, em dikarin wan hemû karan berdewam bikin, ku mezinên miletê me wek wesyet ji me ra hîştine – herdem bi hev ra bin, wî çaxî emê bikaribin ber her destdirêjayîkê ber xwe bidin.

Ez şa me, ku yek ji armancên min jî pêk hat û îro kêfa min cî ye, ku îro ne tenê ziyaret, lê komplêksa heykelan jî bona merivan bûye cîyê seredaneke xweş.

Gava min ev xet dinivîsîn, ji min ra gotin, ku kurê Cangîr axa – Sûrên, nevîyên wî, qewim û pismamên wî hatine seredana komplêksa heykelan, heykelê Cangîr axa û heykelên din.

Van rojan anegorî edetê miletê me eyda Siltan Êzîdê Sor tê derbazkirin. Bona êzdîyan bûye edet, ku di rojên eydan da seredana mezelan û warên ziyaretî bikin – niha jî ziyareta me û komplêksa heykelan. Ez wê jî bêjim, ku ji min ra bi hûrgilî derheqa vê seredanê da şrove kirine. Ez him bi duayên şêx, him jî ji kesên

ku xeberdan û derheqa min da gilîyên xweş û şêkirdarîyê gotin, zef razîme. Ez dixwezim vê firsendê bi kar bînim û bêjim, ku min ev her tişt ne bona wê yekê kirîye, ku pesinê min bidin û min qîmet bikin, lê min bona wê yekê kirîye, ku ev hemû bi dilê milet be, lema jî min xwe li vê rê girt. Berî mehekê jî merivên yek ji ewledên miletê me yê hêja Ûsiv beg qesta ziyaretê û komplêksa heykelan kiribûn, wî çaxî jî dua, qîmetkirin, daxwazên xweşbextîyê hebûn. Niha hewa sar e, lê ew nabe menî, ku meriv seredana ziyareta me û komplêksa heykelan nekin.

Rastî mala Xwedê, ev her tişt min ruhdar dike, min mecbûr dike ser karên paşerojê bifikirim. Û pêkanîna wan gavan tê maneya, ku wê heykelên teze bixuliqin, bi ruhê teze va.

24ê nîsanê sala 2015an, temamîya dinyayê wê 100 salîya Gelkujîya ermenîyan bide kivşê. Me bi wê rojê ra girêdayî 29ê îlonê sala 2014an li ziyareta xwe kevirê bîranînê danîye û di planên me da heye, ku 24ê nîsanê heyteholeke mezin teşkîl bikin. Wê rojê wê mêvanên me hebin ji Şengalê, Rûsîyayê, Ewrupayê. Ji wê rojê demeke dirêj wê derbaz nebe û wê careke din roja 29ê îlonê sala 2015an bê. Lê berî wê em ji bîr nekin, ku emê têksta vîdêofîlma dostê min Sêrgo Yêrîtsyan ya bi sernavê "Riya ber bi ziyaretê dibe: pey du salan ra" raberî we bikin, ku bi awayekî zelal tîne ber çevan, ka di rastîyê da 29ê îlonê sala 2014an li ziyareta Aknalîçê çi qewimî.

EZDIKI.COM

Têksta fîlmê ya nivîskî ya "Riya ku ber bi ziyaretê dibe: pey du salan ra"

Avtor

Êdî sala dudan e, ku riya ziyareta êzdîyan ya li Aknalîçê ji seredana mêvanan xalî nabe. Hemû demên rojê bawermend têne vira, bona duayên xwe ji Xwedê ra bişînin. Lê di salê rojekê bi hezaran ermenî, êzdî, miletên din ji cî û warên dûr û nêzîk, ji Gurcistana cînar, ji Rûsîyayê, Ewrupayê bi vê riya ku ber bi ziyaretê dibe, têne vir. Ewana bi kêmanî salê carekê têne hecê, bona tevî wê gazîya ruh bibin, ku ziyaret elamî wan dike. Bi vê pirsê ra girêdayî fîlmkişandina ji bilindayê gelek balkêş e. Ziyaret tam hatîye çêkirin, ew mîna ziyareta Lalişê ye, bi mezîla xwe ya bi şînkayê va ximximî û gulvedayî û, hilbet, bi komlêksa heykelan ya "dostanîya ermenîyan-êzdîyan va" û bi navbenda xwendinê-kûltûrayê va. Li jêrê, li ser dikên cuda-cuda temamîya rojê gotinên ji dil, ji ruh, duayên bo Xwedê dihatine gotin, sitiran digotin û direqisîn, şa dibûn, bi ruhê paqij bi hev ra didan-distendin, ku di rojên oxirmên giran da li rex hev bin. Gelek kes bîr tînin, ku tu dibêjî qey duh bû, gava bi serkarîya serekê ruhanî yê dînê êzdîyên temamîya cihanê Mîrê Mîran Tehsîn Beg û bi hazirîya desteya bilind ya ruhanî ya Lalişê dua li vê ziyaretê hate kirinê û ji wê rojê şûnda 29ê îlonê hate îlankirinê wek roja ziyareta Aknalîçê. Çawa salên buhurî, usa jî vê carê êzdîyên Ermenîstanê berî pîrozkirina sersalîya vekirina ziyareta Aknalîçê baqên gulan datînin ber heykelê bîranînê yê li Sîsêrnakabêrdê, bi wê yekê va ewana qedirê bîranîna wan şehîdan digrin, ku di dema Gelkujîya ermenîyan ya Mezin da hatine qirkirinê. Vê carê ji Lalişa Nûranî mêvan tunene,

ku ew jî bi wê yekê va girêdayî ye, ku di mehên tîrmeh-tebaxê da li Şengalê gelek êzdî hatine qirkirinê. Ji alîyê êzdîyên Ermenîstanê tacên gulan danîn bona bîranîna şehîdên fermana êzdîyan ya 74an. Usa jî ji navê serekê ruhanî yê dînê êzdîyên temamîya cihanê birêz Mîrê Mîran Tehsîn Beg qedirê wan şehîdan tê girtinê, ku di Gelkujîya ermenîyan ya Mezin da hatine qetilkirinê. Tevgelên vê bûyerê kulîlkan datînin ber agirê netemirî yê li komplêksa heykelan, bi kerrbûnê va qedirê bîranîna şehîdan digirin, pê ra gotinên ber dil da hatinê û dilkovanîyê dibêjin. Ji wê şûnda berê xwe didine sînemaya bi navê "Moskva", ku vê carê li wir vîdêofîlma "Asoyên dostanîyê û biratîyê an jî heca ber bi welêt" û reportaja " Berbanga edil ya gola Wanê" têne nîşandan. Doktorê zimanzanîyê, profêsor Sêrgo Yêrîtsyan ji navê fîlmçêkiran xeberda û behsa dîroka xuliqandina fîlman kir û destnîşan kir, ku ew hatine sazkirinê usa jî di dema seredana wan ya li Ermenîstana Roava, xwesma dema çûne warên jidayîkbûna ewledên êzdîyan yên hêja Cangîr axa û Ûsiv beg. Ne axir bona ewledên gelê êzdîyan sala 2014an saleke taybet e, Ûsiv beg 145 salî ye, Cangîr axa 140 salî ye.

Doktorê zimanzanîyê, profêsor Sêrgo Yêrîtsyan

Hevkarîya qenc ya gelên ermenî û êzdî ji dem û dewranên buhurî tê, gava li rex hev diman û tu caran bîna wan li hev teng nebû û terk li dostanîya wan neket. Hela di ser da doastanîya xwe kirin biratî bona diha nêzîkî hev bin. Bi hev ra şa bûn, lê demên dijwar da jî pişta hev sekinîn û tu caran bêbextîya hev ne kirin. Lê di rojên oxirmên giran da şerê dijminên xwe kirin, wek ku ew yek di salên Gelkujîya Mezin da qewimî. Û ev hemû bû birîneke bi kul û tu caran wê neyê jibîrkirin.

Avtor

Doktorê zimanzanîyê, profêsor Sêrgo Yêrîtsyan usa jî kitêba binecîyê Moskvayê, bazirganê xêrxwaz Mîrzeyê Çolo Siloyan ya bi sernivîsara "Riya ku ber bi ziyaretê dibe: pey du salan ra" ya derheqa ziyareta Aknalîçê da dide nasandin û nuxseya wê ya pêşin

û usa jî wêneyê bi firçeya wênekêş Armên Harûtyûnyan kişandî - "Ziyaret" teslîmî Avtor Mîrzeyê Çolo Siloyan dike. Rûpelên kitêbê nimûneyên taybet in derheqa xuliqandin, çêkirin û firekirina ziyaretê da, bi fikir, gotin û xeyalên înîsîator û sazkirê wê va. Doktorê dîrokê, dosênt Karên Xaçatryan kitêbên ronahîdîtî yên rojnamevan Manûk Mûradyanê rehmetî bi sernavê "Ûsiv beg", bi zimanên ermenî û rûsî dide nasandin û wana raber dike çawa heykelekî taybet bona bîranîna Ûsiv beg. Nasandina kitêban wê pey mêzekirina fîlman ra, li seraya sînemaya "Moskva" berdewam be û li wir wê usa jî temaşegeha wêneyên bedewnitirandinê ya bi navê "Heca ber bi welêt" bê vekirinê. Niha em vegerine ser fîlmê. Ew pêşkêşî dostanî û biratîya ermenîyan û êzdîyan e, bi serî çar mezinayan – Ûsiv beg, Cangîr axa, Zoravar Andranîk û Komîtas, derheqa jînenîgarî û karkirina wan û usa jî derheqa wan pêwendîyan da ne, ku bi saya wan dostanîya ermenîyan-êzdîyan mîna ronahîya çevan hatîye parastin.

Bernameya me ya li heca ber bi Ermenîstana Roava ewqas dagirtî bû û wextê me jî ewqas kêm bû, ku mecala koma efrandarîyê ya "Kartsik" tunebû qiseyên bi rêwîyan ra ber bigire, ji wana pirsan bike, fikira wan bihese.

-Di vê rewşê da çareserîyek tenê heye,- teşkîldarê rêwîtîyê, binecîyê Moskvayê, bazirgan, çêkirçîyê ziyareta êzdîyan ya li Aknalîçê Mîrzeyê Çolo Siloyan dibêje. Xênji vîdêofîlmê, koma efrandarîyê ya "Kartsik" bernameyeke fikiran-mitaleyan hazir kirîye, li wir Mîrze Siloyan hema li ber kenarê Gola Wanê di hevpeyvîna bi Sêrgo Yêrîtsyan ra fikirên xwe dibêje derheqa welatê windakirî, derheqa qîmetîyên li wir hîştî, usa jî derheqa dostanîya bi cînaran ra, pêwendîyên di navbera wan da yên heyî û yên ku wê hebin da şirove dike.

Bazirganê xêrxwez, Moskva, Mîrzeyê Çolo Siloyan

Berbangê, dema sibe teze safî bûye û hecvan hela razayî ne, dest bi programa rojê jî nebûye, meriv dikare bona vîdêofîlma ji

alîyê we da hazirkirî hinek fikiran û bawerîyan bêje. Xwedê bike em careke din ne bi riya Gurcistanê, lê ji Êcmîadzînê bêne li ber kenarê vê Gola Wanê ya bedew û kaw da hêsa bin û bigerin. Duh hevalekî min got, ku ewê neçe Rewanê, wê here di nav wan trafîkan da çi bike, wê diha baş be, bajo bê Îdirê, kirîn-firotana xwe bike, here. Em gerekê bigihîjine wê yekê, ku çûyîn-hatin, li vira wêne girtin di warên dîrokî da kêmtir bibin. Ez bi dilekî erênî li vê pirsê dinihêrim, ku îro wê tu pirsgirêk di nav miletê vira di hindava me û ermenîyan da tunebe. Em gerekê helwêsta xwe biguhêrin.

Avtor

Pey mêzekirina vîdêofîlmê ra hazir teglîfî salonê dikin, kitêbên ronahîdîtî pêşkêşî wan dikin, behsa qîmetê van herdu hunerên efrandarîyê dikin û dibêjin ka ew xwedî çi kemalê ne. Pêşkêşkirina kitêban li warekî dibe, ku li wir temaşegeheke biçûk jî hatîye vekirin. Di nav kesên ku çûbûne Ermenîstana Roava wênekêş Armên Harûtyûnyan jî hebû, ku zêdeyî 20 berhemên wî li vira têne nîşandayîn. Ew li Ermenîstana Roava hatine kişandin, ji warên jidayîkbûna Ûsiv beg û Cangîr axa destpêkirî, heta warên ziyaretî yên Ermenîstana dîrokî – ji Gola Wanê û Dêra Sûrb xaç ya li Axtamarê, dêra Qersê ya ermenîyan û ziyareta li Anîyê, heykelên bi hostatî terişandî, ku bûne warên hêjayî dîtinê, wêneyên ji warên dîrokî, ji gundan, bajaran û yên din.

Hemû bê sebir hîvîyê ne, ku rojtira dinê li ziyareta Aknalîçê rastî hevdu bên, wan heykelan bibînin. Ji vekirina ziyaretê du sal derbaz bûne, lê ew di nava dema buhurî da bi gelek alîyan va guhêrîye. Ne tenê mezîla wê hatîye firekirin, dar hatine nikandin û li der û doran şînahî ye, lê usa jî destpêka sazkirina komplêksa heykelan ya bi navê "Dostanîya ermenîyan-êzdîyan" e, ku hîmê wê êdî hatîye danîn. Ew li rex riya ku ber bi ziyaretê dibe hatîye sazkirin, li rex dergehê ziyaretê û himberî navbenda perwerdeyê-kûltûrayê. Çend meh têrê kirin, ku li ser vê mezîla berfireh heykelên, ku dibin parên komplêksa heykelan, bilind bibin.

Baziragan û xêrxwez, Moskva, Mîrzeyê Çolo Siloyan

Ziyareta me ya li pala çiyayê Araratê çêkirî gelek tişt dibêje me derheqa biratî, dostanîya herdu miletên me da. Li wir wê heykelekî mezin yê gelên ermenî û êzdî bê çêkirinê. Ewê derheqa dostanîya me ya heta-hetayê, dîroka me da be, ku di nava dewranan da di nav herdu miletan da hebûye.

Rêvebirê heyteholê Garêgîn Êvoyan

Ji berevbûna me ya dawî serhevdu salek derbaz bûye û em dibînin, ku der-dorê ziyaretê di halekî kaw û bedew da ne, her cî paqij û delal e û ewê diha hewaskar be, çimkî li vir her tişt bi hizkirin, bi dil û can tê kirinê. Êzdîyên hizkirî, nûnerên olka êzdîyan yên ezîz, ku ji warên dinyayê yên cuda-cuda hatine li vî warê ber dilê we giranbuha eyda xwe derbaz bikin, ez we pîroz dikim. Ez xemgîn im, ku berevbûna me ya vê carê wî wextî diqewime, ku ecêbên giran têne serê miletê we. Xurtên dinyayê bêy ku başî û xirabî nas bikin, bi zora hêzê bi wan kesan ra xeber didin, yên ku bi jimara xwe va biçûk in. Lê gava miletek xwedî kûltûrakê ye, kûltûra biçûk nabe. Êzdîyên ezîz, Li Îraqê van dawîyan ber çevên temamîya dinyayê fermaneke êzdîyan ya din jî qewimî. Fermaneke din, ku dide xuyakirin, ku gelê êzdî wê heta-hetayê bijî. Ez niha hîvî ji we dikim, ku her yek ji me bi bêdengî qedirê bîranîna şehîdên qira gelê êzdî bigire.

Wek herdem, di rojên ha da rêvebirina rojevê didine doktorê zimanzanîyê, profêsor, serekê Yekîtîya welatîyan ya bi navê "Gelîyê Lorîyê" Sêrgo Yêrîtsyan û ew bi xwe usa jî xudanê îdêya komplêksa heykelan û heykelê "Dostanîyê û biratîyê" ye.

Doktorê zimanzanîyê, profêsor Sêrgo Yêrîtsyan

Ez ser wê bawerîyê me, ku armanca wî bû, ku ew bibe ziyareta dostanîya ermenîyan-êzdîyan. Ewê bibe warekî wisa, ku bêne vira

û ruh bidine wê dostanîyê, dostanîya bi hêz, qewîn û mehkem, wêya fêm bikin, bimehînin û gencên me jî çev bidine wan. Ez bêjim, ku em 145 salîya Ûsiv beg didine kivşê û meha çirîya pêşin meha jidayîkbûna Ûsiv begê û Cangîr axa ye û zûtirekê 140 salîya Cangîr axa jî temam dibe. Bi gotineke din, em tevgelên şahîyên sersalîyan in.

Avtor

Bi haziraya bawermendan û merivên welêt yên qedirbilind, bi tevgelîya mêvanên xwedî hurmet patisqeyên sipî ji ser heykelan têne xwarê û di orta komplêksa heykelan da peykerê "Dostanîyê û biratîyê" bi bilindaya 7 mêtran va û sîmvolên kûrfikir – bi xaça ermenîyan û Ro û Taûsê êzdîyan va xuya dibe. Lê di dawîya heykelan da kevirê bîranînê danîne bona 100 salîya Qirkirina Ermenîyan ya Mezin û li ser wî kevirî nexşên ji Dêra ermenîyan ya sereke ya li Êcmîadzînê û ji Lalişa Nûranî hene.

Serekê ruhanî yê devera Armavîrê Sîon metran Adamyan

Em hatine alîkarîya pir ya dêra arakêlakan ya nûranî bidine we hemûyan. Wek hûn zanin, em yek ji yên pêşin in, ku me texmîn kir, dema ew bedbextîya li Îraqê, li ser çiyayê Şengalê qewimî, êdî her kes dikare fêm bike ka di destpêka sedsala 20î da çi hatîye serê me. Tu kesî nikaribû texmîn bikira, ku di sedsala 21ê da, li dinyaya xudêgiravî medenî da dikare ew yek dubare be, ku li Tirkîyê hate serê gelê ermenî. Em ji wê behsê gelekî dilkovan bûn, ku ecêbeke ha hate serê gelê êzdî. Em nikarin tu navî li vê bûyerê bikin, xên ji wê, ku derba dînê îslamê li gelên ne misilman ket.

Şêx Hesen Hesenyan

Bi eyda îroyîn va girêdayî ez we hemûyan bimbarek dikim û ji navê we hemûyan razîbûna xwe didime Mîrzeyê Çolo Siloyan.

Ew dîdema xweş, warê ziyaretî bi hereketê wî hatîye çêkirin, ku bi sedsalan xewna bav û kalên me bû, lê me nikaribû bikira, Mîrze kir, em razîbûna xwe elamî Mîrze dikin.

Avtor

Wek her sal, îsal jî sersalîya ziyaretê ji guhdarîya dîwana Ermenîstanê û civaka me der nemaye. Mêvanên hurmetlî jî cuda-cuda ne – ji endamên hukumeta Komara Ermenîstanê, parlamêntarên Parlamêntoyê girtî hetanî nûnerên karê dîplomatîyê va girêdayî. Berî gişkan wezîrê Komara Ermenîstanê yê heqdadîyê Hovhannês Manûkyan xeber dide.

Wezîrê Komara Ermenîstanê yê heqdadîyê Hovhannês Manûkyan

Yekîtîya gelên me li ser bingehê qîmetîyên me yên tevayî hatîye avakirinê. Û ev germaya îroyîn ya li vira, li ser axa Ermenîstanê ya biçûk herdu gelên me gîhandîye hevdu. Ez bawer im, ku evê demeke gelek dirêj ha be. Û gelên me li ser vê axa biçûk bi hev ra, bi hereketê tevayî hela wê gelek karên baş bikin. Ez îro vê firsendê dixwezim bi kar bînim û bêjim, ku gelê ermenî hevparê xem û bedbextîyên we ye, ku di nav dîroka we ya sext da hatîye serê we, û ji telebext ra îro jî hûn di nav xeman da nin. Hûn zanin, ku ew bûyerên dijwar, ku li bakurê Îraqê qewimîn û heta niha jî xilaz nebûne, ji alîyê welatê me, serokatîya sîyasî ya welêt, serekê komarê da ji dikayên dinyayê yên here bilind bi tundî hatine rexnekirinê. Û ew yek dide xuyakirin, ku gelê ermenî û welatê Ermenîstanê bi w era ne. Hûn dikarin li vir aram û bêxem bin, hûn dikarin li vir karê efrandarîyê va mijûl bin û hertim bizanibin, ku dewleta Ermenîstanê û gelê ermenî li rex we ye.

Avtor

Hemû kesên xeber dan, qîmetên mezin didane karê kirî, ku di nav demeke gelek kurt da rêzeheykelên bedew hatine çêkirin, ku di wan da fikirên kûr û ruhê zindî hene. Di wan da riya ku herdu milet bi hev ra tê ra derbaz bûne, ruhê dostanîya herdu miletan xuya dibe, ku îro kûrtir û mehkemtir bûye.

Serekê belediya devera Armavîrê ya Komara Ermenîstanê Aşot Xahramanyan

Di vê eyda êzdîyên welatîyên me ya bi nav û nîşan da destûrê bidin ji navê serekê komarê Sêrj Sargsyan, serekwezîrê komarê Hovîk Abrahamyan, tevaya binecîyên devera Armavîrê û ji navê xwe razîbûna xwe bidime hemûyan bona vê eyda gelekî xweş. Dostanîya me ji qurnan tê, û îro vekirina van heykelên gelekî bedew îzbata wê yekê ye û ew dostanî wê ya heta-hetayê be. Diyaspora êzdîyan ya here mezin li Armavîrê ye û li vê deverê em li rex hev, wek bira dijîn, dixebitin, Ermenîstanê şên û ava dikin û ewê bibe paşeroja geş bona zarên me.

Avtor

Û bona van her tiştan rind derc bikin, em bi hev ra ji vê eydê bi fikiran va herine ser vê mezîla çend meh berê, dema dest bi çêkirina komplêksa heykelan dikirin. Ji 29ê îlonê 3-3,5 meh derbaz bûye. Dema bazirgan û xêrxwez Mîrzeyê Çolo Siloyan digot, ku ev komplêks wê 29ê îlonê hazir be, gelekan bawerî bi van gotinan ne dianî. Lê Mîrzeyê Çolo Siloyan tu rêyeke din ne didît û bawer bû, ku komplêks wê bê çêkirinê û di zû da wextê xebata xwe ya rojê kiribû 24 sehet, ser demekê hemû karên xwe yên li Moskvayê hîştibû û li Ermenîstanê dima, diha rast li vir, li Aknalîçê. Bona heykelterêşan, hostayên kevirnexşkirinê, çêkirçîyan destpêka rojê û dawîya rojê xuya ne dibû. Tenê gava gelek diwestîyan, wê demê diçûn hinekî hêsa dibûn, ew jî ne ser demeke dirêj, lê gelek ji wana jî cîguhastî vira bûbûn, li vir diman.

Cîgirê wezîra kûltûrayê ya Komara Ermenîstanê Artûr Poxosyan

Welatîyên me yên êzdî îro di alîyê parastina kûltûra xwe da olka here aktîv e û here mezin e. Ez dixwezim ji navê hukumetê razîbûna xwe bidim bona hevkarîyê û bi saya sere wê hevkarîyê ev diyaspora êzdîyan karê xwe yê kûltûrî pêk tîne.

Avtor

Encama van hemû tiştan îro ew e, ku bi hezaran kes dibînin –

bi carekê ra 5 heykelên bedew, bi nexşan û dîdeman va ber çevên me ne. Di ser van da kemera bejinbilind ya mezin ya ber dergehê ziyaretê zêde dibe – bi wêneyê Royê yê neqişkirî va. Li vira her der bi kulîlkan û şînkayê va xemilîye, bi taybetî ji bo ziyaretê rûniştek-kursîyên bi sîmvola ziyaretê va hene.

Serekê serwêrtîya pirsên di hêla miletên kêmjimar û olî ya hukumeta Komara Ermenîstanê Vardan Astsatryan

Navbenda êzdîyan ya ruhanî û kûltûrî hêdî-hêdî saz bû, pêşî ziyaret hate çêkirinê, ku bi rastî jî bona êzdîyan xewna bi sedan salan bû, çimkî ziyareta êzdîyan ya tek-tenê li Lalişê bû. Wî ruhî xwey bikin, ku cem we heye, bi wî ruhî hûnê bikaribin vê komplêksa heykelan xweştir bikin, kûltûra xwe pêşda bibin.

Avtor

Lê xeberdan berdewam dibin. Serekê Înstîtûta dîrokê ya Akadêmîya Miletîyê ya Zanyarî ya Komara Ermenîstanê, doktorê dîrokê Aşot Mêlkonyan dixweze xeberde him derheqa rewşa îro da, him dixweze karê kirî qîmet bike, him dixweze xwestinên xwe dîyar bike. Çawa ku em li hîvîyê bûn, di xeberdana wî da hesînên ji dil, şêkirandina germ û gotinên din yên xweş hebûn.

Serekê Înstîtûta dîrokê ya Akadêmîya Miletîyê ya Zanyarî ya Komara Ermenîstanê, Aşot Mêlkonyan

Dostanîya me hema wisa ji ber xwe va ne xuliqîye, ew xwedî dîroka bi hezaran salan e. Koka me bi hinek alîyan va yek e, em gelên arî, hindawrupî ne, ku li ser vê axê xuliqîne, li cihana çiyayî ya ermenîyan da, li Asorîka Bakur mezîla erdê em li ser diman, yek bû, û ya ecêb jî ew e, ku em xwedî qederekê ne. Di dawîya sedsalên navîn da, gava em ketine nava pencên Împêratorîya Osmanîyê, em herdu milet jî mecbûr bûne bikevine ber derbên dijmin yên giran. Ji me ra kafir gotine, lê yên xwedî bawermendîya rast em bûne, em bûn, ku ji vî welatî ra amin bûne. We bi jîyana xwe ya demeke dirêj li ser vê axê heq kirîye, ku Ermenîstanê

bihesibînin welatê xwe. Çimkî welat ew war e, wek ku kal û bavên me di sedsalên navîn da digotin, "nesla ku ji bavê derbazî kur dibe" ye, lê fikira wê ne tenê ew e, fikira wê tiştekî din e jî, ku li wê axa biçûk xwedî derkevin, parastina gelên li ser axa wê dijîn, karê herî giring e. Û ew yek ermenîyan û êzdîyan li ser vê axê hertim jî bi hev ra kirine. Şedetîya wana ev heykel in, mezinên me ne, dostanîya wan ya heta-hetayê ye.

Avtor

Bona pîrozkirinê û xeberdanê nûnerên Yekîtîya vêtêranên rezadil li vir in, ku wekîltîya pîroznameya serekê yekîtîyê, mêrxasê Arsaxê Manvêl Grîgoryan dikin, ewana usa jî xelatan didine kome şervanên azadîyê û wan kesan, ku keda wan di karê çêkirina rêzeheykelan da heye.

Nûnerê Yekîtîya vêtêranên rezadil Xaçîk Mkrtçyan

Êzdî jî mînanî me tevî Şerê wetenîyê yê mezin bûne. Ez tevbûna êzdîyan di şerê Arsaxê da jî bilind qîmet dikim. Ji rojên pêşin yên tevgera Arsaxê da di desteya Êcmîadzînê ya rezadil da xortên êzdî hebûn. Îro jî gelê êzdî, ku li Ermenîstanê dijî, ewledên xwe dişîne ordîya Ermenîstanê, welatê ermenîyan şên dike û ewana welatê xwe jî dihesibînin. Qetila ku van axirîyan hate sere gelê êzdî, temamîya gelê ermenî hingavt, zendegirtî hîşt. Min ji navê hemû leşkeran dilkovanîya xwe got, lê hevalê me yê şervanîyê, serekqumandarê hêzên çekdar yên Komara Ermenîstanê, serekê Komara Ermenîstanê Sêrj Sargsyan ji dika Neteweyên Yekgirtî bi dengekî bilind qetila di hindava gelê êzdîyan da şermezar kir.

Avtor

Ez dixwezim wê jî destnîşan bikim, ku ev ziyaret wê xwedî mezîleke ha fire û mezin nîbûya, eger general Manvêl Grîgoryan ew bi reza dilê xwe pêşkêş neda û wextê dayînê jî got: ew dikare

mezîla ziyaretê tenê pêşkêş bike, û ewî ji navê xwe û malbeta xwe hema wisa jî kir. Û evê yekê mecal da Mîrzeyê Çolo Siloyan, ku mezîla ziyaretê û ya komplêksa heykelan û navbenda perwerdeyê-kûltûrayê ji hev bide dûrxistinê.

Em di ser da zêde bikin, ku di hîmê van heykelan da xwelîya, ku ji Ermenîstana Roava anîne hene û ava ji wira anî reşandine ser. Bi taybetî bona wî meremî bi serkarîya Mîrzeyê Çolo Siloyan rêwîtîyek hate teşkîlkirinê ber bi Ermenîstana Roava, girêdayî 140 salîya Cangîr axa, 145 salîya Ûsiv beg, 150 salîya Zoravar Andranîk û 100 salîya Qira ermenîyan ya mezin, bi taybet çûne warên jidayîkbûna Cangîr axa û Ûsiv beg û warê Bêrkirîyê, ku li wir, li gundê Hezeranê sala 1904an rasthatina Zoravar Andranîk û Cangîr axa li wir qewimîye. Heca ber bi welêt ne tenê rêwîtîyeke taybet bû bona dîtina rêçên lingên merivên navdar, lê usa jî hurmetgirtina ewledên du gelan, bîranîna şehîdên gelkujîyê bû. Rêwî vegerîyabûne Ermenîstanê û bi xwe ra av û xwelîya welêt anîbûn, ku di paşdemê da ewê bikirana hîmê heykelan da û ew yek mehekê berî şahîyê, hela heykel tam nehatibûne çêkirinê, bi haziraya ruhanîyên êzdîyan û duayên wan hate kirinê.

Bazirgan û xêrxwez, Moskva, Mîrzeyê Çolo Mîrzoyan

Hevalekî me van axirîyan pêşnîyarek kir, got:

-Werin em bi vê kasê jî vexun eşqê cimeteke, ku ji du miletan e, ango, em bi ermenîyan ra bi hezaran salan bi hev ra bûne, em cimetek in, lê miletîya me ji hev cuda ye, em du milet in. Bi rastî jî, ev fikireke baş e. Min gotîye, ku Ermenîstan bona êzdîyan cîyê tek-tenê ye, ku miletê me wê tu caran dînê xwe, erf-edet û rabûn-rûniştina xwe winda neke. Me bawer ne dikir, ku dikare biqewime welatê me yê dîrokî maye bin destê tirkan û ereban. Werin em bi hev ra bin, li rex gelê ermenîyên xwe bin. Em wisa bin, çawa ku mêrxasên me bûne, çawa ku Zoravar Andranîk û Cangîr axa bi hev ra bûne û alî hev kirine.

Avtor

Hemû tevgelên şahîyê ruhdarbûyî ne û şa ne, ew tiştên dîtine, ser her tiştî ra ne. Ji gişkan pirtir ewana zendegirtî mane û hewasa wan tê. Bona kesên hazir xeberdanên her kesî hewaskar bû, xwesma ku her yek ji wana hewil dide behsa nav û nîşanên wê rojê bike. Hema ha bû xeberdana germ û ji dil ya baylozê Îraqê li Ermenîstanê Qazî Tahir Xalid, ku ewî ber haziran got.

/Wergera xeberdana bayloz/

Xeberdana bayloz – Berî her tiştî dixwezim we pîroz bikim bona vê eyda mezin, roja ziyaretê, ez jî bi we ra şa dibim. Ez zanim, hûn îro usa jî xemgîn in, li ser axa me qetilek qewimîye di hindava merivayê da û ew qirkirin e. Em qedirê bîranîna şehîdan bigirin û herin şerê qetilkaran bikin. Ez careke din vê eyda bedew pîroz dikim, ez bona wê dostanîyê şa me, ku di nav gelên ermenî û êzdîyan da bi serokatîya serekê welêt Sêrj Sargsyan heye. Ezê şa bim, ku ji vir şûnda em tenê behsên xêrê bibihên, wek ku îro li vira heye.

Avtor – Wek ku di rewşên ha da dibe, kutasîyê xwedîyên malê - nûnerên êzdîyên Ermenîstanê xeberdan, yên ku ne tenê razîbûna xwe elam dikin, usa jî şêkirdarîya xwe tînin ser zaran di hindava welatîyên xwe – neferên malbeta Mîrzeyê Çolo Siloyan, yên ku ji dil ev şuxul anîne sêrî, gelek pere xerc kirin û karê xwe ser xistin. Kesên din, ku xeberdan, nûnerên rêxistinên êzdîyan yên civakî bûn, ku ne tenê qîmetekî mezin didane vê eydê, lê usa jî wê dihesibînin wek ya dîrokî, çimkî li vira hîmê rêzeheykelan hatîye danînê, ku di paşdemê da wê heykelên din jî di ser da zêde bibin. Bi bawerîya wana, di salên pêş me da wê heykelên wan kesan bêne danînê, ku di karê dostanîya ermenîyan-êzdîyan da karên mezin kirine.

Serekê rêxistina civakî "Mîdîya-Şengal" Emo Şeroyan

Gava Mîrzeyê Çolo Siloyan teze dest bi vî karî kiribû, got ku

emê bi çêkirina vê navbendê va karê xwe xilaz nekin, emê vê navbenda ruhanî mezin bikin, dewlemend bikin, bedew bikin, me ji van heykelan, ji şadirwana dostanîya gelên ermenîyan û êzdîyan û heykelê bona bîranîna 100 salîya gelkujîya ermenîyan dest pê kir.

Serekê yekîtîya hemû êzdîyên dinyayê Ezîz Temoyan

Me ji demên kevinare heta îro bi biratî mil daye milê hev, bi hev ra jîyane û tu kes wê nikaribe bêje, ku di nav herdu miletan da xaleke reş hebûye. Texmîn bikin, ku li tevaya dinyayê tenê Ermenîstan kûltûra êzdîyan pêşda dibe.

Serekê rêxistina civakî ya "Rêxistina êzdîyên cahil yên Ermenîstanê" Sehîd Avdalyan

Ev ziyareta bedew ne tenê bona êzdîyên Ermenîstanê, lê usa jî bona nûnerên diyasporên êzdîyan yên temamîya dinyayê bûye cîyê hecê. Birêz Mîrze Siloyan, miletê êzdî minetdarê we ye. Ez wek cahilekî êzdî, ji navê êzdîyên cahil yên Ermenîstanê razîbûna xwe ji hemûyan ra dibêjim, ji wan kesan ra, ku keda xwe kirine nava çêkirina vê navbenda ruhanî û heykelan da, ku karekî welatparêzîyê ye.

Avtor

Beşa şahîyê ya fermî hêdî-hêdî serhevda tê, her kes ruhdar bûye, derheqa karê Mîrzeyê Çolo yê welatparêzîyê da fikirên xwe dibêjin, ku li vira heykelên bedew daye çêkirin, ziyaret şên û ava û bedew kirîye. Dora xeberdana Mîrzeyê Çolo Siloyan tê û ew gotinên rezalixîyê dibêje bona wan hemû kesan, yên ku keda xwe kirine nava pêkanîna plan û armancên me. Û di planan da ya sereke ew e, ku milet bê vira, bi qîmetîyên xwe yên ruhanî ra bibin nas, hurmeta wan kesan bigirin, ku kedeke mezin kirine nava dostanîya ermenîyan-êzdîyan da.

Bazirgan û xêrxwez, Moskva, Mîrzeyê Çolo Siloyan

Îro 29ê îlonê ye û em berevî vî warê bedew bûne bona bi hev ra heykelên merivên ber dilên me ezîz – Ûsiv beg, Cangîr axa, Zoravar Andranîk ji neslên hatî ra bihêlin, ku bi saya wan em gerekê li ser vê axa tiberk heta-hetayê bijîn. Ev mêrxasên navdar gerekê li rex hev wek melekan sînorên Ermenîstanê biparêzin, me û neslên me ruhdar bikin bona vê ziyaretê mînanî ronahîya çevên xwe xwey kin û biparêzin. Hevalên hêja, roja sedsalîya Qira ermenîyan ya mezin nêzîk dibe, bi hezaran êzdî jî di vê qetilê da şehîd ketin û ew milet îro jî bona dînê xwe tê zêrandinê. Borcê cimeta me ye bona bîranîna yek û nîv mîlyon ermenîyên bira heykelê bîranînê dayne û ew heykel îro di nav mezîla ziyareta me da ne. Em bawer in, ku dengê gazîya heykelê me wê tevî dengê gazîya wan hemû heykelên mezin û biçûk bibe, ku bona bîranîna şehîdên Qira ermenîya ya mezin li cî û warên cuda-cuda hatine sekinandinê.

Merivno, hişyar bin, haj xwe hebin, bona ji vir şûnda bedbextîyên wisa neqewimin. Di kutasîya xeberdana xwe da dixwezim tiştekî xweş bêjim. Em îro heykelê kûrfikir yê dostanîya gelên ermenî û êzdî yên bi hezaran salan pêşkêşî we dikin û dixwezim destnîşan bikim, ku dostanîya me herdu miletan bi sîmvolên me – Royê û Xaç va hatîye mehkemkirinê.

Avtor

Ev xort û keçên êzdîyan vê şahîyê diha geş dikin, ewana bi gotinên xwe yên qenc va xeberên şêkirdarîyê û xweşbextîyê ji hemû kesên hazir û ji wan kesan ra dibêjin, yên ku qedir û qîmetê wê dostanîyê zanin, ku tê binavkirinê wek biratîya ermenîyan-êzdîyan. Para şahîyê ya fermî xilaz bûye. Hinek kes cîguhastî ser dikê dibin, li wir dest bi bernameya sitiranbêjîyê dibe. Ew par bi koma sitiran-reqasê ya bi nav û deng bi navê "Akûnk" dest pê dibe, ku Sargîs Baxdasaryan serokatî lê dike. Sazbendîya ermenîyan ya

miletîyê li her derê ziyaretgehê perwaz dide, meriv dibêje qey ew deng belayî temamîya deşta Araratê dibe.

Rastîyê jî li vir ruh û giyanê miletîyê perwaz dide, li vê meydana berfireh di bin dengê 6-7 def û zurneyan da bi çapik-çapik direqisin, ruhê hunermendîya êzdîyan ya miletîyê li her deran belav dibe. Kêfa her kesî cî ye, her kesên li wir hazir - reqasvan, temaşevan hewil didin şabûna xwe bidine der, çimkî bi cûrekî din nikare bibe jî, şahîya îro ya eşq û şa dilê her kesî bi nazikayî hingavtîye, her kes şa dibe, ferq tune ew ermenî ye, yan êzdî ye. Lê li ser mezîla li rex ziyaretê bi hezaran kes ketine govendê – mezin û biçûk, jin û mêr direqisin û ew reqas bûye pareke berxwedanê û tevgerê, açixîyê û serketinê. Reqasa ku hêvî û bawerîya paşerojeke geş dide merivan, anegorî kêfxweşîya îroyîn e. Bi qetila li Şengalê qewimî va girêdayî çiqas jî di dilê her kesî da kul û bexweketin hebe, lê ewana hatine vira usa jî bona wê yekê, ku şikyatê xwe û yekîtîya xwe bidine der himberî wî derdê bê derman, hatine bona ruhê xwe yê miletîyê yê paqij nîşan bidin, bêjin, ku ew hazir in şerê dijminên xwe bikin. Li meydana reqasê çiqas jî hewaskar be, hesab yek e, meriv dixweze vegere mezîla komplêksa heykelan û hewil bide rastî heykelterêşê Komara Ermenîstanê yê emekdar Gêtîk Baxdasaryan bê, ku heykelên Ûsiv begê û Zoravar Andranîk çêkirîye. Lê derket, ku Gêtîk Baxdasaryan pey kutabûna şahîyê ra vegerîyaye sientxaneya xwe bona karê xwe serhevda bîne. Heyf, ku wê demê em rastî wî ne hatin, lê em bîr tînin, ku me berî bîstekê hev dîtibû, dema wî dêmê Ûsiv begê li ser kevir diterişand û em dikarin dengê wî bibihên.

Heykelterêşê Komara Ermenîstanê yê emekdar Gêtîk Baxdasaryan

Navekî rast li Ûsiv beg kirine – zane, ew bi dilrehmîya xwe, bi zanebûnên xwe, bi pêşdîtina xwe va ya bona miletê wî her tişt baş be, bûye endamê parlamêntoya komara pêşin. Ûsiv beg merivekî

dûrdîtî bû. Ewî paşwextîya xwe dîtîye, ku li vir bona miletê wî wê diha baş be, ne ku li cîyekî din û di rastîyê da jî wisan e. Min hewil daye zêna wî, rastgotinîya wî, aqilmendîya wî bikime nava heykel da.

Avtor

Em ji sinetxaneya heykelterêş Gêtîk Baxdasaryan derbazî ziyareta Aknalîçê, cîyê rêzeheykelan bibin, li wir mecala me heye em rastî heykelterêşê peykerê sereke bên. Em ji heykelê "Dostanîyê û biratîyê" ne gelekî dûr Tîgran Yûxanyan dibînin û pê ra dikevine sohbetê, dixwezin derheqa hûrgilîyên xuliqandina vî heykelê taybet da bihesin.

Heykelterêş Tîgran Yûxanyan

Di rastîyê da "gunehkarê" van hemû karan birêz Yêrîtsyan e. Eger ne fikirên we bûna, ev baxçeyê bi heykelên bedew va tijî wê tunebûya. Înîsîatorê vî karî hûn in, ku berî du salan dest pê bû, hilbet wî çaxî ne konkrêt bû. Paşê ji alîyê we da hate qirarkirinê, ku ew gerekê hebe. Ez ser wê bawerîyê me, ku heykelên me komplêkseke bedew sêwirandine.

Avtor

Tîgran Yûxanyan 3-3,5 meh ser hev şev-ro li vir bûye. Kevirê tûfê yê hişk, ku mînanî bazaltê bû, bi aletên heykelterêş yên nûjen va jî bi dijwarî dihatine terişandin. Carina alet dişkestin jî. Di van karan da, xuya ye, yê herî qewat û bi hêz meriv e, ango heykelterêşê me ye, bi hereket û xebathizîya xwe va, ku axirîyê digihîje armanca xwe. Ew ji xwe bawer bû, ku wê di wextê xwe da çêkirina vî heykelî xilaz bike û wê ewqas şabûnê bixe dilê bi hezaran kesan. 29ê îlonê bona kesên têne vira hecê, êdî rojeke nav û nîşan e. Û bona ev şahî diha rind bê ber çavan, em dîsa rabine jor û ji wir her tişt mêze bikin, ku meriv dikare navên cuda-

cuda lêke: şahîya yektîyê û berxwedanê, heyetîya miletîyê û parastina rengê milet û usa jî şahîya hêvîyê û bawerîyê, ku hema li vir – li Ermenîstanê hîmê xwe avêtîye, çawa ku Mîrzeyê Çolo hiz dike bêje, di bin çevnihêrîya Araratê, ji Dêra ermenîyan ya sereke ya Êcmîadzînê ne gelekî dûr, di ber bayê ku ji Elegezê li me dixe. Xewn û armancên bi hezaran êzdîyan li vê ziyaretê digihîjine hev, ku ji vê axê û avê xuliqîne û bi cihana vira va girêdayî hev in. Lema jî seredana merivan xilaz nabe, şabûna wan mîna behrê pir e, bawerîyên wan qewîn in. Dû ra sitiran û reqas derbazî seraya şahîyan dibin, li wir koma sitiran û reqasê ya "Akûnk" bona mêvanên ji cî û warên dinyayê yên başqe-başqe hatî hunurê xwe nîşan kir û bi wê yekê va êzdîyên, ku dervayî welêt dijîn, bi dilgermî silav dikir. Hilbet, li vira welatîyên me yên ji welatên dinyayê yên cuda-cuda hatî ber milet xeber didin, xebata kirî qîmet dikin û dişêkirînin. Ruhê hemû kesên ku xeber didan, yek bû û her kes hate ser wê fikirê, ku 29ê îlonê sala 2014an rojeke taybet û dîrokî ye. Bi carekê ra 5 heykel hatine vekirinê, û her yek ji wana ber dilê êzdîyan û ermenîyan ezîz in. Li şahîyê ji navê serekê şêwra xelatên civakî yên navnetewî mêrxasê Yekîtîya Sovyet yê du caran, kosmonavtê Yekîtîya Sovyet Vîktor Gorbatko cabdarê şêwrê Karo Hakobyan ordênên "Parastvanê welêt" teslîmî Mîrzeyê Çolo Siloyan û Sêrgo Yêrîtsyan kir bona sazkirina komplêksa heykelan ya bi navê "Dostanîya gelê ermenî û êzdî". Rastîyê jî, dibe hema ew in, ku axa welêt diparêzin û ewledên xwe yên ku dûr û nêzîk dijîn, teglîf dikin, ku bêne welatê xwe.

Li vira jî Mîrzeyê Çolo Siloyan kêmxeber e. Lê niha ew roj ber çevên wî ra derbaz dibin, ku ji dema xuliqandina fikira çêkirina rêzeheykelan hatibû sere wî. Her tişt ji heykelê "Dostanîyê û biratîyê" destpê bû. "Lê ew nikare bi tenê be,- Mîrzeyê Çolo Siloyan got û di ser da zêde kir, ku li vira gerekê heykelên dostê ermenîyan û êzdîyan jî hebin". Wextekê, gava xebat serhevda dihatin, rojnamevanan ji wî pirsîn, ku wê li rex mezîla komplêksa heykelan çi hebe, ew bi beşereke xweş got: "Li rex heykelan wê

tenê heykel hebin". Û ew tê wê maneyê, ku salên pêş me li vir wê heykelên teze hebin, ku ewê rêzeheykelên vira diha dewlemend bike. Wê hîmê baxçeyê nikandina darên bîranînê bê danînê. Bi bawerîya Mîrze Siloyan li vir wek hurmetgirtin, dara pêşin gerekê serekê Komara Ermenîstanê binikîne, û dema firsend hebe, bona wan wê qedirekî mezin be, ku Sêrj Sargsyan li ziyareta êzdîyan ya li Aknalîçê qebûl bikin. Em wê jî bêjin, ku malbeta Mîrzeyê Çolo Siloyan bona sersalîyên Ûsiv Beg û Cangîr axa mêdalên bîranînê yên bi navên "Ûsiv beg" û "Cangîr axa" hazir kirine û wê bi wana wan kesan xelat bikin, ku keda wan di karê mehkemkirina dostanîya ermenîyan û êzdîyan da gelek e.

Heta 29ê îlona sala tê bi dehan hezaran meriv wê bêne seredana vê ziyaretê, ku îzbat bikin, ku dostanî û biratîya di navbera herdu miletan da saz bûye, li tu cîyan nikarin bibînin. Lê pey rast salekê ra, 29ê îlonê sala 2015an ziyaret û sponsorê wê Mîrzeyê Çolo Siloyan û malbeta wî wê bi kirin û fikirên teze va me zendegirtî bihêlin.

Bazirgan û xêrxwez, Moskva, Mîrzeyê Çolo Siloyan

Di serê me da bona paşwextîyê fikireke bona milet gelek giring heye. Em dixwezin kumeyta Taûsî Melek çêkin û ewê ji ya heyî cudatir be. Xên ji wê, meremên me yên din jî hene, ku em dixwezin pêk bînin û em gerekê wan mereman bi Tehsîn beg ra û bi serekên ruhanîyê yên mayîn ra bidine qayîlkirinê. Paşê wê xuya bibe, ka emê çi bikin.

Avtor

Lê heta wî çaxî hûnê li warê ruhanîyê – Ziyaretê, ku li Aknalîçê ye, gelek kesan bibînin, ku têne hecê, hinekên din wê berî zewaca xwe bêne vir, bona duaya ziyaretê li ser wan be, usa jî qedirê mezinên milet bigirin, îzbat bikin, ku ew bi koka miletê xwe ra û bi dostanîya gelên ermenî û êzdîyan ra amin in.Yek ji haziran got: "Duaya Xwedê li ser malbeta Mîrzeyê Çolo Siloyan be, bi saya serê wan em bûne xwedîyê Lalişa xwe, em diha nêzîkî koka xwe ya miletîyê bûn".

EZDIKI.COM

Riya ku ber bi ziyaretê dibe: pey salekê ra

Ez şa me û ji Xwedê razî me, ku koma efrandarîyê ya bi navê "Kartisk" bûye salnivîsara karên me. Ewana bi dil û can her tiştî dikişînin, diparêzin, derheqa ziyareta me da malûmatîyan digihînine temaşevanan û nesletên dahatû. Û karê wanî herî mezin ew e, ku ew hemû dibine fîlm, ku tê da hemû karên me yên bi ziyareta me va girêdayî têne ber çevan. Ez behsa fîlma "Riya ku ber bi ziyaretê dibe: pey salekê ra" dikim, ku derheqa wan her tiştî da ne, ka 29ê îlona sala 2013an li ziyareta Aknalîçê çi qewimîbû. Ez bawer im, ku ew fîlm wê firsendê bide her kes derheqa qewmandinên wan rojan da hayadar be. Ez dixwezim careke din razîbûna xwe bidime "Kartisk"ê û li vira fikirên xebatkarên wê komê raberî we bikim.

Xudanê – Teşkîldar rast fikirîbûn, ku bûyerên bi yeksalîya ziyareta Aknalîçê va girêdayî bi du vîdêoyan va dest pê bikin. Ya pêşin, wek ku sernivîsar destnîşan dike, "Riya ku ber bi ziyaretê dibe", şirove dike, ka ziyareta Aknalîçê çawa xuliqî, bîr û bawerîyên destpêkir û tevgelên wî karî çi ne, usa jî hûrgilîyên bingehdanîn, çêkirin û duakirina ziyaretê bi hazirîya serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê, Mîrê Mîran Tehsîn beg û desteya bilnd ya ruhanî ya ji Lalişê hatî.

Vîdêoya dinê jî behsa derheqa wan êzdîyan dike, ku ji welêt dûr dijîn û kar dikin, û dijwarîya wan ya here mezin hisreta di hindava warê jidayîkbûna xwe ye.

Sêrgo Yêrîtsyan (doktorê zimanzanîyê, profêsor) – Fîlm him derheqa wê yekê da ne, him jî derheqa dostanîya ermenîyan-êzdîyan, kok û rehên me, pêwendîyên me da ne.

Avtor – Van rojan herwiha pirtûka Mîrzeyê Çolo Siloyan ya bi sernavê "Riya ku ber bi ziyaretê dibe" çap bûye, ku bi temamî

derheqa xuliqîna fikira bona çêkirina ziyaretê, lêkirina wê, pirsên bi wê va girêdayî, dostanîya ermenîyan û êzdîyan da ne. Para pirtûkê ya dudan hatîye binavkirinê "Mîyaserbûna xewna dizîka va" û di wê da tê şirovekirin, ku Mîrze Siloyan çawa berbi wê yekê cedandîye û gihîştîye armanca xwe.

Mêvanên ji Lalişê hatî ruhdar bûbûn, him ruhanî, him jî mirîd. Wana texmîn ne dikir, ku wê cejineke ha ya hemmiletî bibe. Tevgelên şahîyê bi fikiran va hela li ziyareta Aknalîçê bûn, lê fikirên hinekan li ser kar û barên sala tê bû, ka wê çi bikin.

Hesen Hesenyan (serekê ruhanî yê êzdîyên Ermenîstanê) – Dostanîya me dikare bi miletên mayîn ra hebe, lê em û ermenî bira ne, çimkî biratîya me her kesî dîtîye, him li meydana şêr, him ser textên şahîyê, him jî di nava jîyana îroyîn da. Tiştekî şabûnê ye, ku fîlmeke ha kişandine, û em nîşanî temamîya dinyayê dikin, ku êzdî hemwelatîyên tam in, ne tenê li Ermenîstanê, usa jî di nav diyasporê da.

Avtor – Nuxseyên pêşin yên pirtûkê dane bazirganê ji Moskvayê Mîrzeyê Çolo Siloyan û kurê rêberê hemû êzdîyên dinyayê, Mîrê Mîran Tehsîn beg – Hazmîr Hazim, ku parlamênterê Parlamêntoya Herêma Kurdistanê ye. Pey dîtina fîlmê ra hemûyan teglîf kirin bona pîrozkirina pirtûka Mîrze Siloyan.

Knyaz Hesenov (serekê olka kurdên Ermenîstanê) – Eva ne tenê bona gelê êzdî, lê usa jî bona hemû miletên komarê, bona hemû tûrîstan wê bibe ziyaretek, wê bêne vira duayên xwe bikin û wê usa jî dua li wî camêrî bikin, ku ew çê kirîye.

Robêrt Şahparyan (Sankt Pêtêrbûrg) – Bona me şahîyeke mezin e. Her yek ji me ji warekî hatîye – ji Rûsîyayê, welatên dereke, em berev bûne bona cereke din jî dostên xwe pîroz bikin, bona eyda miletê êzdî, ku ewana bi saya serê Mîrzeyê Çolo Siloyan bûne xwedîyê vê ziyaretê.

Avtor – Rasthatinên ha mecalê didine me em hev nas bikin, rastî hevdu bên, sohbet bikin. Li vira piranî dostên kevin û teze ne. Gelek ji wana sala par hema li vir, li Ermenîstanê, di dema

duakirina ziyaretê bi hevdu ra bûne nas. Pareke wan jî cara pêşin hatine Ermenîstanê.

Doktor Cemîl (wezîrê Kurdistanê yê aborîyê û malhebûna gund) – Em bi sipartina serekê xwe yê ruhanî Tehsîn beg hatine Ermenîstanê bona tevî şahîya ziyareta êzdîyan bibin, usa jî tevî vê eyda dostanîya gelên ermenî û êzdî bibin.

Avtor – Gelek caran minaqeşe saz dibe, ka salek, yan jî 365 roj, wextekî gelek e, yan na? Dijwar e meriv bersîveke tam bide, dibe ne lazim e jî. Lê tiştekî îzbat e, ku di nav salekê da li ziyareta êzdîyan ya Aknalîçê gelek tişt guhêrîye, xwesma bona wan kesan, ku berî salekê hatibûne vira û niha jî li vir in. Der-dorê wê mezintir bûye, xanîyê navbenda perwerdeyê-kûltûrayê bilind bûye. Bi hezaran hecî hatibûn ne tenê van hemûyan bibînin, lê usa jî bona seredana ziyaretê bikin, ku sala par ji alîyê rêberê ruhanî yê êzdîyan dua lê hat kirin. Hela sala par, 29ê îlonê hate îlankirinê wek roja ziyareta Aknalîçê û ew dide kivşê, ku her sal, hema vê rojê, meriv wê berev bin ne tenê bona duayên xwe bikin, lê usa jî yekîtî û hevgirtina xwe nîşan bidin û bidine kivşê, ku dikarin pirsgirêkên miletîyê bi aştîyane û aqilane çareser bikin. Li vira ne tenê êzdî hene, lê bi jimareke mezin ermenî jî hene, yên karmend jî. Li vir in cîgirê parlamêntoya Ermenîstanê Êdûard Şarmazanov, wezîrê parastinê Sêyran Ohanyan. Û bi vê dorê jî piştî vekirina vê heyteholê, van kesan xeberdan.

Êdûard Şarmazanov (cîgirê parlamêntoya Ermenîstanê) – Li Komara Ermenîstanê bona hemû miletên kêmjimar, di nav wan da bona gelê êzdî her mecal hene bona pêşketinê, xebatê, pêşdabirina mîrata xwe ya kûltûrî û ruhanî. Îro bona me hurmeteke mezin e, ku em tevî vê şahîya xweş ya gelê bona me dost û xwedî qederekê dibin.

Sêyran Ohanyan (wezîrê Komara Ermenîstanê yê parastinê) – Ez ji navê tevaya xebatkarên wezaretê û herwiha ji navê xwe hemû tevgelên vê heyteholê silav dikim û ji bo sersalîya pêşin ya vekirina ziyaretê we pîroz dikim. Eva ziyareta ne tenê

ware ruhanîya êzdîyan e, lê herwiha warê hevgirtina êzdîyan û ermenîyan e. Li vira emê careke din dîroka xwe bi bîr bînin, emê dîsa wan riyan bikine bîra xwe, ku jê derbaz bûne, emê bona heyteholên duwerojê jî bernameyan çê bikin.

Avtor – Wezîrê parastinê yê Komara Ermenîstanê wisa jî bona karekî dinê hatibû vira – bona şervanên êzdî xelat bike. Her kes zane, ku êzdîyan bi ermenîyan ra tevayî mil dane milên hev û ji bo Arsaxê bi mêranî şerê azadîyê kirin, gelek ji wana şehîd bûn û bûne mêrxas. Li vira gelek kes ne tenê ji Ermenîstanê ne, lê wisa jî ji welatên Yekîtîya dewletên serbixwe, Ewrupayê, Rojhilata Nêzîk in. Ew meriv hatine tevî şahîya me bibin.

Sêrgo Yêrîtsyan (doktorê zimanzanîyê, profêsor) – Ev roj – 29ê îlonê hate elamkirinê wek roja hecê. Di rastîyê da hecîyên pêşin yên pey duakirina ziyaretê ra hûn in. Hûn bi duayên xwe va hatine, bi armancên xwe va hatine, hûn hatine daxwezên xwe li vê ziyaretê bînine ser zaran.

Avtor – Bona vê bûyera ber dilê êzdîyan ezîz nûnerên civakî yên cûre-cûre hatine – mamosta û çêkirçî, ruhanî û ronakbîr.

Metranê sere Artak Sîmonyan (ji beşa Armavîrê) – Dîrok me hîn dike, ku gelek caran milet him erdên xwe winda dikin, him jî deroder dibin, dibin mihacir, lê bi xwe ra du qîmetîyên giring dibin, ku bona berdewamkirina jîyanê roleke mezin dilîzin – ew bawerî û ziman e. Çimkî li vira êzdîyên li dinyayê belavbûyî yên xwedî zimanekî û xwedî dînekî berev bûne, ev rasthatina me ya Xwedêdayî ye. Ez hêvîdar im, ku ev duayên me wê bigihîjine Xwedê, ro wê me tevan germ bike, lê dilê me bi hizkirinê û biratîyê va dagire.

Lîparît Sargsyan (helbestvan) – Bona miletan bi kesên ruhanî ra tevayî ronakbîr jî bûne rêvebir û rênîşandar, yên ku bi hunermendîya xwe, sitiranên xwe va pesinê dostanîya gelên êzdî û ermenî dane, ku heta îro jî berdewam e. Bawermendên ji hemû warên Ermenîstanê û ji welatên cuda-cuda hatine vira.

Ezîz Temoyan (serekê olka êzdîyan) – Gava yek bona miletê

xwe karekî ha dike, ez ber wî temene dibim. Em bi rê û rizmên xwe va têne naskirin, bi sazkirina herf û edebîyeta bona zaran va.

Avtor – Li vira ew meriv jî ne hindik in, ku ji warên gelek dûr hatine Ermenîstanê, ji diyaspora êzdîyan ya hevgirtî, wek nimûne, ji bajarên Rûsîyayê yên cuda-cuda, ji welatên dereke.

Pîr Mirazê Koçer Mistoyan (Kalînîngrad) – Bi hezaran salan em zêrandine, xwestine me dînguhastî bikin. Sed heyf, ku gelek kes di wê rê da derbaz bûne, lê ez îro şa û bextewar im, ku ez 37 salan li Rûsîyayê mame, lê li Ermenîstanê dipeyivim, çimkî ez li vira ji diya xwe bûme, li vira mezin bûme, gihîştime, û ew hêza ku di nav me da dijî, bawerî ye. Gelek kes hene, xwesma li Rûsîyayê, ku rind fem nakin ka em bona çi bilêtan dikirin, bi balafirê bi hezaran kîlomêtran derbaz dibin, fem nakin, ku çima em salê çend caran têne Ermenîstanê. Lê em xwedî wê hêzê, wê bawerîyê ne, ku kal û bavên me di nava bi hezaran salan da dane me.

Avtor – Wek ku em li bendê bûn, di sersala pêşin ya ziyaretê da nûnerên desteya ruhanî ya bilind ji Lalişê, bi serokatîya kurê serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê Mîrê Mîran Tehsîn Beg – endamê Parlamêntoya Herêma Kurdistanê Mîr Hazim û endamên desteya bilind ya ruhanî amade ne. Hilbet, Mîr Hazim pîroznameya serekê ruhanî anîbû. Di bîra gişkan da maye, ku sala par, gava ew li Ermenîstanê bû, saxlemîya wî ne gelek baş bû jî, lê bi ciddî û bi hurmetgirtin tevî hemû rasthatinên bi karmendên derece bilind, heyteholan dibû, diçû warên êzdî lê dimînin û bi welatîyên xwe ra qise dikir. Mîr Hazim dixweze silavên êzdîyên Îraqê jî bigihîne bi hezaran kesên amadebûyî. Çawa sala par, vê carê jî, hîmdarê ziyaretê, bazirganê ji Moskvayê Mîrzeyê Çolo Siloyan gelek ber xwe dikeve, dixweze her tişt ser dereceya bilind be.

Lê xeberdana wî gelek zelal û dagirtî ye: xeyala wî ya bi salan mîyaser bûye û îro ber ewqas merivan dixweze rezalixîya xwe bide wan hemû kesan, ku bi hereketê wan ne tenê zyaret hate çêkirinê, lê usa jî karên paşdemê hatine destnîşankirin, bona li rex ziyaretê hemû mecal hebin, ku meriv bikaribin bifikirin, hêsa bin, duayên

xwe bigihînine Xwedê, bona ew di rojên oxirmên giran da li rex wan be.

Mîr Hazim (Endamê parlamêntoya Kurdistanê) – Gelê ezîz, ez careke din dixwezim destnîşan bikim û bikime bîra we derheqa dostanîya ermenîyan-êzdîyan ya bi sedan salan da, û ew dostanî ne tenê li Ermenîstanê ye, lê herwiha li Îraqê û gelek warên dinyayê yên din da ne jî. Ez êzdîyên li vira berevbûyî silav dikim, yên ku ji Rûsîyayê, Gurcistanê, welatên dereke hatine. Ez birayên xwe yên ermenî silav dikim. Em hemû berevî vira bûne bona yeksalîya ziyaretê pîroz bikin, wê ziyaretê, ku Mîrzeyê Çolo Siloyan daye çêkirin. Ez îro gelek şa me, ku bi saya ziyaretê êzdîyên ji temamîya dinyayê berevî vira bûne. Ew karê, ku Mîrze Siloyan kirîye, ne karekî biçûk e. Ewî ev her tişt bona dînê xwe kirîye. Bira Xwedê piştovanê wî be. Eva cara dudan e, ku em ji Îraqê tên bona bi jîyan, xem û dijwarîyên êzdîyan ra bibine nas, bi wan ra bidin û bistînin, qise bikin.

Mîrê Mîran Tehsîn beg rast berî salekê li vira bû – Ermenîstanê, û berî em bêne vira, ewî ji me hîvî kir, ku paşê em her tiştê li welatê bira dîtî jê ra şirove bikin, xwesma ka di nav saleke axirîyê da li vira çi guhêrîye. Eva cara dudan e, ku em têne vira. Emê ne tenê bala xwe bidine emir û kar û barê êzdîyên vira dijîn, lê emê jî ji wan ra şirove bikin, ka welatîyên me yên êzdî û ermenî li Îraqê çawa dijîn. Ez dixwezim bêjim, ku li Îraqê halê êzdîyan, ermenîyan û xaçparêzên din baş e. Ez dixwezim, ku ne tenê jîyana me ya aborî baş be, lê usa jî pevgirêdanên kûltûrî diha mehkem bin. Em hertim bi kûltûra hev ra bibine nas.

Îro eydeke mezin e û eydên ha bira zêde bin.

Avtor – Hilbet, Mîrze Siloyan bona yeksalîya ziyaretê rind karê xwe kiribû. Ya pêşin, çûyîn-hatina wî ji Moskvayê ber bi Ermenîstanê gelek zêde bûye, wextê mayîna wî ya li Ermenîstanê jî pir bûye. Lê van axirîyan ew kêm caran ji Ermenîstanê diçû Moskvayê. Diha pir bûbû çêkirçî û wisa çê dikir, ku mezîla ziyaretê her diçû zêdetir dibû, bona ew bibe warê hêsabûnêyî xweş.

Mîrzeyê Çolo Siloyan (bazirganê xizmetkar) – Bi tevgelîya gelê bawermend me li ser axa ermenîyan ziyareta xwe – Lalişa teze çê kir, dua lê kir û vekir. Ez dixwezim bi dilekî baristan bêjim, ku nerehetî, berxweketinî û cabdarîya wan rojan meriv dibêje qey xwe paşda vekişandibûn. Rastîya rojê ketibû pêşîya her tiştî, ew jî ew e, ku em bi hev ra dîroka dostanîya xwe tînine ber çavan û bi wê emê sedsalan buhurînin. Hema bêje her rojeke sala par pirtir ez, merivên min û hevalên min didane bawerkirinê, ku me bi rastî jî xwe li riya rast girtîye.

Avtor – Wek edet, Mîrzeyê Çolo Siloyan hiz nake derheqa karên xwe yên paşdemê da ji wext zûtir bi hûrgilî xeberde. Û dibe ew rast dike, çimkî plan zû-zû diguhêrin, dema armanc pir mezin e – bibine xwedîyên navbendekê, ku wê him bona ermenîyan, him jî bona miletê wî hurmetê bîne.

Mîrzeyê Çolo Siloyan (bazirganê xizmetkar) – Emê bi vî cûreyî xwexwetîya xwe biparêzin, emê ha bimînin çawa ewledên hêja yên Rojê, ku jîyanê dide me.

Avtor – Ev cûrê karkirina Mîrzeyê Çolo Siloyan derbazî gelekan dibe, û ewana li rex wî disekinin. Mînanî gênêral Manvêl Grîgoryan, yê ku bersîveke kurt da hîvîkirineke Mîrze Siloyan: "Bona ziyaretê xwelîyê nafiroşin, lê pêşkêş didin". Û mêrxasê Arsaxê hema usa jî kir. Û hema ev sidqê qenc bû bingeh, ku ziyaret ber bi başîyê guhêrîye, hatîye firekirin û hêdî-hêdî paşeroja ziyaretê tê ber çavên me.

Heytehola rojê bi duakirina ruhanîyên ji Lalişê hatî xilaz dibe. Dû ra desteya ruhanî duayên xwe di hundurê ziyaretê da dike. Ketin-derketina mêvanên hatî nasekine. Ewana ji warên dûr û nêzîk hatine, hatine hecê, û ew yek dide xuyakirin, ku wana duayên xwe, daxwez û xewnên xwe anîne vira û bawer in, ku duayên wan wê mîyaser bin.

Borîs Lazgîyan (Yaroslavl) – Temamîya olka me ya êzdîyan û êzdîyên diyasporê, ku îro him li Rûsîyayê ne, him li Ewrupayê ne, biryar kirine di roja sersalîya ziyareta me da hazir bin.

Zado Cindoyan (Tvêr) – Ev hemû bona gelê me yê êzdî xwedî kemaleke mezin e, bona dînê me û miletê me nas bikin. Eva tê maneya roja hecê, ku wê rojê temamîya gelê me yê zêdî bi gelê ermenîyan ra tevayî berevî vira dibe û eyda xwe ya ezîz li ser axa ermenîyan pîrox dike.

Rizganê Simo Şamoyan (doktorê ulmên bizîşkîyê)- Bi jimareke mezin ruhanîyên me hebûne, yên ji mala Hadîyan, yên ku di ocaxên xwe da em qebûl kirine, wana karibûye ruhê miletîyê, dînê me biparêzin. Îro, şikir ji Xwedê ra, ku ziyareta me ya ha heye. Wê heca me vir şûnda bibe edet, emê her sal li vira berevbin.

Îşxan Madoyan (herêma Araratê) – Niha êdî warekî ber dilê me ezîz – ziyareta me heye, ku li ser axa ermenîyan ya tek-tenê ye.

Avtor – Ew her tişt gelekan zendegirtî dihêle, yên ku pey salekê ra li vira dibînin. Mezîla dora ziyaretê ya firebûyî nîşan dide, ku paşeroja wê geş e. Û paşeroj wisa xuya dike, ku meriv wê bêne vira ne tenê bona hecê, duayan, lê wisa jî bona hevdu nas bikin, bi hevdu ra bikevine nava sohbetê. Û ew yek, gorî Mîrzeyê Çolo Siloyan, wê li xasbaxçeyê li rex ziyaretê be, ku tê çêkirinê, li wir wê rêyên bi daran va dorgirtî, kursî û cîyên bona sohbetê hebin.

Borîs Temoyan (endamê şêwra rêxistina yekîtîya ciwanan ya êzdîyaye miletîyê ya bi navê "Sincar") – Bona êzdîyên li Ermenîstanê dijîn tiştekî şabûnê ye bibine xwedîyê avahîyekî ruhanî yê ha, çimkî her kes zane, ku milet bêy jîyana ruhanî, bêy çandeya ruhanî dibe ber xetera helandinê û windabûnê here. Karên ha di olka êzdîyan da jî têne kirinê, lê bi hebûna vê ziyaretê meriv fem dike, ku jîyana ruhanî wê xwe li rêke geştir bigire. Gava em di nava salekê da dihatine vira, me texmîn dikir, ku milet seredana ziyaretê dike, bona rojên şahîyê û xweşîyê qurbanan dide.

Memê Amîryan (endamê şêwra rêxistina yekîtîya ciwanan ya êzdîyaye miletîyê ya bi navê "Sincar") – Ez dixwezim hestên xwe ji we ra parvekim. Bona vê rojê ez dixwezim razîbûna xwe bidime teşkîldarê van hemû yekan – Mîrzeyê Çolo Siloyan. Keda wî di nava jîyana gelê êzdî da pir e, lê karê kirî wê bi dewranan bê

bîranînê. Ev roj wê tu caran neyê jibîrkirinê û wê di rûpelên dîrokê da bê nivîsar.

Avtor – Çawa ku êzdî bi xwe dibêjin, bona êzdîyên li Ermenîstanê ji diya xwe bûyî û mezinbûyî ew li ku jî bijîn, Ermenîstan dimîne wek welatê wan, ew şemdanek e, ku herdem wana gazî ber bi warê jidayîkbûna wan – Ermenîstanê dike. Ew hesîn ji wê rojê dubare bû, dema ev warê bawermendîyê – ziyaret, hate çêkirinê û dua lê hate kirinê.

Di mehên salê yên cuda-cuda da, xwesma di mehên havînê da, me li vir gelek êzdîyên li Rûsîyayê dijîn dîtine. Hilbet, her kes şa û serbilind e, ku ziyaretê di fikir û mejûyên wan da gelek tişt guhêrandîye. Bona wê yekê jî bi dil tên, her kes tê, emirê wan çend salî be, karê wan çi be, qulixa wan çi be, ferq nake. Mesele, werzandçîyê êzdî yê bi nav û deng, gulaşgir Roman Amoyan jî li vir bû, ku hertim ji Ermenîstanê ra sîyanetê tîne. Ew çêmpîyonê Ewrupayê yê ducare ye, xelatgirê gelek caran yê dinyayê ye, xelatgirê mêdala tûnc ya lîstikên olîmpîyê ye.

Roman Amoyan (gulaşgir, xelatgirê pêşvanîyên dinyayê û Ewrupayê) – Ez miletê xwe pîroz dikim û dixwezim hûn hertim saxlem û bextewar bin, ez we şa bibînim. Ez dixwezim vê firsendê bi kar bînim û ji we ra bêjim – bira miletê me her sal vê rojê berevî vira bibe û em bi hev ra yekdest bin.

Avtor – Gorî bawermendên êzdî, ziyaret qewatê dide wan. Îdî bûye edet, ku him bona şahîyê, him jî di demên dijwar da têne ziyaretê, dema gelekî hewcê alîkarîya yê Jorîn dibin. Ew ziyaret dergehê bawermendîyên êzdîyan e, ku hêvî û bawerî dike dilê wan.

Sîabend Sadoyan (şervanê azadîyê) – Hurmet û sîyanet ji Mîrze Siloyan ra, yê ku ev ziyaret da çêkirinê û êzdîtîya me bi hev va da girêdanê. Ez razîbûna xwe ya kûr didime gênêral Manvêl Grîgoryan, yê ku mezîla ziyareta me da zêdekirinê û got: "warê ziyaretê nayê firotan, tê pêşkêşkirin". Îro mezîla ziyareta me bi saya serê wî camêrî hatîye firekirinê.

HECA BERBI ERMENÎSTANA ROJAVA













Ava Gola Wanê



Sûlava Bêrkirîyê



Hecî li ber mêvanxaneya Wanê ya bi navê "Ûrartû"



Ser Gola Wanê: Riya ber bi girava Axtamarê dibe. Taçar Vardanyan, Andranîk Artênyan û Mîrzeyê Çolo Siloyan



Dîdemak ji girava Axtamarê û dêra Xaça buhurtî ji qeyika, ku ranêzîkayî kenêr dibe



Qeyîk nêzîkî girava Axtamarê dibe



Girava Axtamarê û dêra Xaça
buhurtî bi vî awahî em qebûl kirin



Yek ji ecêbên dêra Xaça buhurtî li girava Axtamarê



Gola Wanê ji girava Axtamarê



Sîmon Tsatûryan ber kela Wanê



Andranîk Artênyan bi nobedarên girava Axtamarê ra



Girava Axtamarê: dêra Xaça buhurtî bi firçeya wênekêş Armên Harûtyûnyan



Girava Axtamarê berêvarê



Hecî Sêrgo Yêrîtsyan li dêra Axtamarê ya bi navê Xaça Buhurtî



Topika herî dijwar ya kela Wanê



Sêrgo Yêrîtsyan û Mîrzeyê Çolo Siloyan ber kela Wanê



Pisîka Wanê



Nivîsên bizmarkî yên li ser zaxên kela Wanê



Wan: Mîrzeyê Çolo Siloyan ber Derê "Mhêr"



Mîrzeyê Çolo Siloyan ber kela Wanê



Ber kenarê gola Wanê: berbangê – hevpeyvîn bi Mîrzeyê Çolo Siloyan ra bona fîlma vîdêoyê



Asoyên gola Wanê



Cangîr axa di xortanîyê da



Nevîyê Cangîr axa – Miraz, ber dergehê mala bav û kalên xwe



Yek ji malên Cangîr axa li vir bûye



Hewşa mala Cangîr axa



Li odeya mêvanan ya xwedîyê malê yê niha



Mirazê nevîyê Cangîr axa û Şêx Zade bi duakirinê xwelîyê hildidin bona bi xwe ra bibine Ermenîstanê



Malbeta Xetîf axayê bavê Cangîr axa li vê malê maye



Zevîyên hebê nên yên Xetîf axayê bavê Cangîr axa li vir bûne



Li hewşa mala Cangîr axa heta niha jî ji wê kanîyê avê dibin, ku Cangîr axa çê kirîye



Opêrator Samvêl Galstyan li ber sûlava Bêrkirîyê



Newala çemê Bêrkirîyê

HECA BERBI ERMENÎSTANA ROJAVA













Dîdemên bona paşdemê





Sêrgo Yêrîtsyan ber sûlava Bêrkirîyê



Keremê nevîyê Ûsiv begê li ber sûlava Bêrkirîyê



Li meheleke ermenîyan li Bîtlîsê



Mînas Zakaryan bi esilê xwe va ji Bîtlîsê ye



Dêra ermenîyan ya Mûşê





Ev keçên tirk di mehela ermenîyan ya Mûşê da dijîn û di nav hevalên wan da keçên bi esilê xwe va ermenî hene





Li vira goristana ermanîyan ya Mûşê bûye



Mûş: dêreke din ya wêranbûyî



Pira Sûlûxê



Sîmon Kagîyansê hecî li ser pira Sûlûxê



Samvêl Galstyan, Sêrgo Yêrîtsyan û Emo Şeroyan li ser pira Şivên



Xweşikbûn û bedewîya tebîyeta welêt ya ecêb



Êrzurum: dêreke ermenîyan, ku bûye mizgeft



Dêra ermenîyan ya Erzurumê ji hundur va



Avahîyê dibistana ermenîyan ya li Erzurumê



Hecî li meheleke ermenîyan ya kevin ya Erzurumê



Kela Erzurumê



Xanîyên axirîyê yên Erzuruma ermenîyan, ku heta niha mane



Dêra sereke li Anîyê



Hecî li dêra sereke ya Anîyê



Anîya wêranbûyî



Hecî li ber derê Anîyê



Riya ber bi Ermenîstanê: ecêbên tebîyeta welêt





Tebîyeta welêt: heykelên xwezayî, jiberxwe va çêbûyî



ŞAYÎNETÎYA SERSALÎYA PÊŞIN YA VEKIRINA ZIYARETA ÊZDÎYAN LI AKNALÎÇÊ, 29Ê ÎLONÊ SALA 2013AN

DI WÊNEYAN DA



EZDIKI.COM



Li warê bîranînê ya Sîsêrnakabêrdê



Mîrzeyê Çolo Siloyan û Mîr Hazim ji navê serekê ruhanîyê yê gelê êzdî û hemû êzdîyên dinyayê tacên gulan datînin ber heykelê Gelkujîya ermenîyan ya mezin



Qedirgirtina bîranîna şehîdên bêsûc yên Gelkujîya ermenîyan





Destpêka şahîyê li ziyareta Aknalîçê



Bi hezaran kes berevî şahîya ziyaretê bûne



Cîgirê serekê parlamêntoya Komara Ermenîstanê Êdûard Şarmazanov xeber dide



Wezîrê parastinê yê Komara Ermenîstanê Sêyran Ohanyan haziran silav dike



Wezîrê parastinê yê Komara Ermenîstanê
Sêyran Ohanyan şervanên azadîyê yên êzdî xelat dike



Kurê serekê ruhanî yê hemû êzdîyan Mîr Hazim silavnameya
bavê xwe Mîrê Mîran Tehsîn beg bona amadekaran dixûne



Mîrzeyê Çolo Siloyan tevbûyên şayînetîyê silav dike



Ji navê ruhanîyên ermenîyan metran Artak Sîmonyan xeber dide (ji milê Armavîrê)



Ruhanîyên ji Lalişê hatî dua dikin



Silavkirina Şêx Hesen Hesenyan



Şayîr Lîparît Sargsyan silava nivîskarên ermenî digihîne haziran



Sêrgo Yêrîtsyan kemala
dostanîya ermenîyan-êzdîyan tîne ber çevan



Tevbûyên şahîyê yên ji Ermenîstanê, Gurcistanê, Rûsîyayê, Ewrupayê hatî ji vê şahîyê ruhdar bûne





Dor-berê ziyaretê bi milet va kimkimî ye



Mêvanên hurmetlî di hundurê ziyaretê da



Pîr Mirazê Koçer Mistoyan (Kalînîngrad) silavên êzdîyên Rûsîyayê pêşkêşî amadekaran dike



Azîz Tamoyan xeber dide



Koma folklorî ya "Akûnk" bi sitiran û reqasên xwe va amadekaran heyr-hijmetkar dihêle



Dengbêjê êzdîyan yê bi nav û deng Cangîr Broyan distirê



Tevbûyên şahîyê bi koma "Akûnk" ra tevayî ketine govendê



Jin direqisin



Artîstê Komara Ermenîstanê yê emekdar Rûbên Sahakyan distirê



Wêneyê bona bîranînê



Mîrzeyê Çolo Siloyan bi pirtûka xwe ya tezeronahîdîtî ya bi sernivîsara "Riya ku ber bi ziyaretê dibe"



Mêvan bala xwe didine pirtûka Mîrzeyê Çolo Siloyan

Ûsib Etarî (şervanê azadîyê) – Wezîrê parastinê Sêyran Ohanyan bi wê sersalîyê ra girêdayî xelat dane şervanên me û merivên hevalên me yên şehîdbûyî. Em bona qîmetkirina karê me razîbûna xwe didine wezîrê parastinê û serokê komara me.

Avtor – Hilbet, him di nav ermenîyan da, him jî di nav êzdîyan da şahîyên ha bêy mêvandarîyê, nandayînê, eşqvexwerinê xilaz nabin. Wek sala par, vê carê jî cêrgeya xwerinxaneyên bi navê "Mûsalêr" bi sedan mêvanên wê şahîyê qebûl kir.

Hilbet, di qewmandinên ha da gerekê usa jî çend salixîyên edetî pêk bînin, berî her tiştî ya dostanî û biratîya herdu miletan. Vê kasê tamade pêşnîyar dike. Pey ra dest bi sitiranê û sazbendîyê dibe. Pêşî artîstê Ermenîstanê yê emekdar Rûbên Sahakyan sitira. Paşê koma folklorî ya bi navê "Akûnk" reqasên xwe yên ciwan raberî haziran kir. Li ser dikê dû ermenîyan ra dengbêjên êzdî hunurê xwe nîşanî amadekaran dikin, yek ji wana dengbêjê naskirî Cangîr e, an jî Cangîr Broyan, yê ku bi taybetî ji bo vê armancê ji Moskvayê hatîye vira, bona şabûnê bike dilê birayên xwe yên ermenî û êzdî.

Wek ku gelek caran dibe, di şahîyên êzdîyan da reqas cîyê sereke digire. Ya here sereke jî "Govend" e, ku yekîtî û hevgirtina milet dide kivşê. Ew reqaseke wisan e, ku hertim jî ber dilê êzdîyan ezîz bûye û me dibe ber bi reh û koka vî miletî.

Emê dîsa vegerine "Mûsalêr"ê, ku mêvandarî warguhêzî sitiranbêjîyê û sazbendîyê bûye, bûye warê leca bi tevgelîya hunermendên ermenî û êzdî. Û mêvan ji Lalişa Nûranî – navbenda ruhanîya êzdîyan, ji warên Îraqê yên cuda-cuda, ku êzdî zêde lê dijîn, usa jî ji Bexdayê hatine. Ewana roja hatina xwe ya Rewanê ya pêşin da seredana Sîsêrnakabêrdê kirîye, ku li wir warê bîranîna şehîdên gelkujîya ermenîyan e.

Sala par, hema xût vê rojê, gava serekê ruhanî yê êzdîyên temamîya dinyayê gihîşte Rewanê, yekser çû ber heykelê bona bîranîna gelkujîya ermenîyan û hema li vir – li Sîsîrnakabêrdê, rojnamevanan bi wî ra hevpeyvîn kirin û wî got, ku kula wê qirê bi ermenîyan ra tevayî êzdî jî dikişînin.

Mîrê Mîran Tehsîn beg – Min êdî ji Ermenîstanê lezeteke baş dîtîye û ez şa me, ku kêfa êzdîyan ji vira gelekî tê. Ev seredana me li Sîsêrnakabêrdê careke din wan rojên bi qetil tîne bîra me, ku wan deman ne tenê ermenî hatine qirê, lê usa jî êzdî û aşûrî. Xwedê mezin e, û daxweza me ew e, ku ecêbeke usa tu caran li tu cîyan dîsa neyê serê miletan û di dîrokê da bedbextîyên ha dubare nebin.

Avtor – Bona mêvanên ji Lalişê hatî nimûneyên ku li mûzêya Gelkujîya Mezin da hatibûn nîşandan, pir balkêş û hewaskar bûn. Ewana li vira gelek tişt cara pêşin dibînin. Ewana ne tenê bi guhdarî şirovekirinan dibihên, lê usa jî pirsan didin, fikirên xwe bi hev ra diguhêrin.

Em careke din bikine bîra we, ku malbeta Mîrê Mîran di salên gelkujîya ermenîyan da sitar daye zêdeyî 6 hezar ermenîyên mihacirbûyî.

Mêvan di pirtûka "Ji bo mêvanên qedirgir" da bîranînên xwe dinivîsin, di wan da ne tenê hurmet û sîyanet heye di hindava gel da, herwiha haziraya wan tê elamkirinê, ku pirsa naskirina gelkujîya ermenîyan pêşnîyarî parlamêntoyên Herêma Kurdistanê û Îraqê bikin. Bi bawerîya wan hovîtîyên usa gerekê temamîya dinyayê bihese, bona ew tu caran dubare nebin. Êzdî jî miletekî wisan e, ku hatîye qirkirin, kuştin, mal û milkên wan hatine wêrankirin û talankirin, û ewana kul û derdê bêderman yê gelê ermenî diha rind fem dikin. Niha jî, dîsa bi sipartina serekê ruhanî yê êzdîyan dêlêgasyona ji Lalişê hatî li vir e – bi serokatîya Mîr Hazim, yên ku borcê xwe dihesibînin dema bêne Ermenîstanê, berî gişkî herine Sîsêrnakabêrdê, ber heykelê şehîdên qira ermenîyan temene bin, bejina xwe bitewînin. Bi bawerîya Mîr Hazim, ne dûr e, ku parlamêntoyên Kurdistanê û Îraqê qira ermenîyan nas bikin. Mîrzeyê Çolo Siloyan û Mîr Hazim tacê kulîlkan datînin ber heykelê li Sîsêrnakabêrdê, paşê kulîlkan dibin ber heykelê agirê netemirî jî.

Pîr Hamo – (wezîrê pêwendîyên bi civaka sivîl ra li hukumeta Îraqê) – Bi hayadarîya serekê ruhanî û şêxê me em

hatine tevî şahîya ziyaretê bibin. Em dostanîya xwe ya bi sedsalan ji bîr nakin û em borcê xwe dihesibînin, ku wek nûnerên gelê êzdî tevî heyteholên li ziyaretê têne kirin bibin.

Avtor – Gava sala par mêvanên ji ziyareta Lalişê hatibûne Ermenîstanê, gelek rasthatinên wan yên fermî hatine derbazkirin, wana seredana gundên êzdîyan kirin û gelek kêm wext ma bona bi Rewanê û Ermenîstanê ra bibine nas. Bona wê yekê jî wana vê carê hewil dida çiqas ji dest wan tê zêde bi Rewanê ra bibine nas. Vê carê wana pê ra gîhand herine Matênadaranê. Li vira mêvan bi germî hatine qebûlkirin, ewana bi vê dezgeha parastina destxetên kevinare û bi qedera destnivîsarên ermenî ra bûne nas, wana wisa jî bala xwe dane destxetên bi zimanên din.

Pîr Memo – Em ji Lalişa Nûranî 29ê îlonê sala 2013an, li vê roja bi nav û nîşan, hatine vira. Van rojan me gelek tişt dît, bi gelekan ra sohbet kir, em bi kûltûra xwe ra bûne nas. Me li Matênadaranê fem kir, ku ermenî miletekî kevinare ye û xwedî kûltûrake balkêş û hewaskar e. Niha ez êdî zanim, ku ermenî berî Îsa jî xwedî kûltûrake dewlemend bûne, dewleta wan hebûye û hemû dewletên dorê di nav teşkîla wê da bûne, welatekî ji behrê heta behrê bûye. Artêşa wan ya bi hêz, cebirxane, leşker û pereyên wan hebûne. Wana xaçparêzî qebûl kirine, wergera pêşin ya "Încîl"ê kirine. Di karê heykelterêşîyê, sitêrkzanîyê, dinêzanebûnê, bizîşkîyê da gihîştine serketinên mezin. Ermenîstan piştî qebûlkirina xaçparêzîyê ra jî pêş ketîye û tesîra wê li ser pêşketina medenîyetê pir bûye.

Bavê Çaûş (endamê desteya bilind ya ruhanî li Lalişê) – Kêfa min hat gava min ber ziyaretê bi hezaran êzdî dîtin, û ew ne tenê ji Ermenîstanê bûn, lê usa jî ji Rûsîyayê, Gurcistanê, welatên Ewrupayê bûn. Ev hemû bi saya serê Mîrzeyê Çolo Siloyan e, yê ku bi pereyên xwe û yên neferên mala xwe ev ziyaret da çêkirinê.

Ez dixwezim razîbûna xwe ji Mîrzeyê Çolo Siloyan ra bêjim bona her tiştê wî kirîye û bangî wan kesan dikim, ku çav bidine wî, yê ku mal û milk di destê wan da heye û dikarin kêrî gelê xwe bên. Em berî demekê li Matênadaranê bûn, me nivîsên bo xwe

kêrhatî dîtin. Em gelek şa bûn, dema gotin, ku di wan da derheqa êzdîyan da jî gelek malûmatî hene. Li vira heta di çavkanîyên kurdî da jî derheqa êzdîyan da malûmatî hene. Û ez dixwezim berê xwe bidime wan hemû kesan, yên ku dikarin bi lêkolîna van çavkanîyan va mijûl bibin, ev hemû gerekê derxine meydanê, bikine milkê milet.

Avtor – Bona mêvanên me ruh û heyetîya ermenîyan bi vî awahî jî tê dîyarkirin, û ji ber wê jî gelek pirs-pirsyar dikirin. Her tişt hewaskar û balkêş bû bona wana, û ewana dû ra çend caran dubare kirin: "Em bi hezaran salan li rex hev dijîn, lê em derheqa hev da gelek tiştan nizanin, xwesma nesila nû ya herdu miletan hewcê wê yekê ye, ku ji nêzîk va hev nas bikin".

Ecîm Kerîm Silêmanî (Irak) – Eva cara dudan e ez tême Ermenîstanê. Cara pêşin ez hatibûm bona vekirina ziyaretê û min wê demê lezeteke baş dît, ku ziyareta me li welatê we heye. Li Rewanê, di dema rasthatinên bi karmendên derece bilind ra me Ermenîstan baş nas kir. Me wî çaxî got, ku emê dîsa bên. Û îro em dîsa hatine bona tevî şahîya sersalîya ziyaretê bibin û me bi xwe ra duayên Lalişa Nûranî anîne. Vekirina ziyaretê bûyereke mezin e di jîyana Ermenîstanê û di dîroka gelê êzdî da.

Gelek êzdî ji Ermenîstanê derketine û çûne dewletên cuda-cuda yên Sovyeta berê, çûne Ewrupayê. Bi texmîna min, ev ziyaret wana digihîne hev. Heta wana jî, ku terka gund kirine, lê rehên xwe li vir hîştine. Warên jidayîkbûnên wan li vir in. Van rojan li Ermenîstanê em çûne warên dîrokî yên cuda-cuda, me bala xwe da heykelên ermenîyan yên dîrokî-kûltûrî, em bi mîrata kûltûrî ra bûne nas û li her deran me lezeteke baş dît, dema me nasîya xwe dida Garnîyê, Gêxardê, Xor Vîrapê, Êcmîadzînê.

Em bi wan her tiştan va kubar dibin, ku yên dostên me – ermenîyan in.

Avtor – Warê seredana mêvanên qedirbilind yê dinê kela Garnîyê ya pûtperestîyê ye. Dostên me yên êzdî ne tenê heyr-hijmekar, lê usa jî zendegirtî û şaş-metel dimînin. Lema jî lez dikevin

herin him kelayê bibînin, him jî wargehê wê, ku li rex gêlî ye, bi wê yekê va qedirê gelê ermenî û dîroka wî yê kevinare bigirin. Bona wana her tişt balkêş û hewaskar e. Di nava dêlêgasyonê da kesên derece bilind, wezîr, şêwirmend hene û ewana hewil didin ji nêzîk va hevdu nas bikin.

Dema mêvanên me dikevine komplêksa dêrên li Garnîyê, ecêb dimînin. Li vira ewana bi pêşîyên me va heyrî dimînin. Di tiştên dîtî da wana aqilmendîya pêşîyên gelê me didîtin.

Doktor Mîrze Dina (Îraq) – Ez razîbûna xwe ya pir elamî Mîrze dikim, ku ev her tişt daye çêkirin û ew yek gelê me digihîne hev, nav me da yekîtîyê çê dike. Ez razîbûna xwe didime ermenîyan û dewleta ermenîyan, ku destûr dane van her tiştan çê bikin. Em li vira rastî ronakbîrên êzdîyan hatin û gelek şa bûn, ku li Ermenîstanê merivên ha xwendî û pêşketî, zaneyên dîroka xwe hene û daxweza me ew e, ku ew bêne Îraqê, bi welatîyên xwe ra bidin û distînin.

Em çûne Matênadaranê, me ji nêzîk va nasîya xwe da destxetan, dîroka ermenîyan û me rola ermenîyan di nav pêşketina medenîyetê da texmîn kir. Em pir kêfxweş in, ku dostên me yên ha hene. Ez dixwezim em hemû ji dîrokê dersan hildin, herdem bi hev ra, alî hev bikin, piştgirîya hev bikin.

Avtor – Gêxard ji bo serekên ruhanî yên Lalişê warekî ber dilê wan ezîz e, ji ber ku li wir jî bi sedan salan ruhê miletîyê yê ruhanî tê parastinê. Hema komplêksên ruhanî yên ha dibine bingehê nivîsar û edebîyetê, serkanîya ruhê miletîyê, warên parastina kûltûrayê.

Yek ji serekên ruhanî yê Lalişê Bavê Çaûş eva cara dudan e, ku li vir e, û wek ku ew bi xwe dibêje, ewî vê carê bi çavekî din li Ermenîstanê, li dîroka wê, li gelê wê, wisa jî li êzdîyên bira nihêrî. Nasîhevdan û seredanên ha ji bo gelê li vira dijî pir giring in. Hema ji bo wê yekê jî dema çûyînê gotin: heta hevdîtineke din. Ji ber ku axa Ermenîstanê wisan e, ku her kesî ber bi xwe dikişîne, lê miletê li wir germ û mêvanperwer e. Ango, wê dîsa bêne vira, bi kêmanî salê carekê, bona seredana ziyaretê bikin.

Doktor Cemîl (Îraq) – Eva cara dudan e, ku ez li Ermenîstanê

me. Sala par wextê vekirina ziyaretê jî ez li vir bûm. Min zêde ji vî welatê xweş, bi merivên wî yên germ û dilovan va, hiz kir. Ez ji Ermenîstanê gelekî hiz dikim. Welatekî bedew, mêvanhiz e, her kesî ber bi xwe dikişîne. Ez şa me, ku ev welat bi dilê welatîyên min e jî. Ez ji gelê ermenî pir razî me bona vê helwestê. Lê Mîrze li vir ecêbek kirîye rastî, li vir ziyaret çê kirîye. We dît, ne, çend hezar kes hatibûn? Bernameyên wî yên paşerojê jî yên pesindayînê ne, ku li vir ne tenê wê ziyaret hebe, lê usa jî ziretgeh, bi der û dorên xwe yên bedew û hijmekar va. Em şa ne, ku hatine Ermenîstanê, em hatine cem pareke cimaeta xwe, me bala xwe da hal û demên wan, em bi wan va firnax bûn.

Em şikirîyê ji Xwedê ra bînin, em ji Ermenîstanê ra xweşbextîyê bixwezin, bira dostanîya ermenîyan û êzdîyan ya heta-hetayê be. Gava em têne Ermenîstanê, em zoraya wê dostanîyê texmîn dikin. Em zef razîne, gelê ermenî, ku we mecal saz kirine bona Mîrze bikaribe vê ziyaretgehê çêke. Xwedê me gişka sitar bike.

Îvo Waweş (Îraq) – Ez ji Mîrze Siloyan gelekî razîme, ku ziyareteke ha çê kirîye. Ew êzdîyên ji welatên cuda-cuda digihîne hev. Gava em vegerîyane Îraqê, emê ji êzdîyan û ermenîyan ra şirove bikin, ka me li vira çi dît. Êzdî miletekî bi hejmara xwe va biçûk e, û ev ziyareta li Ermenîstanê çêkirî wana digihîne hev. Ez weke vê dinyayê ji Ermenîstanê razî me bona van her tiştan.

Avtor – Em careke din dema xatir dixwezin û berê xwe didine "Mûsalêr"ê û li ser vê axa ermenîyan du miletên bira şa dibin, kêf dikin, hunermendên êzdî û ermenî kilama dibêjin, direqisin, di nav wan da ye usa jî dengbêjê êzdî yê teze xuliqî Artûr Safoyan. Pey ra Cangîr Broyan bi qiseyên xwe yên hewaskar va dest bi sitiranan dike. Em wê jî bêjin, ku malbeta Siloyanan jî xweyşuret e, dengê neferên wê malbetê jî xweş e. Birazîyê Mîrze Siloyan, Miraz çîroka xwe dibêje, ya derheqa evînê û aminayê da, hêvîyê û bawerîyê da, dostanîyê û biratîyê da, qewmtîyê û pêwendîyên merivan yên here qenc da.

Dibe eva reqasa xatirxwestinê be? Lê heta sala tê, hema vê rojê, dema dîsa wê bi hezaran meriv berevî ziyareta li Aknalîçê bin, bona aminaya xwe ya di hindava dînê xwe da, derheqa dostanîya

ermenîyan-êzdîyan da dîhar bikin, ku ber dilê me hemûyan ezîz in. Em gişk xatirê xwe ji hev dixwezin. Û li vira hêja bû em wêneyê xwe bi hev ra bikişînin.

Û gişk dibêjin: heta rasthatineke din li Aknalîçê, sala 2014an li ziyareta êzdîyan, ya nûjenkirî û mezinbûyî.

Usa qewimî, ku pey çend rojan ra me dîsa seredana ziyareta êzdîyan ya li Aknalîçê kir. Û li vir dîsa gelek meriv berev bûbûn. Li wir du dewat hebûn. Yek ji wana ji gundê Kaxsraşênê, navçeya Araratê hatibûn. Bûk û zava gelek şa bûn, ku şahîya wan li warekî bawermendîyê, li ziyaretê derbaz dibe. Wek ku wana digot, pey wê yekê ra, ku horî-melekan dua li wan kir, şahîya xwe li warê li rex ziyaretê berdewam kirin. Ew war bûbû meydana reqasê. Her kesî direqisî – mezin û biçûk, jin û mêr. Hela di ser da jî, li wî warê ber dilê wan ezîz şabûn ketibû dilê her kesekî.

Miraz Mûradyan (serdewatîyê şahîyê) – Em ji Mîrze Siloyan gelek razî ne bona çêkirina vê ziyareta me. Em hemû têne vira û şa dibin.

Avtor – Hela me pê ra ne gîhandibû bi avabûna royê va heyr û hijmekar bimana, me hew dît li vira dewateke din dest pê dike, vê care ji gundê Artaşatê, navçeya Armavîrê hatibûn. Kesên li vira digotin, ku ji warên Ermenîstanê yên cuda cuda, ku êzdî lê dijîn, têne vir. Usa jî ji Gurcistanê, ji welatên Sovyeta berê jî tên. Bona heyteholên cuda-cuda tên, bona hecê, bona seredanê. Şabûna tevbûyên şahîyê ber ziyaretê bi reqasên qeşeng va xemleke bedew dida wî warî.

Ziyareta Aknalîçê bi vî awahî roj bi roj gul vedide, kaw û bedew dibe û bi sedan bawermendan gazî cem xwe dike. Niha li vira çêkirina xanîyê navbenda perwerdeyê-kûltûrayê pêşda diçe. Bi wê ra tevayî wê der-dorên ziyaretê bê tundurustkirinê. Çend meh wê derbaz bibin, û ev warê fire yê dora ziyaretê wê di nav gul û gîha û baxan da winda be, wê bibe warekî ber dilê ermenîyan û êzdîyan ezîz, û pêkhatina xewna Mîrzeyê Çolo Siloyan ya bi salan wê diha geş xuya bibe.

Sal 2013, îlon,
Aknalîç-Rewan-Garnî-Gêxard.

EZDIKI.COM

Riya ku ber bi ziyaretê dibe

Riya ku ber bi ziyareta êzdîyan dibe ji bo Mîrzeyê Çolo Siloyan rêyeke dirêj û dijwar bûye: emirek – ku ji şeş dehsalîyan zêdetir jîye.

Di bîr û ramanan da ji beşera Araratê, ji bayê ji hêla çiyayê Elegezê hatî dilê wî baristan dibû û ew ji Lalişa Nûranî dûrtir ziyareteke nû didît. Xeyalên wek xewnan pêk hat, kemilî û bû rastî. Û di gundê Aknalîçê da, li herêma Armavîrê, li Ermenîstanê ev ziyaret bilind bû.

29ê îlonê sala 2012an bona tevî heytehola duakirina ziyaretê bibin gelek kes ji cî û warên Ermenîstanê yên dûr û nêzîk, ji Rûsîyayê, Ûkraînayê, Ewrupayê hatibûne vira. Dêlêgasyoneke ji ziyareta hemû êzdîyên cihanê – ji Lalişa Nûranî bi serokatîya serekê ruhanîyê yê hemû êzdîyên cihanê Mîrê Mîran Tehsîn Beg jî hatibû wira. Û tiştekî xwezayî ye, ku serokatîya ruhanîya bilind ya êzdîyan ber çavên amadekaran berî her tiştî karê duakirina ziyaretê pêk anî.

Li hawîrdorên ziyaretê bi hezaran meriv berev bûne, ku hatine tevî vê bûyera dîrokî bibin, bona guh bidine gotin û duayên serekê xwe yê ruhanîyê. Û gotinên wî bi tesîr û kurt in.

Mîrê Mîran Tehsîn Beg (serekê ruhanîyê yê hemû êzdîyên cihanê)[1]

-Xûşk û birayên ezîz! Em îro berevî vira bûne bona dua li ziyareta nûçêkirî bikin. Îro rojeke dîrokî ye. Hûn hemû hatine vira

[1] *Ewî ber haziran gotina xwe ya pîrozîyê got û tevaya axavtina wî di dawîya vê beşê da ne.*

bona qedirê miletê êzdî û erf û edetê wî bigirin. Ez pir şa me, ku hûn dikarin li vira her tiştên xwe biparêzin. Bira xuliqandina vê ziyareta nû pîroz be. Bira ew ji we ra xweşbextîyê û serketinan bîne.

Lê berî vê para şayînetîyê, tevaya serokatîya ruhanîyê bi haziraya ewledên xwe yên bawermend dua li vekirina ziyaretê dike. Li her deran dengê duakirinê tê bihîstinê, nûnerên serekên ruhanîyê bi dor li wî cîyî duayên xwe dikin, ku tiberkên ji Lalişê anî li wir bi cî kirine.

Xwesma ji beşera Mîrzeyê Çolo bextewarî dibare û ew dikare bêje, ku xewna wî pêk hat û ew vê yekê bi dengekî bilind dibêje. Dora ziyaretê meriv berev bûne û guh didin duayên ku li hundurê ziyaretê têne kirin. Lê li ser dikê ew kes sekinîne, ku wê bi vê rojê ra girêdayî gotina xwe bêjin. Yek ji kesên pêşin, ku destûra axavtinê didine wî, ruhanîyekî ermenî ye.

Metran Artak Sîmonyan (nûnerê ruhanîya Armavîrê)

-Ez we pîroz dikim. Ka mêze bikin – îro Ararat çiqas şîrin şewq vedaye. Êcmîadzîna Buhurtî ji vira ne dûr e. Em dua û dirozge, hêza wê bi tevayî texmîn dikin. Birayên êzdî yên qedirgir, niha hûn jî xwedî ziyaretê ne. Ev bûyereke pir giring e: miletek, ku xwedî dîroka bi gelek sedsalan e û di wan deman da li rex miletê me jîye, di bin banekî da, alî hev kirine, îro hatîye bona bingehê ziyareta xwe dayne. Ez we û hemû êzdîyên cihanê pîroz dikim. Û bira bi reza Xwadayê Mezin, bi duayên vê minareya nû di ocaxên we hemûyan da şahî û bextewarî bin û di wan rojan da gazî me jî bikin, ku birayên we yên herdemî ne. Duaya Xwedê li ser we be, ez we hemûyan pîroz dikim.

Bala gişkan li ser wê ziyareta mînanî ya Lalişa Nûranî ye, ku bilind dibe. Her kes dixweze xwe nêzîkî ziyaretê bike, bikeve

hundur û eger ew yek ji wan ra li hev neyê, qe na xwe li kevirê dîwarê wî cîyê buhurtî xe. Û li ser dika li rex ziyaretê merivên din sekinîne dorê, ku wê gotina xwe ya bimbarekîyê û pîrozîyê bêjin.

Aşot Xahramanyan (serekê herêma Armavîrê)

-Ev taca gulan ya kevirî bi daxweza dil û ruhê xêrxwezekî ji Moskvayê Mîrzeyê Çolo Siloyan hatîye çêkirin. Di nav her kevirekî vê ziyaretê da bîn û boxsa ziyareta Lalişa Nûranî tê, herwiha hest û edetên êzdîyan tê texmînkirin. Ev bûyera bi rengên jîyana ruhanî û herdemî va nixamtî nêzîkî dilê her binecîyekî herêma me ye. Her çêkirineke nû, xwesma birceke ruhanîyê, ku li ser vê axa pîroz û pir zêrîyayî tê çêkirin, ber dilê me hemûyan ezîz e. Û ev avahîyê ber çavê me pirake roj û demên buhurî û yên îroyîn e, herwiha sîmvola bîr û bawerîyên miletîyê yên paqij e.

Kesên dipeyivin dor nadine hevdu. Gotinên pîrozîyê, qîmetkirinê, razîbûnê yên germ li ser bazirganê xêrxwez Mîrzeyê Çolo Siloyanê ji Moskvayê û malbeta wî da dibarin. Ne axir ewî bi xwe xewn û xeyalên xwe û yên êzdîyên li Ermenîstanê dijîn pêk anî, ku xwedî ziyareta xwe bin, ya ku mînanî wê ziyareta Lalişê ya sereke be, ku bi sedan kîlomêtran dûrî wan e.

Neferên mala Mîrzeyê Çolo jî li vir in: xanima wî, kurên wî, bûk û nevîyên wî.

Romanê Mîrze Siloyan (kurê Mîrzeyê Çolo)

-Saxlemîya bavê min ne zêde baş e û ji ber wê yekê jî çûyîn-hatina bi balafiran ya gelek caran dikare hukumî ser cansaxîya wî bike. Ser van meseleyan bizîşk bi awayekî sert jê ra gotine. Lê ew guh nade bizîşkan. Dema ziyaret dihate çêkirinê, ew nîvê heftêyê li Ermenîstanê bû. Me hewil dida rica ji wî bikin, ku kar û barê xwe bi têlêfonê, bi Întêrnêtê çareser bike. Lê me pê nikaribû, ew ser ya

xwe dima. Hela bilêt nekirîbû, xwe li riya balafirxaneyê digirt, di rê da pê ra digîhand bilêt tembe dikir û piştî çend sehetan îdî li cîyê ziyaretê bû, li rex çêkirçîyan. Lema jî van dawîyan me êdî zor lê ne dikir. Me zanibû, ku ewê ya xwe bike.

Malbeta me, binemala me pir şa ne, ku xem û xeyalên bavê min pêk hatin. Lê em wê jî zanin, ku ewê bi vê yekê va rehet nebe. Ew ji niha da behsa firekirina warê ziyaretê, çêkirina sera şayînetîyan, sazkirina navbenda çandê, bingehdanîna xasbaxçeyê, danîna heykelan dike. Û ya pêşin, ku di serê wî da xuliqîye, ew heykelê dostanîya gelên ermenî û êzdî ye. Tiştekî şabûnê ye. Ew warê jidayîkbûna xwe pir hiz dike û ev yek derbaz nav me zaran da jî bûye. Zarên me, ku li dibistaneke Moskvayê ya naskirî da dixwînin, bi şabûneke mezin behsa welatîyên xwe, Ermenîstanê dikin, gelekan teglîf dikin herine welatê kal û bavên xwe. Ziyaretê gelek tesîr li me kirîye. Ez li dinyayê li kîderê jî bijîm, bi hêvî me, ku her sal 29ê îlonê emê bêne Ermenîstanê.

Li der û dorên ziyareta li Aknalîçê bi cimetê va kimkimî ye. Ew war ancax têra bawermendên hatî dike. Ew ne tenê ji cî û warên Ermenîstanê yên dûr û nêzîk hatine, lê herwiha ji welatên din jî. Bi ruhdarbûn, bi hêvî, bi daxwezan hatine. Li vira merivên nas û nenas in. Em bi wan ra ketine nava sohbetê. Em ji xeberdana wan çend nimûneyan raberî guhdarîya we dikin.

Telman Feroyan (bazirgan, Îvanovo, Rûsîya)

-Em bi ruhdarbûneke mezin va hatine vekirina ziyaretê. Ev xewna me ya di zû da bû, ku yek ji ewledên miletê me yê hêja Mîrzeyê Çolo Siloyan pêk anî. Em hemû jî wek wî şa dibin, ew şabûna temamîya gelê me, herwiha gelê ermenîyan ya bira ye jî. Em jî li Ermenîstanê bûne xweyê ziyareta xwe. Ez bi hêvî me, ku ewê gelek kesan bîne Ermenîstanê, vî warê deşta Araratê ya gelek bedew. Ez bawer im, ku ewê ne tenê bona êzdîyên Ermenîstanê, lê bona hemû êzdîyên Rûsîyayê jî bibe mînanî hecê. Em bi

dêlêgasyoneke mezin va ji Îvanovoyê hatine vira. Îdî min qirar kirîye, ku temamîya malbeta me wê havîna bê were Ermenîstanê û emê berî her cîyan bêne vira. Di paşdemê da ne tenê warê jidayîkbûna me, lê wisa jî ev ziyaret wê me ber bi xwe bikişîne û emê bi xem û xîyalên xwe yên paqij va li vir biqesidin.

Memê Şemsanî (binecîyê Tbîlîsîyê)

-Salên dirêj ez li Tbîlîsîyê dijîm, lê welatê min Ermenîstan e. Ez li Ermenîstanê ji diya xwe bûme û mezin bûme. Îro bona me êzdîyan eydeke mezin e, ku li ser axa Ermenîstanê pêşkêşeke ha dane me. Ziyareta me li ser axa Ermenîstanê ye û ew yek dide xuyakirin, ku ermenî di hindava êzdîyan da çiqas dilovan in. Ezê tiştekî teze nebêjim, eger bidime kivşê, ku dostanîya me herdu miletan di nava hemû dijwarîyan ra derbaz bûye û ber xwe daye. Me tu caran dijminatîya hevdu ne kirîye. Li ku jî bûye, li Ermenîstanê an jî dervayî sînorên wê, ew dostanî berdewam bûye. Li Tbîlîsîyê piranîya hevalên min ermenî ne, merivên gelek dilovan û xêrxwaz in. Bira duaya Xwedê li ser axa Ermenîstanê, miletê wê, ser ermenîyan û êzdîyan be.

Gêorgîyê Egît (rohilatzan, Tbîlîsî)

-Êzdîtî bawerîyek e û peyçûyên wê ne dijî tu bawerîyekê ne û di hindava qanûnên ji alîyê Xwedayê Mezin da sazkirî amin in. Min ji Xaçatûr Abovyan notek anî (bira ruhê wî di nav nûrê da be). Ermenîstan li ser axa welatê buhurtî ye, li wir e ziyareta merivayê ya sereke, heca hemû kesên Xwedênas – çiyayê Araratê. Bextê êzdîyên me lê xist li deşta Araratê, li ser axa Ermenîstanê bibine xwedîyê ziyareta xwe ya pêşin û ez ji bo vê yekê razîbûna xwe didim miletê me û gelê ermenîyan. Ji ber ku ew nîşana dostanîya me herdu miletan ya here baş e.

Eslanê Rostemê Etar (binecîyê gundê Noravanê li herêma Armavîrê)

-Em miletên kevinare ne, em li rex hev jîne, tirkan em jî qir kirine. Me bi ermenîyan ra tevayî xwe li çemê Erez xist, em derbazî vî berî bûn, Ermenîstanê. Ermenî bi xwe jî di nav dijwarîyan da bûn, lê li rex me sekinîn. Tenê miletê ermenî ye, ku destûrê dide em bibine xwedîyê zimanê xwe, nivîsar û edebîyeta xwe, xwendinê bistînin. Em ji miletê ermenî gelek razî ne. Niha em xwedî zimanê xwe, kûltûra xwe, rojname û radyoya xwe ne. Û îro jî ji temamîya dinyayê ra eyan e, ku hema ermenîyan destûr da, ku em li vira ziyaretê çêkin. Em minetdarê miletê ermenî ne.

Serekê ruhanîyê yê êzdîyên temamîya dinyayê Mîrê Mîran Tehsîn Beg cara pêşin seredana Ermenîstanê kir, ew ji bo gelê êzdî, usa jî gelê ermenî hurmeteke mezin bû. Tehsîn beg bi hazirîya nûnerên xwe yên ruhanîyê tevî duakirina vê ziyaretê bû. Ev bûyer şabûneke mezin kire dilê gelê êzdî, ji çavên gelekan hêsir hatin. Ew hêsirên şabûnê, hêsirên ji dil bûn. Ewana xeyal dikirin, ku serekê êzdîyan yê ruhanîyê qe na piştî sedsalekê dîsa li wan biqeside. Ew di meha îlona sala 2012an qewimî.

Em vegerine ser ziyareta Aknalîçê: 29ê îlonê sala 2012an. Mîrzeyê Çolo Siloyan bextewar e. Hawîrdor milet kimkimî ye. Lê tu dibêjî, ku dîsa xewn e – ewqas welatîyên xwe yên şa û eşq bi hev ra ne dîtîye.

Tifaqeke erhede, şabûna tevayî, gelek bextewar in. Meriv hatine bona ecêbeke xweş bibînin. Êzdîyên Ermenîstanê demeke dirêj li bendê bûn, ku li Ermenîstanê ziyareta wan hebe. Merivên bi emirê cuda-cuda dikevine ziyaretê. Kalekî hizhizî ber derê ziyaretê solên xwe ji xwe dike û dîwaran radimûse, dua dike û dikeve ziyaretê. Bûkên genc qelfe-qelfe dikevine hundur û nêzîkî wî cîyî dibin, ku tiberkên buhurtî cî kirine. Li vir zaro jî hene, bona wan wêneyê Lalişê yê li ser dîwarekî ziyaretê hewaskar e. Ziyaret ji berbangê da bi bîn û buxsa hatîyan va dijî. Ewana hey tên û tên.

Mêls Lazgîyan (bazirganê ji Rûsîyayê)

-Bi hezaran meriv hatine vira, min di çavên gelekan da hêsir dîtin, hêsirên şabûnê. Di çavên gelekan da jî hêsirên hizretê, hizreta hişyarbûna ruhanî xuya dikir. Bi çêkirina vê ziyaretê va firsend kete destê gelê me bi bawerîya xwe ra amin be, di hindava paşeroja xwe ra xweşbîn be.

Bi rastî jî ziyaret dikare bibe qesira bawermendîyê. Bawerîya, ku jîyanê dide me, me ber bi wê yekê dibe, ku zimanê xwe, kûltûra xwe, erf-edet û rabûn-rûnştina xwe biparêzin. Em li rex dostên xwe yên ermenî jîne, me dîtîye ku ew çawa diçine dêrê, mûman vêdixin, dua dikin. Lê wisa qewimîye, ku ziyareta me ya ji keviran çêkirî tunebûye û berê me herdem li Lalişê bûye. Niha li Ermenîstanê em xwedîyê mala xwe ya bawermendîyê ne. Ji îro şûnda eger ez bi sebebekê bême Ermenîstanê, ezê ji sedî sed bême Aknalîçê, warê hebandina me, ziyaretê. Û ewê ne tenê bona min, lê bona gelekan bibe edet.

Em dibînin, ku şabûn û yekîtîya temamîya milet çawa dibe û ew yek di nav reqasa ku ji nislekê derbaz nisleke din dibe da xuya dike.

Reqaseke germ, ya miletîyê, qeşeng û çapik. Ev reqasek e, ku hemû – mezin û biçûk – mil didine milên hev. Ev herwiha reqasa yekîtîya êzdîyan ya miletîyê ye. Govenda reqasçîya her diçe firehtir dibe, merivên li dor textê xwerinê yên mezin û biçûk radibin, dikevine govendê. Tu dibêjî qey dawîya sazbendîyê nayê û tu jî gerekê bireqisî, ji ber ku ew reqiseke wisan e, ku te ber bi xwe dikişîne, merivan digihîne hev, rojên te yên berî sedsalan, riya miletê te tê ra derbaz bûye tîne bîra te.

Mîrzeyê Çolo Siloyan jî dikeve govendê. Îro ew gerekê sergovendîyê bikişîne, çimkî ziyareta ku wî daye çêkirin diha zef yekîtî û germayî, bawerî û hêvî ji welatîyên wî ra anî...

Lê reqas berdewam e. Tu dibêjî qey dawîya wê tune...

Borîs Lazgîyan (bazirganê ji Rûsîyayê)

-Vekirina ziyaretê qewmandineke mezin e bona gelê êzdî.

Em îdî li Ermenîstanê xwedîyê "Lalişa xwe ya Nûranî" ne. Lalişa Nûranî ya esilî li bakurê Îraqê ye, li Kurdistanê. Bi saya serê serekê ruhanîyê yê hemû êzdîyên dinyayê Mîrê Mîran Tehsîn Beg û bi pereyên Mîrzeyê Çolo Siloyan ew avahî hate çêkirin û dua lê hate kirin. Piştî dualêkirinê ew bû ziyaret û ewê bibe delîlek bona welatîyên me diha pir caran seredana Ermenîstanê bikin. Zarên me, ku ne li Ermenîstanê ji diya xwe bûne û li wir mezin nebûne, wê fêm bikin, ku ev welatê wan e û ji ber wê jî her tiştê ku li vira diqewime, bi dilê me ye. Ewê jî bidine dû rêz û îza bav û kalên xwe. Ez bawer im, ku ev ziyaret wê teqileke mezin bide qewînkirina dostanîya gelên êzdî û ermenî.

Li sera şayînetîyan, ku li wir gorî erf-edetê êzdîyan, wek dibêjin, bi hev ra nan û xwê dixun, her kes di pêwendîyên mirovan yên germ û ji dil da ye, şayî û eşq in. Li vira nûnerên êzdîyan û ermenîyan hene, herwiha ji hukumetê, parlamêntoyê, kesên ronakbîr. Gelek kes dixwezin xeberdin, gotina xwe ya ji dil bêjin. Mêvanên ji Lalişê hatî di nav heyecanê da ne, him kesên ruhanî, him jî mirîdên wan. Wana şahîyeke ha ya hemmiletîyê texmîn ne dikirin. Tevgelên wê bûyerê bi fikiran hela li ziyareta rex Aknalîçê ne. Û ew bona gelekan herdem wê bibe cîyê herî hizkirî û her kes difikire, ku salekê şûnda dîsa bêne Ermenîstanê û bona xeyalên xwe yên ber dilê her kesî ezîz li vê ziyaretê duayên xwe bikin.

Birêz Mîrê Mîran Tehsîn Beg (serekê dînî yê ruhanîyê yê hemû êzdîyên dinyayê)

-Bi zanebûn û fermana min ev avahî bû cîyê duakirinê – ziyaret. Bi sipartina min piştî heyteholê temamîya pereyên berevkirî gerekê bidine wan malan, ku destteng û hewcedar in, kê dibe bira bibe, dikare xwendkar be, leşker be, hesab yek e. Hela sala par ava Kanîya Sipî ji Lalişa Nûranî û xwelîya li wira anîne vira. Heta dua li wî warî nehata kirinê, ew nikaribû bibûya ziyaret. Armanca

hatina me duakirina wê çêkirinê bû, ku bibe ziyaret. Lalişa me ya Nûranî ya tek tenê ye û tu kes nikare bêje ka ew kengê xuliqîye û weke wê li tu warekî dinyayê nikare hebe, ji ber ku civata me ya ruhanîyê destûra wê yekê nade. Dema duakirinê hesînan ez hembêz kirim, dema bangî Xwedê dikî û dua dikî, hesab yek e, ka tu li ku yî, tu îdî dua li Xwedê dikî. Mîr cara axirîyê sala 1909an hatîye Ermenîstanê. Ez pir kêfxweş bûm, gava pê hesiyam ku ezê bême Ermenîstanê. Dema ez rastî êzdîyên Ermenîstanê dihatim, min daxweza xwe ji Xwedê ra got, ku li ser axa Ermenîstanê ez rastî gelê xwe hatim. Hemû jî xwedî fikir, daxwez û pêşnîyarên ji hev cuda ne, lê ya sereke ew e, ku tu kes ne gazindar bû. Ew ji beşera wan, ji xeberdana wan, ji qiseyên bi wan ra xuya dibû.

Hilbet, çêkirin û dualêkirina ziyareta li Aknalîçê qewmandineke dîrokî ye. Serekê ruhanîyê yê hemû êzdîyên cihanê Mîrê Mîran Tehsîn Beg 29ê îlonê bi nav kir wek roja ziyareta Aknalîçê. Û ew tê wê maneyê, ku her sal wê rojê êzdî wê bêne vira hecê bona aminaya xwe ya di hindava erf û edetê xwe nîşan bidin, ku ji dewr û dewranan tê. Û di nav van hezarsalîyan da ermenî û êzdî herdem rastî hev hatine û li rex hev bûne, di demên dijwar da pişta hev sekinîne, hev ra bûne alîkar.

Mîrzeyê Çolo Siloyan (bazirgan, welatparêz, Moskva)

-Ziyareta me wisa jî ziyareta ermenîyan e. Heta niha Êcmîadzîn ji bo me ziyaret bûye, ewê wisa jî bimîne. Di navbera me û Êcmîadzînê da hinek erd e. Gava serekê êzdîyan yê ruhanî sala 1909an hate Ermenîstanê, bangî êzdîyan kir di hindava Êcmîadzînê da amin bin, lê ji metranê hemû ermenîyan ra got, ku piştgirîya êzdîyan bike. Ez wê germayê texmîn dikim, ku di destpêka sedsala buhurî da bal ruhanîyên me hebûne. Û di vî karî da herdem rola dêra Êcmîadzînê hebûye. Û em ne tenê bi Êcmîadzînê ra, lê herwiha bi dêrên ermenîyan yên mayîn ra jî di

nav pêwendîyên germ da nin. Ji bo nimûne, li Moskvayê metranê ermenîyan yê Rûsîyayê û Nor Naxçiwanê metran Yezras Nersîsyan dostekî êzdîyan e. Em bi endamên diyaspora xwe va gelek caran seredana wî dikin, ew jî me ji bîr nake, me teglîfî eydên dêra ermenîyan ya Arakêlakan dike. Em jî bi dil û can diçin.

Yek ji kesên pêşin, ku ez derheqa pirsa li Ermenîstanê sazkirina ziyareta êzdîyan bi wan şewirîm, ew bû. Ew pêşnîyara min gelekî bi dilê wî bû û ewî di wê pirsê da helan da min. Niha jî herdem dipirse: "Ka we çi kir, hûn gihîştine kîderê?". Çimkî metran Yezras ruhanîyekî çêkirdar, sazkar e. Kê ku dixweze di wê yekê da bê bawerkirinê, gerekê here dêra ermenîyan ya li Moskvayê, ku çêkirina çend avahîyên wê îdî serhev da tê, an jî bikeve hundur û bibîne, ku hiş û sewdayê bawermendê ruhanî dikare bigihîje çi derecê, ku yek ji bajarên cihanê yê herî mezin da navbendeke ruhanî ya çawa hatîye çêkirin. Rojekê, dema me seredana metran kir, ewî soz da bona me gerreke hewaskar teşkîl bike, avahîyên ku beşên dêrê ne nîşanî me bide, derheqa rola wan ya paşdemê da ji me ra şirove bike. Tiştên me bi çavên serê xwe dît, em heyrî hîştin û em pir şa bûn. Ango, dêra ermenîyan ya Arakêlakan dêra me ye jî. Em li rex dêrê ne, dêr jî li rex me ye. Xeyaleke min a din jî heye. Ez ser wê bawerîyê me, ku dem hatîye heykelekî dostanîya gelên ermenîyan û êzdîyan hebe û ew gerekê li bajarê Vaxarşapatê be. Ez ser wê fikirê me, ku cîyê wî heykelî merkeza ruhanî ya hemû ermenîyan e. Gerekê li rex ziyareta me jî heykelekî wisa hebe. Ez nizanim, ka wê daxwaza min kengê bê sêrî, lê zanim, ku ew karekî wisan e, ku wê li Xwedê jî xweş bê û ewê bibe şedê dostanîya herdem ya ermenîyan û êzdîyan.

Û tiştekî text-bext nîne, ku dema di dawîya sedsala 19an û di destpêka sedsala 20an li Ermenîstana Roava tirsa qirkirinê di dilê ermenîyan û wisa jî êzdîyan da bû, telebext ra riya xilazbûnê tenê rev mabû. Herdu milet bi hev ra xwe li riya Ermenîstana Rohilatê girtin, em hatin li rex deşta Araratê û dor û berên çiyayê Elegezê hêwirîn. Di wê dema tevlihev da, di meha çilêya paşin sala 1909an

serekê ruhanîyê yê êzdîyan Mîr Îsmaîl seredana Ermenîstanê kir. Dema ew li Êçmîadzînê rastî cîgirê metranê tevaya ermenîyan metran Gêvorg Sûrênyans hat, got: "Ez dixwezim, ku her êzdîyekî ku qesta te dike, wî mîna ermenîyan qebûl bikî û firqîyê danenî ortê ka ew ermenî ye, yan êzdî ye. Ez daxwaz ji we dikim, ku nûnerekî êzdîyan bal te hebe, ku qulixî dêra ermenîyan bike, wek Mala Xwedê, wek tiberk. Ez dua li Xwedê dikim, ku ev mal him ji bo ermenîyan, him jî ji bo êzdîyan qedîm bimîne".

Wisa qewimîye, ku di nav sedsala derbazbûyî da tu serekekî ruhanî yên êzdîyan seredana Ermenîstanê ne kirîye û aha piştî sedsalekê nûnerê malbeta Îsmayîl Beg – Mîrê Mîran Tehsîn Beg li Ermenîstanê ye. Ew seredana xwe ji Sîsêrnakabêrdê – ji heykelê bîranîna Qira ermenîyan destpê dike, û qedirê bîranîna wan hemû kesan digire, ku ji dest nîrê tirkan hatine qirkirin. Û ewî paşê ji me ra got, ku binemala wan, êzdîyên Lalişê şeş hezar ermenî bin banê xwe da xwedî kirine, ew parastine, ji qirê xilaz kirine. Malbeta Tehsîn Beg, pismam û xizmên wî zanibûn jî ku dikare ecêb bê serê wan, lê dîsa jî xwe li wê rê girtin. Wana bi awayekî din nikaribûn jî, wana nikaribû sonda xwe ya bi dewr û zemanan ya dostanîyê û biratîyê pêk neynin, nikaribûn nan û xwêya bi hev ra xwerine nedine ber hesêb, nikaribûn di hindava bawerîyên xwe da ne amin bin.

Û femdarî ye, ku seredana pêşin wê li Sîsêrnakabêrdê bûya. Mîrê Mîran Tehsîn Beg, endamên dêlêgasyona pê ra hatîye, tacên gulan datînin ber heykelê Qira ermenîyan ya mezin, bêdeng qedirê bîranîna şehîdan digirin.

Mîrê Mîran Tehsîn Beg (serekê ruhanîyê yê hemû êzdîyên dinyayê)

-Min îdî ji Ermenîstanê lezeteke baş dît û ez şa me, ku ev war bi dilê êzdîyan e. Ev seredana li Sîsêrnakabêrdê careke din wan rojên reş tîne bîra me, ku wan deman ne tenê ermenî, lê herwisa

êzdî û aşûrî jî hatine qirkirinê. Xwedê mezin e û daxwaza me ew e, ku ew yek tu caran li tu cîyan dubare nebe û di nav dîrokê da bedbextîyên ha nebin.

Di vî emirê mezin da û bi pirsgirêkên xwe yên tundurustîyê va Mîrê Mîran Tehsîn Beg ne tenê bi destê xwe tacên gulan danî ser heykelê qira ermenîyan, lê herwisa peyayî li cîyê agirê netemirî bû, kulîk danîne wir, bi bêdengî qedirê şehîdên bê sûc û guneh girt. Demeke dirêj li agirê netemirî nihêrî û bi hemdî xwe hilikîya jor, bi dilekî baristan rastî wan rojnamevanan û nivîskaran hat, ku li benda wî bûn, bi wan ra qise kir, derkete dijî her cûre zordestîyan, ew li ku û li kengê dibe bila bibe. Ewî wisa jî got, ku ew di zû da li benda hatina xwe ya li Ermenîstanê bû, da ku bi nêzîkî him êzdîyan nas bike, him jî ermenîyan. Ewî destnîşan kir, ku wisa qewimîye, ku ermenî herdem bi êzdîyan ra aş û ji dil jîne. Niha jî wisan e. Li vir jî, ji Lalişê ne gelek dûr gundên ermenîyan û yên êzdîyan cînarên hev in, danûsitendinên wan germ û mirovane ne.

Parûyr Hakobyan (serekê serwêrtîya navbendî ya diyaspora ermenîyan li Îraqê)

-Ratsîyê jî, dostanîya ermenîyan û êzdîyan di nav gelek cêribandinan ra derbaz bûye û qedîm maye. Em herdem li rex hev bûne û dijminatîya me bi hev ra tunebûye, eksî wê, dema lazim bûye, me piştgirîya hev kirîye. Lê di dema gelkujîyê da dostên miletê me kêleka me bûne, çi ji dest wan hatîye, kirine. Wana emirê malbetên xwe kirîye bin qezîyayê û jin, zaroyên ermenîyan di bin banê xwe da sitar kirine, gelek caran bona ermenîyan ji zulma tirkan xilaz bikin, kincên êzdîyan li wan kirine. Eger haya tirkan hebûya, ku êzdî ermenîyan vedişêrin, cesaret ne dikirin bikevine gundên wan, ocaxên wan, ji ber ku wê rastî berxwedaneke zexm bihatana. Êzdîyan ew di malên xwe da diparastin, dû ra rê û dirb didîtin, ew verêyî Ermenîstana Rohilatê û Ewrupayê dikirin. Gelek

caran ewana jî diketine ber derban û bi ermenîyan ra tevayî malên xwe dihîştin, xwe dispartine Ermenîstana Rohilatê.

Îzbata qewîn ya pêwendîyên baş di navbera ermenîyan û êzdîyan da dîrok bûye, ku di wê da her tenê nimûneyên here baş hene, yên wisa ku nisletên dûhatî wê tu caran şermî nemînin. Temî û şîretên, ku pêşîyan li me kirine, îro jî berdewam in. Ruhê dostanîyê îro jî wisan e, hesab yek e, ka ermenî û êzdî li ku dijîn – li gundan, an li bajarên mezin. Em ser şahîyên hev in, di dema şînê jî em dil didine hev. Ez hatime bona tevî vê heytehola dîrokî bim. Pêwendîyên me yên nêzîk bi Mîrê Mîran Tehsîn Beg û merivên der û dorên wî ra hene.

Mîrê Mîran Tehsîn Beg wextê qisa xwe ya bi me ra got, ku ew seredana xwe dihesibîne wek hatina hecê, ji ber ku seredana wî piştî seredana serekê dînî yê ruhanî yên êzdîyan yê ji malbeta wî qewimî, ku sed sal ser ra derbaz bûye.

Û ji ber wê jî warê seredana serekê ruhanî yê êzdîyan bal metranê hemû ermenîyan Garêgîn B bû. Wek ku her kes li bendê bû, Metranê hemû ermenîyan bi dil û can ew qebûl kir. Sohbeta herdu serokên ruhanî jî wisa germ û ji dil bû.

Metranê mezin tu tişt ji bîr ne kir. Ewî seredana serekê ruhanî yê êzdîyan ya di destpêka sedsala buhurî da li Ermenîstanê, gotinên wî yên ji bo Metranê hemû ermenîyan yê wê demê bi bîr anî. Mêrxasîya Cangîr axa ya di şerê dijî tirkan da jî ji bîr ne kir, paşê derbazî şerê li Qerebaxê bû, gotinên pesindayînê di hindava wan êzdîyan da got, ku di wî şerî da şehîd ketine. Tehsîn Beg jîyana rojane ya herdu gelan, dostanî û biratîya wan ya germ anî ber çavan, herwiha te digot qey gotinên serekê dînî yê hemû êzdîyan yê berî sed salan dubare kir, ku gotibû: "Hûn diha nêzîkî êzdîyên Ermenîstanê ne, di demên şahîyê û şînê da li rex wan bin".

Rasthatina du serekên dînî li ber çavên endamên ruhanî yên ji Lalişê hatî û nûnerên wan olkên êzdîyan derbaz dibû, ku ji cî û

warên cihanê yên cuda-cuda hatibûn. Ew jî rasthatineke dîrokî bû, rasthatineke germ û ji dil.

Seredana din ya serekê ruhanî yên hemû êzdîyên cihanê Mîrê Mîran Tehsîn Beg ber bi heykelê Sardarapatê bû, ku şedeyê serketina ermenîyan û êzdîyan e di hindava tirkan da. Femdarî ye, ku serekê ruhanî yên êzdîyan gerekê qedirê bîranîna wan hemû kesan bigirta, yên ku di şerê giran da axa xwe parastin û bi tevayî Ermenîstana nû çê kirin. Avahîyên baş çê kirin, erf û edetên xwe yên miletîyê parastin, û di ser da jî ew yek zêde kirin, ku kêm bû: xwendin, zanyarî, çand. Êzdîyan xwexwetîya xwe parastin û bi tu tiştî va ji ermenîyên bira paş neman. Gotina sereke ya serekê ruhanî yê dînê êzdîyan bi nûnerên olkên êzdîyan yên ji gelek gundan ev bû, bêy hesabhildana wê yekê, ka ew gund li deşta Araratê ne, an li berpala çiyayê Elegezê ne. Rêwîyekî Îsraêlê li heyteholeke miletîyê ya li gundê Sengerê da amade bû. Ewana jî hatine bawerkirin, ku êzdîyan li Ermenîstanê dêm û bengz û çanda xwe parastine. Di ser da jî, ew bi zimanê xwe xwendinê distînin û têne perwedekirinê.

Mirazê Koçer Mistoyan (Pîr, ruhanîyekî êzdî, Ûrisêt, Kalînîngrad)

-Ez we didime bawerkirin, ku eger rewşa aborî baş bibe, ne tenê ermenî, lê gelek êzdî jî wê bixwezin vegerin. Ez îro gava çûme Aparanê, min li ser rê gelek malên bedew û nûjen dîtin. Min pirs kir, ka ev xanîyên kê ne? Gotin, ku xwedîyên wan bazirgan in û der va dijîn. Li vira ji diya xwe bûne û mezin bûne. Ango, meriv zanin, ku li welatê wan gerekê maleke wan hebe. Pereyên xwe li vir dikine nava kar, xwesma avahîyan çê dikin. Ew dide kivşê, ku meriv dikare vegere û li vira bijî, ji ber ku ev av û ev xwelî qewatê dide te.

Em zanin, ku dijwarîyên Ermenîstanê yên aborî hene. Û ew tesîrê li ser rewşa civakî dike. Lê ew gereke nebe sebebê

mihacirîyê. Em gava diçine gundan, meriv nêzkî me dibin, hêvî dikin, ku em wana cîguhastî warên Rûsîyayê yên cuda-cuda bikin. Em hewil didin ji wan ra şirove bikin, ku ev dijwarî li wir jî hene û dema cîguhastî wir bin, jîyana wan nikare ber bi başîyê here. Ez eynî tişt niha jî dibêjim. Mixabin, jimara wan êzdîyan û ermenîyan ne hindik e, ku mihacir bûne û ketine halekî giran.

Em gerekê anegorî hêz û qewata xwe her tiştî bikin, ku welatîyên me li vir bimînin, bixebitin û bijîn, firsenda wan hebe tiştên xêrê bikin, bikaribin zarên xwe li mala xwe da mezin bikin. Hûn zanin, ku dê û bav dikevine çi halî, dema zarên wan mezin dibin û li warekî wisa dijîn, ku dikarin bi hêsanî şaşîyan bikin? Û em naxwezin wisa be. Niha gerekê her tiştî bikin, ku pevgirêdanên êzdîyên li şaristanîyê bi welêt ra qewîn û mehkem be. Gerekê ser wê pirsê jî bifikirin, ka çawa gundên êzdîyan biparêzin. Îro pir hêsa ye wana winda bikin. Gundên biçûk in, ku bihêlin herin, êdî kes namîne. Lê di wan da goristanên kal û bavên me ne, rêyên zarotîya me ne. Belkî bazirganên me yên serketî yên li şaristanan bikaribin di hewara wan da bên, alî wan waran bikin? Niha em li gundê Sengerê ne. Ez zanim, ku kesên li vî gundî bûne û mezin bûne, tu caran warê xwe bîr nakin. Di ser da jî, bi dilxweşî me teglîfî gundên xwe dikin.

Cindî Emeryan bi hemû qanûnên mêvandarîyê, bi def û zurne, bi nan û xwê pêşîya Tehsîn Beg û rêvebirên wî da diçe wana dibe odeya mêvanan. Ber sifreya têr û tijî dilê hemûyan jî xweş e, kêfa wan li cî ye.

Serekê ruhanî yê hemû êzdîyên cihanê û nûnerên ruhanî yên derece bilind bi gundîyên Sengerê ra dikevine sohbetê, xeberdaneke germ û ji dil di nav wan da pêşda tê. Lê di ser dika reqasê hemû bi hev ra dikevine govendê, çapik û çeleng direqisin. Ji bo mêvanan ev hemû pir hewaskar e.

Nebîyê Mîrê Mîran Tehsîn Beg – Emîrê 13 salî jî di nav kêf û şahîyê da ye, ew tu deqeyekê jî ji kalikê xwe bi dûr nakeve, lê dixweze her tişt bizanibe, ka li wir çi diqewime. Dibe di paşdemê da

hema ew bi xwe bibe serekê êzdîyan yê ruhanî. Anegorî peymana navbenda ruhanîyê ya hemû êzdîyan, qulixa (posta) serekê ruhanîyê ji nislekê derbazî nisla din dibe. Ya sereke ew e, ku Ermenîstan, merivên li vir dijîn li wî xweş hatîye. Ew dixweze pirtûkên îngilîsî yên ser Ermenîstanê peyda bike. Me pirtûkên wisa wek dîyarî dane wî, ew pir kêfxweş bû, soz da wana bixwîne, Ermenîstanê ji nêzîkî va nas bike.

Emîr (Nebîyê Mîrê Mîran Tehsîn Beg)

-Ez pir şa me, ku ji min ra firsend çê bû ez bi kalikê xwe ra bême Ermenîstanê. Li her deran em bi dil û can qebûl dikin. Ji bo min ya here hewaskar rasthatina tevî metranê hemû ermenîyan Garêgîn B bû. Sohbeta serekên ruhanî yên herdu gelan – kalikê min û metranê hemû ermenîyan Garêgîn B gelek xweş bû. Ez van bûyeran tu caran ji bîr nakim. Rasthatinên min bi êzdîyên welatîyên min ra jî gelek bi dilê min bûn. Em şa ne, ku ew baş dijîn, dixwînin, çanda xwe pêşda dibin. Ezê ji Ermenîstanê germayîke xweş bi xwe ra bibim û ezê li benda wê rojê bim, ku careke din bêm vira.

Wisa qewimî, ku roja piştî vekirina ziyaretê li sînemaya Yêrêvanê ya bi navê "Moskva" fîlmeke bi navê "Êzdî: ewledên Royê" nîşan dan, ku ser wan êzdîyan e, ku li Rûsîyayê dijîn. Derheqa wê fîlmê da doktorê zimanzanîyê, profêsor Sêrgo Yêrîtsyan xeberda û destnîşan kir, ku di fîlmê da behsa wê yekê tê kirinê, ku diyasipora êzdîyan ya li Rûsîya Fêdêral kemilî çawa dijî, bawerîyên wan yên di hindava dostanîya gelên ermenîyan û êzdîyan çi ne, qedirhevgirtina wan, pêwendîyên germ, bîranînên dîrokî û destanînên îroyîn çawan in.

Sêrgo Yêrîtsyan (doktorê zimanzanîyê, profêsor)

-Me biryar dabû komeke efrandarîyê bişînine Moskvayê û warên Rûsîyayê yên din bona li vir, li Ermenîstanê temaşevanên

têlêvîzyonê bikaribin ji nêzîk va bibînin ka zehmetkişandin, çerçirandin, berxwedan çi ne bona bigihîjine armancekê, pereyan qazanc bikin û bi wan pereyan ziyaretê çê bikin. Ev yek dibe di fîlmê da bi awayekî vekirî nayê gotin, lê ber çavan e, ka riya ber bi wê ziyaretê dibe çiqas dijwar e. Ev merivê destemel, hogirê minî baş Mîrze Siloyan xwe li wê rê girtîye, çimkî ewî bi xwe ew riya dijwar, riya ku Xwedê jî jê hiz dike, hilbijartîye.

Kê ku Mîrze Siloyan nas dike, haj ji ruhê wî yê germ, merivatîya wî, pevgirêdana wî bi koka xwe ra, bi qîmetîyên gelê xwe yê ruhanî ra heye. Em derheqa wê yekê da jî zanin, ku ew gelekî qedirê gelê ermenî zane. Carekê ewî got, ku warê Ermenîstanê ber dilê wî gelek ezîz e û ew bê wî warî jîyana xwe texmîn nake. Dibe hema ji vê yekê ye, ku ew ewqas heyra ax û ava Ermenîstanê ye. Ew gelek caran van gotinan dubare dike: "Ez emirê xwe bêy Ermenîstanê texmîn nakim. Ez ser demekê çûme. Ew wext ne dûr e, ku ezê vegerim. Û ne tenê ez, lê gelek ewledên gelê me". Ev hemû wisa jî ji gotinên fîlmê yên sereke ne.

Mîr Hazim (kurê serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê Mîrê Mîran Tehsîn Beg, parlamêntarê Parlamêntoya Kurdistanê)

-Berî her tiştî dixwezim razîbûna xwe bêjim ji bo serokatîya Ermenîstanê, gelê ermenîyan bona xêrxwezîya qenc di hindava êzdîyan da. Ez razîbûna xwe didime êzdîyên vira jî, ku erf û edetên xwe rind parasine. Nizanim bona çi, lê ez pir bawer im, ku ev fîlm hema derheqa wê yekê da ne. Ez hêvî dikim, ku hîç caran firqîyê daneynin di navbera ermenîyan û êzdîyan da. Ya pêşin, ez bi rewşa Ermenîstanê ya îro va şa dibim û ya dudan, ez dîsa rica dikim, ku Ermenîstan wek berê bimîne navbenda hevrajîyana êzdîyan. Ez gelek dixwezim di pêşdemê da jî careke din bême Ermenîstanê. Ez dixwezim qewl û şertên wisa bêne sazkirin, ku çûyîn-hatina me ya herdu alîyan zêdetir bibin û di Parlamêntoya Ermenîstanê da parlamêntarekî êzdî jî hebe.

Derheqa vê fîlmê da ji min ra êdî behs kirine. Ew yek, ku li Rûsîyayê diyaspora êzdîyan saz bûye û nûnerên wê gihîştine hêlanên bilid, tiştekî pir şabûnê ye. Lê ya here bi qîmet ew e, ku ewana warên jidayîkbûna xwe ji bîr nakin û hertim bi dilovanî derheqa wê da xeber didin. Ez bawer im, ku ew fîlm piranî derheqa hizretê, bêrîkirinê da ne. Êzdî û ermenî gelên xwedî hîs û hesîn in û serketinên wan yên wisa hene, ku bo me giranbuha ne. Wek malbet, dê û bav, merivên di emir da mezin, warên jidayîkbûnê. Fîlmên wa pir giring in, ji ber ku firsendê didin bifikirin, rojên buhurî bi bîr bînin û tiştên nekirî pêk bînin.

Samvêl Koçoyî (akadêmîkê Akadêmîya hiqûqzanîyê ya Rûsîya Fêdêral)

-Ez minetdarê Mîrzeyê qedirbilind û teşkîldarên din im bona vê bûyera gelekî xweş. Duh, di dema şahîyê da hate gotinê, ku Mîrze Siloyan pirayek çê kirîye di navbera Ermenîstanê û êzdîyên dervayî wê da. Rastîyê jî wisan e, û ew gelek giring e. Bo nimûne, min îdî biryar kirîye, ku her sal bême Ermenîstanê, herime ziyaretê. Em dilovanîya Ermenîstanê, gelê ermenîyan di hindava êzdîyan da texmîn dikin. Ez herwiha ji wan her kesan jî razî me, yên ku ev fîlm kişandine. Eva jî gaveke ber bi mehkemkirina dostanîya gelên ermenî û êzdîyan da.

Armanca fîlmê ew e, ku merivên bi zehmetîyan xwe li riya xerîbîyê girtine, çawa dikarin rabine ser pîyan, bigihîjine serketinan. Mêrxasên fîlmê, ku karibûne dervayî Ermenîstanê bigihîjine destanînan, pêwendîyên xwe bi warê jidayîkbûna xwe ra ne birîne. Hemû jî dixwezin Ermenîstana gulvedayî û pêşketî bibînin.

Berî nîşandayîna fîlma bi navê "Êzdî: ewledên Royê" koma kişandina fîlmê nimûneyên fîlmê yên pêşin û dîyarî dane serekê ruhanî yê hemû êzdîyên cihanê birêz Mîrê Mîran Tehsîn Beg û ew yek bi riya Mîr Hazimê kurê Mîr û bazirganê ji Moskvayê,

bingehdarê ziyaretê Mîrzeyê Çolo Siloyan hate kirinê.

Êdî dem hatibû, ku bala xwe bidine fîlmê. Ew dîrokek e derheqa êzdîyên ku li Rûsîyayê dijîn, herwiha derheqa wê dostîya ermenîyan û êzdîyan da, ku li xerîbîyê tê parastin. Ew herdu milet li ku jî bijîn, di navbera diyasporên ermenîyan û êzdîyan da pira dostanîyê çê dikin. Lema jî him ermenî, him jî êzdî derheqa hev da wisa bi dilgermî xeber didin. Meriv dikare wê fîlmê bi nav bike wek mehkembûna dostanîya gelên ermenî û êzdî.

Ew herwiha dîrokek e derheqa wan merivan da, yên ku sazkar in, lê tu caran welatê xwe, warê jidayîkbûna xwe, goristanên dê û bavên xwe, merivên xwe ji bîr nakin.

Mêzekirina fîlmê xilaz dibe. Ser rûyê her kesî şabûn û eşq e. Ne axir ev hemû jîyana me ye. Û ne tenê ew. Fîlm bi hêvîyê û bawerîyê va dagirtî ye, her qewmandinek bi rastî bûye, lê di wê da ya here sereke bawerî ye di hindava çavkanîyên miletîyê, bêy ku bidine ber çavan ka merivê ermenî yan êzdî bi çi rê ra derbaz bûye. Mêrxasên fîlmê Lalişa Nûranî, riya pêşîyên xwe ya dijwar, warên xwe ji bîr nakin, ku ji wan ra pêşketin anî. Rastî jî, miletê êzdî bi miletê ermenî ra li rex hev pêş ket, bû xwedîyê wê yekê, ku hinkûfî wî miletî ye, ku hebûna xwe ya dewlemend dipatrêze û pêş dixe, nivîsar, edebîyet, sitiran û hunurmendîya xwe dewlemendtir dike û di vê sedsala dawî da di navbera van herdu miletan da di vî alî da tu firqî nehate danînê.

Sîmon Tsatûryan (nivîskar, pûblîsîst, hiqûqzan)

-Eva fîlma careke din da îzbatkirinê, ku dostanîya me herdu miletan çiqas kûr û mehkem e. Û ya sereke jî ew e, ku ew dostanî ji dil û germ e. We dît, ku him ermenî, him jî êzdî çiqasî bi heyecan, bi fikir û bawerîyên aqil bûn, çimkî dostanîya wan herdu gelan ber dilê wana pir ezîz e. Di hemû perçên vê fîlmê da ev yek xuya dibe. Van rojan em hemû jî bi ruhanî dewlemend bûn, ew jî bi çêkirin û duakirina ziyaretê va girêdayî bû. Ez we gişkan pîroz dikim û

dixwezim bêjim, ku ev qewmandin bi dereceyeke gelekî bilind, bedew derbaz bû. Ez gotina xwe serhevda tînim û dibêjim, ku ji xudanên fîlmê ra li hev hatîye jîyana merivên ji welatê xwe dûr bînine ber çavan, bi fikirên xwe, bi şabûn û xemên xwe va.

Bekir Sedûnyan (xebatkarê serwêrtîya gelên kêmjimar û pirsên dînî ya li rex hukumeta Komara Ermenîstanê)

-Kesên li fîlmê mêze dikin, wê dilbaristanîyê texmîn dikin, ku di nav welatîyn me yên di xerîbîyê da heye, yên ku gelek zehmetîyan ra derbaz bûne û bi ser ketine, lê herdem jî hizreta ax û ava Ermenîstanê di dilê wan da bûye. Ji mêrxasên fîlmê her yek ji riya xwe ra derbaz bûye, bi ser ketîye. Tiştê di fîlmê da bi dilê min ew bû, ku bona wan kesan ya sereke ew bûye, ku serketinên xwe bigihînine armanca wê, bikine xizmeta safîkirina pirsgirêkên miletîyê – xweykirina edetan, pêşketina çandê, parastina her tiştê miletîyê.

Hesen Hesenyan (Şêx, serekê ruhanî yên êzdîyên Ermenîstanê)

-Ez dixwezim fîlmên wa gelek hebin, bona diha zeef me nas bikin, bi efr-edet û rabûn-rûniştinên me ra nas bin. Min dixwest, ku fîlmeke wisa derheqa êzdîyên li Ermenîstanê dijîn da jî bihata çêkirin. Miletê me xebatkar e, mînanî ermenîyan ji keviran nan çê dike. Êzdî jî wan dijwarîyên ermenîyan yên îroyîn li ser milên xwe dibin, ew piranî bi heywanxweykirinê û rêncberîyê va mijûl in. Jimara wana jî ne kêm e, ku karên mayîn dikin. Hilbet, meyê bixwesta, ku pêşketin diha zêde bûya, pirsgirêkên xwendinê-çandeyê diha lez bihatana çareserkirinê û dema lazim be, birayên me, ku derva djîn, hertim wê alîkarîya me bikin. Hela di ser da jî, meriv dibêje qey Mîrze Siloyan daxaz-xîyala me hemûyan ya gelek salan pêk anî. Êdî li Ermenîstanê jî ziyareta êzdîyan heye.

Taçar Vardanyan (nûnerê diyaspora ermenîyan ya li Moskvayê)

-Me serketinên welatîyên xwe dîtin û bi wan va şa bûn. Rastîyê jî, di nav 10-15 salan da ji wan ra li hev hat ser pîyan bisekinin, kar bikin, bigihîjine encaman û tu rojekê jî pirsgirêkên miletîyê ji bîr ne kirin. Me dît, ku her kes ji wana bi hizreteke çawa behsa Ermenîstanê, warê jidayîkbûna xwe dikir. Hûn rind zanin, ku ermenî û êzdî li ku jî bijîn, dost û xêrxwezên hev in. Di fîlmê da ew perçe gelek xweş bû, dema behsa dîyasporên ermenîyan û êzdîyan tê kirinê. Dêmek, di xerîbîyê da jî ew pira heye, ku rê vedike bona dostanîya herdu gelên me xweykin û pêşda bibin.

Ji dîtina fîlmê wisa xuya dibe, ku ew piranî derheqa me ermenîyan da ne, ku em gerekê çawa miletê xwe, hebûna xwe biparêzin. Dibe bal me her tişt azad e, lema em qîmetê wê azadîyê û xwexwetîya miletîyê rind texmîn nakin, ku gelek kes hevsûdîyê li me dikin. Lê ewana tu caran êzdîbûna xwe ji bîr nakin û ew yek wana diparêze. Ez ser wê bawerîyê me, ku hema eva yeka ji me kêm e. Di fîlmê da wesyet hene, ka çawa zora dijwarîyan bibin, bixebitin, saz bikin, di hêla aborî da pêş bikevin, lê tu caran miletîya xwe ji bîr nekin. Meriv dibêje qey temamîya fikira wê fîlmê me dibe ber bi sazkirina ziyareta Aknalîçê, ku nimûneyeke geş û ya tek-tenê ye. Rastîyê jî, Mîrze Siloyan xwedî meremên bi culet û bilind e. Em gerekê herdem li rex wî bin, û wek ku min fem kir, ewê karê xwe yê pîroz berdewam bike. Ewê gelek gavên serketî bavêje. Hûn zanin, ku gavên ha ji hizkirina ax û ava welêt destpê dibin. Mîrze Siloyan ji warê jidayîkbûna xwe ra amin e, welatê xwe pir hiz dike û qîmet dike. Ez carina ji wî ra dibêjim, gava têyî Ermenîstanê, berçevkên rengê gulê datînî ber çevên xwe, bona wan tiştan bibînî, ku xeyalên te ne. Ew dibêje, ya here giring xwêya welatê te ye, her tiştên din îro hene, sibê tunene, îro dijwarî hene, sibê ewê bêne çareserkirinê. Ya here sereke ew e, ku welat rûyê xwe yê paqij û bi rûmet neguhêre. Ev e bawerîya Mîrze Siloyan

Dêlêgasyona ku ji Navbenda ruhanî ya Êzdîyan - Lalişê hatîye, giring dibîne, ku rastî serokatîya Ermenîstanê, nûnerên civakê bê, çimkî bi wan ra gerekê li ser hinek pirsan li hev bikin û wana çareser bikin. Wana texmîn dikir, ku pir nêzîk in, lê mixabin pêwendî hindik in. Rasthatinên herdu alîyan, pêwendîyên çandî û perwerdeyê di nabera wan da pir giring in. Wana derheqa van yekan da di her rasthatinekê da bi bîr dianîn. Herdu alîyan herwiha digotin, ku di nav pêwendîyên ermenîyan û êzdîyan da pirsdanînên ku dijwar bêne çareserkirin, an jî neyên safîkirin, tunene. Derheqa vê yekê da şedetîyê didin rasthatin û qiseyên serekwezîr Tîgran Pêtrosyan, cîgirê serekê Parlamêntoya Ermenîstanê Êdûard Şahnazaryan, wezîra Ermenîstanê ya kûltûrayê Hasmîk Poxosyan, cîgirê wezîrê Ermenîstanê yê karên der va Sêrgêy Manasêryan, serekbajarê Yêrêvanê Taron Margaryan û yên din bi serekê êzdîyên tevaya dinyayê û endamên dêlêgasyona bi wî ra hatî ra. Dostên me yên êzdî ew yek destnîşan dikirin, ku çawa li her deran di hindava êzdîyan da dilovan in û hazir in pirsgirêkên wan çareser bikin.

Mîrê Mîran Tehsîn Beg (serekê ruhanî yê hemû êzdîyên cihanê)

-Rasthatinên me yên dilgerm û dilovan bi metranê hemû ermenîyan Gerêgînê Duduyan û serekên dewletê ra dilê me baristan dikin.

Em herdu jî miletên bawermend in, ji ber wê jî em gelek zêrîyane, lê em bi dînê xwe ra amin mane. Metranê hemû ermenîyan Garêgînê Duduyan bi bîr anî, ku di salên destpêka sedsalê yên dijwar da mala me daxwezek îlan kiribû û gorî wê hemû êzdî gerekê ermenîyên ji qirê xilazbûyî di malên xwe da biparêzin. Xênji wê, Cangîr axa bi taxbûra xwe va bi ermenîyan ra tevayî bi tundî şerê tirkan kir. Ango, em ne tenê hertim bi hev ra bûne, lê me herdem pişt daye pişta hev û bûne hevalên şêr jî. Ez zanim, ku êzdîyên Ermenîstanê timê jî li rex birayên xwe yên

ermenî bûne. Min ji Garêgînê Duduyan ra got, ku wisa bike, ku di paşdemê da jî tu êzdîyek xwe li Ermenîstanê xerîb nebîne.

Di rasthatinên min yên bi merivên derece bilind da xeberdana me ya sereke li ser dîrok û dostanîya herdu gelan bûye. Hemû jî derheqa dîroka herdu gelên me da baş zanin, qedirê gelê êzdî digirin, rola wê di jîyana Ermenîstanê da bilind qîmet dikin. Gava min derheqa wê yekê da bi wan ra qise dikir, min digot ku ez badilhewa van tiştan dibêjim, ji ber ku wana ji xwe zanibû. Lê dîsa jî, serketinên me, pêwendîyên germ û ji dil, dostanîya herdu miletan ya di nav dewranan da mehkembûyî da gerekê hertim bê gotinê û bi layîqî bê qîmetkkirinê. Min usa jî got, ku derên malên me herdem ber kesên ji Ermenîstanê vekirîne, him bona ermenîyan, him jî bona êzdîyan. Em bi serokatîya Ermenîstanê ra li ser gelek pirsan sekinîn, di nav wan da pirsên bi kûltûrayê û xwendinê va girêdayî jî.

Em wê jî bêjin, ku di dêlêgasyona bi serokatîya serekê ruhanî yê hemû êzdîyên cihanê da parlamênterên Parlamêntoya Îraqê û Herêma Kurdistanê jî hebûn. Ewana jî kêfxweş bûn ku pêwendîyên ruhanî û kûltûrî-perwerdehî bi Ermenîstanê ra wê diha qewîn û mehkem bin û amadebûna xwe dîyar kirin, ku di wî karî da alîkar bin.

Ji wana du kes berbiçav diketin: Mîr Hazim û Ebdil Ezîz, ku mêrên navsere û xwendî bûn, meriv heyr û hijmekar bû li wan mêze bike, wana bi hurmeteke mezin derheqa Ermenîstanê û ermenîyan da xeber didan.

Mîr Hazim endamê Parlamêntoya Kurdistanê ye, kurê serekê ruhanî yê êzdîyan, di rastîyê da berdewamkarê karê bavê xwe ye. Ew piştgirê wê yekê ye, ku bi Ermenîstanê ra pêwendîyên germ hebin û ew pêşda herin.

Ebdil Ezîz li Îraqê doktorekî bi nav û deng e, lê bi serokatîya ruhanî ya Lalişê ra pir girêdayî ye. Bavê wî serekê qewalan û dibistana dînî ye û ew gelek şa ye, ku pir tişt hene ji bavê xwe

ra bêje. Ew jî ser wê bawerîyê ye, ku pêwendîyên herdu alîyan gerekê pêş bixin, gerekê riya bibînin, ku ermenî û êzdî zêde ser hev da herin û bên, bona pirtir hev nas bikin û hev fem bikin.

Mîr Hazim (endamê Parlamêntoya Kurdistana Îraqê)

-Ez rêberîya bavê xwe – Mîrê Mîran Tehsîn Beg dikim, lê bi wê ra tevayî jî endamê Parlamêntoya Herêma Kurdistanê me. Eva çend roj e ez li vir im, dilê min ji germê û dilovanîyê baristan dibe. Bavê min jî bi pêwendîyên ermenîyan û êzdîyan yên dilgerm şa ye, û ya sereke jî ew e, ku em ji metranê ermenîyan li benda qebûlkirina ji dil û germ bûn, lê ev yek me ji serekên dewletê hêvî ne dikir. Lê em şaş derketin, wana jî em bi dil qebûl kirin.

Rast e, Herêma Kurdistanê nû saz bûye, lê me – êzdîyan hela di sala 1915an da derdê qirkirina birayên xwe - ermenîyan dîtîye û ber xwe ketine. Mala kalê min sitar daye bi hezaran ermenîyan, ji ber wê jî ez hertim piştgirê wê yekê bûme, ku qirkirina ermenîyan rast bê qîmetkirin û di hêla civaka navnetewî da bê naskirin. Şedetîya wê yekê ew e, ku Mîrê êzdîyan sala 1909an nameyek ji metranê tevaya ermenîyan ra şandîye, di wê da tê gotinê, ku Mîr weke 6000 malbetên ermenî kirîye bin sitara xwe. Di nameyê da herwiha tê destnîşankirinê, ku hukumeta Almanîyayê hîvî dike, ku ermenîyên mihacir teslîmî wan bikin, lê Mîr aminaya xwe bi wan nayne, dij derdikeve û tenê piştî çend mehan wan ermenîyan dide hukumeta Anglîyayê.

Îro li ser axa Kurdistanê heta 3 hezar ermenî dijîn. Me dostanîya bi ermenîyan ra ya bi sedsalan daye ber çavan û bi hêvîkirina êzdîyan yek ji ewledên ermenîyan yê hêja Aram Têgoyan hatîye hilbijartinê wek endamê Parlamêntoyê.

Çimkî min ji berê da zanibû, ku berdevkê Parlamêntoya Ermenîstanê Êdvard Şarmazanov me qebûl bike, berî rasthatinê min têlêfonî serekê Parlamêntoya Herêma Kurdistanê kir û pê da hesandinê, ku ezê sibê herime Parlamêntoya Ermenîstanê bona

rasthatinê. Ewî hîvî ji min kir, ku ji navê wî endamên Parlamêntoya Ermenîstanê teglîfî Kurdistanê bikim.

Rasthatin û gotûbêjên me gelek ji dil bûn û demek dirêj lazim e, ku em wana bimehînin û fêm bikin.

Ebdil Ezîz (bizîşk, profêsor, Îraq)

-Ez dema hatime Ermenîstanê, tiştê pêşin, ku min dît, ew danûsitendinên ermenîyan û êzdîyan yên dilgerm bûn. Bona min şabûneke mezin bû, ku ez li cîyekî ewqas êzdî bibînim. Weke 100 salan Mîrê me, serekê me yê ruhanî, nehatibû Ermenîstanê. Gava min dît, ku bi germayî û hizreteke çawa wî qebûl dikin, çavên min tije hêsir bûn. Ez zendegirtî mam, ku êzdî li Ermenîstanê çawa bawerîyên xwe, erf-edetên xwe, rabûn-rûniştina xwe parastine. Ji şabûna sizî di canê ra me ra diçû. Ev bona me tiştekî teze bû. Gava me dua li ziyaretê dikir, me dît ku li rex ruhanîyên me metran û ruhanîyên ermenîyan sekinîne. Û ermenîyên, ku tevî vê şayînetîyê dibûn, ji êzdîyan zêdetir şa dibûn, beşera wan diha geş bû. Emê derheqa van hemûyan da binivîsin û emê di nav olka me ya êzdîyan da belav bikin, emê bêjin, ku em bi dil û can qebûl kirin û emê tu caran vê camêrîyê û mêvanhizîyê ji bîr nekin.

Gava me seredana metranê hemû ermenîyan Garêgîn B kir, Bavê Mîr hîvî ji wî kir, ku ew alî wê yekê bike, ku dostanîya ermenîyan û êzdîyan dubare, sêbare bibe. Tiştekî surî nîne, ku berî Îsa bê, em cînarên hev bûne û xwedî dînekî bûne.

Dilê me bi şabûnê va tije bû, dema metranê hemû ermenîyan behsa wê yekê kir, ku rola êzdîyan di karê parastina ermenîyan ji destdirêjayên tirkan çiqasî pir e. Xwesma ewî rola Cangîr axa bi bîr anî, ku ewî şerekî çawayî giran bi tirkan ra danîye. Ewî wan 30 xortên êzdî bi bîr anî, ku di şerê bona Qerebaxê şehîd ketine. Ewî herwiha got, ku ew tu firqîyê danayne ka kê ermenî ye, kê êzdî ye. Em bi hev ra Ermenîstana teze çê dikin.

Serekê me yê ruhanî li Parlamêntoya Ermenîstanê ji cîgirê

serekê parlamêntoyê ra got, ku gerekê wisa bikin, ku sînor zêde vekirî bin, bona gelên me bikaribin herin-werin, zû bi zû hev bibînin.

Mîrê Mîran Tehsîn Beg di rasthatinên tevî karmendên derecebilind da got, ku daxwaza wan ew e, ku Parlamêntoya Ermenîstanê da êzdîyek hebe, ku bikaribûya daxwezên miletîyê pêk banîya. Evana pirsên wisan in, ku bi demê ra dikarin bêne çareserkirin. Bona wê lazim e em gelek caran ser hev da herin û bên, bona em bikaribin bi hev ra hemû pirsan safî bikin. Dema ez vegerim Lalişê, ezê berî her tiştî çevronahîyê bidime bavê xwe, ezê jê ra bêjim, ku êzdî zimanê xwe, erf-edetên xwe, dînê xwe ji bîr nekirine û li Ermenîstanê di rewşeke aram û bê tirs da nin. Min li Ermenîstanê nûnerên êzdîyan yên ruhanîyê dîtin, ku dînê me rind parastine, li hinek cîyan ji me çêtir jî xwey kirine. Ev hemû bona me kubarî û cîyê şanazîyê ye. Eger di paşdemê da jî ermenî û êzdî bi hev ra bin, pişta xwe bidine pişta hev, ewê hertim jî bigihîjine meremên xwe.

Van herdu kesan pêşnîyar kirin, ku berî 100 salîya Gelkujîya ermenîyan Parlamêntoyên wan jî Gênosîda ermenîyan ya mezin nas bikin.

Du bûyerên dîrokî – duakirina Ziyaretê û seredana serekê ruhanî yê hemû êzdîyên cihanê li Ermenîstanê bûbû sebeb, ku nûnerên diyaspora êzdîyan yên bi nav û deng, ku li welatên Sovyeta berê da û li Ewrupayê dimînin, berevî vira bibin. Ewana bona xêrê hatibûn, bona alîkarî û piştgirîya warê jidayîkbûna xwe û merivên xwe bikin. Bi vê yekê ra girêdayî li beledîya Armavîrê sohbeteke xweş derbaz bû. Serekê beledîyê Aşot Xahramanyan derheqa herêma Armavîrê da ji haziran ra qise kir. Mêvanan jî xeberda. Di encamê da bernameyek hate amadekirinê bona pêkanîna daxwezên gel. Û ev tenê destpêk bû. Di paşdemê da wê gavên mezin bêne avêtin, wê bi kar û xebata xwe ya tevayî va wê herêmê şên bikin.

Miraz Broyan (serekê ruhanî yê êzdîyên Sankt-Pêtêrbûrgê)

-Ez nûnerê Sankt-Pêtêrbûrgê me. Ez hatime bona tevî vê bûyera mezin û xweş bibim, ku li ser axa ermenîyan ya dîrokî derbaz dibe. Ez bêhesab bextewar im dema welatîyên xwe ha şa û beşerxweş dibînim. Ez tu caran bi dostanîya ermenîyan û êzdîyan va zendegirtî nemame û wê ecêb bûya, ku eger ne wisa bûya. Îro rojeke xweş bû, me dîna xwe da fîlma bi navê "Êzdî: Ewledên Royê" û ew îzbata biratîya me ye. Tu tiştekî em ji hev bixwezin, tuneye û emê di temamîya jîyanê da bi hev ra rê herin. Em ji gelê ermenî, ji serokatîya Ermenîstanê razîne. Bi saya serê dilovanî û germaya dilê wan em her tiştê xwe diparêzin – dêmê xwe yê miletîyê, kûltûra xwe, erf-edetên xwe û hela di ser da jî wana pêşda dibin. Min pirtûka akadêmîkos Yêxîazaryan xwendîye. Ew li Sankt-Pêtêrbûrgê dima û di pirtûka xwe da, ku sala 1886an çap bûye, derheqa êzdîyan da baş xeber dida. Ewî êzdikî baş zanibû. Bi saya serê wî gelek hikyatên me, gotinên me hatine parastin. Ez îro bala xwe didime Yêrêvanê û gelek şa me, ku meriv rengxweş û eşq in. Duakirina ziyaretê, rasthatinên îro, mêzekirina fîlmê kêfa min û welatîyên min anîn. Ezê her sal bême Ermenîstanê, çimkî navbenda me ya ruhanîyê ya nû li vir hatîye çêkirinê. Ewê herdem me ber bi xwe bikişîne.

Zado Cindoyan (Rûsîya, bazirgan, rêçêkir, serekê diyaspora êzdîyan ya li Tvêrê)

-Belê, ev bona gelên êzdî û ermenî eydeke mezin e. Eva herwiha sîmvola hevgirtin û hevhizkirina heta-hetayê ye.

Gelo meriv dikare welat ji dê û bavan cuda bike? Ew herdu wekehev in. Çimkî ewled hertim jî xwe ber bi dê û bavan dicedîne, warê te jî hertim te ber bi xwe dikişîne. Ez ne bi tenê hatime, ermenîyên Tvêrê jî bi min ra hatine. Dêlêgasyona me yekgirtî ye û em bi bîranînên dewlemend va ji Ermenîstanê diçin. Berî her tiştî

ez dixwezim razîbûna xwe bidime teşkîldarên vê rasthatinê, yên ku şahî kirine dilê me û emê bi bîranînên giranbuha va vegerine Rûsîyayê.

Meha îlona sala tê ezê vegerim, çimkî ziyareta me meriv dibêje qey me mecbûr dike – tu di ku da jî herî, vegere. Wisa qewimîye, ku em vira najîn, lê dilê me li vir e. Em ku da jî herin, çiqas pere qazanc bikin, an jî ser çi qulixê bin, rehên me li vir in. Û ew reh ewqas kûr in, ku ew îro jî me bi nan û av dikin, me ruhdar dikin. Piranîya me hewcê malê dinê nîne, em pir-hindikî têr in, lê em kêmasîya ruhanîyê dikişînin, ew dixwezin serketin û şabûnên me bi hev ra bin. Em niha hatine tevî şabûna Mîrze bibin. Ewî gaveke culet avîtîye. Ew rêyeke dirêj derbaz bûye, heta hatîye gihîştîye vê rojê. Ewî ziyareta di xeyalên xwe da li deşta Araratê texmîn kirîye, ber dîdema herdu Masîsan, ber bayê çiyayê Elegezê, bi cînartîya dêra ermenîyan ya li Êcmîadzînê. Û ew îro rastîyek e, xewneke pêkhatî ye. Ez gelek bawer im, ku ziyareta me çiqas here, wê ewqas qewatê û hêzê dest bixe.

Êzdî û ermenî li kîjan qulbê dinyayê bin jî, qedera wan hev diqelibe. Ez dikarim bi nimûneya xwe bêjim. Min Înstîtût teze xilaz kiribû û ez şandime herêma Tvêrê. Ez rastî ermenîyekî bi paşnavê Alîxanyan hatim, ku rêçêkirekî bi nav û deng bû. Çawa dibêjin, ewî ez kirime bin per û baskên xwe, alî min kir, helan dane min, bona bibime zaneyê şuxulê rêçêkirinê. Û îro eger teşkîleta ku ez serokatîyê lê dikim li Tvêrê û ji sînorên wê der xwedî nav û hurmeteke mezin e, ew bi saya serê birakê min yê mezin yê ermenî ye, çimkî ewî hîmê wî karê baş danî. Em – ermenî û êzdî tu caran qencîya hevdu ji bîr nakin. Ez borcdar bûm îro li rex vê ziyaretê merivê xwe yê nêzîk bi bîr bînim û bi saya wî – temamîya miletê ermenî jî.

We çawa texmîn kir, hema bêje temamîya ruhanîya Lalişê bi serekê xwe yê ruhanîyê ra hatîye Ermenîstanê. Bi gotina wan, her tiştê ew li Ermenîstanê dibînin, ji xeyalên wan zêdetir e. Wana

jîyana welatîyên xwe dîtin, dîtin ku êzdîyên Ermenîstanê di çi qewl û şertan da dijîn. Wana dilovanîya ermenîyan di hindava êzdîyan da, dostanîya wan herdu miletan dîtin. Bi wan va şa û firnax bûn. Wana ser xwe jî texmîn kirin, ku bi dilekî çawa şa ew qebûl kirin, dema gihîştine Yêrêvanê.

Her rasthatinek bi dilê wan e, ew razî ne. Ewana di hêlekê da hewil didin çiqas ji dest wan bê zêde tişt li Ermenîstanê bibînin, ji hêleke din va jî di bawerî û duayên wan da Laliş e, navenda wan ya ruhanî.

Dostên me yên teze bi dil em teglîfî Lalişê dikirin, me jî di hindava xwe da hîvî ji wan dikir derheqa navenda êzdîyan ya ruhanî da me ra qise bikin.

Bavê Gavan (serekê qewalên Lalişê)

-Bawerîyên me ji dem û dewranên buhurî tên. Gelê êzdî bawerîya xwe bi gelek melekan tîne – Şîxadî, Şêxobekir, Taûsî Melek. Riya êzdî jê derbaz bûne, paqij e. Em miletekî bawermend in, tiştên ne paqij şanê me nakeve. Derew, çêr, karên xirab ji êzdîyan dûr in. Meriv gerekê di jîyana xwe da rêyeke paqij hilbijêre û bi wê rê ra pêşda here.

Em gelek şa ne, ku li Ermenîstanê ziyareteke ha bedew bona êzdîyan heye. Ewê ewledên gelê êzdî ber bi xwe bikişîne, him li Ermenîstanê, him jî ji sînorên wê der. Em rastî gelek êzdîyên Ermenîstanê hatin. Dem hatîye, ku êzdîyên li der û dorê Lalişê dimînin û êzdîyên Ermenîstanê ser hev da herin, bên. Gerekê seredana hev bikin, herine navbenda ruhanîyê ya hemû êzdîyên dinyayê, wek ku herine hecê.

Hesen Pêşîmam (serekê ruhanîyê yê êzdîyên Ewrûpayê)

-Eva bû çend roj ez li Ermenîstanê me û di nav wî wextî da min him ji gelê ermenîyan, him jî ji êzdîyan lezeteke baş dît. Di dema

vekirina ziyaretê da jî dostanîya mehkem û dilgerm, hevgirtina herdu gelên me xuya bû. Ez ji Tirkîyê çûme Ewrûpayê, li wir mafên me hinekî hatine parastin. Ez diçime kîderê jî, êzdî û ermenî bi hev ra nin. Ez ji we hîvî dikim, vê yekê bidine ber çavan. Qedera me wisa bûye, ku em herdu gel jî bi jimara xwe va hindik in, lê em li her deran mezin xuya dikin û xwestina min ew e, ku em hertim bi hev ra bin, li rex hev bin. Ez li vira dibînim, ku ew hevgirtin heye, lê hinek caran pirsên wisa hene, ku meriv nikare wana veşêre. Mesele, em teze çûne Almanîyayê û di Parlamêntoya wira da du parlamêntarên me hene û daxwaza min ew e, ku li Ermenîstanê jî dengê êzdîyan ji parlamêntoyê bihata bihîstin.

Bavê Şêx (serekê ruhanî yê Lalişa Nûranî)

-Em hatine Ermenîstanê bona ji nêzîk va gelê xwe nas bikin, çimkî em di zûda ye, ku nehatine Ermenîstanê. Li vir metranê hemû ermenîyên dinyayê, karmendên dewletê yên derece bilind em bi dil û can qebûl kirin. Bona wê yekê em sipasdarê wan e.

Ez ji herdu miletan ra hevgirtinê û xweşbextîyê dixwezim. Şikir ji Xwedê ra, ku ez îro dostanîya herdu miletan, pêwendîyên wan yên germ dibînim û ji bo wê yekê gelekî şa me.

Ziyareta, ku li Ermenîstanê hate çêkirinê û ji alîyê Mîrê Mîran Tehsîn Beg da dua lê hate kirinê, êdî ketîye xizmeta bawermendan. Her kes dikare bê vira dua bike, qurbanan bide û h.w.d. Ango, ziyaret tam hazir e bona xizmetî gel bike.

Bê şik, ew kesên, ku hela pêra negîhandine herine Lalişê, gotinên derheqa wê da bona me gelekî hewaskar bûn. Derheqa vê yekê da yek ji mezinên ruhanîyê yê êzdîyan bi hûrgilî derheqa navbenda ruhanîyê ya hemû êzdîyên cihanê da ji hazira ra şirove kir.

Bavê Çaûş (nûnerê ruhanîyê yê derece bilind li Lalişê)

-Gelo meriv dikare derheqa Lalişê da çi bêje? Laliş wê demê

jî hebû, dema dinya teze xuliqî bû. Li wir pira heye, ku jê ra dibêjin Pira Nûranî. Li dor wê sê caran dizivirin. Û li wir kanîyek jî heye, ku em jê ra dibêjin Kanîya Sipî. Li wir Kanîya Zimzimê jî navdar e. Ava wê dikare ji beşeke çiyayên dor û berê wê bizê, sê mêtran bikişe û dîsa ber çavan betavebe, winda bibe. Ez li Lalişê dijîm û qulix dikim. Min xwe bi temamî daye wî karî. Bona wê yekê navê Çaûş li min kirine, çimkî min soz daye nezewicim û xizmetî dînê xwe bikim.

Ji merivên ruhanî yên êzdî sê kes hene, ku nezewicîne. Ewana ji jîyana rojane xwe dane alîkî û xwe bi temamî pêşkêşî dînê xwe kirine. Di nav êzdîyan da bawermendên dînî yên jin jî hene.

Li Lalişê karên wisa hene, ku tenê jin dikin. Ewana mûman çê dikin, nanê bawerîyê lê dixin, lê karên din mêr dikin.

Meriv dikare tiştekî arxayîn bêje: di 29ê îlonê sala 2012an da êzdî li Ermenîstanê bûn xwedîyê Lalişeke biçûk. Ew îdî ketîye dewrê, ji ber ku bi qanûnî dua lê hatîye kirin. Ez bawer im, ku ewê ne tenê ji bo êzdîyan, herwiha bona ermenîyan jî, lo hela ji bo tûrîstan jî wê bibe cî û warê gerê û hêsabûnê.

Andranîk Artenyan (binecîyê Mûsalêrê, xebatkarê bankê)

-Ez ji biçûktîyê da bi êzdîyan ra hevaltî û dostanî dikim û zanim, ku ew di hindava ermenîyan da çiqasî dilovan in. Niha, dema li Aknalîçê ziyareta wan heye, ew şabûna wan ya here mezin e. Êzdî miletekî bawermend e û ev ziyaret wê diha zef wana bigihîne hev, dostên me wê diha zef hev bigirin.

Mîrze Siloyan hevalê min yê gelek salan e. Meriv dikare bêje, ku me pûtek nan û xwê bi hev ra xwerîye, lê ya sereke ew e, ku hevalê min, dostê min xewna xwe û welatîyên xwe pêk anî. Em ji Xwedayê mezin dixwezin, ku emirekî dirêj bide wî, çimkî ewê karê xwe berdewam bike.

Yûra Desinî (bazirgan, Moskva)

-Eger em behsa dostanîya gelên ermenî û êzdîyan bikin, em dikarin bêjin, ku dîroka wê dûr û dirêj e, ya çend sedsalan e û ew dostanî herdem xuya kirîye, him di dema şahîyê da, him jî di dema şînê da. Ez li Tbîlîsîyê ji diya xwe bûme û dikarim bêjim, ku ew dostanî li wir jî berdewam dibe. Zarotî û xortanîya xwe bîr tînim. Hevalên min yên ermenî pir in, li vir, Moskvayê jî nêzîkaya ermenîyan û êzdîyan berdewam dibe, em dibine mêvanên hev, tevî şahîyên hev dibin û gelek caran bi ermenî bi hev ra xeber didin. Bi awayekî din nikaribû bibûya, çimkî ew ketîye nava xwîna me herdu miletan da. Çêkirina vê ziyaretê jî nîşana wê dostanîyê ye, ew dibe pirayeke qewîn di navbera miletên me da. Belê, ziyareteke ha ji Lalişê gelekî dûr dikaribû tenê li Ermenîstanê hebûya.

Bazirgan û xêrxwez Mîrzeyê Çolo Siloyan hiz dike dubare bike, ku di navbera gundê Aknalîçê ya li herêma Armavîrê û Lalişê bi riya rast çend deh kîlomêtr in, û xwestina wî ew e, ku ew rê diha kin bûya, bi kêmanî bi alîkarîya vê ziyaretê.

Bavê Çaûş (nûnerê koma ruhanîya bilind ya Lalişê)

-Eva bû çend sal, ku me dixwest em bêne Ermenîstanê. Û niha em li Ermenîstanê ne. Me guhdarîya radyoya Rewanê dikir û bona me gelek hewaskar bû bizanibin ka birayên me çawa dijîn. Eva xewna me bû, û em bi rastî jî hatine bawerkirinê, ku êzdî bi birayên xwe yên ermenî ra azad û aşt dijîn. Me li her deran texmîn kir, ku di navbera me da germayîk heye. Emê bi bîranînên here qenc va vegerine welêt, bi dilekî rehet, ku gelê me li welatekî baş da dijî.

Ziyareta li Aknalîçê wê roleke mezin bilîze di nava jîyana gelê êzdî da, ewê alî hevgirtina gelê me bike û wê rola wê mezin be di karê nêzîkîhevbûna hev da û her sal 29ê îlonê wê bibe roja ziyareta me. Em gelek dixwezin, ku pey çûyîna me ra ev hevgirtin diha mehkem be û ziyaret tenê xizmetî karên qenc bike.

Em dipirsin, ka ev ziyaret wê karê xwe çawa bimeşîne? Ew yek bi her kesekî, bi her bawermendekî û bi daxwezên wî ra girêdayî ye. Eger yek bixweze li wir qurbanê bide, ew dikare wê yekê bike, eger bixweze dua bike, dikare dua li Xwedê bike, bi gotineke din, her tiştê ku Xwedê qebûl dike, dikare di vê ziyaretê da bike. Diha zef meriv qewatê dide bawerîyê, ne ku bawerî qewatê dide merivan.

Emê bona ermenîyan dua bikin û li her deran bêjin, ku qedirê me girtin, daxwezên me pêk anîn. Û eger em herdem tiştên baş bibihên derheqa biratîya we da, emê gelek razî bin.

Amo Şeroyan (serekê şêwra rêxistina civakî ya bi navê "Mîdîya-Şengal" ya yekîtîya êzdîyan ya miletîyê-welatparêzîyê")

-29ê îlonê bona êzdîyên Ermenîstanê rojeke dîrokî ye, çimkî roja duakirina ziyareta me ye. Dîroknivîs wê binivîsin, ku ew ziyareta êzdîyan ya pêşin e li Ermenîstanê û yek ji yên pêşin e li cihanê. Min çend caran bala xwe dayê, ka çêkirina ziyaretê çawa pêşda diçe û min texmîn kirîye, ka dilê Mîrze Siloyan çawa ji bo her karekî diêşe. Ew şev û roj nerehet bû, hewil dida ku ziyaret baş bê çêkirin. Ez vê yekê hesab dikim wek sîmvola yekîtîya milet. Di nav şer û de`wên dinyayê da em dikarin rastî gelek dijwarîyan bên, lê bawermendîya ruhanî, ziyareta me dikare merivan nêzîkî hevdu bike, bêy ku bidine ber çavan ka kê ser çi qulixê ye, karê wî çi ye, çi ji destê wî tê. Ev xanîyê bona duakirinê gerekê alî merivan bike bona erd-edetên miletîyê, koka xwe biparêzin, bi gotinekê, ew her tişt ku pêşîyên me wek temî û wesyet ji me ra hîştine.

Gelek wext wê derbaz nebe û li rex vê ziyaretê wê navbendeke ruhanî-kûltûrî bê sazkirinê. Û ew tê wê maneyê, ku ji bo êzdîyên Ermenîstanê ev ziyareta nêzîkî çiyayê Araratê wê bibe cîyê kesên Xwedênas, wê bibe warê nêzîkî dil û ruhê her kesî.

Sal 2012, çirîya pêşin
Aknalîç-Rewan

EZDIKI.COM

BIRATÎYA ME ME DIGIHÎNE HEV

Sipasî ji gelê ermenî yê bira ra

Xeberdana li warê bawermendîyê - ziyareta Aknalîçê, di dema dualêkirina wê da (29ê îlonê, sala 2012an)

Cenabê Mîrê Mîran Tehsîn Beg.

Parlamêntarên birêz yên Ermenîstanê, Îraqê û Kurdistanê, welatîyên ezîz!

Em qedirê we bilind digirin û razîbûna xwe didine we bona we îro bi hazirîya xwe va vê eyda me xemiland.

Berî her tiştî ez dixwezim bi dil û can we hemûyan pîroz bikim, ku bi duaya Rebbê Jorîn cara pêşin ji Lalişa me ya Nûranî dûr, li ser axa ermenîyên bira, li welatê me yê nû ev avahîyê bedew, ku ziyareta me ye, bilind bû.

Dibêjin, ku qedera merivan li jorê tê nivîsar. Gava ez li rex Êçmîadzîna Nûranî, Sûrb Gayanê, Sûrb Hrîpsîmê û dêrên din dijîtim, hela di salên xortanîyê da difikirîm, bona çi warekî meyî ku em lê dua bikin, tune. Dê û bavê min bi dilêşî ji min ra hergav digotin, ku ziyaretên me jî hene, lê ew ji me gelekî dûr, li welatê me yê dîrokî da nin.

Min hinekî dereng derheqa Lalişê û Şengalê da bihîst. Salên dirêj hisreta min ew bû, ku hema ser çend deqîqeyan jî mabe, ez li wir bim. Bextê min lê xist û wî bextî ez bextewar kirim. Ez ji Xwedayê xwe razî me, ku mecala min hebû ez xeyala dê û bavê xwe bi cî bînim û hêvîyên xwe yên xortanîyê bikim rastî û bona

êzdîyên li ser axa ermenîyan ya kevianre, di bin çavdêrîya Ararata Batinî vê ziyaretê çê bikim û li wir em dikarin xwestinên xwe yên ruhanî pêk bînin û bi duayên xwe va bi ruhanîyên xwe ra bidin û bistînin. Ev warê me bona çêkirina ziyaretê hilbijartîye jî ne text-bext e, ne ji ber xwe va hatîye. Dibêjin rojên îro berdewama rojên buhurî ne û destpêka pêşerojê ne. Nisleta genc, û ne tenê ew, di rojên me yên eydan da seredana goristanên merivên xwe dike: ez bawer im, ku ji vir şûnda mecala wan wê hebe bi qîmetîyên me yên ruhanîyê ra danûsitendinan daynin, dîroka ayîna dînê me û erf-edetên me yên bi hezaran salan ra bibine nas.

Miletê me bi sedsalan jîye û xwestîye, ku qe na mezelên du nisletên me li warekî bin. Şikir ji Xwedê ra, ku pareke miletê me yê biçûk di destpêka sedsala buhurî da li rex gelê ermenî yê bira hêwirî û eva êdî zêdetirî sed salan e, ku wana mil dane milên hev, ji hev ra bûne pişt û azad û aştî dijîn. Qedera me ya wekehev jî me digihîne hev, herdu miletên me jî di bin tirsa dijminnan da nin, ku bi sedsalan em zêrandine û qir kirine. Ez ne bawer im, ku di şertên din da, li welatekî din miletê êzdî bikaribûya bibûya xwedîyê nivîsara xwe, radyoya bi zimanê wî hebûya, rojname û kovar derxistana û ne tenê xwendina bilind dest banîya, lê usa jî di çiqlên cuda-cuda da doktor û profêsorên wî hebûna. Û me ev her tişt bi saya serê wan qewlan dest anîye, ku bona me li Ermenîstanê hatine sazkirin.

Qewmandinên van bîst salên axirîyê em mecbûr kirin em jîyana xwe li cî û warên dinyayê yên cuda-cuda da derbaz bikin. Ez we didime bawerkirinê, ku bona her êzdîyekî ku ji Ermenîstanê derketîye, mînanî deynekê ye ku her ro Ermenîstana xwe bi bîr bîne, jê ra aştîyê û bextewarîyê bixweze û eger mecala wî hebe keda xwe ya biçûk bike nava pêşketina wê.

Berevbûna min ya îroyîn usa jî firsendek e ez bi dengekî bilind razîbûna xwe ya ji dil û paqij bidime gelê ermenî yê bira û Ermenîstana ber dilê min ezîz, ku lê ji diya xwe bûme û mezin bûme, bûme xwedî mal û hal û min xwendina bilind sitendîye û di wan salan da tu deqîqeyekê û tu ermenîyekî firqî daneynîye orta

min û xwe û ne gotîye tu ji filan miletî yî. Malî ava ji Ermenîstanê ra, malî ava ji gelê ermenî yê bira ra.

Ez îro wê yekê jî dibînim, ku bi saya serê vê ziyaretê, ku di bingeha wê da xwelîya Lalişê û Ermenîstanê tevhev bûne, ber dilê me êzdîyan Ermenîstan diha ezîz dibe. Ji welatîyên me, ku mecala wan tune herine Şengalê, dikarin xwestinên xwe yên ruhî li vira, berpala çiyayê Araratê, nêzîkî Êçmîadzîna Nûranî, li vê ziyaretê pêk bînin. Qedera gelên êzdî û ermenî, mînanîhevbûna dîroka wan ya bi xaçerêyan derbazbûyî gerekê ese rêça xwe li ser danûsitendinên van herdu miletan bihîşta. Gelek caran bona pêwendîyên du miletan bînine ber çavan, gotina "dostanî" bi kar tînin. Ez kubar im, ku zûda ye gotina "biratî" me herdu miletan digihîne hev. Û ev biratî hela ji destpêka sedsala 20î da dest pê bûye, dema şerê ermenîyan ya ji bo rizgarîyê diçû, paşê jî li deştên Arsaxê da qewîntir bû. Û îro tu tişt nikare me mecbûr bike wê biratîya şervanîyê ya du xweşmêran Andranîk Zoravar û Cangîr Axa bîr bikin, ku bi tevayî şerê dijminên xwe yê tomerî kirine, û ew biratî berdewam bû û mehkem bû, nisleta nû ew yek di şerê Arsaxê da jî îzbat kir, dema bi dehan êzdîyên xort û bi emir jîyana xwe dan bona şerê Arsaxê yê azadîyê.

Çawa bo ermenîyên li dinyayê belavbûyî, usa jî bona me pirsdanîna sereke parastina milet e. Em rind fem dikin, ku debeya bi navê "globalîzasîya" her deqe amade ye bi dilxweşîyên cûre-cûre va cahilan hûfî xwe bike.

Û himberî vê belayê çeka me ya here xurt ew parastina dîn û zimanê me ye. Me çêkirina vê ziyaretê ji bo vê armancê pêk anî.

Van dawîyan li ser kolaneke Moskvayê ya merkezî da xanîyekî pir bedew bilind bû. Me zora gelek dijwarîyan bir û ji me ra li hev hat navê ji me ra gelek bedew û bilind, lê ji bo binecîyên Moskvayê nenas, navê "Şengal"ê li wî avahîyî bikin. Xewna min ya zû da bû, ku navê Şengalê li warekî biyanî bidime naskirinê, bona gelê min yê xweyê dîroka bi hezaran salan li cihanê bê naskirin û di nav gelên dinyayê da cîyê xwe yê layîq bigire.

Berî ez xeberdana xwe serhevda bînim, ez dixwezim vê firsendê bi kar bînim û ji navê hemû êzdîyên ku dervayî Ermenîstanê dijîn û ji navê xwe razîbûna xwe bidime desthilatdarîyê, him ya komarê, him jî ya cî, ku her tişt kirin bona ev qewmandina ber dilê me ezîz ser dereceyeke bilind bê derbazkirinê, ew jî wê demê gava li Ermenîstanê gelek pirsên dijwar û yên nehatine safîkirinê hene. Careke din sipas ji bo Ermenîstanê, sipas bona gelê ermenî yê bira.

Sal 2012, îlon

EZDIKI.COM

Êzdî: ewledên Rojê

Usa qewimî, ku ez gelek salan pêşda, li Moskvayê bi rojnamevan Sêrgo Yêrîtsyan ra bûme nas. Koma efrandarîyê ya bi navê "Kartsîk" diçû Yarovslavlê bona derheqa diyaspora êzdîyan da fîlmekê bikişîne. Em hema li balafirgehê rastî hev hatin û çend caran firsend çê bûn me derheqa olkên êzdîyan yên li Moskvayê, Yaroslavlê, herwiha tevaya Rûsîyayê da xeberda. Paşê me bi têlêvîzyonê bala xwe da fîlmên ku koma efrandarîyê "Kartsîk"ê kişandibûn, ku bi naverok û serecema xwe va derheqa êzdîyan, dostanîya êzdîyan û ermenîyan ya di xerîbîyê da, herwiha derheqa biratîya ermenîyan-êzdîyan da. Ew fîlm gelek deng dan, çimkî, çawa dibêjin, ji dilê me û ruhê me xeber didan. Tê bîra min, hema mecala me hebûya, me bi vîdêoyê dîna xwe dida wan fîlman, me bi alîkî va ji wan fîlman hisreta xwe ya ji welêt – Ermenîstanê hildida, alîkî din va jî em bi fikiran va derbazî Rûsîyayê – warê xwe yê jîyana îro dibûn. Bi me va wisa xuya dibû, ku bona me her tişt zelal û femdarî ye, lê ji Sêrgo Yêrîtsyan ra li hev hat bi destî merivên zane ruh û heyetîya êzdîyan bigihîne temaşevanan. Gotinên merivan ji guhên min dernayên: welatê me Ermenîstan e, cîyê herî baş bona êzdîyan Ermenîstan e. Piştî hazirkirina vê fîlmê gelek sal derbaz bûne, lê mêrxasên wê her caran têne ber çavên min. Bi vê yekê va Sêrgo Yêrîtsyan û koma efrandarîyê ya "Kartsîk" bûne dostên me yên baş, û em gelek caran rastî hev dihatin, him li Rewanê, him jî li Moskvayê, lê nizanim bona çi ji fikira me ra derbaz nedibû, ku dikarin kişandina fîlmên wisa berdewam bikin, çimkî gelek sal derbaz bûne, dem û dewran guhêrîne, meriv hatine guhastin. Dostên me yên baş pêşnîyara me qebûl kirin, xwestinên me dane ber çavan û fîlmeke vîdêoyê ya nû xuliqî – "Êzdî: ewledên

Rojê". Ew berdewamîya vîdêoya berê ye, lê hilbet, bi mêrxas û gotinên cuda va. Ew derheqa wê diyasporayê da ye, ku li Rûsîyayê dijî. Mêrxasên fîlmê jî merivne balkêş in, cîyê xwe di jîyanê da dîtine, ew ne tenê bona peydakirina parî nan sibê hetanî êvar kar dikin. Ez behsa merivên xweyqedir û giran dikim, ku hinek ji wan bûne hunermend, gencên me jî êdî qedirê xwendinê zanin, dibine pêşekzanên baş. Kesên xwendinê dest tînin, bona diyasporê gelek ferz in, xort û keçên me çav didine wana. Wek ku di fîlmê da tê şirovekirinê, gelek ji wana ne tenê li dayîreyên xwendina bilind yên Moskvayê û Rûsîyayê dixûnin, wisa jî li dayîreyên xwendina bilind yên pêşketî yên cihanê jî.

Bê şik, eva fîlma herwiha ya nasîdayînê ye û tê da malûmatî hene derheqa dîn, erf-edet, rabûn-rûniştina milet da. Li vira em naveroka fîlmê raberî we dikin û dixwezin, ku her tiştê di fîlmê da hatîye nîşandan û gotin, derbazî nisletên paşdemê bikin. Me ew vîdêofîlm bi jimareke mezin ji ber hev girtîye û di nav milet da bela kirîye.

* * *

Xwedîyê pirtûkê – Wisa tê texmînkirin, ku ji roja xuliqandina dinyayê ev miletê kevinare li çiyan e. Pey hilweşîna dewletên zor yên Babêlonê û Mîdîyayê ewana xwe li çiyayên bakurê Mêsopotamîyayê girtin, li wir sitar bûn û li wir miletîya xwe, ziman û dînê xwe parastin. Wana ji wan çiya û zinarên zexm nanê xwe derxistin. Di nav bi hezaran salên heyetîya xwe da 72 ferman hate serê wî miletî û di destpêka sedsala 20an da jî şûrê tirkan li wan qelibî. Karwanên vî miletê rehm û xebathiz xwe li riya Ermenîstana Rohilatê girt. Û bi gazî û bangawazîya pêşîyên xwe heywanxwedîkirin bû karê wan yê sereke.

O, kurê min, di ku da jî herî, çi jî bikî,
Zimanê dayka xwe jibîr nekî.
Tu herî ku jî, li ku jî bijî, diya xwe bîr bîne, bavê xwe bîr bîne,

Ocaxa xwe ya nûranî ji bîr nekî...
Riya me dûr e, em hela gerekê herine Lalişê,
Horî-melekên xwe ji bîr nekî...

Mirazê Koçer Mistoyan – (pîr, ruhanîyê êzdîyan, bazirgan, Kalînîngrad)

- Ez demeke dirêj li Rûsîyayê mame, zarên min li Moskvayê ji diya xwe bûne, û xetera windakirina rengê miletîyê li wir diha pir e, ne ku, em bêjin, li Ermenîstanê. Li Ermenîstanê em ser hev dijîn, û xeter pir hindik e, dînê me, ocaxa me ber dilê me wek ziyaretê ye. Ziyareta me ya sereke li Lalişê ye, li Îraqê, lê li mala her êzdîyekî da ocaxek heye, û ew ocax ziyaretî ye. Bi bawerîya me cî-nivîn jî ziyaretî ne, çimkî di nava cî û nivînan da dê û bavê te bi reza Xwedê te dixuliqînin. Em vê yekê herdem ji zarên xwe ra dibêjin. Em hertim dema ber wê ocaxê disekinin, tava berbangê dihebînin, çimkî em dibêjin "Şikir ji Xwedê ra, ku tav derket, û emirê me îro bi rojekê va jî dirêj bû". Lê êvarê em ber ocaxa xwe duayên xwe dikin û ji Şems, ango ji tavê, hîvî dikin, ku ew berbangê dîsa derkeve.

Xwedîyê pirtûkê – Welatê êzdîyan yê dîrokî Mêsopotamîya ye, para wê ya bakur, li wir, ku di hezarsalîya 4an ya berî Zayînê da li vir dewletên cihanê yên pêşin hatine avakirin – Şûmêr û Akkad. Li vira di her buhusteke xwelîyê da rûpelên dîroka merivayê yên kevinare hatine veşartin, ku bi dîroka dewletên bi hêz yên cihana kevin Babêlonê û Asorêstanê va girêdayî ne. Di hezarsalîya 2an ya berî dewrana me da Xwedê-sazkarê erş û ezman ber miletên bi koka xwe va Hind-Îranî dîyarkirina xwe ya pêşin kir. Xwedê ji Zerdeşt ra got: "Herin ji xwe ra bi aqilê selîm, bi gotin û karên paqij va bijîn...".

Di sedsalên paşdemê da Zerdeştî di dewletên Rohilatê da bela bû, berî gişkî jî li Asorêstanê. Hemû miletên Asorêstanê Xwedayên Royê – Samas, Şamaz, Şems dihebandin. Dema Mîdîyayê Asorêstan zevt kir, asorîyan bi Xwedayên xwe ra tevayî Xwedayên Mîdîyayê – Ahura Mazda û Mîtra jî hebandin. Wan miletan

Xwedayê Royê ra digotin Îazad, Îzêd, di paşdemê da bû Yêzîd. Ketina Asorêstanê bû sebebê wê yekê, ku komên êtnîk xuliqîn. Di nav sedsalan da ji kesên ku Xwedayê Êzîd dihebandin miletê êzdî xuliqî, ku di nav bawermendîyên wê da nimûneyên medenîyeta kevinare yên babêlona û asorîyan hene û tenê van demên dawî bi zanyarî hate îzbatkirin, ku Xwedayên êzdîyan derheqa dinyayê û erşê ezmîn da çi gotine.

Mirazê Koçer Mistoyan (pîr, ruhanîyê êzdî, bazirgan, Kalînîngrad)

- Bawermendîyên êzdîyan yên dînî bi awayekî kîp bi qanûnên erşê ezmîn va girêdayîne. Mesele, roj û şevên wekehev yên baharê û zivistanê, fitila Royê û yên din. Ji bo nimûnê, Taûsê Melek yek ji Xwedayên me yên sereke ye, ku Ahûra Mazdaya li mezergeha asorîyan-babêlonîyan da ne, ku yek ji 7 warguhêzîyan jî di qilixê teyr da ne. Di jîyana me da ew teyr bi qilxê Taûs va ye. Taûsê Melek ji bo fitilên erşê ezmîn (kosmosê) yên li dora xwe bersîvdar e.

Em niha Em niha gelek tişt derheqa topa dinyayê, bûyerên lê diqewimin da zanin. Em wê jî zanin, ku guhartina qanûnên topa dinyayê wê bibe sebebê bedbextîyên mezin û gelek planet dikarin xirq bibin. Û dema dinya li dora dîreka xwe dizivire, ew bingeha heyetîya cihana şînkayê û heywanan e, ango fikirek dixuliqe, ku ew hêzeke Xwedayî ye û Xwedê serokatî li van hemûyan dikin û ji bo wan cabdar in.

Xwedîyê pirtûkê – Di welatê pêşîyên êzdîyan û kurdan – Babêlonîyan da xwedî-xudanên teze peyda bûn, yên ku ji cî û warên gelek dûr hatin û qanûnên xwe yên wehşî li colanga medeniyetê ya kevinare – Mêsopotamîyayê da bi cî kirin. Osmanîyan, paşê jî peyhatîyên wan – tirkan diha bi hovîtî êzdî zêrandin. Ew ne ji dînê xaçparêzîyê bûn, ne jî ji dînê bûddîzmê bûn, ku ji alîyê "Quran"ê da hatibûn naskirin, û Xwedayê êzdîyan yê sereke Şems dewsa qilxê mirovan qilxê Royê wergirtibû, û bîna êzdîyan heta di hindava xwedî-xudanên dojehê da jî fire bû. Wana di wê yekê da gunehkar

dikirin, ku ew bawerîya xwe bi şeytan tînin. Di rûyê wê yekê da êzdî ji warên xwe yên bi dewranan li ser jîne, bi dûr ketin û ketine çiyan. Di destpêka sedsala 20an da şûrê tirkan gihîşte wan jî û êzdîyên mihacir bi ermenîyan ra tevayî li Ermenîstana Rohilatê sitar bûn.

Mîrzeyê Çolo Siloyan (bazirgan, Moskva)

-Êzdîyên Ermenîstanê di ku da jî herin, Ermenîstan dihesibînin welatê xwe, welatê xwe yê pêşin, û ewana bi têlên cuda-cuda va bi Ermenîstanê ra girêdayîne. Dê û bavên me, pêşîyên me li vir çalkirî ne. Ew bona me tiştekî tiberk e, em çawa dikarin ji bîr bikin, ku me li vira li dibistanê xwendîye, dayîreya xwendinê ya bilind xilaz kirîye, bûne xwedî kar û her tiştî. Bi rabûn-rûniştina xwe va em nêzîkî miletê ermenîyan e. Bona me ermenî ne xerîb in. Rastîyê jî, xên ji ermenîyan, her miletekî din bona êzdîyan xerîb e. Em gava bi heval û dostan va berevî ser hev dibin, em kasa 2an eşqê Ermenîstanê, gelê ermenîyan, dostanîya me, biratîya me, ku ji sedsalan tê, vexudun. Ew ne ji min e, ne ji zarên min e, ne jî ji der-dorên min e. Zarên min li dibistana Êcmîadzînê ya rûsî da xwendine, lê fikirandina wan û ya ermenîyan yek e. Îro dijwarî di wê yekê da ne, ku em nikarin wisa bikin, ku ewana bi kêmanî bi hev ra bi zimanê dayîkê xeberdin. Ez bi rastî jî vê yekê bedbextî dihesibînim. Min gotîye, eger nevîyên min bi ermenî nepeyivin, ew ji bo min ne ezîz in, ango xerîb in. Ez her titşî dikim bona ew ermenî hîn bibin, bext ra, niha îdî bi hev ra xeber didin, lê rind xeber nadin.

Hûnê pirs bikin:

-Lê zimanê dê, êzdikî?

-Zimanê dê ji ermenkî hinekî baştir. Ditirsim, ku hinek tişt ji dest me herin.

Avtor – Mîrzeyê Çolo Siloyan sala 1994an ji Ermenîstanê derketîye, li Rûsîyayê rojên zehmet û dijwar derbaz kirîye, li gelek warên Rûsîyayê xebitîye, niha li Moskvayê dijî, bazirgan e, weke 1000 cîyên bona xebatê hazir kirîye, navbendeke kirîn-firotanê ya mezin, çend sûk dane çêkirin, ku tê da piranî ermenî û êzdî dixebitin.

Mîrzeyê Çolo Siloyan (bazirgan, Moskva)

- Kesên di wê sûkê da kar dikin, ji sedî 70 ji Ermenîstanê ne: êzdî û ermenî ne. Demekê 700 malbetên ermenîyan û êzdîyan cem me dixebitîn û niha jî ne hindik in, weke 500 malbetî hene, ku dixebitin. Ez ji alîkî va bi moralî rehet im, ku min di wan salên giran da gelek alî wana kir, ku him ewana bikaribin bijîn, him jî alîkarîya merivên xwe bikin, ku li Ermenîstanê ne.

Laûra Şahbazyan (xebatkara navbenda kirîn-firotanê ya "Şengal" li Moskvayê)

- 20ê meha tebaxê sala 1964an bavê min di dema ji xeterê xilazkirina zarên êzdîyan wefat bû. Ew xebatkarê polîsa navçeya Êcmîadzînê bû. Êzdîyên ku li Zvartnosê diman, ji me hiz kirin, çimkî ew zaroya merivekî wan bû. Ew hizkirin meriv dibê qey zêdetir bû, dema diya min di sala 1964an da li dibistana hejmara 8an ya ya navîn da bû mamosta û piranîya zarên êzdîyan bûn şagirtên diya min, ji Mîrzeyê Çolo destpêkirî, hetanî yên din. Piştra, dema min sala 1974an fakûlteya fîzîk-matêmatîk ya Ûnîvêrsîteya Rewanê ya Pêdagogîyê temam kir, ez jî 27 salan dû hev li wir xebitîm. Li vira jî piranîya xebatkaran şagirtên min bûn, hemû jî şagirtên qedirgir û merîfet bûn, îro jî merivên baş in. Pêwendîyên me herdem jî yên dostanîyê bûne, me hemûyan jî qedirê hev zanibû û hurmeta hev digirt. Dema berî mehekê ez cîguhastî xanîyê teze bûm, gelek şa bûm gava min dît, ku cînarê min nasê min yê êzdî yê 40 salan bû. Ez ji wana, usa jî hemû êzdîyan, ji dil hiz dikim.

Mîrzeyê Çolo Siloyan (karsaz, Moskva)

- Ez nizanim ka kê ev gotina diyaspora derxistîye, lê tiştek zanim, ku ermenî û êzdî him li Ermenîstanê, him jî li vira em di demên şahîyê û şînê da bi hev ra ne. Tu dewateke êzdîyan tune, ku 30 selefê vexwendîyên wê ne ermenî bin, an jî eksî wê di dewatên ermenîyan yên usa jî tunene, ku êzdî tev nebin. Cejin û şahîyên din dibin û em herdu milet herdem bi hev ra nin. Min nevîyê xwe 5 salan şande stûdyoya "Hovik", ku li wir reqasên ermenîyan hînî zaroyan dikirin, zaro derdiketine pêşbirkan, li wir him sitiranan

dibêjin, him jî direqisin. Ez dixwezim bêjim, ku em pir nêzîkî hev in, bawer bikin, di navbera me da ferq pir hindik e. Rast e, nevîyên min diçine dibistana rûsî, lê gava mecal heye, em gerekê fêrî reqasên ermenîyan bin. Çimkî ew diha nêzkî dilê min e. Zimanê ermenkî jî ber dilê min gelekî ezîz e, û ezê her tiştî bikim, ku zaro wî zimanî jî hînbin. Ev her tişt ne tenê di destê min da ne, ne di destê nisla me da ne jî, ew ji dûr va tê, ji reqasên me. Em hema wisa bûne, bi hev ra, li rex hev, me alîkarîya hev kirîye û pişta hev girtîye. Lema jî êzdî dema derbazî ser axa Ermenîstana Rohilatê bûn, bi ermenîyan ra tevayî hatin. Ermenîstan welatê tekane bû, ku em wek dost û merivên here nêzîk qebûl kir, alîkarîya me kir bona em hemû qîmetîyên miletîyê biparêzin.

Avtor – Him di salên dijwar da, him jî niha pevgirêdanên me bi Ermenîstanê ra nehatine birînê, çimkî Ermenîstan warê jidayîkbûna wan e, welatê wan e. Ziyaretên wan li wir in. Ermenkî ew ziman e, ku bi wî bûne xwendî, xwendina bilind sitendine. Îro jî Ermenîstan wek berê welatê êzdîyan e, ku li wir ewana dikarin kûltûra xwe pêşda bibin, zimanê xwe û xwexwetîya miletîyê biparêzin. Ûsiv beg endamê parlamêntoya Ermenîstanê ya pêşin bû, lê Cangîr axa bi siyarîyên xwe va bi Andranîk ra tevayî li Ermenîstana Roava, Serdaravê û Baş-Aparanê şerê tirkan dikir.

Mîrzeyê Çolo Siloyan (karsaz, Moskva)

-Berî her tiştî bêjim, ku dilê merivan diêşe, dema firqîyê datînin. Bona me ermenî û êzdîyên diyasporê tunene, çimkî em hertim bi hev ra bûne. Li diyasporê, hûn bi xwe dibînin, ermenî, êzdî him li Ermenîstanê, him jî li vira – Rûsîyayê, bi hev ra ne, bi bawerîya min, di her pirsekê da. Lema jî emê berê xwe bidine wezîreta diyasporê û daxwez bikin, ku êzdî ji ermenîyan neyêne veqetandin. Gerekê li parlamêntoyê nûnerê me hebe, bona bikaribe daxwezên miletê me biparêze. Ew bi kêmanî gerekê formal be. Ez bona wê yekê nabêjim, ku ermenî mafên me binpê dikin, ew ne bûye, wê nebe jî. Lê heqî vê yekê dixweze.

Avtor – Gelek êzdîyên li Rûsîya Fêdêral da dijîn, xwedîyê

bîznêsê ne, hinek ji wana di nava jîyana civakî-sîyasî ya Rûsîyayê da cîyê xwe girtine. Di nav wan da parlamêntarên organên cuda-cuda, karmendên ser dereceya bilind hene. Ewana merivên zane ne, ku dixwezin alîkarîya cî û warên welatê xwe û wan binecîyan bikin, ku di wan da dijîn, bi gotineke din, wisa bikin, ku êzdî warên xwe nehêlin, jê dernekevin.

Îro êzdî li Rûsîyayê di hêla bazirganîyê da rind pêşda çûne, hemû jî amade ne keda xwe bikine nava pêşketina karê gundan li Ermenîstanê, bi hesabê, ku ew welatê wan e, wetenê wan e. Bi rastî jî, ew wisan e, ez ne bona gotinê dibêjim, lê bi rastî jî wisan e, hemû jî amade ne, bona wê qewil û şert lazim in, xwestina ji dil lazim e.

- Di nav dînê êzdîtîyê da bi sedan temî-şîret û asteng hebûn, ku her êzdîyek gerekê di jîyana xwe da wana pêk banîya û biparasta. Sê daxwezên here sereke yên di hindava her êzdîyekî da 3 heb bûn.

1. her êzdîyek gerekê bi aqilane bifikire û hereket bike,
2. bi aqilane xeberde,
3. tenê karên baş bike.

Êzdî bi zimanê xwe yê dê – êzdikî xeber didin, ku ji malbeta zimanan ya Hindawrupî, beşa wê ya bakur-rojava ye. Bi gotina gotîyan destnivîs hene, ku li warekî surî têne parastin, lê tu kesî tu destxeteke bi zimanê dê nivîsî ne dîtîye. Lê dîsa jî çend rojhilatnas ser wê bawerîyê ne, ku ew pirtûkên bi destxetan nivîsî bi rastî jî hene. Sala 1921ê ji bo kesên bi kurmancî dipeyivin li ser bingehê elfabeya ermenkî li Ermenîstanê elfabeya êzdikî hate çêkirin, û di dîrokê da cara pêşin pirtûka dersan ya bi sernavê "Şems" hate çapkirin. Lê li ser bingehê wê yekê, ku êzdî li Yekîtîya Sovyet herwiha li Gurcistanê jî dijîn û elfabeya ermenkî nizanin, sala 1929an elfabeya latînî hate sazkirinê, lê ji sala 1941ê da elfabeya kirîlî. Sala 1931ê li Ermenîstanê zanîştgeha mamaostaamadekirinê ya Pişkavkazê ya kurdî hate sazkirin bona kesên ku bi kurmancî diaxivin. Ji sala 1931ê bi zimanê kurmancî rojname ronahî dibînin,

weşanên radyoyê têne belavkirin, ku ne tenê bona êzdîyên Ermenîstanê, lê herwiha ji bo êzdîyên temamîya dinyayê jî bûn.

Mirazê Koçer Mistoyan (pîr, ruhanîyê êzdîyan, karsaz, Kalînîngrad)

- Ez di maleke feqîr da mezin bûme. Ez 13 salî bûm gava diya min wefat bû. Di malbeta me da şeş zaro hebûn û em jî mînanî hemû êzdîyan havînan diçûne zozanan. Ez 4 an 5 salî bûm, me xwe li riya Hankavanê digirt, em li ser palas-pûlûsên makînên barbir rûdiniştin, diçûne zozanan. Li ser halê me yê feqîr da, di pêşî û paşîya makîna me da otobus diçûn. Ji pencereyên wan dêmên gulgeş û bêxem yên hoktêmbêrîkan û pîonêran xuya dikirin. Bi kincên bedew, bi otobûsê cîkî da çûyîn bo min xewnek bû, ku min digot qey wê pêk neyê. Otobûs ser milê rastê diçûn, lê em bi kincîn peritî û pînekirî yên bi herîyê va, nîvbirçî ser milê çepê diçûn û hildikişîyane çiyan. Hema ji wê rojê min qirar kir û sond xwer, ku zarên min wê mînanî van zarokan li otobûsa siwar bin û wê ser milê rastê da herin. Min usa jî fem kir, ku bona wê yekê lazim e baş hîn bibim, ew jî gelekî baş. Min zanibû, ku eger ez di mekteba ermenî da xirab hîn bibim, wê li min bikenin, ezê bibim pêkenî. Min dîtîye, ku çawa zarên ermenîyan ser wan zarên êzdîyan dikenîyan, ku bi lêvkirineke taybet va, ne wek ya ermenîyan, xeber didan. Bi kurtî, xwendina baş bû armanca jîyana min. Ez wê jî bêjim, ku ez gerekê ji zarokên ermenîyan jî çêtir hîn bûbûma, çimkî min fem dikir, ku zanebûn qewatek e xurt e, û ewê hevalên min yên dersxaneyê mecbûr bikira, ku ew qedirê min çawa êzdî bigirin. Min xwesma ziman û edebîyeta ermenkî baş dixwend. Min temamîya edebîyeta ermenîyan ya klasîlk xwendîye.

Sîmon Tsatûryan (nivîskar, pûblîsîst, avûqat, Moskva)

-Dostanîya gelên ermenî û êzdî dostanîyeke taybet e. Dibe di dîrokê da jîyaneke bi hev ra ya edil, dostanî li cîyekî din tunebe. Rehên wê dostanîyê kûr in, ew ji dem û dewranên gelek dûr tên. Dibe rind xuya nabe, lê dîroka me ya mişterek heye, rojên me yên buhurî jî mînanî hev in. Dijwarîyên me jî weke hev bûne, em herdu

jî hatine qirkirinê û ji wana ya here bi qetil jî qirkirina ermenîyan ya mezin e.

Avtor – Civaka êzdîyan di salên 1990î pêrgî warguhastinên mezin bûn. Ji krîza aborî destpêkirî heta hilweşîna Yekîtîya Sovyet,- Mirazê Koçer Mistoyan dibêje.- Berê di malbeta êzdîyan da qîmetê herî buha hebûna jimara pir ya pez-dewaran bû, ku dema maleke teze saz dibû, didane bûk û zavê. Paşê di nav salan da mêr û jin mecbûr bûn jimara wana duqat-sêqat bikin, bona bikaribin cihêzên zarên xwe hazir bikin.

- Kesên ku bi sedan salan bi qeyd û çîdarên edetan va girêdayî bûn, bi carekê ra azadî texmîn kirin. Êdî derheqa wê yekê da ne difikirîn, ku şev nîvê şevê dibe gur bikeve nava pêz, an jî ka debar ji ku dest xin. Û meriv dibê qey me çev da ermenîyan û me xwe li xwendinê girt. Sebeb ew e, ku niha li Ewrupayê û Rûsîyayê bi sedan êzdî xwendinê dest tînin, li dayîreyên cihanê yên here bi nav û deng da dixûnin. Ewledên min ji sala 1993an da li Brûksêlê ne. Gişkan jî xwendina baş sitendine: ewana çend zimanan zanin – îngilîsî, fransî, ermenî jî zanin, çimkî em li mala xwe bivê-nevê ermenî jî xeber didin û em zimanê xwe jî gelekî baş zanin.

Avtor – Ji êzdîyên nisla teze yên li Moskvayê dijîn ra niha bi henekî dibêjin êzdîyên teze. Bona êzdîyên teze qîmetîyên miletîyê û qanûnên ruhanîyê ne tiştên sereke ne. Ewana hewil didin guhdarîya sereke bidine ser xwendinê, bona bikaribin li cihana guhêrî da karê xwe bi serketî bimeşînin. Cemal Hesoyan li herêma Armavîrê ji diya xwe bûye. Ji çar salîyê da li Moskvayê dijî, ûnîvêrsîtêta Moskvayê ya dewletê xilaz kirîye. Hevalên wî li Londonê, Kêmbrîcê, Dûbayê û warên din xwendine.

Cemal Hesoyan (sosîolog)

- Ew êzdîyên xwendin bi dest xistine dikarin kêrî pêşketina civaka êzdîxanê bên. Ew nimûneyeke baş e berî gişkî bona wan hemû êzdîyan, yên ku şika wan li ser serdestîya bidestxistina xwendinê heye, yên xwendî dikarin tesîr li wan bikin. Em dikarin komên hevnaskirinê û hevgirtinê saz bikin bona êzdî rastî hev

bên, hev nas bikin, bi hev ra kar bikin. Mesele, rojnamevanên êzdî dikarin gotaran binivîsin derheqa êzdîyan da. Di jîyana êzdîyên Rûsîya Fêdêral da gelek tişt diqewimin, ku em derheqa wan da tu tiştekî nizanin.

Avtor – Tunebûna dewletê, yekîtîyên miletîyê, rêxistinên civakî yên bi hêz û xurt li ser riya miletê ku xwe li xwendinê girtîye astengên mezin çê dikin. Xebatên zimanzanîyê, lêkolînên dîrokî û kûltûrî lazim in. Wisa, ku ji alîyê hemû êzdîyên cihanê da bêne qebûlkirin. Îro li diyasporên êzdîyan yên cuda-cuda da pirtûk ronahî dibînin, gotar çap dibin, lê ew daxwezên hemû êzdîyan danagirin. Gelek caran ew bi ulmî nayêne îzbatkirin. Sebebê van yekan jî eşîrtî-qebîltîya di nav êzdîyan da ne, ku ji hev çûye jî, lê dîsa jî maye, yek jî jihevdûrbûna diyasporên êzdîyan e.

Zerê Mihoyan (xwendkara Akadêmîya hiqûqzanîyê ya Rûsîyayê)

- Ez li Rewanê ji dayîk bûme, koka min ji gundê Elegezê ye. Ez nevîya akadêmîk Şekroyê Xudo Mihoyan im. Îro pirsgirêka civaka êzdîyan ya sereke ew e, ku derheqa êzdîxanê û dîroka êzdîyan da bawerîyên şaş têne belakirin. Meriv nizane ka ji ku pirtûk derdikevine meydanê, ku bi îzbatîyên dîrokî û analîzên zanyarî va nehatine makkirinê. Hilbet, lêkolînên zanyarî yên giranbuha hene, lê ewana bi tek-tûkan e û bi jimareke biçûk va dertên, ango rind nayêne belakirinê. Ew pirsgirêk dikare bi xwendinê û bi zanyarîyê hel bibe. Bo nimûne, bi destî dibistanên rojên yekşeman. Lê eger em bikaribin dibistanên rojên yekşeman vekin, wê demê emê ber hinek pirsgirêkên din bisekinin, wek tunebûna pirtûkên dersan yên anegor. Bi kurtî, çi jî hebe, çareserkirina pirsgirêkan bi riya xwendinê dibe, bi wê yekê va, ku gencên êzdîyan xwendina baş bi dest xînin.

Avtor – Li Moskvayê cîyê êzdîyan yê rastîhevhatinê û hevnaskirinê dewat in. Dewatên êzdîyan li vira bi heyteholeke mezin va têne derbazkirin. Rêstoranên buha tên kirêkirin, bûk û zava wek qanûn di emirê gihîştî da dizewicin, piştî xwendinê

ra. Merivên wan yên ji cî û warên gelek dûr jî têne dewatê – ji Ewrupayê, Rûsîyayê, Ermenîstanê û Gurcistanê.

Mêls Lezgîyan (bazirgna, Moskva)

- Gava em li Ermenîstanê diman, me erf-edetên xwe rind diparast. Li Moskvayê û herêma Yaroslavlê da weke 10 000 êzdî dijîn. Em li vira jî hewil didin bi erf-edetên xwe ra amin bin, qe na di dewatan da. Em bi vî cûreyî ji bo zarên xwe dibin nimûne, ew çav didine me, bona ew van her tiştan bizanibin û derbazî zarên xwe bikin. Îro dewata keça min e, û hûn bi xwe dibînin, ku ji cî û warên dinyayê yên cuda-cuda nas û dost û merivên me hatine dewatê. Min gazî gelekan ne kirîye jî, wana bi xwe bihîstîye û hatine. Eva yeka me digihîne hev, mecalê dide em rastî hev bên û pirsên cuda-cuda çareser bikin. Mînanî ermenîyan, govenda me jî heye, Koçerîya me heye, ku em di her şahîyekê da direqisin. Ev reqas xwedî dîroka bi hezaran salan in, û bona miletê bê dewlet dikarin bibin sîmvola hevgirtinê, dema meriv destên hev digirin û dikevine govendê, û reqas wana digihîne hev, him bi fîzîkî, him jî bi ruhî. Bi vî cûreyî em xwe xwey dikin û diparêzin. Reqasên me îzbatîyên wê yekê ne.

Mîrzeyê Çolo Siloyan (bazirgan, Moskva)

- Erf-edetên miletîyê bi çûyîn-hatinan va têne parastin, bi rasthatina merivan va. Berê çûyîn-hatin diha gelek bû, zêdetir hev didîtin, şerm hebû, hurmet hebû. Lê niha ji Moskvayê heta Kamçatkayê 10 000 kîlomêtr e, eger dost, qewm û pismam bixwezin jî, wê nikaribin edetên miletîyê biparêzin. Mesele, nav gelê me da hinek pirs hebûn, wek zewaca bi biyanîyan ra, ku qedexe ye. Li Ermenîstanê eger tiştekî wisa bibûya, yekser ew behs bela dibû, wî kesî şermezar dikirin û ew kes şerm dikir, ser hişê xwe da dihat, ne dixwest navê binemala xwe xirab bike. Lê niha, ser dûraya 10000 kîlomêtran, an jî 8000, 5000 kîlomêtran tu kes nizane, ka kê çi dike, çiqasî bi edetên xwe ra amin e.

Samvêl Koçoî (akadêmîkê Akadêmîya hiqûqzanîyê ya Rûsîya Fêdêral)

- Pêşîyên min di nîveka sedsala buhurî da ji warê Aparanê cîguhastî Tbîlîsîyê bûne. Min li dibistana ermenî ya hejmara 104an ya li paytextê Gurcistanê xwendîye. Min zanebûnên xwe yên pêşin bi herfên ermenkî, bi zimanê ermenkî sitendîye, ez bi wî zimanî bi dîrok û kûltûra gelên cihanê û gelê xwe hesiyame. Ez bêjim, ku hemû êzdîyên li ser axa Yekîtîya Dewletên Serbixwe dijîn, esilê xwe va ji Ermenîstanê ne, û niha jî tesîra kûltûra ermenîyan li ser me heye. Her ro guhê me li ser bûyerên li Ermenîstanê ne, lê xanima min ewqas fîlmên ermenî mêze dike, ku ez nikarim pêşîya vê yekê bigirim. Niha jî li Ermenîstanê karê ulm-perwerdeya êzdîyan bi xurtî pêşda diçe.

Avtor – Samvêl Koçoî akadêmîkê Akadêmîya hiqûqzanîyê ya Rûsîya Fêdêral e. Li Akadêmîya hiqûqzanîyê ya Moskvayê xwendîye û xilaz kirîye, hema li wir jî mamostatî kirîye. Rêktorê bingehdar yê Ûnîvêrsîtêta Kîrovê ya Rûsîyayê bûye. Bi pirsên malbetî va girêdayî niha li Moskvayê dijî. Mamostayê Akadêmîya Moskvayê ya hiqûqzanîyê ye, karê zanyarî va mijûl e. Di karê xwe da layîqî navê bilind bûye, çend pirtûkên zanyarî û monografîya nivîsîne, gotarên ser êzdîyan yên ulmî jî çap kirine.

Samvêl Koçoî (akadêmîkê Akadêmîya hiqûqzanîyê ya Rûsîya Fêdêral)

- Êzdî, xwesma ewên ku li Îraqê dijîn, zanin û kubar in, ku bi hezaran salan dînê xwe parastine û ew dîn gorî hîpotêzên zanyarî yên van dawîyan ji Zerdeştîyê jî kevintir e. Piştî warguhastinên di sedsala 12an ra êzdîtîyê ji xaçparêzîyê gelek tişt hilda. Ev yek alî me kirîye em dînê xwe biparêzin. Lê ji alîyekî din va jî ber çavan e, ku li vê cihana globalîze dibe û diguhêre da, êzdîtî hewcê guhartinên teze ye. Piranîya dogmayên êzdîyan yên heta niha heyî, di sedsalên navîn da hatine efirandin û niha ne gorî daxwezên gelê me yên îroyîn in. Em zanin, ku tu kes nikare bibe êzdî. Êzdî ji diya xwe dibin. Êzdî li cihanê ne gelek in û em niha difikirin: belkî lazim e em vê astengê ji holê rakin, bona mecal hebe jimara êzdîyan li cihanê bidine zêdekirinê? Ez ser wê bawerîyê me, ku ruhanîyên

êzdîyan, usa jî her kesê ku bi pirsên dîn va eleqedar in, gerekê li ser vê pirsê bisekinin,

Avtor – Yek ji taybetmendîyên dînê êzdîyan jî ew e, ku ew pareveyî ser eşîretan dibe, ku ji hezaran salan berê da hatîye parastin û ew gihîştîye heta rojên me jî. Dijwar e merî bêje ew yek alî civaka êzdîyan, parastina êzdîtîyê kirîye an zirar dayê? Pirsgirêk hene girêdayî zimên, pirtûkên dersan va. Rêxistinên wisan lazim in, ku bikaribin bi kêmanî di sînorên Yekîtîya Dewletên Serbixwe da bi tevayî van pirsgirêkan çareser bikin.

Samvêl Koçoî (akadêmîkê Akadêmîya hiqûqzanîyê ya Rûsîya Fêdêral)

- Ez bingehê çareserkirina wan pirsgirêkan dibînim. Ne giring e, ka ew çareserî wê li kîjan dewletê bibe. Îro pirsa sereke ew e, ku êzdîtî bi qanûnên hiqûqî, xwesma li Îraqê, wek dîn bê naskirin, wek zerdeştên Komara Îranê ya Îslamîyê bi dînê xwe va têne naskirinê çawa beşeke milet. Ewê firsendê bide êzdîyan ji wan hemû mafan karê kevin, ku biryar hatîye girtin bidine kêmjimarên miletîyê û dînî. Eger em behsa Rûsîyayê bikin, em dikarin bêjin, ku li vir êzdî hêdî-hêdî dikevine nava yekîtîyên kûltûrî û hewil didin di nav xwe da hevgirtinê saz bikin.

Îşxan Ecoyan (sazbend, Yaroslavl)

- Ez ji sala 2005an da bi sazbendîyê va mijûl dibim. Vîola gelek li min xweş tê. Min ew bi temîya bavê xwe hilbijart. Ez piranî sazbendîya klasîk dibihêm. Ez ji Paganînî, Xaçatûryan, Mosart, Bethovên hiz dikim. Ez usa jî sazbendîya gelêrî ya ermenîyan û êzdîyan hiz dikim. Di fikira min da heye li konsêrvatorîya Moskvayê da bixwînim.

Avtor – Bavê Îşxan jî sazbend e. Ew sazbendê koma folklorê ya diyaspora êzdîyan e li Yaroslavlê. Ew koma sazbendîyê di rastîyê da ji neferên malbetekê pêk tê. Endamên komê tevî şahîyên bajêr û yên olka xwe dibin, û hilbet, tevî dewatên êzdîyan û ermenîyan jî dibin, şahîyan dixemilînin. Di bernameyên wan da sitiranên êzdîyan û ermenîyan hene. Êdî 4 klîp derxistine. Sîabend

Siloyan di nav Yekîtîya Dewletên Serbixwe da wênekêşê êzdî yê yekemîn e. Ewî zanîştgeha hunermendîyê ya Rewanê ya ser navê Panos Têrlêmêzyan xilaz kirîye. Dibêje, ku mamostayên wî yên baş hebûne. Weke 20 salan e, ku firçe hilnedaye destê xwe, lê nikaribû demeke dirêj wisa bima, dema pirsgirêkên sosîalîyê hatine çareserkirinê, wî dîsa firçe hilda û bi rengên ermenîyan, bi ruhê êzdîyan wêneyên rûsan kişand. Ew tevî pêşengehan dibe û hunerê xwe nîşanî temaşevanan dike.

Sîabend Siloyan (wênekêş, Yaroslavl)

- Firqî destxet û motîvên rohilatê ne, ango tava heyî, reng û awazên germ û dilnazik. Ewana xweber ji wêne û berhemên rûsan yên wênekêşîyê cuda dibin.

Avtor – Êzdî li Yaroslavlê piranî çêkirçî ne. Kurê Sîabend Siloyan jî çêkirçî ye, lê paşnavê xwe gorî wî welatî guhêrîye, ku lê dijî. Bavê wî Siloyan e, kurê wî Silonî ye. Dayîreya wî ya çêkirçî-xanîlêkiran heye. Lê xwedîyê dayîreya çêkirinê ya here mezin li Yaroslavlê Êdûard Avdalyanê êzdî ye, ku ji gundê Gêtapê, navçeya Ermenîstanê ya Talînê ye. Ew ji sala 1994an li Rûsîyayê ye, parlamêntarê parlamêntoya bajêr e.

Êdûard Avdalyan (parlamêntarê parlamêntoya bajarê Yaroslavlê)

- Wisa qewimî, ku di dema hilbijartinan da tu êzdîyekî dengê xwe neda min. Sebebê wê jî ew bû, ku li ser vê mezîla axê êzdî hema bêje tunene. Û min 5777 deng sitend, piranî jî ji rûsan.

Rojnamevan – Lê we çi kir, ku wana ji te hiz kir?

Êdûard Avdalyan – Min karên baş kirine. Hemwelatîyên min li bajarê min ne hindik in, û ez fikira wan hildidime ser hesêb.

Avtor – Li Yaroslavlê bizîşkên êzdî dixebitin, yek ji wana xîrûrgê tamaran yê bi nav û deng e. Bingehdarê şanoya pantomîmayê ya Rewanê Arsên Polatov jî li vira jîye û li înstîtûta bajêr ya têatroyê da mamostatî kirîye. Ew li goristana Yaroslavlê hatîye binaxkirin.

Fezîr Polatov (serkarê diyaspora êzdîyan li Yaroslavlê)

- Yekîtîya me ya kûltûrîyê ya Yaroslavlê li Rûsîya Fêdêral

rêxistina êzdîyan ya pêşin e. Ew sala 1996an hatîye qeydkirinê. Armanca me ya sereke parastina kûltûra û zimanê êzdîyan e, xweykirina erf-edetên êzdîyan e. Li Rûsîyayê em yên pêşin bûn, ku me komên êzdîyan yên sitiranbêjîyê û reqasê dane sazkirinê, ku tevî şahîyên bajêr jî dibin. Bi saya serê karê me binecîyên vira pê hesîyan, ku gelê êzdî heye. Bi saya serê me ewana bi kûltûra êzdîyan ra bûne nas.

Avtor – Li bajêr û herêmê da weke 6 000 êzdî hene, lê di parlamêntoya bajêr da du nûnerên me hatine hilbijartin.

Yêvgênî Ûrlaşov (serekbajarê Yaroslavlê)

- Mîxaîl Xalatyan du caran wek parlamêntar hatîye hilbijartin, lê Êdûard Avdalyan berî çar salan hatîye hilbijartin. Qedir û hurmeta herduyan jî di nav gel da pir e. Ewana bi pêşekê xwe va çêkirçî ne: riyan, xanîyan, avahîyan çê dikin. Wana dema hilbijartina min da alîkarîya min kirin. Bajarê me pirmilet e: li vir gelek ermenî, ûkraînî, êzdî dijîn, ku hemû jî întêgreyî nava jîyana bajêr ya aborî û kûltûrî bûne. Di navbera wan da pirsgirêkên miletîyê dernakevin. Çiqasî ez zanim, li bajarê Tûtayêvoyê 6 000 nişteçî hene, piştî rûsan koma miletîyê ya here mezin êzdî ne.

Avtor – Tûtayêv bajarekî biçûk e, li rex çemê Volgayê ye. Li vira êzdîyê herî bi nav û deng Borîs Lazgîyan e. Li Rewanê ji diya xwe bûye, dibistana ser navê Parûyr Sêvak ya navîn xilaz kirîye. Xwendina bilind li Rûsîyayê sitendîye, li Rewanê kar kirîye. Ji sala 1990î li Rûsîyayê ye: bazirgan e, bûye parlamêntar. Serwêrê karxaneya caw û qumaşan e, ku karxaneya Tûtayêvoyê ya here mezin e. Di ênsîklopêdîya "Welatîyên Rûsîyayê yên herî baş" da, ku bi bangawazî û pêşgotina serokkomarê Rûsîyayê Pûtîn hatîye çapkirin, navê Borîs Lazgîyan jî derbaz dibe û li wir jînenîgarîya wî jî heye.

Borîs Lazgîyan (karsaz, Yaroslavl, Moskva)

- Hilbet, em li Ermenîstanê ji diya xwe bûne û mezin bûne. Bingeha me li Ermenîstanê ye. Û, hilbet, em difikirin ka îro rewş li Ermenîstanê çawa ye, mirov çawa dijîn, jîyana wan çawa ye.

Em wek binecîyên Ermenîstanê, ku li ser axa wê ji diya xwe bûne, mezin bûne, hatine perwerdekirin, hilbet me pevgirêdanên xwe bi wê ra nedaye qutkirin, û li wir mala me ya kal û bavan û mala min jî heye, û pêwendîyên me bi wir ra pir xurt in. Her sal, hinek caran ser 3 mehan, ez havînan bi malbeta xwe va, bi nevîyên xwe ra diçime Ermenîstanê, ez hêsabûna xwe bi mirovên xwe ra derbaz dikim. Lê kurê min, ku li Londonê xwendîye, gavên bîznêsê yên pêşin li Ermenîstanê dike. Em çima gerekê derheqa Ermenîstanê da nefikirin û wêya pêşda nebin? Ne axir ew paşeroja me ye, em gelek dixwezin, ku zarên me vegerine Ermenîstanê. Me dest bi bîznêsê jî kirîye, em gelek xwe li Ermenîstanê digirin, çimkî hewa wira, her tiştê wira ber dilê me ezîz e. Ez gelek dixwezim, ku Ermenîstan gulvede, pêş bikeve, qewil û şert ewqas baş bin, ku em hemû jî bikaribin vegerine Ermenîstanê û tenê derheqa pêşketina wê, derheqa axa me da bifikirin, ku em li wir ji diya xwe bûne û mezin bûne. Ew bona me pir giring e.

Mîrzeyê Çolo Siloyan (bazirgan, Moskva)

- Bi rastî jî êzdî li Ermenîstanê zîl didin û gul vedidin, heyetîya xwe ya miletîyê diparêzin. Û himberîhevkirina wan bi Azirbêcanê an jî Gurcistanê ra ne mumkun e. Wextekê li Azirbêcanê zêdeyî 100 hezar kurd hebûn. Wana gişkan asîmîle kirin, kirin azirî, otonomîya bi navê "Kurdistana Sor" hebû, ku li wir tenê kurd diman. Wan gişkan kirin azirî. Di nasnameyên wan da nivîsîn "azirî". Gotina "kurd" ji holê rakirin. Li Gurcistanê usa nîbûye, lê li Gurcistanê ew îmkan tunebûn. Şertên usa tunebûn, ku li Ermenîstanê hebûn: radio hebû, rojname hebû. Em îsal çûne Kurdistanê, Kurdistana Îraqê. Em rastî Barzanî û karmendên wî hatin û me derheqa wê yekê da xeberda. Wana li wir jî bi pesin derheqa ermenîyên file da xeber didan (ewana ji ermenîyan ra dibêjin file). Digotin, ku ermenî dostên wan in, merivên wan in. Wana hertim digot, ku Ermenîstan welatê tek-tenê bûye, ku mecal saz kirine bona miletê me.

Avtor – Yek ji heyranê weşanên radyoya Rewanê baylozê Îraqê li Rûsîya Fêdêral Faûx Nerwey bûye.

Faûx Nerwey (baylozê Komara Îraqê li Rûsîya Fêdêral).

- Di salên serokatîkirina Seddam Huseyn da derheqa birayên me yên li Ermenîstanê dijîn, derheqa hal û wextê dinyayê da em berî gişkî ji "Radyoya Rewanê" pê dihesîyan. Ew weşanên radyoyê di karê tevgera me ya azadîxwezîyê li Îraqê, hişyarkirina gel da roleke mezin lîstin. Li me qedexe kiribûn bi zimanê dayka xwe sitiranan bêjin, lê me ji radyoya Ermenîstanê ew sitiran dibihîstin. Desthilta Huseyn guhdarîkirina "Radyoya Rewanê" gunehkarî hesab dikir, lê me bi surî guh dida wan weşanan.

Avtor – Bi hezaran mirov bona guhdarîkirina "Radyoya Rewanê" hatine mehkemekirin û girtinê. Ez heta niha jî fem nakim, ka bona çi ji bo eynî karî yekî bi 3 salan va ceza dikirin, yekî dine bi 7 salan va,- bayloz bi henek dibêje.

Ji Kurdistana Îraqê, ku welatê êzdîyan yê dîrokî ye û ziyareta wan ya sereke – Lalişa Nûranî li wir e, êzdî bi jimareke mezin va berê xwe didine Almanîyayê. Lê him li Awrupayê, him jî li Rûsîyayê tirsa asîmîlebûnê mezin e. Mîrzeyê Çolo Siloyan ser wê bawerîyê ye, ku di vî karî da warê herî bê xeter Ermenîstan e. Ew dixweze, ku wezareta diyasporê ya Ermenîstanê êzdîyên diyasporê jî bike nava bernameyên xwe, ku ji wana çend kes êdî li Ermenîstanê dest bi karê bazirganîyê kirine, gelek kes jî bona destpêkirina bîznêsê lêkolînan dikin. Û ji bo pêşî li derketina êzdîyan ji Ermenîstanê bigirin, bi pereyên Mîrzeyê Çolo Siloyan li herêma Armavîrê bi nimûneya ziyareta li Lalişê ziyareta êzdîyan ya dudan li cihanê tê çêkirinê.

Mîrzeyê Çolo Siloyan (bazirgan, Moskva)

- Li warên dinyayê yên cuda-cuda êzdî dimînin, lê Ermenîstan welatê pêşin e, ku li wir ziyaret tê çêkirin. Armanca wê ya sereke ew e, ku gelê xwe yê êzdî bi Ermenîstanê, bi welatê me, bi wetenê me yê kaw û kubar ra bidine girêdanê. Armanca pêşin ew e, lê ya dudan, ku nisleta me, ku neçûye Îraqê û ziyaretên me nedîtine, vê ziyaretê bibînin û wana bînine ber çavan, tevî eyd û erefatan bibin, wana bibînin û jê hîn bibin. Evê bibe xeleqeke pevgirêdanê

di pêwendîyên navbera êzdîyan û ermenîyên bira da, ne axir em li vî welatî wisa xweş dijîn, wek ku ermenî dijîn. Ermenîstan welatê me ye jî.

Cemal Hesoyan

- Êzdîyên nisleta nû, yên ku ne li Ermenîstanê ji diya xwe bûne, Ermenîstan welatê xwe hesab dikin. Goristanên kal û bavên me li wir in, li malên me tiberkên me, ocaxên me yên miletîyê têne parastinê. Û her êzdîyek borcdar e here ser mezelên merivên xwe û di ocaxa xwe da dua bike. Cara dawî, gava hatime Ermenîstanê, diya min hîvî kir ez wê bibime çiyayên Cêrmûkê, ku di zarotîyê da ew li wir diçûne zozanan. Diya min li ser gîha rûniştibû û digirîya: ew hatibû welatê xwe. Rast e, em niha binecîyên Rûsîyayê ne, lê gava têne Ermenîstanê, xwe perçekî Ermenîstanê texmîn dikin. Lema jî ez bi vê kasê eşqê hemû ewledên Ermenîstanê, çiyayên me, avên me vedixum. Bira welatê me – Ermenîstan mînanî çiyayên me qewîn û qedîm be. Ez ji welatê xwe, ji welatê me yê muşterek ra aşîtîyê dixwezim, çimkî ez jî, hemû êzdîyên me jî em dibêjin: Ermenîstan welatê me ye, çimkî em li Ermenîstanê ji diya xwe bûne û mezin bûne.

Avtor – Di nava dîroka xwe ya bi hezaran salan da êzdî tûşî qetilê, kuştinê bûn, ketine nava şerê mayîn-mirinê. Ewana ne şikestin û zimanê xwe, kûltûra xwe û dînê xwe parastin. Li ser erf-edetên xwe yên kevinare man û ew xwey kirin. Xwedayê mezin ji vî miletê biçûk, kubar û rehm ra gotîye: "Hûn bi bawerîyên xwe, bi gotin û karên xwe yên qenc va li vê dinyayê her hebin".

Rewan-Moskva-Yaroslavl
Bahara sala 2012an

EZDIKI.COM

Hisreta welêt di dil da

Her kes zane, ku îro bi hezaran êzdî li cî û warên Rûsîyayê yên cuda-cuda da dijîn. Û demên dirêj: hinek ji 20 salan zêdetir. Piranîya wana bi cî û war bûne, bûne mal-hal, xwedî kar in. Her yek ji wana di koma xwe da xwedî qedir û hurmetê ye, bûne beşek ji civakê, bi şahî û şînên gel va dijîn. Hilbet, bi van hemûyan ra tevayî tu kes ji wana dêm û bengzê xwe yê miletîyê winda nake. Ewana êzdî dimînin, bi erf-edet û eyd-erefatên xwe va. Lê tenê derdekî wan kesan heye – hisreta di hindava welêt, Ermenîstanê da. Di vê pirsê da welatîyên me belengaz in, çimkî bêrîya welatê xwe dikin û hertim xwestina wan ew e, ku herine Ermenîstanê, seredana qewim-pismam û hevalên xwe, herine ser mezelên mirîyên xwe. Û ewana bi kêmanî salê carekê vê yekê dikin. Meriv dibêje qey min dest pê kir bi kurtî ji we ra şirove bikim, ka di bingehê fîlma vîdêoyê ya bi navê "Hisreta welêt di dil da" çi heye. Koma efrandarîyê ya "Kartsik" bi rezadilî ew film daye me bona em di vê pirtûkê da naveroka wê raberî xwendevanên xwe bikin.

Avtor – Tevlihevîyên sîyasî, xiringêleya aborî, guhartina destkeftîyên miletîyê û hemmerivayê, hilweşîna dostanîya ku di navbera gelên ji cî û warên Yekîtîya Sovyet diman da hebû, ku di salên 1990î da li ser axa Yekîtîya Sovyet qewimîn, gîhandine wê yekê, ku bi hezaran binecîyên Ermenîstanê cî û warên xwe hîştin, koçber bûn. Bona perê nanê rojê derxin, bi hezaran êzdî jî ji Ermenîstanê derketin.

Gelo welatîyên me yên êzdî li ku û çawa dijîn, gelo di hindava tirsa ji holê rakirina qîmetîyên miletîyê û ruhanîyê çawa ber xwe didin? Ewana çawa û bi çi qederê bi Ermenîstanê, bi ermenîyên

SEREDANA SEREKÊ RUHANÎ YÊ HEMÛ ÊZDÎYÊN DINYAYÊ BIRÊZ MÎRÊ MÎRAN TEHSÎN BEG LI ERMENÎSTANÊ; SAL 2012, ÎLON



Li ber mêvanxaneya Rewanê ya "Golden - Palas" pêşwazî li serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê, birêz Mîrê Mîran Tehsîn Beg û kesên bi cenabê wî ra hatî dikin



Mîrzeyê Çolo Siloyan pêşîya mêvanê qedirbilind da diçe



Keçika êzdî ya biçûk wek edet nan û xwê kerem dike



Zarok bi merîfeta xwe va hurmeta mêvanê qedirbilind digirin



Nûnerên desteya ruhanî ya bilind ya ji Lalişê hatî – serekê ruhanî yê Lalişa Nûranî Bavê Şêx û serekê qewalan Bavê Gavan



Nûnerên desteya bilind ya ruhanî ya Lalişê



Mîrzeyê Çolo Siloyan bernameya rojê raberî
Mîrê Mîran Tehsîn Beg dike



Li Sîsêrnakabêrdê:
hazir dibin herine ber Heykelê bona şehîdên qira ermenîyan



Gulan datînin ber heykelê şehîdên qira ermenîyan





Hurmetgirtina li ber agirê nevemirî yê li Sîsêrnakabêrdê



Mîrê Mîran Tehsîn Beg li Sîsêrnakabêrdê bersva pirsên rojnamevanan dide



Hevpeyvîn li Sîsêrnakabêrdê



Mêvandarîya li herêma Armavîrê: Mîrê Mîran Tehsîn Beg, serekê herêmê Aşot Xahramanyan û Mirazê Koçer Mistoyan (Kalînîngrad)



Mîrê Mîran Tehsîn Beg li ber rêzeheykelê "Serdaravê"



Tacê gulan ji bo bîranîna şehîdên têkoşîna mêrxasîyê ya Sardarapatê



Mêvanên qedirbilind li gundê Nalbandyan li herêma Armavîrê



Pêşwazîkirina bi nan û xwê



Dua li nan û xwê tê kirin

EZDIKI.COM



Rasthatina serekên ruhanî yên herdu cimaetan Garêgîn B û Tehsîn Beg li dêra ermenîyan ya sereke li Êcmîadzînê 28ê îlonê sala 2012an



Sohbeteke germ û ji dil derheqa dostanîya bi sedsalan ya herdu cimaetan da



Mîrê Mîran Tehsîn Beg "Încîla" kevin ya berî gelek salan çapkirî pêşkêşî birêz Garêgîn B dike



Serekê ruhanî yê ermenîyan Garêgîn B bi dilovanî wê pêşkêşa giranbuha qebûl dike



Herdu serekên ruhanî demekê ketine nava xeyal û mitaleyan



Serekê ruhanî yê ermenîyan rûpelên "Încîlê" weldigerîne



Di destê serekê ruhanî da wêneyê Lalişa Nûranî ye



Serekên ruhanî berî xatirxwestinê



Herdu serekên ruhanî ji hev ra xweşbextîyê û oxira xêrê dixwezin



Endamên dêlêgasyonê ji serekê ruhanî yê hemû ermenîyên dinyayê ra gotinên razîbûnê û şêkirandinê dibêjin



Endamên dêlêgasyonê cem serekê ruhanî yê hemû ermenîyan



Fotoya bîranînê piştî hevdîtina bi serekê ruhanî yê ermenîyan ra



Endamên dêlêgasyonê ji dêra ermenîyan ya sereke derdikevin



Endamên dêlêgasyonê ber derê qesira metranê hemû ermenîyan

SEREDANA SEREKÊ RUHANÎ YÊ HEMÛ ÊZDÎYÊN DINYAYÊ BIRÊZ MÎRÊ MÎRAN TEHSÎN BEG LI ERMENÎSTANÊ; SAL 2012, ÎLON



Mîrê Mîran Tehsîn Beg bi kurê xwe – Hazim li ber derê Qesira ruhanî ya sereke.



Endamên dêlêgasyonê li Qesira ruhanî ya Êcmîadzînê



Qebûlkirina mêvanan li hukumeta Komara Ermenîstanê



Serekwezîrê Komara Ermenîstanê Tîgran Sargsyan û serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê Tehsîn Beg bi hev ra sohbetê dikin



Axavtina serekbajarê Rewanê Taron Margaryan derheqa êzdîyên paytextê Ermenîstanê û navbenda êzdîyan ya kûltûrîyê da ne, ku tê plankirin çê bikin



Bona endamên dêlêgasyonê hewaskar e bi paşeroja Rewanê ra bibine nas



Rasthatin tevî cîgirê parlamêntoya Komara Ermenîstanê Êdûard Şarmazanov



Têma sohbeta li Parlamêntoya Komara Ermenîstanê pirsgirêkên kûltûrîyê-perwerdeyê yên miletên kêmjimar in



Li gundê Aknalîçê li herêma Armavîrê, ku ziyareta êzdîyan li wir e, pêşwazî li Mîrê Mîran Tehsîn Beg dikin.



Serekê dînê êzdîyan bi duakirinê pîyê xwe davêje ziyareta nûçêkirî

EZDIKI.COM



Duakirina ziyaretê ji alîyê serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê û desteya ruhanî ya bilind da



Dîdemek ji wextê duakirina ziyaretê



Di dema duakirina ziyaretê endamên desteya bilind dua-dirozgeyan û sitiranên dînî dibêjin



Duakirina Ziyaretê xilaz bûye: Ziyareta êzdîyan li Ermenîstanê rastîyek e



Pey duakirinê ra xweşbextîyê ji hevdu ra dixwezin



Dua li Xwedê dikim: tu edlayê û dostîyê bidî me



Bi hezaran kesên berevbûyî bi dilxwezî serekê ruhanî yê hemû êz-dîyên dinyayê Mîrê Mîran Tehsîn Beg silav dikin



Duayeke bêdeng li Ziyareta teze



Bi hezaran kes li Ziyareta êzdîyan ya Aknalîçê





Serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê, birêz Mîrê Mîran Tehsîn Beg bi xeberdana bi duayan berê xwe dide miletê berevbûyî



Serekê herêma Armavîrê Aşot Xahramanyan ber haziran xeberdana xwe ya silavkirinê dibêje



Metran Artak Sîmonyan (ji milê Armavîrê) silavên dêra ermenîyan ya Arakêlakan digihîne miletê berevbûyî



Mîrzeyê Çolo Siloyan xeber dide



Reqasa miletîyê ji şahîyên êzdîyan kêm nabe



Mêvanên ji Moskvayê govend xweş kirine



Sazbendîya ser dereceya hunermendîyê ya bilind govend giran dike



Her kes direqise



Foto bona bîranînê: bi dostên kevin û teze va



Pey mêzekirina fîlma "Êzdî: ewledên Royê" ra serekê koma fîlmkişandinê Sêrgo Yêrîtsyan dîyarîyan pêşkêşî Mîr Hazim dike



Pey mêzekirina fîlma "Êzdî: ewledên Royê" ra serekê koma fîlmkişandinê Sêrgo Yêrîtsyan dîyarîyan pêşkêşî Mîrzeyê Çolo Siloyan dike



Fîlma "Riya ku ber bi Ziyaretê dibe" tê kişandinê. Hevpeyvîn bi Pîr Mirazê Koçer Mistoyan ra (Kalînîngrad).

SEREDANA SEREKÊ RUHANÎ YÊ HEMÛ ÊZDÎYÊN DINYAYÊ BIRÊZ MÎRÊ MÎRAN TEHSÎN BEG LI ERMENÎSTANÊ; SAL 2013, ÎLON



Di dema kişandina fîlma vîdêoyî ya "Riya ku ber bi ziyaretê dibe"



Hevpeyvîn bi Bekir Sedûnyan ra



Pey dîtina fîlma "Êzdî: ewledên Royê" ra fikirên xwe pevdiguhêzin



Fîlma vîdêoyî ya "Riya ku ber bi ziyaretê dibe" tê kişandinê: hevpeyvîn bi Hesen Hesenyan ra



Rojnamevan Ovsanna Madatyan bi bazirganê ji Moskvayê Borîs Lezgîyan ra ketîye nava sohbetê



Êzdîyên bedew – Emîne, Mîdîya û Cemîle



Fikir pey dîtina fîlma vîdêoyî ra: Miraz Broyan (Sankt Pêtêrbûrg)



Qîmetkirin derheqa dostanîya ermenîyan-êzdîyan da: Samvêl Koçoî (Moskva)



Naveroka fîlmê bi dilê bazirgan Zado Cindoyan (Tvêr, Rûsîya) e: welatê wî Ermenîstan e



Advokatê ji Moskvayê, nivîskar-pûblîsîst Sîmon Tsatûryan derheqa wê dostanîya ermenîyan-êzdîyan da xeber dide, ku dervayî Ermenîstanê berdewam dibe



Bazirganê ji Moskvayê Borîs Lezgîyan
îdî zû-zû tê Ermenîstanê



Serkarê rêxistina civakî ya bi navê "Yekîtîya êzdîyan ya miletîyê "Mîdîya-Şengal" Emo Şeroyan şa ye, ku li Ermenîstanê îdî Ziyareta wan heye



Bi bawerîya Yûrî Dasinîyê ji Moskvayê, ku li Tbîlîsîyê ji diya xwe bûye û mezin bûye, Ziyaret di wextê xwe da û li cîyekî rast hatîye çêkirinê



Bona Mêls Lezgîyan (Moskva) pêwendîyên bi rehên miletîyê ra ber dilê wî tiştekî ezîz e



Rewan êvarê: Reqasa ji ber xwe va piştî şahîyê



Çelengîya reqasa miletîyê didine kivşê



Gişk direqisin



Merivên di emir da mezin direqisin



Mêvanîya cem wezîra kûltûrayê ya Komara Ermenîstanê Hasmîk Poxosyan



Mîrê Mîran Tehsîn beg pirsgirêkên êzdîyan yên di hêla kûltûrîyê-perwerdeyê da raberî wezîra kûltûrayê ya Komara Ermenîstanê dike



Pevguhastina fikiran demeke dirêj kişand



Xatirxwestina bi gotinên şêkirdarîyê va



Mêvandarîya li wezîreta karên der ya Komara Ermenîstanê



Cîgirê wezîrê karên der ya Komara Ermenîstanê Sêrgêy Manasêryan pêşwazîya Mîrê Mîran Tehsîn beg dike



Mîrê Mîran Tehsîn beg dixweze danûsitendinên Ermenîstanê-Îraqê xurttir bibin



Nûnerên desteya bilind ya Lalişê di dema rasthatinê



Rêwîtîya ber bi herêma Aragasotnê



Li gundê Sengerê, herêma Aragasotnê



Ha pêşwazî li serekê ruhanî dikin



Dualêkirina Mîrê Mîran Tehsîn beg



Mîrê Mîran Tehsîn beg bi gotina silavkirinê va berê xwe dide nûnerên olkê



Di bin kon da milet kimkimî ye

SEREDANA SEREKÊ RUHANÎ YÊ HEMÛ ÊZDÎYÊN DINYAYÊ BIRÊZ MÎRÊ MÎRAN TEHSÎN BEG LI ERMENÎSTANÊ; SAL 2012, ÎLON



Ev zaro ji vira bala xwe didinê ka li gundê wan çi diqewime



Keça êzdîyan bi vî cûreyî bala xwe dide vê rasthatinê



Hêsabûneke demkurt di bin siya daran da



Mîrê Mîran Tehsîn beg û Bavê Şêx pey rasthatinê ra fikiran pevdiguhêrin



Rasthatineke ji nişkêva: tûrîstên ji Îsraêlê wêneyên seredana desteya ruhanî digirin û bala xwe didine wan



Kesên ji welatên der hatî jî direqisin



Li vira jî reqasa miletîyê perwaz da



Dengê zurneyê demeke dirêj di guhê her kesî da dike zingîn



Mezin û biçûk direqisin



Şahîyên êzdîyan bêy reqasan derbaz nabin



Serekê ruhanî yê kemal û zane – Mîrê Mîran Tehsîn beg.



Wêneyekî bîranînê bi kesên ruhanî ra



Du giregirên ruhanî yên Lalişê – Bavê Gavan û Bavê Şêxbilind ya ruhanî ya êzdîyan pir hewaskar e



Xeberdana karmendên ermenî yên derece bilind bona nûnerên desteya bilind ya ruhanî ya êzdîyan pir hewaskar e



Hevpeyvîna rojnamevan Hraçya Papîkyan bi Mîrzeyê Çolo Siloyan ra: fîlma "Riya ku ber bi ziyaretê dibe" tê kişandin



Opêrator Samvêl Galstyan guhdar li bûyeran mêze dike: kadrên dawî yên fîlma "Riya ku ber bi ziyaretê dibe" têne kişandin.

welatîyên xwe ra girêdayîne? Pirsên ha gelek caran têne kirinê. Em hewil bidin bersîva wan bidin. Îvanovoya wextekê navbendeke senaya têkstîlê ya Yekîtîya Sovyet ya here mezin bû û li vir bi hezaran gencên ji cî û warên welêt yên cuda-cuda kar dikirin. Îvanovo îro jî pirmilet e. Li vir weke 15 000 ermenî û 500 êzdî dimînin, ku hemû jî ji Ermenîstanê hatine vira.

Têlman Fêroyan li gundê Argavandê, herêma Armavîrê ji diya xwe bûye. Sala 1982an çûye eskerîyê, piştî qulixkirina di eskerîyê da li Rûsîyayê maye, li Îvanovoyê bi cî bûye. Li vira ew bazirganekî deverê yê herî mezin e, parlamêntarê parlamêntoya deverê ye, yek ji merivên herî hurmetlî ye, bi wê ra tevayî karê xizmetguzerîyê jî dike, alîkarîya kesên destteng û feqîr dike. Ji salên 90î da karê çêkirina riyan dike. 95 selefê karê çêkirina rêyên bajêr û deverê li ser milê wê dayîreyê ye, ku ew serokatî lê dike.

Têlman Fêroyan (bazirgan, binecîyê Rûsîyayê, Îvanovo) – Di salên 30î da li deverê rewşeke giran hatibû sazkirinê, senayî kar ne dikir, nangiranî bû, hela di ser da jî, welatîyên me dest pê kirin terka welatê xwe dan, gelek ermenî û êzdî hatine vira û pirsgirêkên hemûyan yên sosîalî, nasnameyê û sitarê hebûn. Ez, ku berî wana hatibûm vira, min borcê xwe dihesiband bi karê xwe ra tevayî bi karên wana va jî mijûl bibim. Bira wek pesin neyê qebûlkirin, lê di wî alî da min karekî êpêceyî mezin kir.

Avtor – Bazirganî, qazanckirina pereyên mezin tesîr li ser Fêroyan ne kirine, ku ew alî kesên di tengasîyê da bike. Gênên miletîyê, yê alîkarîkirina merîyan, serketina di hindava dijwarîyan da, ku eva êdî 5000 sal in hinkûfî vî miletê xebathiz û kevinare ye, derbazî Fêroyan jî bûye. Ewî xwe li wê rê ne girt, ku kîsî xelkê dewlemend be. Ber wî pêşnîyar kirin, ku bibe xwedîyê navbenda kirîn-firotanê ya bi navê "Topol" û pereyên baş qazanc bike, lê ewî xwe li wê rê ne girt û nexwest bibe sebebê bi sedan kesên, ku dikaribûn bê kar bimana.

Têlman Fêroyan (bazirgan, binecîyê Rûsîyayê, Îvanovo) – Dewsa vî avahîyî bi dehan xanîyên nîvhedimî bûn. Bona ew bêkêr bihatana hesibandin, minê tenê hinek pere bida û xilaz. Lê ez wisa

nikarim bixebitim. Min bona hemû malbetên xwedî wan xanîyan li cîyên wana dixwest, ji wan ra xanî kirî, ew jî bi buhayê sûkê, min pirsgirêkên wana çareser kir, dû ra min dest pê kir reng û rû bidime vê mezîla bê ser û ber û min li wir avahîyekî mezin çê kir. Dema ez avahîyê dudan jî çê bikim, mezîla herduyan bi hev ra wê bike weke 7200 mêtrên çargoşe.

Navê yek ji Xwedayên êzdîyan yê sereke li dayîreya Fêroyan ya çêkirinê kirine. Rêvebirê dayîreyên çêkirinê Êdûard Avêrî ye, ku ew jî êzdî ye û li Ermenîstanê ji diya xwe bûye. Êdûard jî dû wesyet û daxwezên Fêroyan diçe: çiqas ji destê wî tê karên bi maeşên baş dide kesên ji Ermenîstanê hatî – ermenîyan û êzdîyan.

Êdûard Avêrî (bazirgan) – Îro cem min 70 ermenî û êzdîyek kar dikin. Ew tê wê maneyê, ku min ewqas meriv ji bêkarîyê xilaz kirîye û maeşê baş didime wan. Ez şa me, ku ewana bi karê xwe va me rûspî dikin.

Avtor – Têlman Fêroyan herwiha di nav karê rêvebirina arzîtîya dewletê da jî hatîye wergirtin. Dîwana herêmê texmîn kir, ku ew xebatkarekî destemel e, hebûna xwe ya federal – germoka bi 45 hêktaran, ku li herêmê bi mezinaya xwe va ya tekane ye, teslîmî Fêroyan kirin, ku ew bi rê va bibe. Çawa li Ermenîstanê, li vira jî di nav hasileta malhebûna gund da ya here giranbuha hasileta germokan e.

Têlman Fêroyan (bazirgan, binecîyê Rûsîyayê, Îvanovo) – Sala par me bona ji nisleta nû ra germokan çê bikin, me gelek pere xistine nava wî karî û me gelek demûdezgên here nûjen kirîn. Em li vira mecbûr in gelek êlêktrîkê bi kar bînin, ji ber ku 10 mehên salê dinya ewrayî ye û ro kêm dertê û di rûyê wê yekê da em zirarên mezin dibînin. Mesele, himberî rojên ewrayî di rojên sayî da du caran zêde ekin tê sitendin. Di nêta me da heye em zûtirekê aletên tîna royê yên hinartî bi cî bikin, lê ew jî pereyên mezin dixweze.

Avtor – Ekinê germokan li ser tevaya mezîla Rûsîya Fêdêral tê firotanê, ji Moskvayê bigire heta Rohilata dûr. Îrîna Nîkolayêva eva weke 30 salan e, ku di vê germokê da kar dike.

Îrîna Nîkolayêva (cîgira serwêrê sereke) – Ev germok ketibû rewşeke teng û ber windabûnê bû: mecala me tunebû karê germokê berdewam bikin, ji ber ku tam ji hal ketibû. Ez nizanim ka wê çi biqewimîya, eger Têlmanê Emo xwe neda ber wî karî.

Avtor – Têlman Fêroyan du caran hatîye hilbijartin wek parlamêntarê parlamêntoya herêmê. Dema me seredana wira kir, haziraya parlamêntarîyê ya cara 3an dikirin. Binecîyên warê biçûk yê bi navê Koxa hîvî dikirin warê wan bê şênkirin û tundurustkirinê.

Endamên sere yên olkên ermenîyan û êzdîyan girêdayî roja komara Ermenîstanê ya pêşin ra xeber didin. Têlman Fêroyan û bazirgan Sos Martîrosyan hurmetname û xelatên peretî didine wan gencên ermenîyan û êzdîyan, ku sala par di hêla sportê û kûltûrayê da berbiçav ketine. Di nav xelatgiran da ne usa jî dengbêj Karîna Sûltanyan, ku xelatgira pêşbirkên herêmê, Rûsîyayê û navnetewî ye. Karîna êzdî ye û ew kilamên ermenî û yên êzdîyan distirê.

Sêrgêy Paxomov (Rûsîya Fêdêral, Îvanovo, sedirê parlamêntoya herêmê) – Em rind zanin ka Rûsîya pirmilet çi ye. Em guhdarîya mezin didin ser pirsên navmiletî. Bal me edil e, her kes rehet e. Carina pirsgirêkên miletîyê yên cuda-cuda derdikevin, em gelek zû lêkolînan dikin, merivên olkan yên xwedîqedir berev dikin û bi destî wan her mesele hel dikin. Usa jî bi saya serê karmendên olkê yên mînanî Têlman Fêroyan e, ku cem me her tişt rehet û edil e.

Avtor – Berî 5 salan civîna olkên ermenîyan û êzdîyan hate derbazkirin. Li wir pêşnîyar hate kirinê dêra ermenîyan çê bikin. Pirsa sitendina xwelîyê hebû. Têlman Fêroyan bi destî dîwanên herêmê û bajêr pirsa çareserkirina wê meseleyê hilda ser xwe. Û 27ê gulanê, di roja cejina bona komara pêşin ya Ermenîstanê, sedirê parlamêntoya herêma Îvanovoyê Sêrgêy Paxomov biryara çêkirina dêrê da destê serokê diyaspora ermenîyan.

Têlman Fêroyan (bazirgan, binecîyê Rûsîyayê, Îvanovo) – Di van salên axirîyê da em him bi êzdîyên Ermenîstanê ra, him jî yên temamîya dinyayê ra di nav pêwednîyên baş da nin. Ewledê

gelê me yê hêja Mîrzeyê Çolo Siloyan 5 salan dû hev kete nava hevraxeberdanan heta gihîşte wê yekê, ku Mîrê Mîran Tehsîn beg razî bû li welatê me – Ermenîstanê ziyareta êzdîyan çê bike. Ew yek me bi awayekî gîhandîye hev û em diha zêde diçine Ermenîstanê. Meriv wisan e, ku dema mezin dibe, xwe ber bi warê jidayîkbûna xwe digire.

Avtor – Di nêta Têlman Fêroyan da heye ziyareteke êzdîyan jî li Îvanovoyê çêke. Bona wî meremî ewî êdî xwelî jî hildaye.

Têlman Fêroyan (bazirgan, binecîyê Rûsîyayê, Îvanovo) – Mesele, îro em êzdî gelekî dixwezin ziyareteke wan ya wisa hebe, ku zarokên me bikaribin herine wir û erf-edetên xwe biparêzin.

Avtor – Ermenî û êzdî herwiha li bajarê Çêrnyaxovskê, li herêma Kalînîngradê jî peyda bûn. Mirazê Koçoyê Mistoyan li vir mêvanxaneyeke 4 steyrkê ya pir ciwan çê kirîye.

Mirazê Koçer Mistoyan, (binecîyê Rûsîyayê, bazirgan, Kalînîngrad) – Ji min ra têlêfon kirin û gotin, ku li vir kombînateke goşt ya ji hal ketî heye. Li Moskvayê karxaneyeke min a rûvîyên dagirtî hebû. Gerekê ew kombînata mezin carek din kar bikira. Û ez bo wî karî hatime vira. Piştî şeş mehan me ew kombînat careke din rakire ser pîyan û me deranîn da. Dû ra ji serokatîya bajêr ber min pêşnîyar kirin, ku ez avahîyê mêvanxaneya kevin, ku berê ser navê Yekê Gulanê bû, bikirim. Axirîyê, min ew xanîyê hedimî û weke kelefeyan kirî û dewsa wî yekî teze çê kir.

Avtor – Li herêma Kalîlîngradê, wek ku li tevaya malhebûnên dewletê yên Ermenîstanê, jimara pez û dewaran bi carekê va kêm bûbû û ew yek heta îro jî berdewam e. Mirazê Koçer Mistoyan pêşnîyar dike herine gundê Malomirazê, ku ji Çêrnyaxovskê 80 kîlomêtr dûr bû, li wir malbeteke êzdîyan bi heywanxwedîkirinê va mijûl e.

Sehîd Evdalyan (fêrmêr) – Em piranî ji bo kar bikin hatine vir. Pêşî me dest pê kir karê birîna daran va mijûl bûn, ku karekî zehmet bû. Em ji wira bê tişt hatine vira. Mala me tunebû: dema em di sovxozê da dixebitîn, ev xanî dane me, dû ra birayên min

dest pê kirin xanî ji xwe ra kirîn. Ev mala me a niha me bi deyn kirîye û heta niha jî em çê dikin.

Avtor – Avdalyanên bira wek berê karê ji hev zêdekirina pez û dewaran dikin, hewil didin karê pezxweykirinê pêş bixin.

Sehîd Evdalyan (fêrmêr) – Pêşî me 14 mî kirîn, pey ra me dest pê kir jimara wan zêde kir. Di nav 4-5 salan da me jimara wan gîhande 1000 serî mî.

Avtor – Firqîya Ermenîstanê û vira ew e, ku li vir heywanan bi cûrê întênsîv kok dikin. Bona nobedarîya gîhayê li mezîla çeperkirî bikin, kesên cî û yên mihacirbûyî hildidin ser kar. Malbeta Avdalyanan şêx in û erf-edetên xwe yên ruhanî û miletîyê baş diparêzin, ji vira tevî hemû eyd-erefatên malbetên mirîdan û pîran dibin. Wana ji Ermenîstanê tiberka hinkûfî malbetên şêxan bi xwe ra anîne.

Egît Evdalyan (şêx) – Sala 1937an bavê min girtin, sala 1938an gulle kirin. Dixwestin ev tiberka me ji dest me hildin, lê me ew di nava çel û kortan da ew xwey dikir. Tê bîra min, ez zaroka 7 salî bûm, min ew tiberk hildida, dikire korê, polîs dihatin-diçûn, min carek din hildida, datanî vir – bin piçengê xwe.

Avtor – Lê ewana gelek salan li vir dijîn jî, lê Ermenîstan wek berê welatê wan e, ku li wir mezelên wan in, malên wan in û tu firsendê ji dest xwe bernadin bona derheqa dostanîya ermenîyan û êzdîyan da xeber din.

Egît Evdalyan (şêx) – Zaroka êzdîyan bistanê jina ermenî mêtîye, zara ermenî berê bistanê jina êzdî xwerîye. Ew di nav me da tiştekî ziyaretî ye, em birayên hev in.

Avtor – Vira her kes zane, ku li herêma Armavîrê ziyareta êzdîyan hatîye çêkirinê û bona wê yekê serekê ruhanî yê hemû êzdîyên dinyayê seredana Ermenîstanê kirîye û mezinên Ermenîstanê ew bi qedir û hurmet qebûl kirine. Mirazê Koçer Mistoyan di nav teşkîldaran da bûye, di hemû rasthatinên Mîr da rêberîya wî kirîye.

Mirazê Koçer Mistoyan (binecîyê Rûsîyayê, bazirgan,

Kalînîngrád) – Him seredana wî, him jî ew yek, ku dervayî Kurdistana Îraqê cara pêşin îzin hate dayînê ziyareta êzdîyan hema li Ermenîstanê çê bikin, derheqa gelek tiştî da dibêje. Piştî wê yekê, ku metranê hemû ermenîyan serekê me yê ruhanî qebûl kir, li hukumetê û Parlamêntoyê, wezîretan da jî rasthatin hatine derbazkirinê. Ew roleke mezin lîst bona xurtkirina dostanî û biratîya me. Ji ber xwe va nîbû, ku di nav merivên sere yên qedirgir da dêlêgeyê êzdî jî heye. Ez bawer im, ku piştî hilbijartinên zûtirekê ra wê endamekî êzdîyan di nav Parlamêntoya Komara Ermenîstanê da jî hebe. Ew yek me borcdar dike. Niha hevalên min - bazirganên êzdî, diha zef diçine Ermenîstanê bona li wira dest bi bîznêsê bikin.

Avtor – Mirazê Koçer Mistoyan dîrokzan e û dîroka miletê xwe rind zane, haj ji hal û demên dinyayê heye û bona şer û de`wên îroyîn gelek ber xwe dikeve.

Mirazê Koçer Mistoyan (binecîyê Rûsîyayê, bazirgan, Kalînîngrad) – Dinyaya tê globalîzekirin, mihacirîya gelan ya mezin, dûrketina ji mal û warên xwe, guhartin kirine di nava cihana êzdîyan ya olî û jîyana rojane da. Întêrnêt alî vî karî dike, ku bi kemala xwe ya pozîtîv ra tevayî, xwedî tiştên nêgatîv e jî. Meriv dibêje, qey dinya ber bi wê yekê diçe, ku hemû bibin miletek û di wê rewşê da hemû êzdî, ermenî, rûs xwexwetîya xwe ya miletîyê winda dikin.

Avtor – Malbeta Mistoyanan li Brûksêlê dijî û bona karê xwe têne vira. Keça Miraz – Cemîle jî li Brûksêlê dijî. Du înstîtût xilaz kirine, 7 zimanan zane, di nav wan da ermenî jî.

Cemîle Mistoyan – Pêşî li der û dorên min gelek kêm tişt derheqa êzdîyan da zanibûn, ji min dipirsîn: -êzdî kê ne? Û min ji wan ra bi hûrgilî şirove dikir. Min digot, ku miletê me yek ji miletên herî kevinare ye, ku dînê me yek ji dînên herî qedîm e. Niha ewana êdî gelek tişt zanin. Li Brûksêlê hevalên min yên ji miletên cuda-cuda hene, di nav wan da gelek ermenî jî hene, ku em bi malê va hevaltî û dostanî dikin.

Avtor – Rast e, ewê du înstîtût xilaz kirine û salên dirêj li

Ewrupayê dijî, lê di bernameya wê ya paşerojê da heye, ku di jîyana xwe da karê xwe yê miletîyê û dînê xwe ji bîr neke. Bona mêrkirinê jî di fikira wê da tune guh nede qeyde-qanûnên êzdîyan û wê tu caran bi xortekî ji miletekî din ra mêr neke.

Cemîle Mistoyan – Çimkî edetên me hene, bavê min heye, civaka êzdîyan heye. Eger ez tiştekî wisa bikim, bavê min wê berê xwe yekser ji min biguhêre û wê bi min ra xeber nede. Him tirs heye, him jî xofa wê yekê heye. Nabe. Ew yek, wek ku ereb dibêjin, wê zewaca heram be.

Avtor – Xanima Miraz – Seyranê di zû da fem kirîye, ku astenga êzdîtîyê bi riya xwendinê bide hilanînê. Ew li Êcmîadzînê ji diya xwe bûye, dibistana wir ya navîn xilaz kirîye, mêr kirîye û cîguhastî Moskvayê bûye. Bi 6 zimanan dipeyîve, li Kalînîngradê xwendina bilind sitendîye, ew jî pêşekzana kar û barên mêvanxaneyan e.

Seyran Mistoyan – Azadî nayê maneya destûrdayîna her tiştî. Eksî wê, azadî tiştekî xweş e, dema tu texmîn dikî, ku tu azad î, dema dikarî aminaya xwe bi xwe bînî, ka çi bikî û di ku da herî. Ez û mêrê xwe em merivên pir azad in, azadî jî ne ew e, ku çawa bixwezî, wisa jî bikî. Azadî nîşan dide, ku tu merivekî baş î, xwendî yî, milethiz î, qedirgir î, hiz dikî, zanî ka malbet çi ye.

Avtor – Rast e, hemû endamên vê malbetê li Kalînîngradê an jî Bêlgîyayê ne, lê bîra welatê xwe dikin, bîra gundîyên xwe û nasên xwe dikin.

Seyran Mistoyan – Meriv çiqas mezin dibe, ewqas zêde dixweze berê xwe bide Ermenîstanê. Dema zarên min biçûk bûn, ji 2-4 salîyê da, li Ermenîstanê bûn, cem dê û bavê min. Heta niha jî, gava em berevî ser hev dibin, derheqa Ermenîstanê, ax û ava wê da xeber didin. Her bîranîneke baş, her tiştê xweş bi Ermenîstanê va girêdayî ye.

Avtor – Li Çêrnyaxovskê jî êzdî hene, ew jî hisreta welêt di dilê wan da dijîn, bi hêvî ne, ku jihevdûrketina wan ser demekê ye û ewê rojekê vegerin û wê ji nêzîk va li tiştên xwe yên miletîyê xwedî derkevin.

Esed Şamoyan (binecîyê herêma Kalînîngradê) – Li Ermenîstanê tu caran em mecbûr nekirine em dînê xwe biguhêrin. Em bi ermenîyan ra hertim bira bûne, em li rex hev mezin bûne. Di zarotîya xwe da min texmîn ne kirîye, ku firqîyê daynin navbera ermenîyan û êzdîyan, niha jî wisan e. Ji Ermenîstanê têne mêvanîya me, ez diçime wira cem hevalên xwe.

Ûsiv Tatoyan – Ez dixwezim gelê ermenî edil bijî, li Ermenîstanê xweşbextî hebe. Bira milet wisa bijî, wek ku ew dixweze, bira hertim şênayî û jîyaneke têr û tije hebe. Em bîra hevalên xwe, merivên xwe, melekên xwe, wan tiberkan dikin, ku me li Ermenîstanê hîştine.

Avtor – Bi alîkarîya Mirazê Koçer Mistoyan Abgar Abgaryan hîmê deranîna selên bêtonî danî.

Abgar Angaryan – Li Kalînîngradê gava rastî êzdîyekî têyî û jê dipirsî ka tu ermenî yî, dibêje na, ez êzdî me, em dibêjin: de tu ji me yî, da, çi firqî? Li vir ermenî, êzdî, tu firqî tune.

Avtor – Bona piştgirîkirinê, îsal tenê binecîyên gundên herêma Armavîrê teglîf dikin bona li vê karxaneyê kar bikin, yên ku ji teyrokê zirareke mezin dîtine. Li bajarên Kalînîngradê jî êzdî hene, ku di hemû çiqlên aborîya bajêr da kar dikin, hinek kes jî bi karê bîznêsê va gîro ne. Îso Hemşoyan ji gundê Zovûnîyê ye, salên dirêj li polîsa navçeya Rewanê ya Şengavîtê da xebitîye, li Kalînîngradê xwendîye, lê piştî derbazî pênsîyayê bû, hate Kalînîngradê.

Îso Hemşoyan – Em li her deran û hertim derheqa warê jidayîkbûna xwe da difikirin, merivatîya me ya mezin li Ermenîstanê heye. Merivatîya me ne îro dest pê kirîye, ew ji kal û bavan tê. Me çawa dest pê kirîye, em wisa jî berdewam dikin. Me perwerdeya xwe li Ermenîstanê sitendîye, hevalên me yên baş hebûne.

Avtor – Bajarê Vladîmîrê yek ji colangên kevinare yên Rûsîyayê ye, ku jê ra herwiha yek ji cewahirên "Xeleqa zêrîn" ya arkîtêktûrîyê jî tê gotin. Di navenda bajêr da heykelên dîrokî yên kevinare hene û her ro bi sedan tûrîst têne wira. Li vira jî gelek ermenî û êzdî dijîn. Yek ji wana Şemo Mamoyan e, ku ji sala 1979an da li vir e, dema li

eskerîyê qulix dikir. Ewî înstîtûta fînansîyê-bazirganîyê xilaz kirîye.

Şemo Mamoyan (serekê koma "SK Prom" ya Vladîmîrê) – Em piranî karê asfaltkirinê dikin û em têknologîyayên nûjen bi kar tînin. 12 rêvebirên kar hene, ku her yek ji wan şuxulê her perçeyekî karê xwe dike.

Avtor – Dayîreya çêkirinê, ku ew serkarî lê dike, ketîye di nava deh dayîreyên kar yên herî mezin. Van dawîyan karê çêkirina avahîyê navbenda xurekê bi lez "Macdonald" jî, ku wê li navbenda herêmê da be, sipartine wî. Li bajêr û herêmê weke 1000 êzdî dijîn, hemû jî ji Ermenîstanê ye.

Ezîz Mistoyan li Ermenîstanê hatîye dinyayê. Piştî temamkirina koma yekê a mektebê cîguhastî Vladîmîrê bûye. Bona wî Ermenîstan welatê wî ye, lê ermenî – welatîyên wî ne.

Ezîz Mistoyan – Li wir heval û birayên min hene, dan û sitendinên me bi ermenîyan, bi miletê ermenî ra hene, em merivên axekê, avekî ne.

Avtor – Bavê Ezîz - Samvêl Mistoyan jî karê bîznêsa bi çêkirinê va girêdayî dike. Di salên sovêtîyê da Samvêl dihate van xozanan, paşê ma û gazî malbeta xwe jî kir. Li Vladîmîrê kesên ji mala hadîyan tunene û ew yek parastina erf-edet û eyd-erefatên miletîyê dide zehmetkirinê.

Samvêl Mistoyan (bazirgan) – Em salê du caran eyda Hêkesorê dikin û ez wana didim teşkîlkirin, derheqa wê yekê da him ermenî zanin, him jî êzdî. Em gişk berevî ser hev dibin û bi hev ra eyda xwe derbaz dikin. Li gelek bajaran dîtine ka em çawa dikin, wana jî çav daye me û wek me dikin.

Avtor – Hema bêje li hemû bajarên Rûsîya Fêdêral xort guhdarîyeke mezin didine ser spore, dê û bavên wan jî qîmetê wê yekê zanin. Mesele, Têlman Fêroyan ji bo wî meremî li Îvanovoyê xanîyek kirê kirîye, ew nûjen kirîye, bangî werzendvanan kirîye û ji bo zarên êzdî yên li Îvanovoyê dijîn, mecal saz kirine.

Andrêy Şalov (werzendvan) – Eva weke du salan e, ku em li vira werzandinan dikin, şagirtên min tevî pêşbirkên cuda-cuda

dibin. Koma me ya întêrnasyonal ye, her kes dikare bê cem me û werzandinan bike. Em her tişt dikin bona pêşketina spora boksê.

Werzendvan – Werzandina li vira berî her tiştî cesaretê, xwebawerîyê di hindava hêza min dide min.

Avtor – Rostem Mistoyan yek ji werzendvanên Vladîmîrê yê herî bi nav û deng e. 17 sal in, ku ew werzandinan dike, gelek caran bûye endamê koma bijare ya Rûsîya Fêdêral, sala 2005an bûye serketîyê pêşvanîya Ewrupayê di nav gencan da.

Rostem Mistoyan (hostayê sporê yê Rûsîya Fêdêral) – Sporê em xwedî ne dikirin, ango me ji sporê pere qazanc ne dikir, birayê min serketîyê pêşbirka navnetewî ye. Piştî dest ji spora aktîv kişand, ew 5 salan karê werzendvanîyê dike. Niha me dest bi bîznêsa karê bi çêkirinê va girêdayî kirîye. Eger her tişt wisa here, ku me plan kirîye, ezê bikaribim seraya sproê ya arizî çê bikim.

Avtor – Tvêr yek ji bajarên Rûsîyayê yê kevinare ye, ku bingeha wê di sala 1135an da hatîye danîn û li rex çemên Volgayê û Timayê ye. Êzdîyê herî bi nav û deng, ku ji Ermenîstanê ye û li Tvêrê bi cî û war bûye, Zado Cindoyan e. Ew li Rewanê ji diya xwe bûye, piştî xilazkirina mektebê, sala 1972an li înstîtûta polîtêxnîkîyê ya Gorkîyê hatîye qebûlkirinê û pey xilazkirina wê ra li Rûsîyayê maye. Salên dirêj karê çêkirina riya kirîye, di postên bilind da kar kirîye. Dibêje, ku di jîyana wî da ermenîyan roleke mezin lîstîye. Bona ku li Ermenîstanê ji diya xwe bûye û nava ermenîyan da mezin bûye û gihîştîye, li mekteba ermenîyan da xwendîye û bi alîkarîya kesekî ermenî pêş ketîye.

Zado Cindoyan (bazirganê ji Rûsîyayê, Tvêr) – Wan deman hela xwendina min jî tunebû, ez çûme cem merivekî bi paşnavê Alîxanyan, ku merivekî gelekî baş û serkarekî rêvebirina kar bû, serekên rûsan yên mezin nas dikir. Malhebûna wî ya mezin, warekî wî yê hêsabûnê hebû. Di rastîyê da ewî rêyeke rast nîşanî min da û ez gihîştime serketinên mezin.

Avtor – Sala 1977an bi saya plana "Rêyên li warên xwelîya ne reş", ku li Yekîtîya Sovyet dest pê kiribû, ew bû rêçêkirekî mezin û

bi nûjenîyên xwe va ne tenê li herêma Tvêrê berbiçev ket, lê wisa jî li tevaya Rûsîyayê deng da. Ji sala 1986an vir da li herêma Tvêrê dimîne. Çawa li Gorkîyê, wisa jî li vir bi diyasproa ermenîyan û bi ermenîyan ra six girêdayî ye, serdewatîyê 5 malbetên ermenîyan e.

Zado Cindoyan (bazirganê ji Rûsîyayê, Tvêr) – Ev pevgirêdanên me yên mehkem û rast ji dewranan tên, ne îro dest pê bûne. Dîrok jî ji sedsalan hatîye, û li cihanê li ku ermenî heye, li wir êzdî jî heye û eksî wê.

Avtor – Li Tvêrê jî Zado Cindoyan xwedîyê dayîreyeke lêkirina xanîyan û rêçêkirinan e. Piranîya rêyên herêmê ew çê dike, wisa jî karê çêkirina xanîyan, avahîyan dike. Zado Cindoyan hema li Lîxoslavlê dijî. Ev bajarekî biçûk e, di hêla aborî da warekî ne gelekî destdayî ye, lê dîsa jî ewî li vî bajarî mêxanxaneyeke 4 steyrkê, fîtnês klûb, sera şahîyan û xwerinxaneya ser dereceya bilind çê kir.

Zado Cindoyan (bazirganê ji Rûsîyayê, Tvêr) – Me ew xanî çêkirine bona zarên me, xort û keçên me neçin cîyên din, lê li vira berevî ser hev bin, hev nas bikin. Bingeha pêşin ev e, bona em bikaribin nisleta din bi qîmetîyên miletîyê va bidine girêdanê, çimkî emir tiştekî wisan e, ku em îro hene, sibê tunene. Lê kê wê dewsa me dagire? Min wisa daye teşkîlkirinê, ku li vir tu tiştekî bazirganîyê tuneye, ew her tenê bona pêşketina kûltûra miletên me ne. Bira bizanibin, ku em xwedî çi kûltûrayeke dewlemend in.

Avtor – Cem Cindoyan gelek ermenî kar dikin. Piranîya wan çêkirçî ne, erebajo ne, ku ji Lorîyê, Êcmîadzînê, Rewanê hatine. Mxîtar Naxoyan ji mehela paytext ya bi navê Sîlîkyan e, ku li wir gelek êzdî dijîn. Li vira jî danûsitendinên ermenîyan û êzdîyan xweş in.

Mxîtar Naxoyan – Ez dikarim bêjim, ku êzdî merivên me yên xûnê ne, tu firqî tune. Mesele, li taxa me jî êzdî hene, em bi hev ra hevaltî û dostanî dikin.

Avtor – Dayîreyên Zado Cindoyan yên bazayên çêkirinê piranî li Tvêrê ne, kurên wî ew bi rê va dibin.

Têmûr Cindoyan (serwêrê teşkîleta "Lîxoslovlatodor SPI")

– Em li hemû deverên Tvêrê dixebitin, em usa jî li bajarên cînarên Tvêrê jî kar dikin.

Avtor – Tenê di teşkîleta çêkirina riyan da 200 pale kar dikin, ji nîvê xebatkaran zêdetir êzdî û ermenî ne. Di van salên dawî da gelek mihacirên ji welatên Hevgirtina Dewletên Serbixwe hatine vir. Kolêktîvên Zado Cindoyan jî pirmilet in.

Larîsa Kovalyova (binecîya Lîxoslavê) – Nav û dengê kolêktîva me ya pirmilet him li Lixoslavlê, him jî li Tvêrê pir e. Ew yek berî her tiştî bi xebata Zado Cindoyan ya bêqusûr va girêdayî ye. Karê bi wî ra him gelek hêsa ye, him jî gelek dijwar e. Hêsa ye, çimkî çêkirçîyekî profêsyonal e, di hindava her xebatkarekî da xemxur û guhdar e. Lê dijwar e, çimkî ew sistîyê temûl nake.

Avtor – Li Lîxoslavlê pirsgirêkên miletîyê yên berbiçev tunene. Serekên diyasporên miletîyê û dîwana cî bi hev ra pêşîya hinek nerazîbûnan digirin. Derheqa vê yekê da serekê dîwana navçeyê dibêje: di wî karî da keda Zado Cindoyan pir e.

Vîktor Gaydênkov (serekê dîwana navçeya Lîxoslavlê ya herêma Tvêrê) – Rola Zadoyê Ûsiv di karê şênkirin û bedewkirina bajêr û navçeyê da jî pir e. Ew di salên 90î yên dijwar da hate bajarê me, dema her tişt ji hev diçû. Teşkîletên çêkirinê jî ji hal ketibûn, wî hema bêje ji sifirê dest pê kir û bingeha teşkîleta çêkirinê ya bona tevaya navçeyê û herêmê danî, ku perçên wê li herêmên din û li Tvêrê jî hene. Zadoyê Ûsiv gavên ciddî davêje bona di navçeyê da pêşdabirina malhebûna gund û heywanxwedîkirinê.

Elî Cindoyan (fêrmêr) – Li fêrma heywanxwedîkirinê, ku Cindoyan serkarî lê dike, 3 çêlekdoş dixebitin, dotina çêlekan bi cûrê êlêktrîkîyê dikin, rêxê paqij dikin, usa jî karên din dikin.

Avtor – Fêrma ji hal ketibû û ji hev çûbû, deynên wê yên mezin hebûn, lê di salên derbazbûyî da ew deyn hatine dadanê. Li wan deştan, ku di van salên axirîyê da nedihatin bêcerkirin û bûbûne xozan, niha 500-600 hêktar hebê nên lê tê çandin.

Zado Cindoyan – ewledê êzdî yê Ermenîstanê, nûnerê Ermenîstanê ye li ser vê axa Rûsîyayê, ku bi vê rênîşê dijîn

û kar dikin – "Rêçeke qenc, navekî baş li ser wê axê bihêle, ku tu lê dixebitî, lê tu caran gazîya welêt ji bîr neke". Ew merivekî welatparêz û ermenîhiz e.

Zado Cindoyan (bazirganê ji Rûsîyayê, Tvêr) – Merivê li ser ax û ava wira ji diya xwe bûbe, wê çawa axa xwe, welatê xwe ji bîr bike? Dibe di xortanîyê da di nav kar da van her tiştan texmîn nakî, wextê te tune. Lê demek tê, ku ev hizkirin di nav te da dikele, çiqasî jî bixwezî, nikarî welatê xwe, warê jidayîkbûna xwe hiz nekî. Merivê paqij nikare bi cûrekî din bifikire derheqa warê jidayîkbûna xwe, axa welatê xwe da.

Avtor – Me bi vî cûreyî dît hal û kar, derd û xem û serketinên welatîyên me yên êzdî li cî û warên Rûsîya Fêdêral yên cuda-cuda. Me behsa kar û barên wan, hewildanên wan bona parastina xwe û xem û xeyalên wan kir. Axa Rûsîyayê ya kevinare ew qebûl kir û mecal da wan jîyaneke nû dest pê bikin li ser wê axê, ku li wir gelek pirsgirêkên civakî, sosîalî, navmiletî û sîyasî û welatîyên me karibûn bi destî tifaq û hevgirtina xwe ber van dijwarîyan ber xwe bidin. Gelo wê bikaribin li vê cihana, ku tê globalîzekirin demeke dirêj ber xwe bidin? Ewana bi xwebawer dibêjin: erê! Dîroka miletê wan bi vî awahî ew qal kirîye û perwerde kirîye.

Moskva-Yaroslavl-Tvêr-Kalînîngrad.
Sal 2013.

EZDIKI.COM

MÎYASERBÛNA XEWNA SURÎ

Ji merivên xwe yên nêzîk ra sipas nabêjin an jî Riya dijwar ya xwenaskirinê

Rastîyê gotî, ez dû gelek fikiran çûm, min tiştekî gelekî ferz ji bîr kir. Ne hêsa ye meriv ji vira gelek dûr bijî û çêkirina ziyareteke ha hilde ser milê xwe. Lê gelek hevalên min yên xortanîyê, usa jî yên salên gihîştî hatine hewara min û ew barê giran hildan ser milên xwe. Ez nizanim ji kê destpê bikim: belkî ji Andranîk Artênyan, ku li her deran digihîje hewara her kesî? Ewî roj û şev li xwe dikir yek, ku her tişt bi dilê min be. Bona wî karê ku nebe, tune, ew tu caran bêhêvî nabe. Lê dema rastî dijwarîyekê tê, ew dijwarî bi laqirdîyekê derbaz dike û te hew dît henekeke usa bi cî got, ku zehmetî ji her kesî vedikişe. Andranîk di dema xwe da serkarî li malhebûneke dewletê kirîye. Ew ewledê ermenîyekî ji Farizistanê Almast e û Nazxanima diya wî jî ji Naxîcêvanê ye. Û îro ew xwedî malbeteke giran e. Ez bîranîneke hewaskar bêjim: Andranîk xwedîyê nevîyên bedew û aqil e. Nevîyê wî yê bi navê Andranîk, ku xwe li riya kişandina fîlman girtîye, fîlmeke ser ziyareta li Aknalîçê kişandîye. Hûn zanin ya here giring çi ye? Ev xort ji êzdîyên li gundê wî dijîn pir hiz dike. Ango, ewî li mala xwe dîtîye, ku neferên malê çawa qedrê miletên din, herwiha êzdîyan digirin. Ew sala par bi nevîyê min ra bû nas, û ez bawer im, ku dostanîya min û Andranîk, ya ewledên me xût ewê berdewam bikin. Her kes zane, ku êzdî û ermenî demeke dirêj rex hev jîne, hev baş nas dikin û fem dikin, ewana qedirê hev zanin, hurmeta hev digirin. Lê em gerekê ji bîr

nekin, ku ew dostanîya sal û zemanan ya paqij gerekê ji nislekê derbazî nisla din bikin. Telebext ra sedsala 21ê ji bo dostanîya rasteqîn, pêwendîyên ji dil bû asteng. Em gerekê bi nimûneya dostanîya ermenîyan-êzdîyan bidine nîşankirinê, ku em miletên usan in, ku qedirê dostanîyê, hurmetê rind zanin.

Em niha behsa hevalên xwe yên din bikin, ku bi saya hereketê wan avahîyê ziyareta me bilind bû. Homêros Pêtrosyanê hevalê min yê zarotîyê çêkirçî ye. Ewê bi cabdarîyeke mezin va çêkirina ziyaretê hilda ser xwe û ji bîr kir, ku Mîrzeyê hevalê wî dikare di dema çêkirina ziyaretê bi pirsên xwe va wî rehet nehêle. Ez li Moskvayê me, Homêros li vir e, em her ro hev ra têlê dixin, lê gelek caran pirs bi têlêxistinê nayêne çareserkirinê. Him Homêros, him min, him jî gelek kesên din fem dikirin, ku emê cara pêşin bi hev ra ziyaretekê çêkin. Û min gelek caran hevalan ji min zêde dixwestin ziyaret bêqusûr bê çêkirin, carina em bi dilxweşî diketine qirka hev jî. Lê Homêrosê bînfire, xweyê xeysetê berbihêr her tişt bi cî dikir. Eger lazim bûya, ewê êhilşanda, kêmasîyan rast bikira, her tenê bi dilê min bûya. Çi bûye, bûye, ya ferz rêzûltat e. Îro ziyareta me ya delal heye û li ser her kevirekî wê rêçên destên Homêros û hostayên wî hene, li vir hostatîya hosteyên ermenî, xûdana enîya wan tê kivşê. Deqekê texmîn bikin germaya teva deşta Araratê û xebata bin wê tevê û armanca çêkirçîyan ew bû, ku him baş çê bikin, him jî di wextê da, 29ê meha îlonê çêkirina wê xilaz bikin û dergehên ziyaretê ber hatîyan vekin.

Gelek kes ser ziyaretê xebitîne. Xwesma keda wênekêş Mêrûjan Mxêyan gelek e, ew herdem li rex me bû bona ziyaret xeml û rewşeke kaw bistîne, lê wêneyê Ziyareta Lalişê, ku di hundur da ne, dilê merivan baristan dike. Texmîn bikin, ku ez merivekî wisa me, ku her tiştî qebûl nakim, lê zanim ku Mêrûjan Mxêyan hunurmendekî bê qisûr e, ew karê xwe rind zane, lê dîsa jî em hewil didin bîr û bawerîyên xwe jê ra bêjin.

Niha jî ew di nav mitaleyan da ne, hewil dide, ku sîmvolên êzdîyan li ziyaretê hebin.

Dema vekirina ziyaretê bi hezaran kes hatibûn, û meriv texmîn dikir, ku ziyaret bi der û dorên xwe va biçûk e û hewcê firekirinê ye. Temamîya payîzê û zivistanê armanc-bernameyek di serê min da dikelîya, rengê xwe digirt, dibû qalib û dîdemek jê çê dibû. Lê dema bihar hat, me yekser dest bi firekirina warê dora ziyaretê kir. Hilbet, li deşta Araratê îro warekî vala tune û em gerekê bi xweyî-xudanê wî erdî ra biketana nava danûsitendinê bona peydakirina erdekî zêde. Perçekî axa dora ziyaretê di destê malbeta gênêral-lêytênant Manvêl Grîgoryanê dostê minî hêja da bû. Gava me berê xwe da wî bona hinek erd dest bixin, jê bikirin, wî got: "Axa ziyaretê meriv gerekê tenê pêşkêş bike...". Ez rast bêjim, ez ji van gotin û helwesta wî pir dilbaristan bûm, meriv dibêje qey min qewateke xurt sitend. Li min diket ez wî dostê xweyî hêja ra tenê bêjim mala te ava, çimkî di demên wisa da gotinên razîbûnê wê têr nekin.

Herdu gênêral Manvêl Grîgoryan û Sêyran Saroyan sala par di vekirina ziyaretê da hazir bûn. Ez wê jî bêjim, ku ez bi wan ra di nava pêwendîyan da me û ewana herdem jî dibêjin em amade ne alîkar bin.

Ez dixwezim razîbûneke germ bidime serekê navçeya Armavîrê Aşot Xahramanyan, ku ewî ne tenê bi dil û can serekê me yê ruhanîyê, ku hatibû Ermenîstanê qebûl kir, lê herwisa jî nûnerên olka me ya ji cî û warên Rûsîyayê yên cuda-cuda hatî jî. Xeberdaneke germ û ji dil xuliqî, nûnerên gelê me yên ji der hatî pêşnîyarên konkrêt kirin. Hate gotinê, ku gerekê pevgirêdaneke xurt hebe di navbera êzdîyên der va û yên warên wan yên jidayîkbûnê li Ermenîstanê da. Eger gavên bi aqilane bêne avîtinê, ez ser wê bawerîyê me, ku her kes wê karê bide warê xwe yê jidayîkbûnê.

Roja vekirina ziyaretê nûnerên olkên êzdîyan yên ji warên Rûsîyayê yên cuda-cuda hatî li Ermenîstanê bûn. Femdarî ye, ku dema ew li Ermenîstanê bûn, warên kal û bavên xwe qesidîn, rastî gelek kesên karmend û bazirgan hatin.

Du birayên bazirgan Borîs û Mêls Lezgîyan karê xwe li Moskvayê û Yaroslavlê dikin, gihîştine destketinên mezin.

Pêwendîyên wan yên six bi Ermenîstanê ra hene, li Yêrêvanê tamtaşên bedew ji xwe ra çê kirine, zû bi zû tên û diçin. Bona wan bûye edet, ku di salê da mehekê li Yêrêvanê û Ermenîstanê bin. Di ser da jî, kurê Borîs bîznêsa xwe li Ermenîstanê xurt dike û di fikira wan da heye wî karî zêdetir pêşda bibin.

Bi tevayî di nêta xortên me yên destemel da heye karê xwe yê bazirganîyê li Ermenîstanê jî dest pê bikin. Têlman Fêroyanê ji Îvanovoyê, ku parlamêntarê Parlamêntoya wê herêmê ye, merivekî naskirî ye û ew jî herdem bi merivên warê xwe yê jidayîkbûnê ra ne. Pêwendîyên wî bi olka ermenîyan ra jî heye û ewî alîkarî kirîye, ku li wir erdekî bidin bona çêkirina dêra ermenîyan. Bi tevayî, li her deran di navbera olkên ermenîyan û êzdîyan da hevkarî heye. Ewana ser şîn û şayên hev in, qedirê hev digirin, wextê lazim be tên hewara hev.

Ev yek li Kalînîngradê jî gelek xurt e. Li wir navbera Miraz Mistoyan û bazirganên ermenî gelek xweş e. Van axirîyan rojnamevanên têlêvîzyona Ermenîstanê rêportajek amade kiribûn derheqa olkên ermenîyan û êzdîyan yên Kalînîngradê da. Wana bi germaya dilê xwe derheqa hev da xeber didan, meriv bi hevsûdîyeke qenc li wan mêze dikir. Li devera Tvêrê jî wisa ye. Zado Cindoyanê çêkirçî derheqa wê qedirgirtinê da bi dilovanî qise dike, ku navbera ermenî û êzdîyên wira da heye. Tiştekî veşartinê nîne, ku herdu cimet jî xebathiz, cabdar in, ewana qedir û hurmeta miletê xwe bilind xwey dikin, bi wê yekê ra tevayî hewil didin bibine hemwelatîyên layîq yên Rûsîya Fêdêral.

Him ermenî, him jî êzdî hewil didin çiqas ji dest wan bê, zû întêgreyî nava wî welatî bin. Hilbet, ev yek wê alî bike diha zû rabine ser pîya, bi aborî xurt bibin û pêş bikevin. Û bi wê yekê va wê ji olka xwe ra bibin alîkar. Hilbet, xweşbûna jîyana olkê bi alîkarîya aborî va girêdayî ye. Ji bext ra bona vî karî him ermenî, him jî êzdî hazir in.

Îro li diyaspora me ya Rûsîyayê merivên ronakbîr jî ne hindik in, yên ku di dereceyên jîyanê yên cuda-cuda da gihîştine serketinên

mezin. Profêsor Samvêl Koçoyî pêşekzanekî navdar e, hiqûqzanekî baş e. Heyranê welatê xwe ye. Wek zanyar carina tê Ermenîstanê. Ez vê yekê dikarim derheqa Yûrayê Desinî da jî bêjim. Ez wê jî bêjim, ku sala par gelek zanyar, dersdar, bizîşk, rohilatzan, pêşekzanên dereceyên cuda-cuda hatibûn şahîya ziyareta me. Her kes zane, ku Ermenîstan welatê zanyarîyê û perwerdeyê ye. Gelek êzdî li Ermenîstanê xwendineke baş sitendine. Ji bo wana li xerîbîyê xwendinê dest bînin mînanî xewnekê ye. Lawên me dayîreyên xwendinê yên Rûsîyayê, Ewrupayê û Amêrîkayê yên here baş da dixwînin. Mixabin, îro êzdîyên Ermenîstanê zêde xwe li xwendinê nagirin. Dibe wext guhêrîye û hinek asteng çê bûne? Daxweza min ew e, ku ewana bi rastî derc bikin ka xwendina bilind çiqasî ferz e bona ronakbîrên milet peyda bibin. Ez zanim, ku îro kêmasîya dersdaran heye, xwesma dersdarên zimên. Ew bona parastina zimanê miletê me pirsgirêkeke ciddî ye. Em dixwezin, ku li Ermenîstanê êzdî di her dereceyan da aktîv bin, tevî karê hilanîna kêmanîyan û çareserkirina pirsgirêkên heyî bibin.

Min jorê destnîşan kir, ku di karê pêşketina çanda me da kar gelek e, em gerekê wisa bikin, ku sitiranên êzdîyan, sazbendîya me pêş bikevin. Dema navbenda me ya çandê-perwerdeyê vebe, ez bi hêvî me, ku emê jî bifikirin ka bi çi va dikarin alîkar bin.

Ez dixwezim razîbûna xwe bidime ronakbîrekî li Ermenîstanê naskirî, merivekî dilovan û zane Sêrgo Yêrîtsyan, yê ku bi şêwr û tevgelîya xwe va kedeke mezin kire nava karê xuliqîna ziyareta me û karê teşkîlkirina şahîyên bi ziyareta me va girêdayî. Karê wî yê here mezin jî ew bû, ku bi serkarîya wî fîlma "Êzdî: lawên welatê Rojê" hate kişandin. Ew fîlm derheqa diyaspora êzdîyan ya li Rûsîyayê û xem û xeyalên ewledên wan da ne. Me bi wê fîlmê va karibû hisreta xwe ya di hindava Ermenîstanê da raxin ber çavên welatîyên me – him ermenîyan, him jî êzdîyan. Me got, ka em li Rûsîyayê çawa kar dikin û çi dikin, keda me di şênkirina wî welatî da çiqas e. Wek ku di fîlmê da jî xuya dibe, me tu caran pêwendîyên xwe ji warê jidayîkbûyîna xwe ne birîye û em dixwezin, ku ev yek

diha qewîn û mehkem be. Amadekarên fîlmê yên din rojnamevan Hraçya Papîkyan, opêrator Samvêl Galstyan bûne merivên ber dilê me ezîz, çimkî wana bi her cûreyî hewil dida me rind fem bikin û dû ra ew her tişt raberî temaşevanan bikin.

Dema serekê ruhanîyê yê hemû êzdîyên dinyayê Mîrê Mîran Tehsîn Beg, desteya bilind ya ruhanîyê û endamên dêlêgasyona pê ra hatî yên din, endamên diyaspora êzdîyan ya Rûsîyayê hatine Ermenîstanê, wana li vir jî kişandina fîlmê berdewam kir û fîlmeke din jî amade kirin, ya bi navê "Riya ku ber bi ziyaretê dibe", ku dîrokeke bi rastî hewaskar e derheqa wê yekê da ka ev ziyaret çawa xuliqî. Ew herwiha kronologîya ye derheqa wan çend rojan da, ku di dema wê da her rasthatinek bi vekirina ziyaretê û merivên ku tevî wê bûyera bi nav û nîşan bûn da ne, ku ji welatan û warên Ermenîstanê yên cuda-cuda hatibûn.

Him fîlma berê, him jî ya teze wê di sînemaya "Moskva" da bêne nîşandan. Dû ra ewê bi têlêvîzyonê û bi Întêrnêtê bêne nîşandan.

7 fîlmên dinê jî li ser vana zêde bûne yên derheqa diyasporên ermenî û êzdîyên li Îvanovoyê, Yaroslavlê, Tvêrê û Kalînîngradê da. Ewê mecalê bide baştir hevdu nas bikin, wisa bikin, ku diyasporên ermenîyan û êzdîyan nêzîkî welêt bin. Lazim e fîlmên ha zêde bin bona em bizanibin ka welatîyên me çawa dijîn û dixebitin. Lê ew gerekê nebe sebeb, ku hûn jî Ermenîstanê bihêlin, herin. Meriv rast bêje, jîyana li xerîbîyê pir zehmet e û dibe em – ermenî û êzdî ser xwe ne, ku dikarin ber xwe bidin, bingehên xwe yên miletîyê biparêzin. Lê ew riya xweparastinê dûr û dijwar e. Xudê neke, ku yek ji riya xwe derkeve.

Niha em dîsa berev bûne bona yeksalîya bingehdanîna ziyareta xwe bidine kivşê. Ez dixwezim wan bi hezaran merivan pîroz bikin, ku wê roja şahîya me li Aknalîçê bin, çimkî hatina wan îzbatek e, ku ziyareta me serhevdu yeksalî ye, lê êdî deng daye. Pey bi sedan salan, belkî bi hezaran salan jî wê evê rojê bi bîr bînin.

Sal 2013

Merivê herî bextewar an jî Ziyaret bona sedsalan tê çêkirin

Ez hertim fikirîme, çima li Ermenîstanê ziyaret tune. Me derheqa ziyareta Lalişê da bihîstibû, ku li Îraqê ye. Di salên Sovyetê da derheqa her tiştî da malûmatî pir hindik û kêm bûn. Xewn û xeyala me - êzdîyan bû herine wira, texmîn bikin ka li wira çi heye. Pey erdheja Spîtakê ya sala 1988an ra ew daxwez-xewn-xeyala min diha xurttir bû, ku li Ermenîstanê ziyareta êzdîyan çê bikim. Lê wextekî wisa bû, ku min ne dixwest derheqa wê daxweza xwe da bikim dengî, belkî qewata min jî têr nekira û ew ziyareta ku bihata çêkirinê, zêde di fikira min da bû. Û wisa bû, ku ez mecbûr bûm ser demekê ji Ermenîstanê derkevim û li Moskvayê bi cî bim. Li wir jî dijwarî ne hindik bûn. Lê dîsa jî fikira çêkirina ziyaretê li Ermenîstanê tu caran ji serê min derneketîye. Ew fikir herdem bi min ra bû. Ew jî wê demê, ku ez êdî li Lalişê qesidîbûm, ez bi serekên ruhanîyê yên êzdîyan ra bibûm nas, em bi hev ra bûbûne dost. Çûyîna min, malbeta min û hevalên min li Lalişê êdî gelek caran qewimîbûn, em her sal diçûne wira, mecala min hebû ez derhqa nêta xwe ya derheqa çêkirina ziyaretê da ji serekê ruhanîyê yê hemû êzdîyên dinyayê Mîrê Mîran Tehsîn Beg û desteya bilind ya ruhanîya êzdîyan ra bêjim.

Di nav demeke kin da min fem kir ka ew çi difikirin, ku Laliş yek e, li cihanê tek tenê ye û nabe ku yeke wek wê li warekî din jî hebe. Min zanibû, ku wana bi sebebên wisa gelek pêşnîyarên din jî înkar kirine. Lê ez ne ji wan merivan im, ku bêhêvî be û min zanibû, ku ezê rojekê ji rojan destûreke erênî bistînim. Gava ez li gundên êzdîyan digerîyam, min dît ku li goristanan ziyaretên wisa

yên biçûk hatine çêkirin. Û rojekê jî min ev mesele ber Mîr vekir û ji bextê min ra wî destûr da, ku ziyareteke wisa dikare li Ermenîstanê jî hebe. Me bona wê armancê goristana Aknalîçê hilbijart, ku hemû merivên min li wir hatine binaxkirin. Min fem kir, ku ziyaret gerekê gelek bi lez bê çêkirinê. Lê bona wê yekê lazim bû her tişt gorî qeyde-qanûnan bihata kirin.

Dema me cîyê çêkirina ziyaretê hildibijart, me çend ruhanîyên ji Lalişa Nûranî teglîfî bal xwe kir. Du kes hatin – qewal Huseyn û koçek Bereket, ku bi xwe ra tiberk û ava ji kanîyên zelal yên Lalişê anîbûn.

Şahîyeke bi dilê her kesî hate derbazkirin. Min gazî gelek merivan ne kiribû. Li vira duayên dirêj hatine xwendinê, lê tiberkên bi ava kanîyên zelal yên Lalişê va warkirî kirine hîmê ziyaretê. Min wê demê êdî texmîn dikir, ku ziyareta me çawa li vî warê bedew yê deşta Araratê bilind bûye.

Hûn zanin meriv çiqas bextewar e, dema xeyala wî ya here sereke di jîyana wî da rojekê mîyaser dibe? Ez di nav vê sala axirîyê da merivê herî bextewar bûm, çimkî ziyareta me roj bi roj bilind dibû.

Her kevirekî ku dema çêkirina ziyaretê datanîn ser hev, ber dilê min buha bû. Kevirên ku ji Noyêmbêryana dûr dibirîn dianîn, bi demê ra rengê ziyaretê diguhartin. Ew bi dijwarîyên xwe va gerekê bibûya çêkirineke tam û hevgirtî. Ne axir ew kevirên ku xwe ber bi jor girtibûn, gerekê axirîyê bigihîştana hev û nîşana ziyaretê gerekê li tepeyê wî xistana. Hûn texmîn dikin, ku ev hemû di bin tava sincirî da dihate kirinê û tu jî dixwezî, ku ew xanî zû bê çêkirinê û kumeyta wê bi me va bê xanê.

Ya balkêş ew e, ku her çêkirçîyekî ziyaretê jî dixwest her tişt bê qusûr be, te digot qey berê wan hev keve, ewê hevdu fem bikin. Eger lazim bûya, ku hilşînin, careke din çêkin, ew jî dikirin. Tu kes dij dernediket. Biryarên wisa bêy gilî û gotin dihatin kirinê.

Her kesî derc dikir, ku ev ziyaret bona sedsalan tê çêkirin.

Gava ziyaret hazir bû, min fem kir, ku barekî giran ji ser milê

min ket, ew ne tenê pêkhatina xewn û xeyalên min bû. Bona her miletekî ziyareta bawermendîyê pir ferz e, ew jî vê dema me ya dijwar û tevlihev da. Tiştekî veşartinê nîne, ku di alîyê parastina erf û edetên miletîyê da êzdî û ermenî ji miletên din cuda dibin, çimkî herdem jî dixwezin nêzîkî reh û koka xwe bin. Lê sed heyf, ku ew yek îro dikare bi xeter be. Ew rastîya, ku tu dûrî welêt î, gelek caran dibe sebebê dijwarîyan û astengan. Hela di ser da jî, cedandina merivan ya bona peydakirina nanê rojê, gelek wext jê dixwe û bona karên miletîyê kêm wext dimîne.

Ev ziyaret bona gelekan dikare bibe hişyarkira ruhanî. Jîyan bê bawerîyê nabe. Û ew bawerî gerekê roj bi roj xurttir be. Ez diçime ziyareta me ya li Aknalîçê, dibînim, ku meriv ji gundên dûr – Talînê û Aparanê tên, ez şa dibim, tu dibêjî qey ev dinya dane min. Bi bawerî tên û bi hêvîya, ku armancên wan wê bêne sêrî. Hema bi vê yekê tenê jî mabe, em dikarin bêjin, ku ziyaret wê roleke mezin bilîze.

Sal 2013

EZDIKI.COM

Em li rex hev jîne an jî Dostanîya me qewîn û mehkem e

Wisa bûye, ku ermenî û êzdî bi sedsalan li rex hev jîne, hertim di rojên teng û şahîyan da bi hev ra bûne. Eşîreta me jî wek wan. Em jî ji dest qirê filitîne û bi ermenîyên bira ra tevayî li deşta Araratê hêwirîne. Malbeta me malbeteke giran bûye, bavê min malxwêyê wê malê bû. Neh zarên wî hebûn. Me xwelî bêcer kir, me ekin û rez zêde kir û hilbet em di wî alî da gelek tişt ji ermenîyên cînar hîn bûn. Û îro eger êzdî bûne xwelîbêcerkirên baş, ew bi saya serê alîkarîya ermenîyên bira ye jî.

Malbeta me li gundê Yasîblûxê, herêma Surmelîyê, li Ermenîstana Rojava maye. Bavê min – Çoloyê Silo li wir ji diya xwe bûye, di malbeteke mezin da.

Malbeta me ji eşîra Qazanî-Selwanê ye, ku dikeve nava êla êzdîyan ya Ortilîyan.

Gorî dîrokê eşîreta me di karê parastina milet da roleke mezin lîstîye, qedir û hurmeta eşîrê û milet bilind xwey kirîye. Ew yek xwesma di dema bûyerên sala 1918an da zelal xuya bûn, dema kurdan piştgirîya sîyaseta desthilatdarîya tirkan ya gelkujîyê kirin û dest pê kirin zor li êzdîyan kirin, ew qir kirin, hewil didan wana bînine ser dînê mehmedîyê. Bi vê sebebê wana êrîşî ser gelek gundên êzdîyan kirin. Eger wek a wan nebûya, wê demê dikuştin, talan û wêran dikirin.

Sala 1918an leşkerên kurd êrîşî gundê me kirin, dest bi talan û kuştinan kirin. Gelek kes hate kuştinê, hinekan dîl girtin, parek jî revî.

Sebebê her tiştî ew bû, ku eşîra me, êzdîyên gund yên din

ne dixwestin dest ji dînê kal û bavan bikişînin û di fikira wan da jî tunebû dînguhastî bibin.

Çoloyê Silo, ku bi rezadilî bûbû leşkerê padşê rûsan û şerê dijî tirkan dikir, tê gund û halê sazbûyî ber çavê xwe dibîne, ku çawa talan kirine û gund vala bûye, milet tûşî kuştinê bûye, her kes di nav hewar û gazîyê da ne. Ew derdikeve dijî kurdan, gundîyan berevî ser hev dike bona berxwedanê. Tu rêyek tunebû, gerekê şer bikirana, bona merivên saxmayî bikaribûna bê qezîya ji wê cehennemê derketana. Hela di ser da jî, bavê min gayekî me û çêlekeke me ji dest dijmin derdixe. Ew diya xwe - Farê, xûşkên xwe – Xatê û Gozê jî dibîne, ku ji gund derketibûn û xwe li dora gund telandibûn.

Bavê min bi apên min va têne ser wê bawerîyê, ku riya tek tenê bona merivên me ji wê zulmê xilaz bibin, ew e, ku xwe li çemê Erez xin, derbazî Ermenîstana Rohilatê bin û ev yek bi dijwarîyeke mezin dikin.

Bavê min gilî dikir, ku wan deman ava çemê Erez rabûbû û xeter bû jê derbaz bin. Gelek jin, zaro, kal û pîr dida ber xwe, dibir.

Ser rûyê çêm birîndar hebûn, jin û zaro bona nexeniqin, dikirin hewar û gazî. Bavê min ra li hev tê bi merivên xwe va ji Erez derbaz be û li gundê Qerebûrûnê bihêwire (niha navê gund Karakêrt e). Ewana bi hêvî bûn, ku ew demên tevlihev wê derbaz bin, hal wê aram be û ewê careke din vegerine warên kal û bavan.

Demek dirêj derbaz nebû, ne tenê merivên me, lê gelekên din jî hatine bawerkirinê, ku ku ew yek nabe û dest pê kirin warên ji wan ra destdayî bigerin. Merivên me cîguhastî gundê Imo li navçeya Talînê bûn, paşê çûne Artaşatê, dû ra hatine Rewanê, li mehela Sarî Tax bi cî bûn. Pey gelek dijwarîyan û zehmetîyan ra hatine gundê Zvartnosê, navçeya Êçmîadzînê bi cî bûn. Em wê jî bêjin, ku bona gelek êzdîyan deşta Araratê bû cîyê herî hizkirî, çimkî li vira şert û mercên bona jîyanê ji hemû derên din çêtir bûn. Bavê min û diya min (ew jî ji malbeta êzdîyan ya bi nav û deng Şerqîyan bû) li ser bingehê erf û edetên êzdîtîyê malbeteke qewîn saz kirin,

bi 8 kuran û qîzekê va. Bi kurtî, bavê min dest pê kir careke din malbeteke giran saz kir. Roj tunebû, ku gundê xwe bîr neanîya, ku ji sînor ne gelekî dûr bû. Tu ji Erez derbaz bî, gundê me ye...

Ji vî berê çêm gundê me xuya dike, ku li berpala çiyakî ye. Ez zanim, ku bavê min hisreta gundê xwe di dil da ji vê dinyayê bar kir. Ez jî dixwezim seredana wira bikim. Ez gelek caran çûme Ermenîstana Rojava, lê heta niha jî ji min ra li hev ne hatîye herim wî gundî.

Ez bi hêvî me, ku ezê zûtirekê herim wir û ewê bona min, bona hemû merivên min wê wek hecê be.

Bavê min êş û hisreta ocaxa bav û kalan di dil da ji vê dinyayê çû. Diya min, Emîna Memê, ku emirekî dirêj kir, zêdeyî 80 salan, piştî mirina bavê min temamîya qaranîya malê hilda ser milên xwe.

Ew nimûneyeke degme ya dayîktîyê, dilrehmîyê, xebathizîyê bû. Mala me da hertim derheqa koka me, Lalişê, hebandinê da hatîye xeberdan û tu edet û dua-dirozge ji bîra me neçûne. Em – zuretên Çoloyê Silo, me nikaribû terbîyeteke din bistenda. Hemû mirîyên malbeta me li rex ziyareta me ya li Aknalîçê hatine çalkirin. Min hela bi zar ne gotîye, lê ziyareta me usa jî bona bîranîna wan hatîye çêkirin.

Gava ez tême vira, ez xwe diha qewat û xwebawer hîs dikim, çimkî herdem dikevime nava bîranînan û hezar û yek qewmandinên rojên xweş dikevine bîra min. Bavê min 20 salî bû, gava ecêbên giran hatine serê wî û ew bi çend merivên xwe va ji wan rojên reş xilaz bûn. Lê daxuliqî, malbeta wî ji hev zêde bû.

Gelek malbetên êzdîyan jî wisa. Wana qîmetekî mezin dida xebatê, hewildanê û ew yek derbazî lawên xwe jî dikirin.

Diya min 24 salan ser hev bê mêr qaranîya ewledên xwe, ocaxa xwe hilda ser milên xwe. Niha şikir ji Xwedê ra, malbeta me ji hev zêde bûye, birayên min xwedî qedir û qîmet in, ewledên wan jî cîyê xwe di emir da dibînin. Malbeta Siloyana careke din rabû ser xwe û bi hêz bû. Rast e, ne hemû li vir, Ermenîstanê ne, lê zanin, ku koka wan li wê ocaxê ye, ku kalikê wan Çoloyê Silo bingeha

wê danîye û riya emirê wî jî wek qedera gelek êzdîyan bûye. Eger axa Ermenîstanê ya mêvanhiz nîbûye, ez nizanim ka di wan salên giran da wê çi bihata serê bi hezaran malbetên êzdîyan. Zehmet e texmîn bikin, ka zulma tirkan û kurdan dikaribû çi banîya serê wan. Û kê ku ev rastîya sade fêm nake, vê dostî û biratîyê nabîne, ku di nava vê sedsala dawî da diha qewîn û mehkem bûye, nikare fêm bike ka ermenî roleke çawa lîstine di emirê êzdîyan da. Û dema kurê serekê ruhanî yê êzdîyên dinyayê Hazim, ku wusa jî parlamêntarê Parlamêntoya herêma Kurdistanê ye, got, ku parlamêntoya wan amade ye li ser pirsa gelkujîya ermenîyan bisekine, bona qirkirina ermenîyan nas bike, min fêm kir, ku bi wê yekê va wê qîmetê bidine wan wehîştîyan, ku di hindava êzdîyan da jî hatine kirinê. Û qebûlkirina belgenameyeke wisa berî roja 100 salîya qira ermenîyan wê bûyereke giring be di karê pêwendîyên di navbera Ermenîstanê û Îraqê da. Dema min ev xet dinivîsîn, behseke xêrê hat, ku pêwendîyên di navbera Ermenîstanê û Îraqê da her diçin xurttir dibin. Dema sala par serekê ruhanîyê yê hemû êzdîyên cihanê Mîr Tehsîn beg bi desteya xwe va li Ermenîstanê bû, derheqa wê yekê da jî xeberda, ku çûyîn-hatina di navbera binecîyên herdu welatan da gerekê bêne zêdekirinê. Ewê firsendê bide bona gelên herdu welatan diha nêzîk hevdu nas bikin. Û Ermenîstan dixweze, ku binecîyên Îraqê bikaribin bi hêsanî seredana Ermenîstanê bikin. Hilbet, dema Ermenîstan van gavan davêje, êzdîyên wira jî dide ber çavan.

Ez careke din derbazî fikira xwe bim, ku min li jorê got.

Ez jî di riya xwe da çûm. Bavê min qîmetekî mezin dida xwendina di nav êzdîyan da. Û ew gelek şa dibû, dema didît, ku mêla kurê wî li ser xwendinê ye.

Min xwendina bilind sitend, bûme zaneyê karê malhebûna gund, ez çend salan di dereceya malhebûna gund da xebitîm, bûm serkar jî. Lê bûyerên li welêt qewimîn gelek armanc û daxwez tevlihev kirin. Min ser demekê welat terk kir, lê tu caran ji warê jidayîkbûna xwe "bi dûr ne ketim", eksî wê, min gelek mukurîya

welêt dikir. Ew hisreta di hindava axa welêt da bû. Eva rastîyek e, ku ne tenê li min çetin tê, lê usa jî wan êzdîyan, ku ji Ermenîstanê çûne û li xerîbîyê bi cî bûne. Em bi sebebên cuda-cuda li Rûsîyayê, Awropayê, welatên dinyayê yên cuda-cuda da rastî hev tên û em zanin, ku em behsa çi jî bikin, di bîra me da Ermenîstan e, warê me, zarotîya me, çiya û banîyên me.

Bira her kes bizanibe, ku zehmet e giloka wan bîranînên me verêsin. Em tu caran ji wan nawestin, hela di ser da jî, em qewatê digirin, ruhdar dibin. Bûye edet, ku di van salên axirîyê da, piranî di mehên havînê da, em bi hevalan va, bi ewledên xwe va, bi nebî û nebîçirkan va têne Ermenîstanê û em bi bîranînan va koka xwe, pêşîyên xwe bîr tînin. Em diçine ser mezelên merivên xwe, diçine warên jidayîkbûna xwe, em zureta xwe bi Ermenîstanê ra dikine nas. Heyf, ku gelek nebîyên me, ku li derva ji diya xwe bûne û mezin bûne, bi sebebên cuda-cuda nehatine Ermenîstanê. Mesele, sala par min nebîyên xwe anî Ermenîstanê. We bidîta ew çawa şa dibûn, digotin ev çi welatekî bedew û xweş e. Li zaran ecêb dihat, ku meriv dikaribûn êvaran derkevin, li kûçeyên orta bajêr bigerin, li qawexaneyan rûnên, hêsa bin. Heyf, ku bona zarên me ev azadî li xerîbîyê tune. Bona wan êvar seheta 6 an 7ê êvarê xilaz dibe, ew li malên xwe ne. Yêrêvan bona wan mînanî xewnekê ye û ez bi hêvî me, ku ewê zû bi zû bêne vira, çimkî ziyareta me xwedî roja xwe ye – 29ê îlonê û ez bawer im, ku bi sedan êzdî wê hema wê rojê bêne Ermenîstanê.

Her kes zane, ku dema meriv ji koka xwe tê birînê, nikare mehkem ser qedema bisekine. Niha em gerekê usa bikin, ku ew kok mehkem be. Daxweza min ew e, ku him birayên me yên ermenî, him jî êzdî li ser vê axa batinî ji xwe bawer û zexm bin. Dibe em heta kutasîyê derc nakin, ku Xwedê çi firsendekî baş daye me. Min dixwest, ku êzdî berê xwe nedana cî û warên dûr û derez, çimkî ewana bi xwe jî zanin, ku dikarin li ser axa welatê xwe – Ermenîstanê jî naz-nemetan saz bikin. Gişk zanin, ku êzdî heywanxweykir, şivanên pispor, zaneyê deranîna hasileta şîr in,

usa jî xwelîbêcerkirên bêqusûr in. Gelek kes bi sebebên cuda-cuda dest ji vê yekê dikişînin û xwe li riya xerîbîyê digirin. Dibe jî dewlet gerekê zêde alî heywanxweykira û rêncberan bike, ku ew deranîna malhebûna gund zêde bikin. Bona wê yekê lazim e warên çêre ne ku girtî bin, lê bona her kesî vekirî bin, bona bikaribin heywanxweykirinê pêş bixin.

Ji bext ra, tu caran di navbera ermenîyan û êzdîyan da pirsgirêk tunebûne, dewlet herdem jî di hindava me da dilovan bûye. Ez zanim, ku serokkomarê welêt herdem jî di hindava êzdîyan da xemxur e. Ewî îsal pîrozîyeke ji dil şandibû girêdayî eyda miletîyê ra. Cara pêşin wekîlekî êzdîyan Armên Emoyan bû parlamêntarê parlamêntoya Yêrêvanê. Bona me mînanî xewnekê ye, ku wekîlekî me di Parlamêntoya Ermenîstanê da jî hebe. Ez dixwezim destnîşan bikim, ku dema nûnerên me yên ruhanîyê yên desteya bilind hatine Ermenîstanê û rastî merivên dewletê yên ser dereceya bilind hatin, berî her tiştî ew pirs pêşda dikişandin û ew yek hesab dikirin wek cûrekî tam întêgrebûna nava civaka Ermenîstanê da. Em zanin, ku Parlamênto ne li ser bingehê miletên kêmjimar tê avakirinê, dêmek gerekê olka me bi xwe di nav kar û barên sîyasî da aktîv be. Femdarî ye, ku pirsa miletên bi jimara xwe va biçûk gerekê tu caran nebe hacet di tevgera sîyasî da, lê îro gorî Konstîtûsyona Komara Ermenîstanê meriv dikare li ser bingehê piranîya dengan bibe parlamêntar. Heynese, xwestina min ew e, ku çawa jî mabe, li Parlamêntoya Ermenîstanê nûnerekî êzdîyan hebe.

Çareserkirina vê pirsgirêkê û yên mayîn berî gişkî bi me – êzdîyan va girêdayî ye û ji bo wê dostanîya ermenîyan ya germ heye. Gelek ferz e, ku di nav êzdîyan da welatîyên Ermenîstanê yên layîq hebin. Lê bona bibine merivên usa, lazim e em alî wan bikin, bona ew xwendinê dest bînin, terbîyetdarîya baş bistînin, bi her alî pêş bikevin û ev hemû gerekê ji bo her maleke êzdîyan be.

Em zanin, ku hêza here xurt bona parastina êzdîyan wek milet, malbet e û şikir ji roja îroyîn ra, ku erf-edetên me xwey kirîye. Îro

jî malbet têne sazkirinê, dewat têne derbazkirinê. Hela di ser da jî, welatîyên me yên ku li dervayî welêt dijîn, xwesma di mehên havînê da, şahîyên ewledên xwe li Ermenîstanê dikin. Û ew dibe sebeb, ku ewana bêne Ermenîstanê. Van axirîyan ez di dewatekê da hazir bûm. Jimara mêvanên ji der va hatî ji 300 kesî derbaztir dibû. A texmîn bikin bê Ermenîstan ji bo van merîyan çi ye – ew veger e ber bi koka xwe, bi kêmanî ser çend rojan. Wan wexta ew diçin warên jidayîkbûna xwe, seredana mezelên merîyên xwe dikin, diçine çîyê. Van axirîyan, dema hevalekî me yê ji Rûsîyayê li Ermenîstanê bû, got ku çûye çiyayên Hankavanê û ava wan kanîyan vexwerîye, ku zaroktîya xwe da gelek caran vexweribû. Êzdî ji tebîyeta xwe, ji av û axa xwe gelek hiz dikin û ew hizkirin ji nisletekê derbazî nisleteke din dibe. Ruhê êzdîyan di nav tebîyetê da ye. Ewana xeyala pêşîyên xwe di nav wan çiya û banîyan da digerin, usa jî hisreta xwe ji welatê xwe hiltînin, ku êzdîyan bi ermenîyan ra tevayî ji neyaran ra hîştin.

Îro êzdî Ermenîstanê welatê xwe dihesibîne û di ku da jî here, nikare demeke dirêj bimîne. Em herine ku jî, di ruh û dilê me da Ermenîstan heye, em bîra ax û ava xwe dikin, bîra kanî, çiya û gelîyên xwe dikin. Ev hemû, xwesma ji bo merivên dervayî Ermenîstanê dijîn, ber dilê me hemûyan ezîz in.

Sal 2013

Himberî pirsgirêkên sedsala 21ê an jî Dijwarîyên diyaspora êzdîyan

Sedsala 21ê di hindava merivayê da gelek pirsgirêk saz kirin. Yek ji wan jî pirsgirêka mihacirîya binecîyan e. Em îro bixwezin, nexwezin, em gerekê destnîşan bikin, ku di encamê da ji Ermenîstanê, herwiha ji Gurcistanê jî ji mihaciran diyaspora êzdîyan ya li Rûsîyayê saz bûye. Êzdîyên, ku ji Ermenîstanê derketine îro li van cî û warên Rûsîyayê hêwirîne: Moskvayê, Sankt-Pêtêrbûrgê, Îvanovoyê, Yaroslavlê, Tvêrê, Kalînîngradê, Krasnoyarskê û gelek bajarên din.

Li wir êzdîyên, ku nêzêkî hev dijîn, digihîjine hev, hevdu nas dikin, wê şûnda tevî şîn û şahîyên hev dibin. Dereceya hevgirtina kesên mihacir pir bilind e, em usa jî eydên xwe yên miletîyê, ruhanîyê, erf-erefatên din bi hev ra derbaz dikin. Ev yek dikare bi nimûneya mihacirên ermenîyan va diha zêde bibe. Mesele, vekirina dibistana yekşemê, ku wê mecalê bide kûltûra miletîyê biparêzin û pêşda bibin. Ez zanim, ku li gelek cîyan zarên êzdîyan bi hizkirin diçine dibistanên ermenîyan yên rojên yekşemê, lê bi wê yekê ra tevayî kûltûra xwe jî ji bîr nakin. Li hinek waran xeberdana bi zimanê dê dibe pirsgirêk, çimkî bi zimanê dê tenê li malê xeber didin, ew jî gelek caran bi mezinan ra. Lê der va zimanê dê nayê bikaranîn. Min dixwest, ku zarên êzdîyan bi zimanê dê ra tevayî ermenî jî hîn bûna. Êzdîyên, ku bi esilê xwe va ji Ermenîstanê ne, ango, zarên me, nebîyên me, gerekê ermenî jî bizanibin. Bona wana riya ber bi Ermenîstanê gerekê herdem jî vekirî be. Bi gotineke din, îro diyaspora êzdîyan saz bûye, ku pirsgirêkên wê hene û em gerekê ji îro da derheqa çareserkirina wan da bifikirin. Û

em çareserkirinan gerekê bi riya Ermenîstanê jî bibînin. Êzdî, ku bi jimara binecîyên xwe va ji miletêm kêmjimar pirtir in, li Ermenîstanê xwedî jîyana perwerdehîyê-kûltûrî ne û ev hemû hewcê wê yekê ye, ku bê sîstêmatîzekirin. Em gerekê bikaribin îro alî pêşketina kûltûra xwe bikin. Ne axir ew bingehê heyetîya her miletekî ye. Em li rex ziyareta xwe navbendeke ruhanîyê, kûltûrîyê saz dikin, armanca wê gerekê ew be, ku miletê me di hêla ruhanîyê û xwendinê-kûltûrayê da pêş bikeve. Ez bi hêvî me, ku li vir wê herdem ruhanîyek hebe, yê ku çawa li Lalişê, wê ne tenê qirarên dînî pêk bîne, lê usa jî wê alî wê yekê bike, ku nisleta niha terbîyetdarîya ruhanî bistîne, koka xwe û rehê xwe nas bike. Wê derveza ziyareta me ya bedew hebe. Li wir wê sîmvolên êzdîyatîyê hebin: di ortê da tav, lê li rexan wê taûs hebin. Hilbet, ewê bibe parek ji komplêksa ziyareta me.

Dor û berên ziyaretê tê tundurustkirinê bona ew bibe warê hêsabûnê, bi dar û tûmên bi ber û dêkoratîv va. Kesên têne ziyaretê dikarin bîna xwe vedin, di bin sîya wan daran da serhêsa bin. Dibe di paşwextîyê da li vir ziyareteke diha mezin bê çêkirin. Çimkî wê jimara bawermendan û tûrîstan her zêde bibe. Der û dorên ziyaretê wê hertim bê sûrkirinê û li vira wê heykelê dostîya gelên ermenî û êzdî bê danînê. Em zanin, ku ew dostî bi hezaran salan bûye. Ew dostanî xwesma li Ermenîstanê mehkemtir bû, di dema jîyana herdu miletan ya bi hev ra ya weke du sedsalan da. Em zanin, ku di dema Qira ermenîyan da êzdî jî zirareke mezin dîtin. Gelek îzbatî hene, ku êzdîyan jîyana malbeta xwe kirine bin xeterê bona birayên xwe yên ermenî biparêzin. Derheqa vê yekê da Tehsîn Beg jî got, ku kalikê wî li warên êzdî lê diman bi hezaran ermenî ji xezakirinê xilaz kirîye. Gelek qewmandinên ha bûne, ku dibe îro hatine bîrkirinê, lê ew nîşana dostanîyê ye, ku herdem jî di navbera ermenîyan û êzdîyan da hebûye. Gelek êzdîyan jî texmîn kir, ku ew îdî hew dikarin bi tirkan ra tevayî bijîn, mihacirî Ermenîstana Rohilatê bûn. Ez tenê bêjim, ku ji malbeta me li Îdirê 64 kes hatine kuştinê. Tenê çend kes xwe xilaz kirin, xwe li çemê Erez xistin û li ser axa ermenîyan sitar bûn.

Meriv dikare derheqa dostanîya gelên ermenî û êzdîyan da dûr û dirêj xeberde. Xwestina min ew e, ku derheqa wê yekê da him gencên ermenîyan, him jî yên êzdîyan bizanibin û wî edetî pêşda bibin, ku di nav gelek salan da zexm bûye. Niha li bajarên Rûsîyayê yên cuda-cuda da ermenî û êzdî li rex hev dijîn. Mesele, li navbenda kirîn-firotanê ya li Moskvayê ya bi navê "Şengal", ku ez serkarî lê dikim, ermenî û êzdî li rex hev dixebitin. Dema vekirina ziyareta li Aknalîçê gelek ermenî bi wê armancê bi xusûsî ji Rûsîyayê hatibûn û heta kutasîyê jî tevî şahîya me bûn. Ez şa me, ku hurmetgirtina ermenîyan û êzdîyan dualî ye û tu pirsgirêkek tune, ku di dema çareserkirina wan da hevfemkirin tunebe. Ez wê jî zêde bikim, ku ew qedirgirtin di hemû dereceyan da hene. Sala par, dema ji Lalişê dêlêgasyoneke mezin bi nûnerên ruhanîyê yên desteya bilind, parlamêntar, ronakbîran va hate Ermenîstanê, rastî qedirekî mezin hat. Metranê hemû ermenîyan yê herî mezin Garêgîn B serekê êzdîyên dinyayê Mîrê Mîran Tehsîn Beg wek birayê xwe qebûl kir. Di navbera serekên ruhanî yên herdu miletan da sohbeteke hewaskar û ji dil qewimî. Wana bi dilovanî derheqa wan bûyerên di nav dîroka herdu miletan da qewimî destnîşan kirin, dema rojên oxirmên giran da ermenî û êzdî hertim jî rex hev bûne. Û serekê ruhanî yê êzdîyan nuxseke Încîlê ya taybet wek hedya da serekê ruhanî yê hemû ermenîyan. Rasthatinên ji dil û germ hatine derbazkirinê usa jî li Parlamêntoya Ermenîstanê, li hukumeta Ermenîstanê, li wezîretên Ermenîstanê yên kûltûrayê û karên der, li beledîya Yêrêvanê.

Hemû rasthatin li ser bingehê qedirgirtina hev, pêwendîyên germ da derbaz bûn. Ango, li ser bingehê wê dostanîyê, ku di zû da di navbera ermenîyan û êzdîyan da saz bûye. Di dema wan rasthatina hate texmînkirinê, ku lazimaya berdewamkirina wan pêwendîyên dostanîyê heye. Û ew dostanî dikare di her dereceyan da hebe, heta di dereceya ruhanîyê da jî. Yek ji endamên dêlêgasyona ji Lalişê hatî bi dilekî baristan got, ku li Ermenîstanê qîmetîyên ruhanî rind hatine parastinê. Em gerekê van gotinan

bona xwe bikin rênîş û di nav milet da gelekî behsa navenda me ya ruhanî – Lalişê bikin, em gerekê taybetmendîyên bawermendîya xwe rast raber bikin, bi karê terbîyetdarîya ruhanîyê va mijûl bibin.

Dikarin di navbera xebatkarên bi xwendinê û perwerdeyê va girêdayî rasthatina teşkîl bikin. Wezîrê înformasyonê yê Herêma Kurdistana Fêdêral li Ermenîstanê bû. Wî pêşnîyar kir rasthatina mamostayên zimanê kurmancî teşkîl bikin, cêribandinan hev biguhêrin derheqa sazkirina kitêbên dersdayînê da. Ewî got, ku eger herdu welat qayîl bibin, wê demê dikarin mamostayan hazir bikin, pirtûkên dersan amade bikin.

Dikarin goveka hevrakarkirinê diha fire bikin. Endamê parlamêntoya Kurdistanê Hazim ji navê serokê parlamêntoyê dêlêgasyona parlamêntoya Ermenîstanê teglîfî Îraqê kir. Ez bawer im, ku ew pêşnîyareke giring e. Çima rastî hev neyên û hewil nedin bi hev ra kar bikin? Dibe tesîra endamên parlamêntoyê bibine bingeh bona karê bi hev ra zêde bibin. Bi riya hewayê, ango bi riya rastene ya here kurt va em gelekî nêzîkî hev in û ev yek wê di karê sazkirina hevkarîyê û pêşdabirina wê da rola xwe bilîze. Ne dûr e, ku em di hêla aborî û bazirganîyê da jî hev ra kar bikin.

Lê ya here ferz dîplomatîya gelêrî ye. Dibe êzdî bixwezin herine ziyareta xwe ya li Lalişê? Li wê herêmê ermenî jî dijîn. Ez bawer im, ku ewê jî bixwezin pevgirêdanên wan bi welatê wan ra hebe. Ango, mecalên hevrakarkirinê yên mezin hene. Wana gerekê rast û bi aqilane bi kar bînin.

Sal 2013

Li welêt gelek kar heye an jî em Ermenîstanê bikine welatê xeyalên xwe

Ez xên ji Ermenîstanê li tu cîya xwe wisa baş texmîn nakim. Gava tême Ermenîstanê, qet naxwezim ji vir herim. Heyf, wisa qewimîye ku kar û barên min yên sereke li Moskvayê ne. Lê ez hertim ser wê fikirê me, ku ez ser demekê çûme û zû an dereng ezê vegerim. Îro li her deran derheqa mihacirîyê da xeber didin. Ez timê jî ber xwe dikevim, ku derheqa wê yekê da dibihêm. Ev yek me hemûyan, wisa jî êzdîyan mecbûr dike ser vê pirsê bifikirin. Eger welatîyên me didine ser rê û li xerîbîyê bextewarîyê digerin, ew nayê wê maneyê, ku ewê wê bextewarîyê ji sedî sed bibînin. Bona gelekan xewn û hêvîyên wan dibin lêgerînên bêfeyde li xerîbîyê. Sed heyf, ku ew ermenî û êzdî jî têne navbenda me ya kirîn-firotanê, ku dû wê yekê ra, ku xebatê nabînin, bê pere dimînin, ji me pera dixwezin bona bikaribin vegerine Ermenîstanê. Gotina min ew e, ku dema welatê xwe dihêlî, hizdikî ser demekê be jî, gerekê bifikirî ka çi dikare bê serê te.

Bawer bikin, ku karê me li welêt diha pir e. Havînê bextê min lêxist, ez rojên berevkirina zerdeleyan li gundê Baxramyanê, navçeya Armavîrê bûm. Di rê da, li rex baxçeyekî em sekinîn, me dît ku tevaya zerdeleyan ketine bin darê. Dilê min gelek êşîya. Çi dewlemendtî ketibû erdê! Eynî zêr bû...

"Kes tune, ku berev bike û bibe,- baxçevan got.- Min çiqas karibûye, berev kirîye, firotîye. Yên din di bin darê da ye".

Piranîya ekin li wir e. Ez bi pêşekê xwe va zaneyê karê malhebûna gundîtîyê me, û ez zanim, ku hema malhebûna gundîtîyê dikare ne tenê rewacên Ermenîstanê têr bike, lê dikare

wî ekinî bifiroşe der va jî, him fêkî, him jî pincar. Eger bi aqilane tevbigerin, fêkîyên me li her welatekî dikarin bêne qebûlkirin û ewê bi dilê bikirçîyan bin. Ez rast bêjim, ez haj pê tuneme, ka li Ermenîstanê bona pêşdabirina karê malhebûna gundîtîyê çi tê krinê, çi bername hene, lê dikarim serbest bêjim, ku Ermenîstan dikare bibe welatê deranîna fêkîyên herî baş. Em bixwezin, nexwezin, em welatekî agrarîyê ne jî, xwelîya me bi bereket e, gundîyên me xebathiz in. Lê hûn zanin ew kengê bînteng dibe? Gava ew bi tenê ye, gava alî wî nakin, bi çavekî biçûk li wan dinihêrin an jî bawerî pê naynin.

Dema ez dibêjim gerekê alî gundîyan bikin, ew nayê wê maneyê, ku gerekê ava wî ya avdanê hebe, malzemeyên xwelîyê an jî têknîk ber destê wî bin. Mesele, lazim e wisa bikin, ku riyan bibînin bona ekin di wextê da bigihînine bikirçîyan, lê ne ku wisa, ku me li Baxramyanê dît, bi çal û kortên yekmêtrê va. Bi vî halî meriv nikare ekin bibe derekê û tu kes jî wê neyê ber derê te, ekinê te nekire, çimkî makîne wê di nîvê rê da wê xirab bibe.

Gelek kes ser wê bawerîyê ne, ku dema ji Ermenîstanê dertên, dikevine cinnetê. Ew ne wisan e. Lema jî meriv gerekê dûr û dirêj bifikire, paşê biryara xwe bide. Bawer bikin, ku kesên li der va dijîn, bi fikiran va her roj, her gav li vir in, li Ermenîstanê. Ez li Moskvayê rojê hezar caran bi fikiran va berê xwe didime vira, ez li rêyên zarotîya xwe ra digerim, bi merivên xwe yên nêzîk û qewimên xwe ra dikevime sohbetê. Bi kêmanî ji bo min Ermenîstan başqe ye, ne mînanî tu warekî din e, ew hertim min ber bi xwe kaş dike. Ermenîstan welatê min e, û emirê min çiqas zêde dibe, ew diha zêde min ber bi xwe dikişîne, ji sibê heta êvarê. Û ez nikarim guh nedime wî dengî, çimkî ew deng ber dilê min zef ezîz e.

Û em gerekê wê dara bawerîyê mînanî ronahîya çavên xwe biparêzin. Em nikarin wan hemû tiştan winda bikin, ku me dest anîye. Lema jî gerekê wê dara bawerîyê av din, miqatî lê bikin, alî bikin, ku bigihîje, ber bide.

Em gerekê Ermenîstanê bikine welatê xeyalên xwe, ku wêderê

her mecalên bona jîyaneke bextewar hebe, her kes xwedî kar be, bikaribe bixûne, bê qenckirinê, bikaribe hêsa be. Û meriv tenê bi riya xebatê, berxwedanê, serketina di hindava dijwarîyan da dikare bigihîje van yekan. Û hemû miletên li Ermenîstanê dijîn xwedî van karebûnan in.

Rast bêjim, min dixwest li vir xeberdana xwe xilaz bikim. Lê ezê berdewam bikim. Ez fem dikim, ku îro destê dewletê nagihîje her deran. Dijwar e her tişt kontrol bikin, rasterê bikin, piştgirî bikin. Lê dewlet gerekê alî bike, ku cîyên kar bêne sazkirinê. Kesên ku îro dihêlin diçin, an karekî peyda nakin, an jî maeşê sitendî têra jîyanê nake. Dibe sebebên moralîyê-psîkologî jî hebin. Ez naxwezim wan kesan hêvîşikestî bikim, ku xwe li riya xerîbîyê digirin, lê dixwezim bêjim, ku ewê rastî gelek dijwarîyan bên, bira nefikirin, ku ew diçine welatekî bê qisûr. Ev alîkî da. Ji alîyê din va, rastîyê jî gerekê bîznêsa biçûk û orte aza be, lê bi wê ra tevayî jî dewlet gerekê zêde tevî wî karî nebe, bacên giran bi sitiyê wan va neke. Li vira merivên min hene, ku ber wan dijwarîyan tab ne kirin û êdî xwe nadine ber karê kirîn-firotanê. Bona wê yekê jî welat diterkînin. Bernameyên dewletê yên ferih û zelal lazim in û ez ser wê bawerîyê me, ku îro bona dewletê pirsa sereke gerekê sazkirina cîyên kar yên nû be û gerekê maeşekî wisa bikaribe bide, ku milet bikaribe kêm-zêde baş bijî. Gelek welat – wek Çînistan, Taîland bi wê rê ra derbaz bûne û bi ser ketine. Ermenîstan gerekê bikaribe zona aborî ya azad bi aqilane bi kar bîne.

Ka em ji alîyê din va vê meselê binihêrin. Ez nimûneyekê bînim. Navbenda bajêr gerekê bi dikanên gelek nûjen va neyêne tijekirinê, wek "super", "giper" û bi duruşmên din va. Ewana tesîrê li ser dikanên biçûk dikin û gelek karmendên wan dest ji karê xwe dikişînin. Ermenîstan gerekê bibe welatekî wisa, ku ekin û berên xwe bifiroşe der va, heta hasilet û hebûna malhebûna gundîtîyê jî, wek fêkî û pincar, hela fêkîyên hişkkirî jî, wek qeysî û yên din.

Ez li gelek welatan qesidîme û min dîtîye, ku fêkîyên hişkkirî, ango qeysî, yên Tirkîyê ne. Lê ew wek yên Ermenîstanê ne tem in

û ew buhatir in jî. Niha hûn dikarin bêjin, ku ew kar li Ermenîstanê jî tê kirinê. Erê rast e, lê ez dibînim û dibihêm, ku xwedîyên fêkîyan nikarin zêdaya fêkîyên xwe bifiroşin, bigihînine bikirçîyan. An jî buhayê wan ewqas erzan in, ku heqê xebata wan jê dernakeve. Merivekî min li gundê Aşnakê heye, ku nexwestîye zerdeleyên xwe bi 50 draman bifiroşe, ew kirîye nava dolaban û jê araq çê kirîye. Ez nizanim ew çend lîtr araqa ji zerdeleyan çêkirî wê çiqas alî mala wî bikin, lê ez zanim, ku ew meriv hêvîbir bûbû û bona qazancê berê xwe dabû warên dûr û derez û ji bo wî karî hatibû cem min. Min jî seredana merivê xwe kir, ez bi bax û baxçeyên wî va heyr û hijmekar mam, lê êşîyam, ku ew hêz û qewata berê nemaye. Lê eger fêkî di wextê xwe da û bi buhayên bilind bihatana kirînê, bawer im rewş wê bi awayekî din bûya.

Ezê titşekî teze nebêjim, eger destnîşan bikim, ku hertim jî guhdarîyeke mezin danîne ser karê malhebûna gund. Îro li her welatekî hewil didin, ku xwelî zêde ekin bide, xizmetî merivan bike, bona xwelîbêcerkir jî têr bin. Zanin, ku eger wisa nebe, wê demê ewê berê xwe bide bajêr. Ew pirseke din e, ku xwelîbêcerkir xên ji wê yekê ku ber û ekinê baş digihîne, bi wê ra tevayî jî karê tûrîzmê va mijûl e an jî karê xizmetkarîyê dike.

Li cihanê gelek modêl hene. Her kes wan nas dike. Meriv gerekê bifikire, ka ji wana kîjan dikarin kêrî Ermenîstanê bên. Cêribandinên me jî hene. Em carina dikevin nava bûyerên ecêb. Ewqas xwelîya me ya ekindar heye, lê em difikirin çawa parî nan peyda bikin.

Sal 2013

Cêribandina ermenîyên dost an jî Pirsgirêkên me yên xwendinê-kûltûrîyê hene, ku hewcê çareserîyê ne

Gelek caran ji min dipirsin: ev her tiştê tu dikî, çi ye? Ez bersîva wan didim, dibêjim: -dilê min û ruhê min wisa dixwezin, belkî jî dilrehmî ye, xizmetguzerî ye. Şikir ji Xwedê ra, ku dîroka xizmetkarîya ermenîyan dûr û dirêj e. Bazirgan-xizmetkarên ermenîyan bi kar û barên xwe va berbiçav ketine. Wana dêr û dibistan çêkirine, sêwîxane û malên kal û pîran xwedî kirine, alîkarîya kesên di tengasîyê da kirine. Ez zanim, ku him Alêksandr Mantaşyans, him Mîkaêl Aramyans, him Galûst Gyûlbênkyan, him Alêk Manûkyan û yên din xizmetên mezin kirine û tu caran bi dengê bilind derheqa karê xwe yê kirî da negotine û çawa dibêjin, li defê nexistine, û ser wê bawerîyê bûne, ku ew tiştekî dikin ne bona wê yekê, ku derheqa wê yekê da bêjin, lê bona bikaribin xizmetî miletê xwe bikin. Ez xwe wek wana nabînim, ez wê yekê dikim, ku dikare kêrî gelê min bê û ez wî karî wek ermenîyên dilxwez dikim, ku karên mezin kirine.

Bazirgan-xizmetkarên ermenî yên bi nav û deng borcê xwe dihesibînin xizmetî gelê xwe bikin, berê xwe bidine milet û herdem jî bang kirine, ku li rex milet bin, her tişt bikin bona çareserkirina pirsgirêkên xwe. Ez bawer im gelek bazirganên ermenî jî ser vê bawerîyê ne. "Hûn destê qewîn yê miletê ermenî ne, hûn qinyat didine dayîreyên wê, hûn hebûn û xizna wî ne". Gelek baş hatîye gotinê. Tiştekî veşartinê nîne, ku êzdî gerekê di vê dereceyê da ji ermenîyan gelek tişt hîn bin. Merivên me yên dewlemend, ku

teze li ser qedeman sekinîne an jî merivên teknevs hewil didin gavan bavêjin ne tenê bona çareserkirina pirsgirêkên êzdîyan, lê usa jî alî ermenîyan û rûsan jî bikin, herwiha miletên mayîn jî. Van axirîyan dostekî minî baş pirtûkên derheqa Alêksandr Mantaşyans, Mîkaêl Aramyans û yên din wek pêşkêş dane min, di nav wan da kitêbeke bi sernivîsara "Şuxulvanîya ermenîyan ya bazirganîyê-aborîyê li ser axa Tirkîya niha: ji sedsala 15an heta sala 1915an". Min li wir tiştekî balkêş dît: xizmetkarên ermenî dema lazim bûye karê dilrehmîyê kirine û firqî danenîne ka filankes ji çi miletî ye, xwesma dema qezîya hatîye serê milet, an jî milet ketîye halekî giran, xelayî ser wan da hatîye. Lê her kes zane, ku ya sereke gerekê çareserkirina pirsên milet bin. Di vê pirsê da karê me gelek e. Em gerekê berev bin, pirsên xwe yên miletîyê, civakî yên here giring safî bikin. Mesele, ev çend sal in em derheqa navbenda êzdîyan ya perwerdeyê-çandê li bajarê Rewanê da xeber didin. Dîwana bajarê Rewanê bi xemxurî berbirî vê pirsê dibe û ez bawer im, ku emê bibine xwedîyê navbendeke wisa. Li vira hevgirtina me lazim e, em ferztîya wê pirsê gerekê rind fem bikin. Dema ermenîyên dewlemend di wextê da dibistan didane çêkirinê, piştgirîya bernameyên kûltûrî û perwerdeyê dikirin, rind zanibûn ka ew dayîre wê bi çi karî va mijûl bibin. Ez van axirîyan pê hesîyam, ku Hovhannêsê Stêpan Ananyan (Ananov), ku li goristana Vagankovê ya ermenîyan da hatîye binaxkirinê û bona bîranîna wî minareyek hatîye çêkirin (xudanê wê Vardgês Sûrênyans e), di kutasîya sedsala 19an da piştî mirina jina xwe qirar dike li Tîflîsê dibistana jinan ya bi navê Hovnanyan-Marîamyan çê bike. Berî qeydên Sovyet bêne testîqkirinê, ev dibistan di karê pêşketina perwerdekirina jinên ermenî da roleke giring dilîst. Meriv wisa texmîn dike, ku ev camêr – Hovhannês Ananyan zanibû ka bona çi vîllaya xwe ya pir buha difiroşe û gelek pere jî dike ser bona sazkirina wê ocaxa xwendinê-perwerdeyê. Ev hemû gerekê bona me bibin nimûne û rênîş. Dibe em mecalên bona terbîyetkirina nisleta me ya di hêla xwendinê-kûltûrayê da jî saz bikin. Ez

îdî derheqa wê yekê da nabêjim, ku em gerekê bi her teherî alî parastina erf-edetên xwe, eyd û erefatên xwe bikin.

Em di ku da jî herin, em bi dil û ruhê xwe va li vir in. Em bi dil û can pêyî li axa welatê xwe dikin û em dixwezin, ku rêça me li wir bihêlin. Ez dixwezim dîsa behsa bazirganên ermenî yên xêrxwaz bikim. Ez careke din dixwezim dewlemendên xêrxwez yên ermenî bi bîr bînim. Ez zanim, ku di salên 2012-2013an da 1700 salîya Alêksandr Mantaşyans û Mîkaêl Aramyans dane kivşkirinê. Texmîn bikin, ku karên wan merivan tu caran nayêne jibîrkirinê. Bextê min lê xist, ez li Yêrêvanê tevî 170 salîya bûyîna Mîkaêl Aramyans bûm, min dîna xwe da fîlma derheqa wî da, min kitêba "Mîkaêl Aramyans. Jîyan û şuxulvanîya wî" xwend. Rastî jî meriv dikare gelek tişt ji merivên wisa hîn be, ku armanca wan ya here sereke ew bûye, ku xizmetî gelê xwe bikin. Ev meriv diçûne wir, li ku hewcê wan bûn. Wana tu caran bona dilrehmîyê, xêrxwezîyê, alîkarîyê derê kîsikê xwe girtî ne hîştine.

Bona min hurmeteke mezin bû rastî nebîyê Mîkaêl Aramyans – Alêksandr Canoyêv bêm û ji navê gelê êzdî 1700 salîya kalikê wî yê bi nav û deng pîroz bikim.

Ez şa bûm, gava min dît ku ew jî ber bi koka xwe vedigere. Alêksandr Canoyêv bi dilgermî derheqa gelê êzdî da xeberda, got ku li dervayî welêt hevalên wî yên êzdî hene, ew haj ji dîroka êzdîyan heye, zane, ku ew li Ermenîstanê jî dijîn. Ne axir Tîflîs bajarekî pirmilet bûye û kalikê wî emirê xwe li Tîflîsê derbaz kirîye. Û li Tîflîsê gelek salan êzdî diman, piranîya wan jî ji Ermenîstanê bûn. Ango, dostanîya ermenîyan û êzdîyan him li Ermenîstana Rojava, him jî li Ermenîstana Rohilatê, him Gurcistanê, him Kavkazê û him jî li warên din bûye. Îro ew dostanî li Rûsîyayê berdewam dibe, li warên cuda-cuda, li welatên din û ya sereke jî ew e, ku hevaltî bi hev ra dikin. Jimara hevalên min yên ermenî li Moskvayê gelek in.

Ez vegerim ser pirsên miletê me. Îro komeke bazirgan, xêrxwez û ronakbîrên êzdîyan saz bûye, ku îro ne tenê di dewatan

da, an jî, dûrî ocaxên me, di şîna da berevî ser hev dibin, lê bona çareserkirina pirsên gelê me yên miletîyê, kûltûrayê, perwerdeyê berev dibin. Wextê min dixwest dest bi çêkirina ziyareta Aknalîçê bikim, min li Moskvayê gelek nûnerên miletê xwe berevî ser hev kir û min derheqa wê yekê da ji wan ra got. Bona min ya ferz ew bû, ku ew bi min ra hemfikir bûn.

Kengê wana got erê, êdî gerekê dest bi kar bikin.

Di nav me da gelek kes hene, ku dixwezin ji miletê xwe ra bibin alîkar, bi kêmanî li gundên ku em lê bûne, li wan deran hewil didin xanîyên kûltûrayê teze bikin, baxçeyên zaran tundurust bikin, alî xwendkaran bikin, ku bikaribin heqê xwendina xwe bidin, herine hewara wan kesan, ku di tengasîyê da ne.

Karê xêrxwezîyê wa dest pê dibe, gava ji hebûna xwe parekê başqe dikî bona çareserkirina pirsên gelêrî, alî wan kesan dikî, ku hewcedar in.

Gava em berevî ser hev dibin û li ser van pirsan fikra xwe dibêjin, em texmîn dikin, ku her kes dibêje tiştê ferz ew e, ku alî xwendina gencan bikin. Lê gotinên ha gerekê bêne mîyaserkirinê. Îro dervayî Ermenîstanê gelek êzdî hene, ku di dayîreyên xwendina bilind da dixwînin. Em vê yekê nikarin derheqa Ermenîstanê da bêjin. Dibêjin, ku jimara wan gelek kêm e.

Bingehê parastina milet ziman e, dîn e, erf-edet in, eyd-erefat in. Ji bext ra ev hemû hatîye parastin. Lê wê baş bûya, ku bernameyên me yên derheqa pêşdabirina zimên da hebûna. Ez şa me, ku kitêbên dersan yên bona silsileta niha hene. Lê pêşekzan dibêjin, ku ew her tişt gerekê bêne veçêkirinê û nûjenkirinê. Dostên me yên ji Îraqê jî hazir in di wî karî da alî me bikin. Em dikarin keda xwe bikine di nava vî karî da, bi gotineke din, em dikarin bernameyên ji bo alîkarîyê amade bikin, alî wî karî bikin bona kitêbên xwendinê-mêtodîyê yên ser dereceya bilind bêne sazkirinê. Ez êdî derheqa wê yekê da nabêjim, ku pêşekzanên me hewcê wê yekê ne, ku ji bo wî karî xwendina taybet bistînin. Meriv dikare cêribandina welatên dinê bi kar bîne. Li vira jî

em gerekê gelek tişt ji cêribandina dostên xwe yên ermenî hîn bibin. Min bi dilekî baristan kitêba Arakêl Sarûxan ya bi sernavê "Alêksandr Mantaşyans: bazirgan û xêrxwezê mezin" xwend. Avtor dibêje, ku Alêksandr Mantaşyans çawa pereyan başqe dikir bona xwendkarên ermenî, yên ku dervayî welêt dixwendin. Hela di ser da jî, salê carekê seredana wan dikir, guh dida daxwezên wan. Lê piştî xwerinê xwendkaran di bin tebaxên xwe da zerf didîtin, ku di wan da pereyên bona xercên mehekê hebûn. Bona me hurmeteke mezin e ji van kesên ruhmezin tiştan hîn bibin. Hovhannês Ananyan jî wek wî dikir, ku gencên ermenî yên aqil yên Tîflîsê xwendina xwe li Moskvaê, li Înstîtûta Lazaryan ya zimanên dereke da xwendina xwe berdewam bikin. Ev hemû bona me nimûne ne. Ez zanim, ku bona pêkanîna van yekan wê asteng hebin, lê bêy xwendina baş emê nikaribin bibin miletekî pêşketî.

Pirsgirêkên me yên miletîyê-kûltûrîyê-xwendinê gelek in û em gerekê xwe li riya çareserkirjna wan pirsgirêkan bigirin. Li vira jî wê cêribandina dîrokî û ya demên nû ya ermenîyên dostên me kêrî me bê.

Sal 2013-2014

EZDIKI.COM

Dewsa paşxeberê an jî Bona êzdîyan Ermenîstan welat e

Dost û xêrxwazên hêja, ev bû, ku min dixwest ji we ra bigota. Ez fem dikim, ku îro emir ewqas zû pêş dikeve, ku gava ev kitêba min bikeve destê we, hinek tişt wê guhêrî be. Ez dixwezim, ku ew guhartin yên baş bûna û tiştek ser emirê merivan da zêde bikirana. Êzdî û ermenî miletên wisan in, ku keviran datînin ser keviran, dixwezin ku warên wan bedew û şên bin, ku dewleta me qewîn û ser xwe be, dostanîya me mehkem û hevgirtî be.

Her kes zane, ku tiştê herî xurt di nav merivan da – ew bawerî ye. Ez dixwezim, ku ew bal herdu miletên me ser dereceya pêşin da bin. Gava min du sal berê guh dida sohbeta serekên me yên ruhanî Garêgînê B. û Tehsîn beg, min fem kir, ku destpêk û berdewamîya dostanîya me li ku ne, û bona çi ew dostî wisa mehkem e. Û ew yek, ku ziyareta me ya li Aknalîçê ji Dêra Êcmîadzînê ya Nûranî ne gelek dûr e, gelek sîmvolîk û balkêş e. Min texmîn ne dikir, ku ziyareta êzdîyan li cîkî din da bûya. Ez bawer im, ku di paşdemê da metranê hemû ermenîyan wê rojek ji rojan seredana ziyareta me bike. Ewê bona me bibûya rojeke nav û nîşan. Ne axir em di duryanên hêvîyê û bawerîyê da herdem li rex hev bûne û me xwe li riya dostanîyê, meriv dikare bêje biratîyê, girtîye û me ev her tişt parastîye, mînanî ronaya çavên xwe xwey kirîye.

Her sal, 29ê meha îlonê roja ziyareta me ye. Wê rojê gelek kes wê bêne Ermenîstanê, Aknalîçê. Êzdî wê ji cî û warên dinyayê yên cuda-cuda bêne vira, wê duayên xwe bikin û wê usa jî hurmeta xwe di hindava Ermenîstanê û ermenîyan da dîyar bikin. Çimkî Ermenîstan îro bona bi dehan hezaran êzdîyan welat e. Û bona

me her kesî welat ew war e, ku bêy wî emir dibe tiştekî vala.

Ziyareta me her sal wê bona wana ecêbeke xweş raber bike. Di wî alî da sala 2014an wê saleke berbiçev be. Li vir wê 29ê îlonê heykelê dostanîya gelên ermenî û êzdî bê vekirinê, bi bedewî û sîmvolên xwe va. Dora vî heykelî wê heykelên wan kesan bin, ku kedeke mezin kirine nava dostanîya ermenîyan-êzdîyan da, wek Ûsiv beg, Zoravar Andranîk, Cangîr axa. Li vira wê nîvheykelekî kevirî daynin bona bîranîna şehîdên Gelkujîya ermenîyan ya mezin, ku wê pêşkêşî 100 salîya Gelkujîya ermenîyan be. Ev her tişt wê îsal be.

Bona min riya, ku ber bi ziyaretê dibe, bû qeder. Ez û gelek welatîyên min borcdar in çiqas ji dest me bê, ewqas pir di wê rê ra herin, ku bona me bûye tiberk.

Me gişkan dîsa xwe li riya ziyaretê girtîye û em borcdar in wê rêyê bi hurmet û qedirgirtin derbaz bin.

NAVEROK

Dewsa pêşgotinê an jî fikir û dîtinên
Mîrzeyê Çolo Siloyan yên ji dil û xeyalên wî 5

Banga 100 salîya Gelkujîya ermenîyan û vegera
Cangîr axa li ziyareta Aknalîçê 9
Ruhê dostanîya ermenîyan-êzdîyan 31
Ji Lalişa Nûranî heta Aknalîçê
an jî di duryanên dostanîya ermenîyan-êzdîyan da 53
Riya ku ber bi ziyaretê dibe. Pey du salan ra 66

BINGEHÊN PAQIJ YÊN DOSTANÎYA QEWÎN Û BIRATÎYA DILGERM

Çar mezinayên dostanîyê an jî Rêwîtîya ber bi welêt 76
Berbanga edil ya behra Wanê 131
"Di rojên oxirmên giran da gelê ermenî li rex me ye" 138
"Ev qirkirina êzdîyan ya 74an e"
Riya ku ber bi ziyaretê dibe: pey salekê ra 142
Riya ku ber bi ziyaretê dibe. Pey du salan ra 158
Têksta fîlmê ya nivîskî ya
"Riya ku ber bi ziyaretê dibe: pey du salan ra" 168
Riya ku ber bi ziyaretê dibe: pey salekê ra 186
Riya ku ber bi ziyaretê dibe 202

BIRATÎYA ME ME DIGIHÎNE HEV

Sipasî ji gelê ermenî yê bira ra 235
Êzdî: ewledên Rojê 239
Hisreta welêt di dil da 258

MÎYASERBÛNA XEWNA SURÎ

Ji merivên xwe yên nêzîk ra sipas nabêjin
an jî Riya dijwar ya xwenaskirinê..... 272
Merivê herî bextewar an jî Ziyaret bona sedsalan tê çêkirin 278
Em li rex hev jîne an jî Dostanîya me qewîn û mehkem e..... 281
Himberî pirsgirêkên sedsala 21ê an jî
Dijwarîyên diyaspora êzdîyan..... 288
Li welêt gelek kar heye an jî
em Ermenîstanê bikine welatê xeyalên xwe..... 292
Cêribandina ermenîyên dost an jî Pirsgirêkên
me yên xwendinê-kûltûrîyê hene, ku hewcê çareserîyê ne..... 296
Dewsa paşxeberê an jî Bona êzdîyan Ermenîstan welat e 301

MÎRZEYÊ ÇOLO SILOYAN

RIYA KU BER BI ZIYARETÊ DIBE: PEY SÊ SALAN RA

ՄԻՐԶԱ ՉՈԼՈՅԻ ՍԼՈՅԱՆ

ՏԱՃԱՐ ՏԱՆՈՂ ՃԱՆԱՊԱՐՀԸ. ԵՐԵՔ ՏԱՐԻ ԱՆՑ

МИРЗА ЧОЛОЕВИЧ СЛОЯН

ДОРОГА, КОТОРАЯ ВЕДЕТ К ХРАМУ: ДВА ГОДА СПУСТЯ

Berpirsyarê weşanê – Galya Hovhannîsyan
Berevkirina ser kompyûtêrê – Anahît Arzrûmsyan
Foto – yên Garnîk Mosînyan, Samvêl Galstyan, Garîk Abêlan, Sêrgo Yêrîtsyan
Nexş-nîgarîya kompyûtêrîyê – Hêxînê Pîloyan, Lîana Mînasyan
Xemilandina serrûpelê – Arabo Sargsyan

ԷԴԻԹ ՊՐԻՆՏ
Երևան, Թումանյան 12
հեռ.՝ (374 10) 520 848
www.editprint.am
info@editprint.am

EDIT PRINT
12 Toumanyan str., Yerevan
Tel.: (374 10) 520 848
www.editprint.am
Info@editprint.am

